# HIKYATÊD CIMETA KURDA

Սիրով նվիրում եմ իմ
հայրենի երգի գրքերն
Հայաստանի Ազգային
Ակադեմիայի Գրադարանին։

Հաջողեն ձեռքի դասայծ

Բրիգմա Զաքար

ԱՍՈՂԻԿ

8.07.05

# ՔՐԴԱԿԱՆ ԺՈՂՈՎՐԴԱԿԱՆ ՀԵՔԻԱԹՆԵՐ

A II 90241

ԳԻՐՔ
VI

ԳՐԱՌՈՒՄ,
ԱՌԱՋԱԲԱՆ ԵՎ ԾԱՆՈԹԱԳՐՈՒԹՅՈՒՆՆԵՐ
ՀԱՋԻԵ ՋՆԴԻԻ

«ԱՍՈՂԻԿ» ՀՐԱՏԱՐԱԿՉՈՒԹՅՈՒՆ

ԵՐԵՎԱՆ

891.57-3

# HIKYATÊD CIMETA KURDA

KITÊBA VI

A II 90241

BERNIVÎSAR,
PÊŞXEBER Û NIVÎSARNASÎ
YÊN HECÎYÊ CINDÎ

Академия наук Армянской ССР
Фундаментальная библиотека

Weşanxana "Asoxîk"

Yêrêvan 2005

# DU GILÎ

15 sal berê, sala 1990-î, 1-ê gulanê Hecîyê Cindî xatirê xwe ji jîhanê xwest, çû ax û barê sar...

Lê wê neyêne temirandinê ew karên pir mezin, ku ewî kir bo gelê xwe, bengzê wîyî qencîyê, ruhê wîyî mervatîyê.

**Kar û barê doktor, profêsorê kurdî pêşinî li dewrana sovêtîyêda Hecîyê Cindîye nemir wê heta-hetê bibriqin li ezmanê dîroka kurd û Kurdistanê.**

Hecîyê Cindî kitêba "Hikyatêd cimeta kurda"-ye 1-ê sala 1961-ê, ya 2-a sala 1962-a, ya 3-a sala 1969-a, ya 4-a sala 1980-î, ya 5-a sala 1988-a bi pêşxeber û nivîsarnasîyava dabû weşandinê.

Eva kitêba "Hikyatêd cimeta kurda"-ye **şeşane, ku me girêdayî 15-e salîya wefatbûna Hecîyê Cindî-va bi hizkirin hazir kirîye.**Dewsa pêşxeberê me gotarên H. Cindî û F. Jewarî danîne. Nivîsarnasî jî ne tam bûn. Çi ku pey her hikyatekê hatibûn nivîsarê-me cî-war kirin.

Her hikyatek usa hatîye nivîsarê, çawa hikyatbêj gotîye.

Hikyat bona terbiyetdarî, perwerda silsileta, bona lênihêrandina zanyarî, lêkolîna zimîn, edet, rabûn- rûniştandina gel di hindava celebên hunurê efrandina wanda gelekî ferzin.

## XEZNEXANEKE GEL

Nava çanda kurdada zargotina(folklora) wêye kevne-teze, ya ku gelekî dewlemend û pirjanire, cîkî herî layîq digire. Ew sal bi sal dewlemend bûye, şaxvedaye, gulvedaye.Nimûnê efrandinêd wê notlanî kitêbxanekê ser hevduda hey zêde bûne, nava gelda bela bûne, hatine hasil kirinê, şimşat kirinê.

Di vê xezna nehesabkirîda, bawer bike, emekê her nefereke wî gelî heye: hergê bi efrandina xweva, tişt ber xwe derxistinêva, hergê bi jêhilanîna xweva.

Dengbêjî, zargotin nava kurdada bûye edeteke usa, çawa reqas û eyd- erefatin. Nava zargotinêda temamîya emir, rabûn û rûniştandin, edet, fikirdarî û xwestinên gele dewr û zemana têne kivşê. Nava wê zargotinêda dilê gel dikute, serbilindaya wî tê xuyan, fîlosofîya emirê wêyî qurn û dewrana tê raçev kirin.

Ewî gelî bi ahil û cahil, bi xort û qîz, bi kal û pîrê xweva li ser zargotina xwe karekî mezin kirîye, ruhê xwe kirîye nav, hel kirîye, qurne pey qurinê mak û dewlemend kirîye û anîye gîhandîye me.

Zargotina me, çawa cewek, nava sal û zemanada bûye çemekî mezin, sal bi sal teze bûye û eynî wî xeysetîye, çi ku gel bi xweye, bûye neynika dilê wîyî sidqtemiz, aqa helal, çiqa çilka şîrê dê

Zargotina gelê kurd efrandina temamîya gele bi dînê başqe-başqeye(musulman, êzdî, ele-îlahî, xaçparêz), gelê ku ji hevdu parparî bûye (Kurdistana Îraqê, ya Tûrkyayê, ya Îranê û Sûryayê).

Meneke dewlemendbûn û dûmikdirêjîya zargotina me ewe, wekî sal û zemana hukumetêd xerîb nehiştine gelê me xwe li rîya xwendinê bigire.Dewsa wê nava gelê meda zargotinê pervedaye.

Her nimûneke zargotina kurd tu sînorekî dewleta nas nekirîye: ji her sînora, çawa teyrê atmece hewabir bûye, gihîştîye her qulçekî Kurdistana, sed yazix, hê par-parî kirî.

**Hecîyê Cindî**

## DEWSA PÊŞXEBERÊ

Sala berê xatîya bavê min- Kida Îvo, ji gundê Pampa Kurda (naha Sîpan) hatibû Yêrêvanê.Çendekî hate mala me mêvan.

Bavê min, Hecîyê Cindî, bona nivîsara zargotinê çûbû gundêd kurmanca.Du rojê dinê bavê min hat.Çawa hergav-bona hatina xatîya xwe zef şa bû, paşê balole kaxez danî ser texte û bi beşereke xweş, ji xwe pir razî, go:

- Min xizneke çawa berev kirîye…Eva beyta, ku min bernivîsîye, filankesê gotîye, eva kilama - bêvankesê…

Xatîya Kidê pirsî, go:

-Tu navê wan merîya jî dikî deftera?

Go:- Erê welle, navê zarbêja miqîm dinivîsim!

- De wekî usane,-xatîya Kidê pir hewas got,- êvarê ezê jî tera du-sê çîrokêd biçûk bêjim. Navê min jî, fireya seheta xwe, têke deftera.

Go:-Ser çevara, xatî can, tek tu bêje!

Êvarê xatîya Kidê çend hikyatêd çûk gotin, û Hecîyê Cindî ber nivîsî.

Sibetirê kêfa xatîya Kidê tunebû,bêhewas, medekirî bû. Ewê go:

- Îşev-mişev xew nekete çevê min.- Û berxwe ketî, melûl zêde kir:- **Mala minê, ax min qirikê… Hecî, lawo, hema bi van çîroka, qelîbotka tu ebûra xwe dikî…?**

Hecîyê Cindî emirda kêm dikenya, lê vê carê bi dil têr kenya, rabû xatîya xweye kinêze xîret paç kir û go:

- Xwedê min bêy "çîrok û qelîbotka" neke, xatî can.Ez wana hiz dikim, naxwezim ewana bêne bîr kirinê, unda bin: ji xanimê mîna te hîvî dikim-minra beyt, kilam, hikyat, qelîbotika bêjin, û ez jî ber binvîsim.

Sal buhurîne… Belê, Hecîyê Cindî bi zargotinê (folklorê) ne ku tenê ebûra xwe, lê usa jî ebûra gelê xwe dikir, ebûra ruh û rusqetê.Hecîyê Cindî jîyana xwe pêşkêşî "milkê malê"- berevkirin, lênihêrandin û weşandina zargotina gelê xweyî pir hizkirî kir.

Salêd şerê cîhanê yê ewil, hêna zulma Romê, rev û bezê Hecîyê Cindî ji êl û êşîra xwe qetîya, xunavê xwe: dê û bav, xûşk û bira, kalik û pîrikêd xwe unda kirin… Sêwîxanada mezin bû. Hecîyê Cindîra tenê mabûn rutbê kurmancîyê, xîreta miletîyê û sidqê qencîyê.

Gundêd Ermenîstanêye kurmancîye- Elegez, Qundaxsaz (naha Rîya teze), Pampa Kurda (naha Sîpan), Heko, Tilik, Gelto û yêd din

bona Hecîyê Cindî bi tomerî bûne gundê zarotîya wî - Emençayîra duda. Zargotin jêra bû dengê dayîka wîye Zozana Îvo.

Zilamê êr û misken, dê û bav undakirî bi hesta undakirinêye xedar texmîn kir, wekî dur û cewahirê gel- beyt-serhatî, hikyat, kilam, meselok jî dikarin bêne unda kirinê.

Hecîyê Cindî nivîsîye: "Xizneke cimetê dewr û zemana xwey kirî hema li ber çevê me dihelya, beteve dibû...Ewê femdarîyê rihetî nedida min" (binhêr- Pêşxebera berevoka H.C. "Meselok û xeberokêd kurdî").

Û ewî bernivîsî...

"Min çiqa zargotin dinvîsî,-Hecîyê Cindî danî bîra xwe,- ew aqas minra dibû xûn û goşt, û min qirar kir, wekî dur û cewahirê zargotina me berevkim, wekî ew ne ku tenê ji undabûnê xilaz bin, lê usa jî bibine arzîtîya zanyarîyê, arzîtîya gelek silsileta. Zargotina me pir dewlemende, îlahî beyt-serhatîyêd wê kevirêd qîmetlîne..."(binhêr- pirtûka "Hecîyê Cindî : jîyan û kar", Yêrêvan, s.2003).

Hecîyê Cindî sala 1936-a, 28 salîya xweda berevoka **"Folklora kurmanca"** hazir kir û da weşanê. Ev berevoka karekî pir giran bû, qewmandineke berbiçev nava dîroka çanda kurdada. Ji 660 rûpêlêd wê 584 rûpêl Hecîê Cindî nivîsîye, 76 rûpêl -hogir û pismamê wî, kurdzanê eyan Emînê Evdal nivîsîye. Hecîyê Cindî 30 şaxêd (varîyantêd) êposa "Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî", 172 kilamêd bengîtîyê,66 efrandinêd zarotîyê, 41-yêd govendê, 11 kilamêd Evdalê Zeynikê, 31 beyt-serhatî (çawa "Mem û Zîn","Zembîlfiroş", "Xecê û Sîabend", "Memê û Eyşê", "Leyl û Meclûm", "Dimdim", "Dewrêşê Evdî" û yêd mayîn), usa jî 25 hikyat cî-war kirine.

**Zêndîtîya xweda Hecîyê Cindî 82 pirtûk dane weşandinê-**yêd zanyarîyê, dersa, pêdagogîyê, zargotinê û bedewnivîsarê.Ewî romana bihagiran **"Hewarî"** nivîsî, kîjan bi zimanê rûsî, ermenî, erebî hate wergerandinê û weşandinê Heta 400 miqale, lêkolîn, pêşxeberêd wî û qinyatêd mayîn rojneme û kovarêd başqe-başqeda hatine çap kirinê.Bi veçêkirina H.Cindî bi deha çîrokêd kurdî bi zimanê ermenkî û rûsî di kitêb û berevokêd cudada ronkayî dîtine.

**Şêst salada li Ermenîstanê tû dereceke kurdzanîêye usa tune, ku Hecîyê Cindî bi karêd xwe dewlemend ne kiribe** (binhêr-pirtûka "H.C. jîyan û kar").

Hecîyê Cindî sala 1985-a, pirtûkeke mezin , ya ji 880 rûpêlî - berevoka "Meselok û xeberokêd cimeta kurda" da weşanê. "Nava vê

berevokêda meselok, xeberok û firazêd gelê kurda hatine cî-war kirinê, yêd ku bi nêta dîrokzanîyê, terbetîyê, bedewsinetîyê pareke zargotina kurdaye dewlemende zefe hêjane. Ewana bona hîndarîya zimên, bedewnivîsarê, dîrokê û miletzanîyê çevkanîya ferzin",-em ser rûpêla berevokêye pêşin dixûnin. Akadêmîkê ermenîyayî eyan Aram Xanalanyan pêşxebera pirtûkêda nivîsîye: "Ew ênsîklopêdîya gelê kurdaye-ya emirê wê, aqilbendî û fikirdarîya wêye bedewsinetîyêye..."

Doktor Çerkezê Reş nivîsîye: "Sertaceke kurdzanîêye tomerîye berevoka "Meselok û xeberokêd cimeta kurda". Bi vê xebata mezinva Hecîyê Cindî qey bêjî xwest bêje - çika şuret û xebathizîya helale enzel emirê mezin da jî çi to ecêba kûltûrîêye terikî dikarin bikin, çi to efatîya bînine sêrî... Qinyatêd çapa ji hiş-aqila der,rênîşêd tiştanîyê, nevsîyê, cî-warîyê wê kitêbê digihîne hêlanê têkstologîya folklorîêye here bilind, dikine xebateke monûmêntal (gotara "Bavê zargotina cimeta kurd", pirtûka"Hecîyê Cindî, jîyan û kar",s.2003).

Du salê din, 80salîya xweda, H. Cindî du kitêbêd xwe jî dane weşanê.Yek ji wan berevoka "Hikyatêd cimeta kurda"-ye pênca bû.

Hecîyê Cindî çend roja berî mirinê- weyseta xweda, evan xebera jî nivîsî bû **..."Cimeta mine hizkirî, ez deyndarê zimanê te,efrandin û zargotina te bûme û bi helalîya şîrê dîya xwe tera xebitîme, wekî deynê te ser min nemîne.Gelo min ew deyn çiqa vegerandîye, ew jî bira Xwedê zanibe.**

**Zef ji te razîme...Xebatêd xwe û pêra jî navê xwe tera dihêlim, ew jî, gelo, wê kêrî te bê?**

**Nizam, wextê ya xwe bêje!**

**Xatirê we!**

Hecîyê Cindî
25-ê nîsanê, s.1990,Yêrêvan"

**Frîda Hecî Cewarî**

# 1. ELO Û FATÊ

Wextekî mêr, jinik û du zarêd wan hebûne. Zareke wanaya kur bûye, ya dinê qîz. Qîzik ya mezin bûye. Emirê Xwedê tê ser jinikê- ew diçe remetê. Herdu zarêd wê dimînin êtîm. Mêrik dinhêre ebûra wan nave - dizewice. Çawa gişk dêmarî, ew jî ber mêrik heyfe, lê dilê xweda naxweze wanaya bivîne. Gilîkî, yeke bê Xudê bûye. Malêda çi ku diqewime, dibê: "Elo krîye".

Salekî mêrik toxim hazir dike ku biçîne. Ew dizîva toxim diqelîne. Wê salê wanra ji wê zevîyê nan şîn nave. Dimîne sala mayîn. Jinik divê:

- Mêrik, çika ez herim ser koçekê - qe risqê mera çi divê?

Êvarê wextê razanê keçik nava wê êratê bûye,ew hişyar dimîne nava cîda. Mêrik divê:

- Jinik, koçekê qe çi got?

Jinik divê:- Koçekê çi got- mala wî xravbe, go: "Du zarêd êtîm hene: bivin serê zeviyê têkin qurban, wê nanê we dîsa şînbe".

Mêrik divê:- Na, wekî ez birçîna bimirim, ew yek nave!

Jinikê zanibû ku mêrik dixapîne, go:- Lê em bê nan ça bikin, bona herdu zara em gişk gerekê bimirin?

Mêrik nihêrî boşe, serî jinikêra nayê kutanê, go:

- De ezê sivê herim bajar, tu nan bide zara, paşê wan bive serê zevîyê têke qurban.

Fatê nav cîda nifir bavê xu kir, ku direve, wêya bawar dike. Sibetirê mêrik çû bajar. Jinikê zarara nan kire kaxê, danî ber wan. Fatê go:

- Elo, hilde bireve, ez çiqas divêm- "dayne", tu daneyne.

Elo kax hilda li ber xûşkê û revî. Fatê pey ket û go:

- Elo, dayne, - danenî, - Elo, dayne, - danenî...

Ewana bi wî teherî li gund derketin. Xudê zanibe çiqas çûn. Hew nihêrîn ro çû ava. Sîngê çîyakî rûniştin, nanê xu xarin. Elo nigê xwe kaxê xist. Kax çû derkete binê gêlî.

Fatê go: - Elo, te çima ew kax avît, ne ew çêkirina dya me bû?

Fatê panzde- şanzde salî hebiye. Elo wir rûdinê, lê Fatê peyayî binê gêlî dibe bona kaxê. Diçe kaxê dibîne. Dinhêre va nava qamîşda devê avê koçikserek. Ker- ker diçe, dinhêre va yekî Bejinbuhust veleziyaye razaye. Sîtilek jî tujî birincê kişmîş kirî li wire. Kaxa xwe tujî brinc dike, ker- ker tê digihîje birê xu. Herdu têr duxun, çi ku dîtibû birê xura gilîdike.

Em bînin ser Bejinbuhustê rû hirî. Ew hişyar dive, dinhêre va ser sîtila wî dewsa desta, ew divê: "Dive jî maşoqa min lê hildaye", pasê duşurmîş dive, divê: "Ew bêyî min tişikî hilnade. Ez xu bitelînim, çika ew kîye, ku tê dizîya min?". Bera ew xu veşêre, em bên ser Elo.

Elo divê:- Xûşkê, ez nartisim, îro jî ezê herim dizîya wî.

Ew kaxê hildide diçe koçiksera Bejinbuhust. Ça ku dixaze birinc dagire, Bejinbuhust divê:"Eva çîye, ku bixum. Ez wî bavêm çelê, bira bive xurê mişika ". Ça ku Elo davê çelê, Elo dike qûrîn. Perî, maşoqa Bejinbuhust biye, ku dengê merîya dibihê, ji otaxa xu dertê, divê:

- Ew çi bû?

Bejinbuhust divê:- Ew cûcikekî hêkê bû.

Sivetirê ça ku Bejinbuhust diçe nêçîrê, Perî tê ser çelê, divê:

- Xorto, tu saxî, yanê mirîî?

Elo divê:- Ez saxim, lê serê min işkestîye.

Perîyê şirît dahiştê, ew derxist. Elo hê biçûk bû, teze çarde salî - derxistina wî rehet bû. Perîyê serê wî girêda, av anî ewî destê xu şûşt. Nan anî, ewî çiqas karibû xar. Xura cem wê ma hetanî nêzkaya hatina Bejinbuhust, ew bir paşda dahişte. Wî cûreyî ewê Elo du sala xay kir. Elo bû xortekî gotina we. Perîyê wir ya xu Elo kire yek. Çiqas roje Elo dikete çelê, lê hema Bejinbuhust ku diçû- ew derdiket. Lê îjar ne ku pê şirîtê, Elo xura pêpelînikek çêkiribû -pê diketê, pê derdiket. Pêpelînk ji çelê dernedixist.

Bira ew xura ha derbazke, em bêne ser Fatimê. Pey çûyîna Elora Fatê gelekî digirî, divê: "Wî birê min hebe- tunebe kuşt, loma jî Elo neziviri". Ew girya- girya xewra çû. Hew nihêrî yekî deyil wê kir. Ewê çevê xu vekir, nihêrî -êvare, yek ser wêra sekinîye. Siyar divê:

- Qîza delal, rabe, tu nizanî ku eva erdê Bejinbuhuste, wê bê te buxe.

Ewî xortî Fatê terkiya xu kir, tevî xu anî nava hevala. Hevala ku Fatê dîtin kenyan, gotin:

- Kuro, malava, em ziravqetî bûn bona te, me go :"Hebe- tunebe ew Bejinbuhust, ku dibû xezal, ew xapand". Lê dinhêrin rastî jî te xezal girtîye.

Ew xort kurê padişê biye, tevî hevala çûbine nêçîrê:Bejinbuhust dikeve dilqê xezala, ku wî bixapîne. Lê bextê wî çê biye- rastî keçikê tê û îda nade pey Bejinbuhust. Kurê padişê keçik xura anî malê, go:

- Dayê, eve keçika ruhê min, ezê wê jî bistînim.

Jina padişê divê:

- Lawo, ew yeke êtîm, çolê mayî, tê ça bistînî? Herge dixwezî ezê xwera têkim carî.

Lê gededivê:- Na, dayê, Fatimêra îro şûnda dibêjin Fatime xanim.

Jina padişê dinhêre boşe, keçikê dişîne hemamê, hemamîş dike, deste kincê laîqlî lê dikin, rastî jî dive Fatime xanim. Merî hizêmekare lê binhêre.

Jina padişê divê:- Lawo, tu ça ketibûyî wan çol besta?

Çi ku hatibû serê Fatimê gişk wêra gilî kir. Xanimê gelekî gunê xu wê anî, qîza wê kete bîrê... Cab dane padişê, ku kurê wî xura qîzek anîye. Jina padişê ew rind çêkir- bisikê wê şekir, çevêd wê kilikir- bire dîwanxana padişê. Padişê gelekî bûk begem kir, emir kir, ku karê dewatê bikin. Jina padişê dil nekir ku defêxin, lê padişê go:

- Jinik, raste tu bona Perîyê ber xu dikevî, lê şikir roja îroyînra, ku kurê me nehatîye kuştin, diyê me vênesyaye...

Bira ewana xura şabin, em bînin ser Perîyê û Elo. Elo Perîyêva ya xu dikin yek. Perî hemile dertê. Rokî ew Elora divê:

- Elo, em ça bikin ku ji Bejinbuhust xilazbin? Hal- hewal eve, - hetanî wî çaxî ewana xwera tev dijîtin, qet bona kuştina Bejinbuhust duşurmîş nedibûn.

Elo go:-Perî, tu dikarî pê bihesî ruhê wî kuye?Ewî ne yekî tewakele -ruhê wî ne qalibê wîdane, yanê na nahakayî hatibû kuştin.

Êvarê Perî serê xu datîne, dinihêre Bejinbuhust tê. Bejinbuhust divê:

- Ha, Perî xanim, bêje, çi te qewimîye, te serê xu danîye? Yekî forma min maşoqê teye, çi dixazî ezê tera bînim.

Perîyê go:- Malava, ez temamya rojê tenê gêj dibim. Yanê neçe nêçîrê, yanê jî ruhê xu bide min ez pêra şabim heta tu têyî.

Bejinbuhust gelekî duşurmîş dive, divê:

- Rastî jî tu gelekî belengaz bûyî, te reng avitîye. Lê ruhê min dûre, ew hevt tebekê binê erdêdane, hundurê qutîya pola dane, navdil beranê qerdane...

Sibetirê Perîyê gote Elo:- Ruhê wî hevt tebekê binê erdêdane. Riya wê merî dikare gomêra bikeve, derê çelê afirê hespê qerdane. Hetanî ew hespê qer neve nêçîrê -em nikarin derî vekin.

Du ro derbaz dibin, Bejinbuhust hespê qer dibe nêçîrê. Ça ew diçe Elo ji çelê dertê. Ew Perîyêva peynê afir didin yalîkî, Perî jêra divê:

- Elo, tu wextê peya divî, hundurê bîrêda derîk heye, tu ewî derî hêdîka veke, wekî beran pê nehese, ew te nevîne, yan na- ewê te bikuje.

Ew zincîrê tîne, Elo dadihêle. Elo wextê peyayî bîrê dive, dike gazî, Perî zincîrê dikşîne, dive dîsa davêje nava peyîn. Elo ça ku Perîyê gotîye hêdîka derî vedike, diçe avê dibire. Paşî nîvro dinhêre beranê qer hate ser avê, beran avê navîne -paşda diçe. Roja dinê Elo kete teldê zinarekî, dinhêre beran tîbûna sistbûyî ancaxkî xu çêmra gihand û wir av nedît, mexel hat.

Elo parava ça ku pê şûr lêxist, beran pirpitî. Elo dadayê zikê wî qelaşt, nihêrî rastî jî va qutîke- çapa qutîya papîroza bin dilê wîdane. Ewî qutî vekir, nihêrî sê hêkê çapa hêkê reşêla têdanin. Ewî ça hêkek işkênand- ew der- dor gişk şîn bûn, kevir- kuçikê wira nava şînayîda indabûn. Herdu hêkê dinê qutîyêva kire paşila xu, hat kete bîrê. Ewî kire gazî, şabûna ewî Bejinbuhust bîr kiribû. Wexta dengê wî tê, Bejinbuhust te ser bîrê, divê:

- Kuro, tu kura ketî wir? Bextê tera ezî kêfsizim, yanê na minê tu wirda bifetisandayî.

Wî çaxî Elo hêka duda jî dişkêne. Wextê ew hêkê dibîne, dixaze xu bavêje bîrê, ku destê Elo derxe, lê Perî dike gazî, divê:

- Elo, zûbike wê jî bişkêne!

Elo wê jî dişkêne. Bejinbuhust û hespê qer wira dikevin. Perî zincîrê dadihêle Elo derdixe. Wextê Elo derdixe, derê bîrê vedibe. Wira tujî merî dibin, lavaya dikin, ku wana jî derxin. Elo dixaze wan derxe, Perî nahêle, divê:

- Na, Elo, wextekî xirave, dinyake bêbexte. Were em herin, ezê bavê xura bêjim bira du xulama bişîne wan gişta jî derxin.

Çiqas hebûna Bejinbuhust hebûye gişkî hespa dikin, berê xu didin şeherê padişê.

Wextê digihîjine perê şeher, Perî çend zêr dide golikvanê şeherê bavê xu, divê:

- Kuro, here mizgînîyê bide padişê, bê -qîza te Perî hat...

Wextê padişa pê dihese, sînota xuva diçe pêşiyê. Ça ku hev dibînin, Fatê xu davêje pêsîra Elo, lê Elo wê nas nake. Cimet gişk dimîne şaş. Fatime divê:

- Cimet, eva xortaya -Eloye, birê mine!

Wiraya hêja şabûn dikeve nava hazira jî, nav wanaya jî. Ew çûn mirazê xu şabûn.

Sibetirê Perîyê go:- Bavo, Bejinbuhust gele merî pê sêrê kiribûn kevir. Wextê ew hate kuştin ewanaya gişk saxbûn. Du xulama bişîne, bira herin wanaya derxin.

Usa jî kirin. Kutabû çû.

## 2. ŞERÊ JINA

Carekê hebûye, tunebûye mêrikek û jina wî hebûne. Halê wan pak biye. Herro, sibê zû, wedê mêrik dest-rûyê xu dişûşt, digot:

-Xudê, tu min xaykî!

Rokî jina wî go:- Malava, bê Xudê tu min ji şerê jina xaykî.

Mêrê wê divê:- Jin çine, wê çi min bikin? Bivin agir jî nikarin min bişewitînin.

Jina wî ser vê yekê tevdiçîne. Rokî mêrik diçe cot. Jina wî ji dûkanê çend kîlo mesî distîne û tevî nanê wî dive serê cot. Wextê mêrik radike, ew dizîva mesîya davê xeta cot, tê xara rûdinê. Mêrikê feqîr gava dizvire, dinhêre va mesî xeta cotda: pê dikeve top dike, tîne dide jinikê: Divê:-Jinik, eva mesîne, min xeta cotda top kirine, bive çêke heta ez êvarê têm.

Ew nan duxe, jinik mesîya carek dinê tevî derdana paşda tîne. Mesîya çê dike, wan derê xu dide hevdu, mesîya jî vedişêre.

Êvarê mêrê wê ji cot tê westyayî. Tîne hine nan, toraq, pîvaz dide ber mêrikê reben.

Mêrik divê:- Jinik, çima te ew mesî çê nekirin, minê naha bi medekî baş bixara?

Jinik divê:- Mesîyê çi, tu min dikenî?

- Lê min mesî neda teda? Min xuxa pê destê xu xeta cotda top kirin.

Jinik divê:- Bo hişbe, te xewn dîye…

Yek wî, yek jinikê -digre jina xu dikute. Jinik dertê ber dêrî, dike gazî, divê:

- Gundo, mêrê min cina dikeve…

Gundî cînar hildişin mala wan. Mêrikê reben divê:

-Heyran, cinaketina çi? Min xeta cotda mesî dîtin, danê ku çêke. Naha ez dibêjim- ew min gunekar derdixe…

Gundî çevê hevdu dinhêrin û divên: " Welleh evayî rastî jî cina dikeve", - dest- pîyê mêrik girê didin, pê şiva germaşivê rind dikutin.

Mala wanda şevbihêrîyê dikin hetanî nîvê şevê, paşê gişk belayî malê xu divin. Gişk diçin, mêrik divê:

- Jinik, tu Xwedêda bibînî, lê min mesî nedan te?

Jinik divê:- Tu dixazî dîsa gazî gundîyakim -te bikutin?

Mêrik divê:- Jinik, tu Xwedêda bibînî, ez ne dînim, ez westîyayî, birçî -tu çira min hatî xezevê?

Jinik mêrê xwe dide sondê, paşê mêrikra gilîyê xwe dike...Mêrikê reben diçe dest- rûyê xu dişo, divê:

- Xudê tu min ya xirav xaykî, şerê jina xaykî...

Jina mêrik diçe wan mesîyê sorkirî tîne dide ber mêrik. Herdu rûdinîn tev nan dixun.

Ew çûn şuxula xwe, emê jî xilazbin ji emelê xwe.

## 3. MOZIK

Wextekî jin û mêrek hebûne. Ewanaya gelekî tembel bûne. Mozikeke wan hebûye. Herro wanaya bona avdana mozikê dikirin şer. Rojekî mêrik divê:

- Tu mozikê bive avê!

Lê jinik divê:- Tu gerekî mozikê bivî avê!

Mêrê wê divê:- Zanî çi, kî me ku xeverda, ew jî bera mozikê bive avê.

Jinik divê:- Bera gilîyê teve.

Jinik radive xwera diçe mala cînara, lê mêrik malda ber tendûrê rûdinî. Rêwîk li mala wan diqeside. Tê malê, dinihêre va yek ber tendûrê rûniştîye. Divê:

- Roj xêra te!

Mêrik deyn nake, çi zmanî xeber dide - mêrik deyn nake. Mêrikra dide xebera, çevê xwe digerîne, dinhêre xêncî qutîkî û deste nivîn tişkî wî tune. Wan nivîna dike bînanî bixuça qutîêva girê dide, dide ser pişta xu û rê dikeve. Xêlek şûnda jinik mala cînara tê, dinhêre- çi bivîne? Ne nivînê wê hene, ne qutîya cihêzê wê. Dibe qîrînya wê, divê:

- Ka qutîya min nivînava?

Mêrik divê bi eşq: - Te xeverda, tê mozikê bivî avê.

Jinik divê:- Ere, ezê mozikê bivim avê, ka qutî?

Mêrik divê:- Weleh yekî wa - vî teherî qutî nivînava hilda bir.

Jinik kel- bîn pey mêvan dikeve. Mêvan dinhêre -va kulfetek ça direve. Ew piştîyê xu datîne, rûdinî hetanî jinik tê digihîje. Jinik slavê didê, ew slava wê vedigire û divê:

- Çima usa direvî, evda Xudê?

Jinik divê:- Min mêrê xu kirîye şer, diçim mala bavê xu.

Mêrik divê:- Wekî aqilê te mêrê te nabire, ez jî bê jinim- were min bistîne.

Jinik pêra qaîl dive. Digîjne gundekî, îda êvar biye, diçine malekî. Ewê malê jî helîse çêkiri bûye. Helîsê tînin, jinik têr duxe. Kevanî divê:

- Xûşkê, tişkî etib tê tunebe, hûn çî hevin?

Jinik divê:- Bêmene em helalê hevdune.

Kevanî divê:- Xûşkê, mêrê te helîsê duxe?

Jinik divê:- Na, omida min, ew helîsê hiz nake.

Êvarê haşa wextê dikevin cîda, mêrik divê:- Jinik, ese medê min diçû helîsê, lê te çevê min têda hişt.

Jinik divê:- Malava, çima berxu dikevî? Çevê min korbe, min nizanbû tu helîsê hiz dikî. Helîse a wî qulçê handane, here bixwe, hinekî jî minra bîne.

Mêrik divê:- Jinik, lê navê te xêr?

Jinik divê:- haşa navê min Kubirîm.

Mêrik bera here helîsê. Em bînin ser jinikê: ça ku mêrik diçe, ew nivîna qutîêva hema usa girêdayî dide pişta xu, yala...

Mêrik têr duxwe, herdu lepê xwe jî wêra tujî dike, lê digere-nagere terîêda ser cîyê wê venabe. Li jinikê hêdîka dike gazî, haşa "Kubirîm, Kubirîm...". Jina xweyê malê deyl mêrê xwe dike, divê:

- Mêrik, rave, mêvan dixweze here destavê.

Gava çirê vêdixin, jinik divê:

- Mêrik, rave, haşa nava mêvan çûye, xu lewitandîye.

Malixê derî vedike. Mêrik dinhêre- jina wî çûye, ji malê dertê. Mêrikê reben şerma îda paşda nayê, wê şevê serê xu hildide û diçe...

Jinik digîje malê, mêrê wê divê:

- Te xu pêşîyê xeverda, de mozikê bive avê...

Jinik teze poşman dive, ku ew mêrê xuyî efsene nehişt, tevî wî mêrikê dinê neçû...

## 4. XASÊ

Carekî pîrek hebûye, du kurê wê hebûne. Herdu kurê xu dizewicîne, lê qêmîş nake nan bide bûkê xu. Carekê bûka mezin divêje bûka biçûk:

- Were em xura du kata lêxin, hê xasîya me nehatîye.

Xasîya wana tê bîna kata hildide. Gundê wan jî dewat biye: radive herdu bûkê xwe dive dewatê- şabaş dide ser şabaşê, ku kate paşila bûka bikeve, bûk bivin oyîn. Bûka biçûk divê bûka mezin:

- Xûçê, ez dirtisim.

Lê ya mezin divê: - Nertise, min rind cî kirîye, hişk girê daye, ha banzde, ha banzde. . .

Xasî dinhêre boşe, bûka tîne malê. Ça neheqî -çar roja nan nade wan. Bûk birçîna xu hev nagirin, lê ça bikin, xasîyê ar kirîye nav kox. Bûka mezin diçe tewilê, kerê tîne lê sîyar dibe, diçe du nana eşkevt derdixe.

Xasî tê dinhêre dewsa simê kerê nav kox. Divê:

- Raste, sim- simê kerêne, lê fêl- fêlê Xasêne.

Bûk dinhêrin sitara wan destê xasîyêda tune...Xasî diçe zozana. Rokî Xasê diçe biniya kon, haşa xu tezî dike, pêda- pêda herî dike porê xu, berî ser xu dide, tê dor xasîyê. Wisa dike - xasîyê hiş dêxe û paşda tê mal. Êvarê ji çîyê yek tê, cavê dide kurê pîrê, ku halê pîrê tune.

Kurêd wê, bûkêd wê diçin. Kurê wê divê:

- Dayê, çi te qewimîye?

Pîrê divê:- Xasê, Xasê...

Yekî cînar divê:- Divê malê, kevantîya min bispêrin Xasê...

Êvarê pîrê qurbana hazira dive. Kevantî jî, hemîn, digihîje Xasê.

Dinyayêda tiştê usa jî diqewimin, ha...

## 5. AHMED Û MERGÎSK

Wexteke padişak hebûye. Ji ewled tewleda kur û qîzeke wî hebû. Rokê kurê padişê diçe seyrangê. Gelekî digere, dinhêre va mergîskeke sipî devê avê ser qumê xu daye tevê. Dide pey mergîsikê, digire, gelekî pê şa dive. Mergîsk dest dertê, direve. Ew jî dizivire malê.

Çiqas roje kurê padişê diçe cem mergîskê, jêra dive mijûlîke ferz. Em bînin ser mergîskê. Ew qîza padişê mergîska bû. Bavê wê nihêrî çiqas roje ew li mal dertê. Ewî du mergîsk ser kivş kirin. Wedê qîzik ji mal derket, wana dane pey wê. Ew çû gihîşte Ahmed. Ewana hev şabûn heta dereng, ew paşda revî, lê herdu mergîska ber qulê ew girtin, kirin orta xu birin. Ahmed ew yek dît, lê heta ser hişê xuda hat - ewana çûbûn.

Herro Ahmed dihate devê avê, lê mergîska wî tunebû. Rojekê ew çû ber qulê nihêrî- mergîsk derket, lê herdu mergîska ew paşda kaş kirin. Mergîskê go:-Ahmed, here, roja înîyê were.

Wedê ku wê xeberda- dihaka Ahmedê belengaz bû maşoqê wê. Ma hetanî înîya dinê, rok lê dibû salekî. Ew sivê şevda rabû çû ber qulê. Hema ça mergîsk derket, ewî girt kir berîya xu, anî malê. Yaşîkek tujî qûm kir -mergîska xu kirê. Rokî mergîsikê go:

- Ahmed, malava, te ez kirime vê şûşê, lê min zanibûya- ez tu cara tevî te nedihatim.

Ahmed go:- Lê te ça bikim, dixazî derxim?-Ahmed ew derxist û go: - An kêderê te xaş tê, wira jî bigere.

Êvarê Ahmed pey dîwana bavê xu dihate konta xu, nihêrî dengekî stranêyî xaş tê. Ew hêdîka çû telbê wî dengî -nihêrî li konta wî tê. Ewî derî vekir, nihêrî çi bivîne? Qîzeke bedew kincê sipî lê nav konta wîda xura distirê, dilîze. Ew ber derî ma qerimî. Keçik zivirî dît Ahmad lê maye metelmayî, go:

- Ahmed, isa li min nenihêre, ez qîza padişê mergîskame. Min tu begem kiribûyî, loma jî tevî te hatim.

Ahmed tirê xewne, pêşîyê nizanbû çi bigota, paşê ça xewê hişyar be- destê wê girt, bir ser cîyê xu da rûniştandinê. Lê şabûna wî gelekî nekişand. Rokî ewana cîda bûne, xûşka Ahmed ku tê wê qîzê paşla Ahmedda divîne, paşê dizvire krasê mergîskê ser îstolê divîne, ker-ker dive avêda berdide. Mergîsk radive divîne kirasê wê tune, divê:

- Ahmed, te krasê min avîtîye?

Ahmed divê:- Na, wele hebe tunebe Fatimê avîtîye.

Gazî xûşkê dike, xûşk divê:

- Ahmed, dive tu bona krasê mergîskê gazî min dikî? Min ew roda berda. Heyfa wê nîne wî krasî xuke, carî pêva bivînin.

Mergîskê go:- Raste, Ahmed can, ew kiras kêrî min nayê, lê qezyayê wî bê.

Em bînin ser kiras. Torçîyê axakî mesî digirtin, ew kiras kete tora wan. Wana birin dane axê. Axayî fêlbaz bû, lê nihêrî, na ne kirasekî xayîne, gazî xulama kir, go:

- Kî here xaya vî kirasî minra bîne, ezê kode zêr bidim wan.

Keskî dest bera nebir. Xulam çûn malê xu. Êvarekê torçî gelekî medekirî bû, dîya wî go:

- Çi te qewimîye, lawo?

Torçî go:- Çi bêjim, dayê, nizam axê me dîn bûye, nizam jî ez lê fem nakim. Me wê rojê, sirya mesî girtinê- kirasê mergîskekî torêda dît. Nahaka me bûye bela, divê:"Gerekî hûn xaya vî krasî minra bînin".

Pîrê go:- Ê, malava, lê tu çima qe minra navêjî, tiştekî heqê xu nîne, sivê min bive cem axê xu.

Sivetirê torçî pîredîya xu bire cem axê xu. Pîrê go:

- Selam tera, axê min!

Axê go: - Xêr bêyî, pîrê!

Pîrê go:- Kurê min giliyê te minra kir, loma jî ez hatim.

Axê go:- Belê, pîrê, ez sozê xu ne poşmanim. Hanê tera kode zêr heqê te, lê xêr- te nanî, ezê serê te lêxim.

Pîrê jêra razî bû. Zêrê xu da pişta xu bir mal danî. Sibetirê tevî kurê xu çû li wir, kuderê, ku ew kiras dîtibû. Pîre serwext bû, go:

- Kuro,lawo, xaya kiras wî şeherê himberdane, çimku av li wir tê.

Ew zivirî cem axê, go:

- Axayî saxbe, min pê gemîyê bivin li wî şeherî. Lê min bîr nekin, bira torçîkî te li wir xura tamekîda bijî, hîvya min be.

Ça ku pîrê gotibû, wana usa jî kir. Pîrê pirs- pirsîyara pê hesya, ku ew kirasê bûka padişêye. Pokî çû ber palata padişê sekinî, go:

- Ez xalîçene baş çê dikim. Min hildin cem xu. Ne min kure, ne qîze, hetanî ez xaşbim -ez mala wedabim. Paşê xêra dê û bavê xu kulme xalî têkin ser min.

Mergîsk qayîl nebû, go:- Ez pîra hiz nakim, pîr fêlbazin.

Lê Ahmed go:- De pîreke, guneye, hema tu biwelidî, wê zara te bihejîne.

Pîrê ma mala wanda, lê ew benî fêla xu bû. Rokî gote mergîskê:

- Bûkê can, tu qe malê dernakevî, ew ne başe bona saxlemîya te. Were ez te bivim nav şeher, devê avê, hewa lape baş li wire.

Mergîskê go:- Na, dîya pîr: ber ewlin ez gerê hiz nakim, lê ya duda- ez îzina xu Ahmed pirskim, paşê.



[library stamp]

Êvarê mergîskê nêta pîrê Ahmedra got. Ahmed go:

- Ê, çi bû, lê gelekî dûr neçin.

Sivetirê mergîskê pîrêra go:

- Dîya pîr, Ahmed îzina me da em îro herin.

Pîrê go:- Na, îro sebirke, şuxulê min heye, sivê emê herin.

Ew dizîkava li mal derket, çû cem torçî, go:

- Kuro, sivê filan sehetê gemî li vir hazirbe.

Bira torçî here gem, em bînin ser pîrê. Sivetirê pîrê mergîsk hilda çû devê avê. Mergîsk ku gemî dît, go:

- Dîya pîr, xu jor bigire, bira ewana me texmîn nekin, şerme. Wê nevêjin ev kulfetana li vir çi digerin?

Pîrê go:- Na, lawo, tu hundur dernakevî, haş tişkî tuneyî. Ev gemîya eşyayê baş tîne dirfoşe. Ewana arş- vêrşa xuda ketine, talaşa wan emin?

Ser vê xeberdanê pîrê dibîne nikare mergîskê bixapîne, dadidê wê hişk digire, dike gazî. Çar- pênc gemîçya dadane mergîskê dikine gemîyê û berê wê dizvirînin ber bi şeherê xu.

Êvarê Ahmed tê malê, dinhêre mergîsk tune. Xûşkê dipise, xulama dipirse, gişk divên, wekî, vê sivê ew pîrêva çûne, hê nehatine. Wê şevê Ahmed diçe devê ave, wekî pirs- pirsîara bike. Lê wir, kêderê pîrê mergîsk biribû -fêza wê derê xarinxane hebû. Ew wê gumanê çû, ku dibe jî hineka ew dîtibin. Bi salix, bi sûlixa yekî xulamê wê xarinxanê divê:

- Ahmed can, min nizanbûye, ku ew kulfeta teye. Pîrek yeke gelekî bedew anîbû li vir. Ewê ew kulfet hişk girtibû, wî çaxî çar- pênc mêra ew navhevdura kirin, avîtin gemîyê û rê ketin.

Teze Ahmed fem kir ew çi pîr bûye, ku ewî pê destê wê mala xu xrav kir. Ew hate malê, çû dîwanê gişk bavê xura gilî kir, lê dîya wî tunebû. Xatirê xu ji bavê xast û karê xu kir ku here, lê xûşkê go:

- Ahmed, ezê jî deste kincê mêra xukim tera bivim heval. Heger tu hatî kuştin, bra ez jî bêm kuştin, bê bira çimanim?

Ahmed nihêrî xûşk gelek ber xu dikeve, ew jî tevî xu hilda. Xudê zanibe rîya çend roja ew çûn -gihîştine şeherekî şên. Ahmed go:

- Xûşkê, em herin mala destebirakê bavê xu. Ew bazirganbaşîye, wê komekê bide me.

Ewana daxlî nava şeher bûn, îda berî êvarê bû. Çûn mala bazirganbaşî. Gava xulam cav da bazirganbaşî, ew hat çev Ahmed ket, de şabûna nizanbû çi bikira. Ewî ewana birin konta jorîn, ezet, qulix... Xeverdan, Ahmed go:

- Eva jî kurmetê mine, apo. Cîyê me cîkî daynin.

Xulama ew birin konta wan. Jina bazirganbaşî go:

- Mêrik, ew cahilana kîne?

Bazirganbaşî go: - Jinik, eva kurê wî padişayîye, yêd ku komek da min- ez ji qaçaxa xilaz bûm:eva nanê bavê wîye, ku nahaka ez û tuva rûniştine malda ber bexîrya germ dixun.

Sive xêr ser meda jî safî bû -ser wan jî. Jina bazirganbaşî nan danî, nanê xu xarin.

Ahmed go: - Apo, tu qe navêjî çika qizmeta me çîye?

Go:- Lawo, ezê çi bêjim, belkî kurê birê min çendekî hatîye mala apê xu mêvan.

Ahmed go: - Na, apo, qezyake mezin min qewimîye, hergê tu dikarî komekê bide minda.

Bazirganbaşî go: - Bêje, lawo, çi biye?

Ça ku hatibû serê wî gişk gilî kir li wanra. Bazirganbaşî go:

- Usane ew kulfeta teye ku zorê anîne? Îro çend roje mala wîda kêfe. Lê ew du mehela li me wêdane.

Ahmed go:- Apo, bi şer, dew wê gele merîyê vira zeyîbin, kulfeta min yeke isane ew nikare ser sîya wêkeve. Ezê xu têkim koçek, yan çevê min nabîne, bira kurmetê min jî bikeve bin milê min, min mal-mal bigerîne. Lê bira ew nizanbe, ku ez hatime mala te. Emê êvarê li mal derkevin. Tenê wedê em li vir dertên gerekî xulamê te hespa li wir hazirkin, bira şerê me neyê te.

Bazirganbaşî go: - Kurê min, jina wîye mezin xûşka mine, ewê komekê bide te.

Sivetirê deng şeher bela bû bona koçekê kor. Axê jî xulamê xu şand pey koçek. Koçek ça ku kete hundur, go:

- A, axayê min, ev çi qalme- qalime qapîyê teda?

Axê go: - Erê, koçek, min xura kulfetek anîye, çare pê nave, nayê yolê.

Koçek go: - Malavao, min haqasê isa aqil kirine...Tu xema meke, min bive konta wê.

Axa da pêşya wan, birin hundur. Gava mergîskê Ahmed dît, şabûna ew mabû xu bavîta ser lingê wî, lê Ahmed ew da fem kirinê, ku dûr here. Ahmed wanra nihêrî û got:

- Axayî saxbe, nahaka tu here herêma xu, carîke kulfet bişîne vira heta sivê. Sivê tê bistînî pêşkêşa xu.

Axa çû, carîk şand ber destê wan û temî dayê, ku ranezê. Bû nîvê şevê, Ahmed carî girêda, devê wê tijî pîne- mîne kir. Deste kincê mêranî derxist, mergîskê kir û hersêk bi komeka jina bazirganbaşî dizîva li mal derketin. Xulam gişk xewa kûrda bûn. Ça ku derketin, nihêrîn bazirganbaşî xulamê xuva hespê wan hazir girtine. Ewana xatirê xu ji wana dixazin û berê xu didin şeherê xu.

Bera ew herin, Xudê oxira wanrabe. Em bînin ser axê. Gava sivê axa çû, çi bivîne? Ne koçek heye, ne mergîsk, xulam jî hatîye halê fetisandinê. Bera Ahmed neferê xuva herin mala xu. Lê axa zû go:

- Kuro, gazî pîrêkin, hûn deh xulam pîrekî ne hêjene. Wana ça çûn, ku hûn hişyar nebûn?

Pîrê karê xu kir, dîsa hate şeherê padişê. Ahmad rokî malda rûniştibû. Xulamê wî -wî xulamê xarinxanê anî herêma wî. Ahmed go:

- Xêr hatî tu, xortê delal, pêşda were, rûnê.

Xort go: - Ahmed, ez hatime tera bêjim, wekî ew pîra jina te biribû -dîsa hatîye. Ewê vêsipê cem me nan û xarin xura istend.

Ahmed çend zêr dane wî û du xulam danê, ku pîrê bigirin, bînin. Xulam çû. Bi destê xort pîrê anîn dîwanê. Telalçîya telalê xistin, çiqas cimeta şeherê padişê hebû topbûn. Ahmed serhatîya xu û pîrê wanra gilî kir.Cimetê xuxa qirar danî. Hineka gotin:

- Poça hespêva girêdin, bira bela- belayîbe…

Lê hineka jî gotin: - Hestîyê wêye herame, wê pincarê û şînayê biherimîne, bira bavên ber kûçika.

Bi gotina gotîya pîrê para xu istand.

Yêd forma pîrê belkî gişk roja pîrê bivînin!

Ahmed, jina xwe jî çûn mirazê xwe şa bûn, hûn jî herin mirazê xwe şabin.

- Em zef ji te razîne!

## 6. NÊÇÎRVANÊD BIRA

Hebûye, tunebûye du nêçîrvan hebûne. Ewana bi pêşê xava gelekî eyan bûn. Herdu nêçîrvan birê hevdu bûn. Êvarekê, wexta zivirandina malê, soqaqeke tengda rastî wezîrê padişê tên. Wezîr, ku herdu bira cot divîne, dive agir xa dikeve. Rojekê divêje padişê :

- Padişayî caxbe, tu temamya rojê wa rûdinêyî, çokê teyê bikşin, saxlemîya tera ne başe.

Padisa divê:- Lê tu nikarim text bihêlim?

Wezîr divê:- Padişayî saxbe, haqas nêçîrvanê eyan şeherê teda hene, wana bişîne bira postêd şêra û pilinga bînin, temamya dîwanêda raxe: him dîwanê germ be, him jî - bedew be.

Padişa divê: - Tu xaş divêjî, wezîrê minî delal, lê ez ka kî bişînim, ku wê qirarê biqedînin?

Wezîr divê:- Emê herdu kurê Hesoê neçîrvan Ahmed û Semend bînin. Ewana hostê wî şuxlîne.

Sivetirê herdu bira hê cîda bûn, qasidê padişê hatin ber dêrî, elam dikin, ku padişa dîwanêda hîvîya wane. Herdu bira hevdu dinhêrin, kincê xa xadikin, diçine dîwana padişê. Elamî padişê dikin, ku nêçîrvan hatine. Padişa emir dike, ku wan bivin cem wezîr. Wezîr divê:

- Bira bisekinin hetanî destê xa dişom, deynê Xudê bidimê, ezê bêm.

Pey wan gilyara birê mezin gelekî hêrs dikeve. Birê biçûk ber dilda tê, divê, ku ew sebirke, mala Xudê sebirê avaye. Tê ber çevê birê mezin, wextê bavê wan şandin cîyê nehatinê. Ewî gote jinêda: "Tu fikara meke, herge ez nezivirîm- du kurê min hene, herdu geda û Xezalê xayke, ewanayê heyfa min hildin". Pey çûyîna bavê wanra, dîya wan belengazîyêda mir…

Semend deyl Ahmed dike, divê:- Tu duşurmîş neve, ancaxakî hatîye wext, emê heyfa bavê xa ji van xûnxura hildin.

Ro şîrin dive, wezîr tê. Wanaya hildide diçe dîwana padişê, divê:

- Padişayî saxbe, te çi qirar danîye? Evan şêrana hîvîya qirara tene

Padişa divê:- Gelî nêçîrvanêd delal, hûn ji maleke eyanin, berê pêşîyêda we qulix kirîye. Loma jî roja îroyîn min bona nêta xa hûn tegilîf kirine.

Ahmed divê:- Padişayî saxbe, bêje çika nêta te çîye?

Padisa divê:- Gerekê haqas postê şêra û pilinga bînin, ku temamya dîwanxanê bê raxistin.

Ahmed divê:- Padişayî saxbe, em nikarin miqabilî nêta te bin, lê gerekî tu jî qirarê mera razîbî.

Padişa qayîl dibe. Ahmed divêje:

- Çi xerc heye gişk kîsî wezîr. Bira wezîr hazirke sed gamêşî, bira çêke hewzekî, wir tijî şereva hevt sala bike, heqê qesava jî sitûyê wî.

Sivetirê wezîr hewzekî nava mêşeda dide çêkirin, tijî şerav dike, wan sed gamêşa dajo mêşe, dike axlekî, dizvire şeher qesava teglîf dike.

Em bînin ser herdu bira. . Hetanî wezîr axil dide çêkirin, şeravê dide anîn, herdu bira jî serê dara xara cî hazir dikin, ku fesalbe lêxistina terewila wanva.

Xêlek derbaz dive, axil tije şêr û pilingê birçî divin. Ewana naçin xarina gamêşa, qrûtî ser hewizê şeravê dibin, gava şeravê dixun, narîn wan tê, bê hemdî xa dikevin. Wexta gişk hiş ketin, bira gişk kuştin, hesav kirin teslîmî qesava û wezîr kirin, zivirîne mala xa.

Padişa ku posta distîne, gazî herdu bira dike, pêşkêşî wan dike du şûra û kîse zêr. Pey vê yekêra wezîr lê- lêbû xa bikuşta û wanra sond xar, ku çevê wanra bîne.

Em bînin ser kurê padişê -Xelîfe. Xelîfe, ku vê mêranîyê divîne, diçe cem herdu bira, hîvî dike, ku wîya cem xa hildin nêçîrvan. Herro, gava diçû nêçîrê, herdu bira ne dihîştin Xelîfe wan dûr keve, ku qezîya wî neqewime. Bona nanê nîvro Semend erd diqelaşt, şînayî radixist têda tije ser goştê nêçîra dikir, ser goşt jî tijî pincara xarinê -cetrî, pûng û gele pincarê mayîn dikir, paşê agir ser dadida. Hetanî wana hinekî bîna xa distand, rehet dibûn, nanê wan hazir dibû û wana nanê xa dixarin, radibûne dîsa nêçîra xa.

Rojekê wezîr duşurmîş dive -hetanî berbanga sivê. Berbanga sivê nêtek dikeve dilda. Sivetirê zû xa dîwana padişêra dighîne, taba xa nayne û divê:

- Padişayî saxbe, pirseke min heye nizam bêjim, yanê na, dilê minda dide alaya?

Padişa divê:- Bêje, wezîrê min, glîyê te minra qirarin!

Wezîr divê: - Padişayî saxbe, ku wextê te enî hestîyê fîlabe, wê her padişaîra forma xewnabe, tu qisûr tê namîne.

Padişa divê:- Lê em kê bişînin?.

Wezîr divê:- Emê Semend û Ahmed dîsa bişînin.

Padişa duşurmîş dive û divê :- Lê ew herduê tenê bikaribin?.

Wezîr divê:- Padişayê min saxbe, nezivirin jî- bona du nêçîrvana xu şeher xirab nabe?

Em bînin ser herdu bira. Herro, wextê têne malê, xûşka wan Xezal pirs dike bona Xelîfe.

Ewana pê dehesin, ku Xelîfe cîdane. Kurebeşkekî sor dikin, wekî herin dîtina wî.

Em bizvirin cem Xelîfe. Rokê Xelîfe divêje qaweçî:

- Qe dîwanêda çi heye, bona çi xever didin?- de, ew çend roje ew haj pê tune.

Qaweçî jêra divê, ku wezîr hatîye cem bavê wî - dixazin herdu nêçîrvana bişînin hestiyê fîla. Xelîfe dixaze rave, lê nikare. Dergevan elam dike, ku herdu nêçîrvanê bira hatine dîtina wî. Xelîfe emir dikewana bînin hundûr. Herdu bira tên hundur, slavê didine Xelîfê. Xelîfe slava wan vedigire û divê, ku wedekî xaşda hatine, divê:

- Ezê bihatama ber bi we, lê nexaşîyê mecal neda min.

Xelîfe emir dike- texte dide rastkirin xa û herdu birara. Ahmed xeber dide, laqirdîya dike, lê qe beşera Xelîfe xaş nave, Semend wê yekê texmîn dike, divê:

- Xelîfe, dive me tu iciz kirî? Îzina te heve, em ravin.

Xelîfe divê:- Guh bidine min ez çi divêjim, - divê, - Wezîr hatîye cem bavê min, ku we bişînin hestuê fîla, lê ez duşurmîş divim, wê ça be halê Xezalê hetanî hûn bizvirin? Ez zanim bavê min û wezîrva, ku qirar qebûl kirine, wê we eseyî bişînin.

Mehmed divê:- Teva girêdaye miqatbûna Xezalê.

Xelîfe soro- moro dive û divê:

- Ku minva girêdaye? Ez jî dixazim tevî we bêm!

Mehmed divê:- Hergê xatirê me ba te heye, tu vira bimîne boy Xezalê. Ku te dît em nezivirîn, çiqas hebûna me heye bidêda ku te ew da mêrda, lê bîr nekî bidî yekî usa, ku dilê Xezalêbe.

Ewana wira razî dibin, ku Xelîfe bimîne. Wezîr ku dibîne çûyîna bira cem Xelîfe, padişêra divê:

- Padişayî saxbe, pişt guhê xava nevêje, zûtirê elamî wanke.

Sivetirê dîsa qasidê padişê tê ber derê nêçîrvan. Nêçîrvan ku diçine hundurê dîwanê, wezîr bi fêl hundur dertê. Ewana silavê didine padişê, padişa slava wan vedigire û cî nişanî wan dike, ku kêleka wî rûnîn. Padişa divê:

- Gelî xortêd delal, hestûê fîla ji minra bînin, ku hûn ijar jî qirara min biqedînin, hûnê pêşkêşeke giran bistînin. Ezê bidim we xalîyê û usa jî hûnê îzinê bistînin timê bona hatina dîwanxanê.

Semend divê:- Padişayî saxbe, em ji hurmeta te razîne, lê tu jî gerekî qirara me qebûlkî.

Padişa divê:- Bêje, kurê min, qirara xa!

Semend divê:- Padişayî saxbe, qirara meye ewlin ewe, ku tu qezîya neyê serê xûşka me, ya duda -çi xerc lazimbe kîsî wezîrbe, - paşê Semend divê, - Padişayî saxbe, gazî wezîrke.

Wezîr tê hundur, Semend divê:

- Wezîr, hazirke sed pelewanî bi çekava, barê sed deveyî xurek mera, barê pêncî deveyî şereva hevt sale bona nêçîrê.

Paşî van xastina wezîr dibe gurekî har, wira sond duxe, ku heqê wê xercê gişkî axirîêda ji wan bistîne. Wezîr hazirîyê divîne, bira diçin cem xûşkê, temî didinê, ku ew miqatî xube, hetanî ewana dizivirin, ewana divêjin xûşkê, ku temîya wê dane Xelîfeda jî. Xatirê xa ji xûşkê dixazin û li mal dertên. Bera bira lêdin herin, lê em bînin ser wezîr.

Êvarê wezîr taba wî nayê dîwanêda, padişa divê:

- Berxa nekeve, wezîrê min, ezê wî xercî ser te sivikkim.

Em bînin ser Xezalê. Êvarê ew rûdinê ber temnê û dilê xara dilûbîne û digirî:

-Wey birano, rê nenase,
Êvar hatîye, dilê min ditirse,
De belkî Xwedê kurê sebabê birê min bikuje,
Çima dilê minra çêkirîye xem û qise…

Evan gilyana dêvda, nişkêva yek dêrî dixe. Xezal dipirse:

- Ew kîye?

Cava wê dide, ku Xelîfeye. Xezal gava dêrî vedike, ecêbeke reşe giran: yek ser sifetê wî pêçayî, qapût namilê dadikute hundur. Xezal ku wî divîne, cîda dive risas. Wezîr zûzkava derî pey xa dadide, pêşda tê. Xezal dipirse:

- Çi şuxulê te vir heye?Birê min ne malin...

Wezîr divê:-Xezala delal, ez zanim birê te ne malin, padişê xûnxur ewana şandine rîya çûyîn- nehatinê. Tu naka tenêyî, huba te jî zûda firîye dilê min.Were serê xa minra têke yek,yanê na-tê poşman bî.

Ser van gilîya ew ber bi Xezalê diçe. Xezal tivinga birê dîwarda tîne xarê, rastî wî dike, Wezîr bê hemdî xa ji hûndur direve.

Em bînin ser Xelîfe. Ew çawa pak dive, diçe mala nêçîrvan. Xelîfe ça ku Xezalê divîne, dipirse :

- Çima te reng avîtîye?

Lê ew divê:- Rûyê tenêbûnêdane.

Em bînin ser wezîr. Wezîr padişêra divê:

- Padişayî saxbe, tu haj pê heyî, ku kurê te pey êtîmoka nêçîrvana diçe? Ew ne laîqî dîwana teye, cimeta şeher gişk me dikene.

Pey van gotinê wezîrra, padişa gazî kulfeta xa dike, divêje kulfeta xa, ku bêy Xelîfe here xûşka nêçîrvana bivîne.

Xanim ku diçe mala nêçîrvana, çevê xa bahar nake. Dinhêre va horîk, staxula, rûniştîye ber temnê, teminê çê dike. Gava Xezal çev xanimê û carîyêd wê dikeve, ber wanva radive, wanra postê pilinga û kurebeşka datîne, hîvî dike ku rûnên. Xanim kaxezekî padişêra dişîne. Padişa ku kaxazê distîne ecêbmayî dimîne. Xanimê lêkirîye:"Te ça kaxaza min stend, karê sîyara bike, bişîne mala nêçîrvana". Padişa elamî Xelîfe dike, ku ew hazirya xa bivîne.

Wexta Xezal pê dihese gilî bona çîye, ew li Xanimê hîvî dike, ku sebir kin, hetanî birê wê tên. Lê Xanim wê serwext dike, ku hetanî wî çaxî nikare wêya tenê bihêle.

Sîyarê padişê tên, bûkê divin. Padişa hevt şeva, hevt roja wanara dike def û dewat.

Wezîr dinhêre boşe, carîya Xezalêye mezin du- sê zêra didêda û divê:

- Roja çarşemê Xelîfeê cîyada here, berbangê têke qîje- qîj, bê: “Nizam kî bû yek paşila Xezalêda, çev min ket pencerêra revî”.

Roja çarşemê Xelîfe tevî xûşka xa diçe ber ocaxê û wê şevê nayên. Berbanga sivê qîjîn dikeve dîwana padişê, gişk ber bi oda Xezalê direvin. Xanim tena kiras tê dipirse:

- Çîye, çi qewimîye?

Pîrê divê:- Hêja, nizam kî bû nav cîyê Xezalêda, çev min ket pencerêra revî.

Xanim carîya gişka dişîne û Xezalê dipirse, ku ew kîye, çi şuxulê wî li vir heye? Xezal destê xasîyêda sond duxe, ku derewe, tiştê usa tunebûye. Sivetirê deng digîje Xelîfe: ew bê seknandin xa malêra digihîne. Xelîfe tê malê û rast diçe cem Xezalê.

Em bînin ser Xezalê. Ew ku dinihêre xasîya wê bahar nake, ku derewe, benê pişta xa vedike, ku xa bixeniqîne. Wê deqê Xelîfe dikeve hundur- forma gurekî har, dadide benê darda tîne xarê, pirtî-pirtî dike. Xezal ku çev Xelîfe dikeve, xa davêje pêsîrê û digirî. Ew divê, ku şer lê gilî kirine, ew haj tişkî tune.

Xelîfe divê:- Lê kî ew yek gilî kirîye?

Xezal divê: - Carîya pîr şev nişkêva kire qîjîn û ew derew kir.

Xelîfe bê seknandin diçe dîwanê, dişîne pîrê jî tîne dîwanxanê, nava cimeta dîwanxanêda, Xelîfe pîrêra divê:

- Tu ku rast nevêjî ça bûye û te çima ev şera gilî kirîye, ezê pê destê xa te bikujim. Ez zanim, Xezal temize, çawa belgê kaxezê.

Pîrê digirî û divê:

- Wezîr sê zêr dane minda, ku ez usa bêjim, a zêrê wî jî vane kîsêd min danin, - ew zêra ji kîsik derdixe dide destê Xelîfe.

Wezîr divê:- Pîrê şera gilî dike.

Lê cimeta dîwanêda gişk qirar dikin wî dardakin. Wezîr divê:

- Padişayî saxbe, serê min lêxe, lê pêşîya lêxistinê îzinê bide ez herim xatirê xa ji neferê xa bixazim.

Cimeta dîwanêda gişk dimînin hatina wezîr. Em bînin ser wezîr. Wezîr ça digihîje malê, kincê xa diguhêze, xurceke xu tijî xurek dike, xurcê dinê jî tijî zêr, hespa xa sîyar dibe, dizîkava li şeher dertê.

Em bînin ser Semend û Ahmed. Ewana tên ra nêzîkaya şeherra dikin, çadira lêdixin, ku rihet bin. Qerewil elam dikin, ku dûrva reşek tê kivşê.

Semend divê:- Lêxin herin nêzîk, çika çîye?- paşê divê, - kuro, herin bigirin bînin.

Pelewan ku diçine nêzîk, ew qamçî dikşîne bin zika hespê kumeyt, lê pelewan wî digirin, tînin cem Semend. Semend gava lê mêze dike -eva wezîr.

- A, - divê, - wezîrê padişê, tu usa kuda diçî?

Wezîr divê:- Ez bona we hatime, gunê min remetîyê bavê we tê, bira duyê wî vênese. Padişê xûşka we darda kirîye, ew hîvya hatina weye. Dil- dînê min ber hev neda, ez pêşya weda hatim. Werin ez we bivim cem padişê roava. Emê bêjin, ku ev pêşkêşanê me wîra anîne, wê cî jî bide we, pêşe jî, hûn cahilin -gunene.

Semend duşurmîş dive, lê Ahmed divê:

- Ew yek nave, Xelîfe Xezalê gelekî hiz dike. Ev kelba dixaze me şaşke, - Ahmed divê, - kuro, dest- pîyê vî kelbî girêdin, wêda daynin.

Sive ser qenca safî dibe, ser wanara jî, deva bar dikin, berê xa didine şeher. Cav tê padişêra, ku nêçîrvan hatin, Wezîr jî xara anîn...

Padişe, Xanim, Xelîfe, Xezal û temamîya cimeta şeher pêşîya wanda tên.

Ewana serê wezîr cenimê şa dikin ber wê cimetê.

Hêja şabûn dikeve nav hazira jî, nav wan jî.

Bira ewana herin mirazê xa şabin, hûn jî mirazê xa şabin.

## 7. KUNDUR

Carekê hebûye - tunebûye gavanek hebûye. Sê qîzê gavan hebûne. Jina wî hemle bûye. Rokê jina gavan diçe himamê. Ew himamêda diwelide, kundurekî tîne. Avê xwe dike, kundurê xwe hildide diçe malê, kundur dibe davê qulçê merekê. Êvarê ew xewnê dibîne.Xewnêda yekê jêra got: "Kundurê avê lêke, ew zara teye, tu xrabîyê lê nabînî". Ew ku avê kundur dike, kundur postê wê dişqite, qîzek lê der nayê, horîk lê dertê. Wextê ew avê kundurê dike sê kew têne nav malê.

Xûşka mezin divê:- Em wê bivin!

Xûşka ortê divê:- Lê ewê van dera çi bike?

Xûşka biçûk divê:- Dîya wê guneye, emê libis bivin, bira ji her tiştî azabe.

Û hersê xûşk libsê kundurê hildidin, kulekêra difirin. Dîya kundurê ku dibhê, xuva diçe. Çiqas erdê dimîne -Xwedê zanibe, bi girîê keçika biçûk ser hişê xweda tê.

Ku avê keçikê dike, teşt tijî zêr dibe. Ser wê avlêkirinê jina gavan çiqas roj bû- avê keçikê dike. Xwedê zanibe çiqas wede derbaz dibe, kundur mezin dibe, dibe qîzeke gihîştî. Pê wan zêra gavan xwera padişê çêtir xan- man dide çêkirinê. Gavantîyê dertê, ancax şuxulê mala xwe yole dibe. Rokê kurê padişê bavê xwera divê :

- Bavo, ezê herim xwera yeke usa bivînim, ku dilê min bihebîne.

Padişe divê:- Çiqas qîz û bûkê şeherê minda hene, tu kîjanî begemkî, ezê tera bixwezim.

Çiqas bedew şeherê padişêda hebûn, hatin top bûn. Kurê padişê kîjan leqand, aqilê wî lê nebirî.

Kurê padişê go:- Bavo, kulfetê şeherê te yek jî nehêjeyî xwestina mine: yê bedew aqil nînin, yê aqil jî bedew nînin.

Padişa ber sekinî kir -nekir çare nebû. Nanê wî, xurcê zêrava jêra dagirtin, ew terkeseryatî dinê bû. Pir çû, hindik çû- rastî şivanekî hat. Kurê padişê go:

- Selam elêkim, şivanê delal!

Şivan go:- Elêkim selam! Ser çeva, ser sera hatî, xortê delal.

Kurê padişê go:- Eva kerê kêye?

Şivan go:- Eva kerê Hemîd begêye.

Kurê padişê xwera got:"Wele, ezê îro mêvanê wî begî bim". Kurê padişê hetanî êvarê cem şivan ma. Êvarê jî tevî wî çû mala beg. Hemîd

begê pê hisîya, ku xortekî laîqî wî wê mêvanê wîbe. Qîzeke wî hebû, da xemlandin. Kurê padişê hate mala beg.

Kurê padişê go:- Selam elêkim, gelî beg, begler!

Bego gote, go:- Elêkim selam, xortê delal, tu ser çevara hatî, - beg go, - xortê delal, tu wa ji kuda têyî, tê kuda herî?

Kurê padişê go:- Ez kurê filan padişayîme, qîza digerim.

Beg go:- Ê, çi bû? Em jî wextê xweda forma webûn, lê me guhdarîya mezinê xwe dikir, - paşê go, - Kurê padişê, ez tera salixê qîzekê bidim, tu tucara poşman nabî,-ewî devê xwe kire guhê kurê padişê, kire piste- pist. Kurê padişê go:

-Beg, ez pê hesîyam qîza teye mêra heye, tu çi dibêjî?

Beg go:- Kurê padişê, qîza min eva hane. Ne ya mêrane, ne ya tûra. Gele xazgînî hatine, tu kesî qebûl nake. Lê wexta tu, kurê padişê mêvanê minî, qîzeke -ez qurbana te dikim.

Kurê padişê go:- Begî saxbe, ez ji hurmeta te razîme, lê gele qîz û bûkê şeherê bavê minda hene, lê ez kesî begem nakim. Hetanî ez qîza tera xeber nedim, ez tu cara qaîlya xwe nadim.

Paşî gilîyê kurê padişêra gişka çevê hevdu nihêrî. Qîza beg rabû çû oda xwe, kurê padişê da pey, çû. Kurê padişê go:

- Qîza qenc, navê te xêr?

Qîzikê go:- Navê min Çîlê.

Kurê padişê go:- Çîla delal, tu zanî ez qîza digerim?

Çîlê go:- Tu yeke forma min erd- ezman bigerî navînî.

Kurê padişê go:- Tu min begem dikî?

Qîzikê go:- Min xewna xweda tu dîtî, ezê te jî bistînim.

Kurê padişê go:- Ez ne kurê padişême, ez qest dikim, ku bavê te-te bide. Tu çi şuxulî qe zanî, ku em ebûra xwe pê bikin?

Çîlê Go:- Şuxul çîye? Ew pêşê xulama û belengazane. Merîyê mîna min û tera şuxul kirin şerme.

Kurê padişê go:- Lê ku tu radizêyî, kê cîyê te datîne- hiltîne?

Qîzikê go:- Lê carî bona çine? Serê min carî şe dikin, ser çevê min dişon, nan didin devê min.

Kurê padişê li oda wê dertê, diçe oda mêra.

Beg go:- Ha, we hevdu begem kir?

Kurê padişê go:- Na, begê min. Kulfet min lazime...

Û ew hespa xwe sîyar dibe, rê dikeve. Pir diçe, hindik diçe, dinhêre va bire qîz û bûk deştekêda pincarê diçinin. Ew dajo cem wan. Dibe pîrqe- pîrqa qîza lê dikenin, pincarê davênê. Qîzek ji wan başqe bû, got:

- Kivşe tu nezanî li van dera, xortê delal. Xwe şaş neke, cahilin, tu rîya xwe here.

Kurê padişê go:- Tu qîza kêyî?

Qîzikê go:- Ez qîza gavanim.

Kurê padişê li wan dûr ket. Kurê padişê duşurmîş bû û go:"Eva qîzaya gelekî bedewe, ezê hema rast herime mala gavan". Diçe nava şeherê wan, pirs- pirsyara, diçe mala gavan. Çi gavan? Navê wî gavane, lê camêrî tam padişaye.

Êvarê qîzik tê malê, dinihêre va ew gede, ku rêva rastî wan hatibû, hatîye mala wan. Kurê padişê gava li kundurê dinhêre, dibe forma pîyana.

Kurê padişê go:- Qîza delal, ez gele cî geryame, min tenê tu begem kirî, ez kurê padişême, were minra meherin.

Qîzikê go:- Ez tiştê usa nakim, here merîya bîne, bi erf- edetê dinê ezê te bistînim.

Kurê padişê go:- Wekî usane, ez egile nebim.

Qîzikê go:- Hezar olecaxê dinê hene, were em gustîlê xwe lev biguhêrin.

Ewana gustîlê xwe lev diguhêrin. Kurê padişê lê dinhêre gustîla kundur hêjeyî xercê bavê wî hevt salane. Kurê padişê xatirê xwe ji wan dixweze û diçe.

Ewî çawa dîtibû usa bavê xwera şiro dike.Padişe gazî wezîr kir, go:

- Wezîr, here bûka min ji filan cîyî bîne, bê qezî- nezya, hilde çiqas sîyar û berbû dixwezî.

Wezîr sîyarava rê dikevin. Ewana digihîjine mala gavîn. Gavan du roja îzina wan nade. Paşî du roja bi ezet- qulix wanaya verê dike. Wezîr çev bedewbûna bûka padişê dikeve, dexesbûna xwe dixwe. Xwedê zanibe çiqas ji mala gavîn dûr dikevin, terî wan dikeve erdê, baran dibare. Sîyara gotin, go:

- Wezîr, kona em lêxin hetanî sibê!

Wezîr go:- Cefê nebînin, emê bivine mêvanê Hemîd begê, ez wî nas dikim.

Cab dane begda, ku wezîr hatîye mêvanîya wî. Beg rabû hate telbê wezîr. Wezîr ku beg dî, go:

- Selam elêkim, begê min.

Beg go:- Elêkim selam, wezîrê padişê, tu ser sera, ser çevara hatî. Ba tu anîyî, baranê anîyî?

Wezîr go:- Em ji dewat tên.
Hemîd begê go:- Dewata kî?
Wezîr go:- dewata kurê padişê.
Ewana paşî pirs- pirsyara texte rast dikin. Dewlet serê gavîn, çi lazim bû gavîn dagirtibû. Sîyara nanê xwe xarin, çûn rehet bin. Man wezîr û beg.
Beg go:- Te ez kuştim, wezîr.
Wezîr go:- Çi bêjî gavîn danîbû, çima min çixera zêde te bikira, ew jî bibira padişêra? Lê bûk her tiştî zêdetire.
Beg go:- Wezîr, sureke min heye, ku tu starkî, ezê kîse zêr pêşkêşî tekim.
Wezîr go:- Em birê hevdune.
Beg go:- Qîza min zûda dilê wê ketîye kurê padişê, gerekê tu mirazê wê bînî sêrî.
Wezîr jî xwe ew yek dixwest. Ewî go:
- Tu gerekê komekê bidî minda. .
Ewana çûne oda bûkê, alî hev devê wê girêdan, dest- pê wê grêdan, avîtine terkîya wezîr, wezîr bir.
Xwedê zanibe çiqas cî çû. Wezîr qîzik li hespê peya kir, danî ber darekê, devê wê vekir.
Wezîr go:- Herge tu serê xwe minra têkî yek, ezê te berdim, xêr na- ezê te bikujim.
Qîzikê go:- Tu tesmîlî Xwedê bî, min veke.
Wezîr qîzik vekir. Qîzikê go:- Tu du deqa sebirke, ezê va bêm.
Ew cî rabû, fitilî piştiva, banzda ser hespê, papaxê wezîr hilda, lêda çû.
Em bên ser sîyara. Sive safî bû, cîyar rabûn, lê wezîr tunebû. Çûn nihêrîn bûk jî tune. Êwana hetanî paşî nîvro vev çûn hatin. Paşî nîvro paşê wezîr hat- serqot, westîyayî, hincirî. Sîyar pêşîêda çûn. Ewî got:
-Kuro, kurê padişê horîyê çawa hîştin, hat bû maşoqê vê qexpê. Êvarê hûn razayî bûn, sîyara ser meda girtin, min pêra negîhand deyl wekira. Ewan ew hldan birin, min tenê da pey lê, hespa min rêva teqîya, ez şerpeze bûm.
Beg ewana birine hundur. Sîyar gişik rûniştin dora wezîr. Wezîr go:
- Em bê bûk herin mera şerme, werin em qîzeke esilzade vir bivînin bivin.
Gişik duşurmîş bûn.

Wezîr go: - Hemîd, ew qîzka duh kîbû?

Hemîd go:- Wezîrî saxbe, qîza minbû.

Wezîr go:- Hemîd beg, tu gerekê me vê şermê derxî, qîza xu bidî em bivin.

Hemîd go:- Wezîrî saxbe, qîza min, min biçûkayîda daye kurê birê xwe, lê wexta ev qezya we qewimye, bira min jî biqewme.

Qîza beg kincê xwe xukir, du berbûya ew birin krine faytonê.

Em bzvirin cem kurê padişê. Çevê wî rê qetya hetanî sîyar hatin, lê gava bûk peya kirin qidûmê wî işkest.

Kurê padişê go:-Te xwe şaş kirîye, wezîr, ev ne dergîstya mine, ev qîza Hemîd begêye.

Wezîr go:- Padişayî saxbe, kurê te rast divê- ev ne dergîstya wîye. Rêva yarê wê ser meda girtin ew birin, min da pey, hespê min teqya:Em man şerpeze, min ev qîzka hane delal pêşva anî, eva qîza esillzadane, ew bê esilbû.

Padişê gilyê wezîr qebûl kir, lê kurê wî guh nedida bûkê.

Em bên ser kundurê. Ew bi hespê hetanî sibê çû, sibê ew ser kanîkî peya bû, destê xwe, ser çevê xwe şûşit, nhêrî wê bire pez binatara kanîyêda diçêre. Ew dakete gelî, çû cem şivan go:

- Şivanê delal, ez birçîme, qe nan dor te tune?

Şivan li wê tem, têlê nihêrî go:

- Xanim, nan cem min heye, lê ne teştêke laîqî teye.

Kundurê go:- Bide, çi Xwedê krîye risq!

Şivan nanek hebana xwe derxist, hûrî şîr kir, kevçî kire navê, da ber wê.

Kundurê nanê xwe xar, dest kire nav porê xwe, du zêr dane şivan.

Şivan go:- Bona çi, xanim?

Kundurê go:- Bona nan!

Paşê kundurê go:- Hanê tera van zêra, kavirekî şerjêke, goşt, tera lê hûr minra, û kincê xwe bide minda.

Şivan çenga zêra hilda, kavirek şerjê kir, hûrê wê û kincê xuva dayê.

Kundur li şivan dûr ket, porê xwe kire bin hûr, kincê şivan xu kir û diçe. Pir diçe, hindik diçe- Xwedê zanibe, dighîje şeherê padişê. Ew hespa bin xwe dide pîrekê û sê zêra didê, ku pîrê xayîke heta ew têdibe. Xaxa jî diçe ber dîwana padişê, rûdinê.

Yekê go:- Tu çima vira rûniştîî?

Keçelok go:- Ez xevatekî dixazim.

Wekîlê padişê padişêra got, padişê ew qazvanok kivş kir.

Keçelok sibê zû qaz hildidan diçû ber çêm, heta evarê, evarê qaz top dikir tanî malê.

Rokî şeherda dewet bû.

Çiqas mervêd dil eşq gişk çûbûne dewetê. Evarê keçelok hûr serê xwe derxist, kincê xwe xukir, çû dewetê. Gava kete govendê, cimetê gişka govend berdan, li wê hatine temaşê. Ma nêzkaya belabûnê Kundur çû tanga dêrî li govendê derket, hew cimetê dît govendêda tune. Sibetirê temamya şeher li wê xeber didan. Şevtira dinê dîsa çû dewetê.

Kurê padişê go:- Ez gerekê îro vê bigrim.

Dîsa hate wextê belabûna govendê, Kundur çû nêzkaya derî derket ,çû.

Kurê padişê hew nihêrî- qîzik inda bû.

Şeva sisya kurê padişê go:-Gelî lawika, hûn du hev ber dêrîbin, ezê jî hundurdabim, wexta ew dertê hûn elamî minkin. Wextê Kundur hunudur derket, wana da pey.

Kunudur kuda çû wan da pey. Kurê padişê nihêrî ew diçe berbi mala wan. Ew çû kete holika keçelok, dixast kincê xwe bêxista, lê kurê padişê hevalê xuva ketne hundur.

Kurê padişê ça ku destê wê girt ,ku kinca neêxe, gustîla xwe dêstda dît.

Kurê padişê go:- Ya ku min xura nîşan kirbû eve, eva jî gustîla min, - ewî destê wê girt bire dîwane, cem bavê xwe.

Padişa, ku çev qîzikê ket, bê hemdî xwe cî rabû. Keçikê ber padişê temene bû, destê wî ramûsa. Padişê destê wê girit, da kêleka xwe. Ewî jî bêyî gotnia kur gustîla tilya qîzikê nas kir.

Padişê go:- Ça tu hatî vira, qîza delal?

Qîzikê go:- Namûsê ez anîm, - ewê go, - ez gerekê serhatya xwe bi cimetê bêjim, padşayî saxbe.

Sibetirê telala lê xisit, çiqas cimeta şeher hebû gişik hetin soqaqa padişê.

Padişê go:- Cimet, gişik guh bidne van gilîya, û sûda vê pirsê didime destê we, - ewî gazî Kundurê kir û go, - bêje, qîza delal, serhatîya xwe.

Cimetê ku kundur dît, gişik man ecêb mayî.

Kundurê go: - Cimet, ez çi dibêm, guh bidine glîyê min, paşê kî ku dixaze pêşda werin, pirsa bidin.

Cimet gişik bibû risas. Lê wezîr ruhê wî kişyabû, kêleka padişê.

Kundurê go:

- Syarê padişê hatine mala bavê min du roja kirin, xarin, ça ku edetê mebû bavê min rîya wan dît û em verê kirin. Em hatin rêva baran barî, terî kete erdêda. Wezîr em birine mêvanê begekî. Ez wî nas nakim: çi ku bavê min sîyarara danîbû rast kirin, nanê xwe xarin û gişik çûn rehetibin. Ez jî başqe odekî dabûm, şev min nihêrî wezîr û begva devê min grêdan, dest pê min grêdan, ez avîtime ser hespê, Wezîr ez birim.

Wezîr go:- Drewa dike cimet, yara ew birin!

Qîzikê go:- Sebirke, ez xilazkim, herge tu rast dibêjî, bira cimet min bikuje, xêr tu drewa dikî bira cimet te teslîmî minkin, -. qîzikê go, - ewî ez çikas cî birim Xwedê zanibe, şevbû, ez jî wan yêra nenasbûm.

Ew cîkî sekinî, ez ji hespê peya kirim devê min vekir û go: " Herge tu serê xu minra têkî yek- ez te nakujim, xêr na- ezê te vir bikujim". Ez duşurmîş bûm, min go: "Teslîmî Xwedê bî, min veke bra glîyê tebe. Ewî ez vekirim min got: "Îzina min bide, ez haşa herim destabê paşê.Ez ku rabûm, min banzda ser pişta hespê, papaxê wî hilda û ez revîm. Min sond xar, wekî çawa jî mabe çevê wîra bînim.

Sibetirê min çend zêr dane şivanekî. Kincê wî û kavirek lê da şerjêkirin, hûrê wê hilda û bi wî teherî gihîştme vira.

Wezîr go:- Cimet drewa dike!

Qîzikê go:- Ez drewa dikim - lê ev papaxê kîye? Hespa te jî mala pîrê dane, ew mala fêza gund.

Cimetê nihêrî qîzik raste.

Padişê go:- Te çima usa kir, min tu şandbûyî çawa merîyê malê?

Wezîr go:- Padşayî saxbe, beg ez kêfxaşî kiribûm ez haş xwe tunebûm.

Padişê emr kir, beg anîne dîwanê. Serê beg û wezîr cenimê şa kirin, hêja heft roja wanra kire def - dewet, ew çûn gihîştne mrazê xwe, em jî bighîjne nêt meremê xwe.

## 8. QÎZA NAMÛS

Hebûye tunebûye padişak hebye û sê kurê wî hebûne.

Hersê kurê padişê dighîjin. Lê padişa bona zewaca wan tişkî nabêje.

Rokî hersê bira diçine nava bostanê zeveşa seyrangê.

Bostançî go:- Kuro heta xweşe, hûn wa bigerin aza. Wextê qeytkirna we derbazbûye.

Birê mezin go:- Em çabkin, apê Temir, bavê me tenê bona padşatîya xu duşurmîş dibe, ne zane em hene, ne zane tunene.

Temir go:-Ezê sê zeveşa wera bjbêrim. Her yekê wê xura xulamekî bînin zeveşê xu başqe - başqe bişînin dîwanê padişê, cimeta dora wîra, wê pirsa zewaca we safîkin.

Hersê bira sê xulam anîn. Her yekê zeveşa xu kire sinîkî padşêra şandin.

Xulam ku zeveşa dibin dîwanxanê, cmeta dîwanxanêda gişik razîbûna xu didin, çmku wextekî başbûye.

Padişê go:- De kerkin, bra lawik keremkin. Zeveşa kurê mezin ker dikin dinêrin pûçbûye. Cimet gişik hevdu dinihêre. Zeveşa kurê ortê ker dikin- dinhêrin yalîk pûç, yalîk slamet. Dîsa cmet hevdu dinhêre.

Zeveşa kurê biçûk ker dikin, esane gihîştî, forma xûn berfa tev rêtî.

Qazîşro go:- Padşayî saxbe, te tecbe kir, kurê te çi dibên?.

Padişê go:- Bêje gilyê xu, qazîşro!

Qazîşro go:- Kurê te dewa zewacê dikin.

Kurê teyî mezin divê- "ku wext- wedê min derbaz bye".

Yê ortê divê- "ku nîvê emrê min çûye, nîvî maye".

Lê kurê teyî bçûk divê- "Wextê mine".

Pey vê şêwrêra padişa kurê xu zewicandin.

Padişê qîza wezîr kurê xuyî mezinra xast, qîza wekîl kurê ortêra xast, lê kir nekir Peyale qîza qazî nestand.

Em bînin ser Peyale.Peyale rokî tevî seyîsa hesp brine ber çêm, ku bişon. Ser delavê qîz û bûkê şeher- jî top bibûn. Yê hirî dişûşt, yê kinic. Wextê fela bû, hespa kirin hîre- hîr, dane pey hev. Seyîsa hesp zevt nekirin, ewana dane ser kulfet, gişik revîn, qîzek kete nav pîyê wan.

Peyale go:- Kuro, wana kulfetekê xist, bilezînin wir.

Peyale seyîsava gava gihîşitine qîzikê, qîzik xûnêda enda bibû, û xuva çûbû. Peyale dezmala wê vekir enya wê girêda, gote xulama go:

-Kuro avê bînin!

Xulama av anîn. Peyale av sifetê wê kir, ewê çevê xu vekir.

Gava ewê çevê xu vekir Peyale ji bedewbûna wê ma şaş.

Peyale go:- Navê te xêr,qîza delal?

Keçikê go:- Navê min Xezal.

Peyale go:- Tu qîza kêyî, Xezala delal.

Xezalê go:- Ez qîza Temrê bostançyê padişê me.

Peyale go:- Lê tu min nas dikî?

Xezalê go:- Erê tu Peyaleyî, bavê min timê payê te dide, ça xortekî aqil.

Xezalê xatrê xu ji Peyale xast ku here, lê Peyale nehişt.

Peyale go:- Xezala delal, were te pê hespê bivim.

Xezalê go:- Pê niga daha hurmetlîye, ne ku pê hespa xortekî nenas, wê cimetê minra çi nebêje?

Xezal niga çû, lê Peyale haqas wext pey nihêrî, heta ew enda bû.

Pey wê dîtinêra Peyale ser Xezalê bengî bû.

Padişê çiqas qîz şeherê wîda hebûn dida rêzê, lê Peyale kesî qaîl nedibû. Rokî îda Peyale xu zevt nekir, gazî xûşka xu kir u go:

- Ezê tera gilîkî bêjim, tu ku komekê bidî minda, çi bixazî ezê tera bînim.

Xûşkê go:- Bêyî gotna tejî ez zanim, tê çi bêjî.

Peyale go:- Tu ku rast bêjî usane- tu remldarî.

Xûşkê go:- Tu dixazî ku padişêra bêjim bona qîza qazî.

Peyale go:- Tu cara min ne ew hez kirîye, ne jî dixazim, ez yeke mayîn hiz dikim.

Xûşkê go:- Çika bêje ew çi bexteware, ku dilê te hebandîye?

Peyale go:- Ew qîza Temrê bostançîye, navê wê Xezale.

Xûşkê go:- Çî aqile, navê padişêra dlîze: qîza qazî, bedewa qîza, naxaze, qîza bostançî dixaze.

Peyale go:Qencîk te dikeve bike, xêr na- cîyê xuda kerbe.

Xûşkê go:- Nahaka tu çi ji min dixwezî?

Peyale go: - Tu gerekî cûrekî Xezalê bînî vria, ez bivînim.

Xûşkê go: - Lê tu zanî ewê bê?

Peyale go: - Tu bişîne, diqewme bê.

Xûşkê gazî carîyê kir, û şande pey Xezalê. Em bînin ser Xezalê.

Pey dîtina Peyalera ew jî bengî bibû. Roj lê dibûn sal. Ça ku carîya xanimê tê pey Xezalê, Xezal bê xeberdan, kincê xwe xudike tê diwana padişê. Carî pêşyê dikeve dibe otaxa xanimê. Otaxêda Peyale xûşka xwe tene bûn. Xezalê go:

- Selam elêkim, xanim.

Xanimê go: - Elêkim selam, Xezal pêşda were!

Xezal rûnişt û go: -Xizmeta te xêr xanim, te şandibû pey min?
Peyale go: - Xezala min, min şandye pey te.
Xûşkê go: - De hûn qasekî xeberdin, ezê va bêm.
Em bînin ser bûka mezin. Ew pencerêra dît, ku carîyê qîzeke bedew anî mala wan, lê ça bû? Ewê gazî carîyê kir û go:
- Ew kî bû te anî malê?
Carîyê go: - Qîza bostançî bû, xanimê ez şandime pey.
Qîza wezîr çû konta baltûzê, ku her tiştî bihese. Ew xu dewsa xanima mezin hesav dikir, çimku kulfeta padişê ew çend sal bû çûbû remetê. Ew ku hate hundur nihêrî Peyale Xezal hemez kirye, dest - dest pajda çû.
Xezalê go: - Peyale, min berde
Peyale go: - Netirse, Xezala min, hetanî ez saxbim tu kes nikarê tişkî te bike.
Xûşka wî tê Xezalê verê dike. Bûka mezin dîtina xwe her cî gilî dike. Temamya şeher deng bela dibe. Deng dikeve guhê padişê. Padişa gazî Peyale dike dîwanê. Peyalê diçe dîwanê, destê wî radimûse û divê:
- Te gazî min kirîye, bavo?
Padişa go: - Erê, min gazî te kirîye. Raste, ku tu qîza bostançîra digerî?
Peyale go: - Rîyê min bin nigê te, bavo, raste ez wê dihebînin û ez wê jî bistînim.
Padişê îzna wî da, ew çû.
Qazîşro go: - Padşayê saxbe, lê xu ez glîye tewekel nabêjim? Bona Peyale terka wê bide, Peyale bişîne pêşya karvanê xoyê, bostançî qîzêva jî li şeher aksorke (sirgûnke),ji şeher derxe.
Sibetirê padşê gazî Peyalê kir, go:
- Hazir be here pêşîya karvanê xoyê.
Pey çûîyna Peyalera padişê qirar kir, ku Temir qîza xova li şeherê wî derkevin.
Temir medê xwe kirbû, lê Xezal digirya, gundî- cînarê nêzîk gişk hatibûn mala wan. Ewana jî digiryan. Temir û Xezalêva sibê zû ji şeher derketin. Xezalê li bavê xwe dinhêrî, dilê wê gelekî xirav dibû, bavê wê kal, porê sipî teze pîyê wêda derodero dibû. Ewê dilekî kul, dengekî zelal sitra:
Wey gidîno, sibeye dilê minra sibe sare,
Dilê min hêsîrê brîndare,

Ezê bavê xu dinêrim gelkî kale.
De belkî sudê mala sebeb xiravke
Ryê hizkirna qîzêda bûye aksor, derodere.

Temir dinhêre qîz gelkî ber xu dikeve, ewî go:

- Xezala min, ez bavê teme, xema neke, ez bavê teme.

Xezal go: - Bavo, ez bona wê yekê ber xu dikevim, ku te rûyê xu xevata padşêda sipî kir, lê ewî gişik pêpes kir, neşêkirand.

Temir go: - Dewir usane, lawo!

Xudê zanibe ewana çiqas erd diçin, terî wan dikeve erdê. Ewana konê xu li wir lê dixin. Sibê zû mîrê ereba pê dûrebîna dinêre wa konek çayîrê wîda vegirtine.

Ewî go: - Kuro, çika pê bihesin ew çi kone?.

Xulam çûn hatin, gotin ku, kaleke û kulfeteke cahale- rêwîne, wê herin.

Mîr go: - Kuro, hespê min bînin!

Ew li hespê sîyar bû, berê xwe da konda. Temir dî, ku sîyarek hat derkete ber kon. Mîr ku Temir dî, go:

- Selam elêkim, rîspî!

Temir go: - Elêkim selam, mîr!

Mîr go: - Navê te xêr?

Temir go: - Navê min Temir.

Mîr raste Temirra xeber dida, lê çevê wî kon bû. Ew li hespê peya bû, beyî îzna Temir çû konda. Temir jî da pey. Mîr ku çev Xezalê ket, go: "Ew Xezala îşev min xewna xweda dît, hema eve". Nava kon sekinî go:

- Lê hûn wa ku tên, hûnê kuda herin?

Temir go: - Min qîza xwe anîbû zêyî, nahaka ez paşda divim.

Mîr go: - Usa nabe, ez qîza te be pêşkêş verê nakim. Ez mîrbim xanimeke wa bive mêvana min bê pêşkêş here?

Temir go: - Zev razîme ji hurmeta mîrê xwe. Gerekê hetanî berê êvarê em bigihîjine cî.

Wanaya kirin- nekirin xwe ji mîr xilas nekirin. Mîr ewana tevî xwe birine herêma xwe. We rojê çixereke mezin kir hetanî êvarê. Êvarê gazî Temir kir. Temir çû cem wî. Mîr go:

- Temir, tu cîkîda naçî. Çiqas qelen bixwezî ezê bidime te, tu qîza xwe bide min.

Temir go: - Mîrê min, ew kulfeta mêre, ya te jî komîya te heye.

Mîr go: - De xeverdan ne lazime, wê nahaka we bivine xanê, sivê amê dest bi dewetê bikin.

Temir çû. Mîr gazî xulama kir û go:

- Temir qîza xweva bivin xana jorin!

Xulama Xezal, Temirva birine xana fêza şeher. Xezalê go:

- Bavo, ancaxkî em li mîr dûrketin. Nahaka tu here ew gelîyê ku em tevî mîr derbaz bûn û li wir hîvya minbe.

Temir go: - Tu min dikujî, Xezal.

Xezalê go: - Bavo, herge tu naxazî ez mîr bisînim lêde here.

Temir xatrê xwe li qîzê xwest û rê ket.

Pey çûyîna bavêra Xezalê deste kincê wîye kewin li xurucê derxist xukir, dizîva peyayî heyata xanê bû, ya ku tijî hespê girêdayîbûn, li yekê sîyar dibe û direve.

Cav dighîje serkarê xanê, ku dergîstya mîr revî. Serkarê xanê û xayê hespê, hespa sîyar dibin didine pey wan. Em bînin ser Xezalê. Xezal digihîje gelî, dengekî hêdî bavê dike gazî.

Bavê wê tê digihîjê. Herdu dajon.

Diçin hinekî ji gelî dûr dikevin Xezal hespa dide seknandin.

Temir tirsya, go: - Çima Xezal, te dibekî tişt bîr kirye?

Xezal go: - Na, bavo, sermila mine çepê birîndar bûye, hanê pê temezya min parava girêde.

Temir go: - Dixazî, Xezal, em li vir hinekî bisekinin?

Xeazlê go: - Na, bavo, gerekê em bilezînin nahaka ewana pê, pê pey me tên. Em ku gundekî cîkîra negihîjin ewê me bigirin, paşda bivin. Ewana hetanî soreborê sivê ajotin, soreborê sivêra dengê kelba wan tesele bû.

Temir go:- Evê pêşya me gunde.

Xezalê go: - Diqewme eylebe, bavo.

Temir go: - Na lawo, gele kelb hene vir, yê eyla sê, çar kelb hene vir, yê eyla sê, çar kelba zêdetir xayî nakin.

Ewana hinekî çûn malek kete ber wan.

Temir derî xist. Kulfeteke navsere derî vekir.

Temir go: - Xûşkê, mêvana xayî nakî?

Pîrê go: - Mêvan, mêvanê Xudêne keremkin pêşda werin. Pîrê hespê wan kişandine tewlexane, ewana jî birine xanî.

Malda pîrê bû, bûka wê û kurê wê bû. Kurê wê bûka wê jî rabûn.

Temir go: - Xûşkê, ez hîvî dikim, tu cîkî bavêjî qîza min brîndare. Pîrê li Xezalê nihêrî femkir ku revîne, çimku kincê wê yê mêra bûn. Ewê birîna wê vekir, hine belghewêz rîyê şîr xist, pê şûşt, paşê girêda û ew da paldan.

Em bînin ser Peyale. Peyale ça ku li karvantîyê hat, çû cem xûşkê.

Xûşk girya, go: - Netirse Peyalê, padişê Temir Xezalêva pêy çûyîna tera li şeher aksor kirin.

Peyale ça ku bihîst glîyê xûşkê, çû cem padişê.

Padşê go: - Keremke, Peyalê min.

Peyale go: - Min tera go, ku Xezalê peştir ez kesî nastînim, te ew bona min aksor krîye, mijî aksorke, îro şûnda tu min navînî.

Padişê ça kir çare Peyale nebû, çi lê lazimbû ewî hilda û li şeher derket.

Çiqas çû Xudê zanibe, rastî du sîyara hat.

Peyale go: - Elêkim selam, gelî bra!

Sîyara gotin - Elêkim selam, xortê delal !

Peyale go: - Hûnê wa kuda herin.

Syarê navsere go: - Çend ro pêşda kalemerek û qîzeke cahilva konek xalîya mîrda lêxistibûn. Mîr destê zorê dixast qîzik bistanda, êvarê ewanaya şandibûn xanê bal min, ku sivê dewatê bike. Qîzke çeleng bû. Evarê dest xuda kincê mêra xu kiribû, hespek ji heyata xanê hildabû revîbû. Nahaka kuda çûye nizanim, ez ku wê nevînim mîrê serê min lêxe.

Peyale go: - Lê wan gotibû ku kuda diçin?

Sîyar go: - Belengazî gotbû, ku qîza xu anîye zêyî.

Peyale go: - Qîzik nahaka çûye gihîştîye mala xu, hûn badilhewa lê digerin. Herin mîrra bêjin, ku de donzde sîyara ser wanda girtine-ew birine.

Sîyara xatrê xu li Peyale xastin, hevdu dûr ketin.

Dilê Peyale hinekî barstan bû. Ew du rojbû ewî tiştekî tem nekiribû, li hespê peya bû nanê xu ji xurcê derxist, xar û dîsa rê ket. Gele wext çû berê êvarê rastî şivanekî hat.

Peyale go: - Selam elêkim şivanê delal.

Şivan go: - Elêkim selam, ser çevara hatî xortê delal, tê wa kuda herî? Hespê peyabe minê şîr dotîye hê nav avêdane. Were em tev bixun, paşê Xudê oxra terabe. Peyale li hespê peya bû, rûnişt ser şînayê. Şivan nan hûrî şîr kir, du kevçî li hebana xu derxist danî, lê hebana wî tijî pincara cûre, cûreyî bû, usa dewsandibû ku kevçî zorekî navê derxist.

Peyale go: - Tu çima du kevçîya xura digerînî, ev pincara hizêmetî jî te xuva darda kirîye tê çabikî?

Şivan go: - Carekî maqûlekî forma te rastî merîya tê, pê kevçîkî nayê xarin, lê ev pincara jî xûşka min nexaşe bona wê min çinîye.

Peyale go: "Welle, ezê îşev mêvanê vî şivanî bim, eva gele tişt zane". Êvarê Peyalê tevî şivan çû mala wî. Temir nemal bû, ew çûbû xura tamekî bivîne, xebatekî destxe. Şivan go:

- Daye, min tera mevanek jî anî.

Dê go: - Mêvan, mêvanê Xudêne, lawo.

Şivan hespa wî axil da grêda, û ew çûne hundur.

- Keremke rûnê, xortê delal.

Peyale rûnişt, bûkê nan anî, nan xarin. Şivan go:

- Dayê, ew pincara te digot- min anî.

Pîrê go: - Xudê te xayke, lawo!

Şivan go: - Dayê, apê Temir kuye nayê kivşê?

Pîrê go: - Min ça kir çare pê nebû, çûye xura xanekî bigire, digo - ezê herim cem beg rêncbertîkî bixwezim.

- Lê Xezal çawane?

Pîrê go: - Birîn gelekî kure, çika ew pincara îro bidime ser- wê çawa be?

Peyale xwe zeft nekir, go:

- Ka kuye Xezal, dîya pîr?

Pîre go: - Lawo, ew mêvana mine, çî te ser wê heye?

Peyale go: - Netirse dayê, ew min nasdike, Xezal dergîstîya mine.

Pîrê da pêşîya Peyale, bire odê. Peyale nihêrî Xezal nava germêda diqimile. Pîrê çû ew tenê hîştin. Peyale destê wê girt. Xezalê çevê xwe vekir, ma acêb mayî - Peyale rûniştibû ber cîyê we. Xezalê go:

- Dûrî min keve, tu çi rûkî pey me ketî, bavê te em bêmal, bêhal kirin, berî dinê dan, namûsa mera lîst, em kirine vê rojê.

Peyale go: - Tu çi jî bêjî ez li vir naçim.

Temir tamek girtibû, ewana çûn ketine. Pîrê ser birîna Xezalê xevitî, Xezal pakbû. Çika zêr ku Peyale anîbû besî wanbû. Ewana êpêce wext li wir man.

Em bizvirin cem padişe. Pey çûyîna Peyalera sitarî nekete wî. Ewî bi pirs - pirsyara pê hesya cîyê wan. Kî şand, ewana nezivirîn. Xuxa çû ewana anîn. Heçkî zêrê wane ku mabûn Peyale da pîrê, kurê wê.

Padşê teze wanra def- dewat kirin.

Ewana çûn dewatê, em jî hatin vira.

## 9. BÊCAN PELEWAN

Wextekî Rostemî zal dîwanxana xuda tevî cimeta xwe qise dikirin: nişkêva derî vedibe qotek tê nav malê.

Qot go: - Rostem, Qiralî kafir koka me anî, min ji Xudê neyaz kir, ku ruh ber minda berde heta vira. - Paşî van gilya got çû remetê.

Rostem go: - Kuro, gazî şêxkin, bira helalkin- bivin teslîmî erdêkin.

Gazî şêx kriin, qot şûştin, kefnandin bi heytehol teslîmî erdê kirin. Rostem gazî pelevanê xwe kir. Çiqas pelevanê wî hebûn gişk dîwanêda berev bûn.

Rostem go: - Gelî pelevana, gerekî em heyfa vî camêrî li kafir hildin.

Gurgan pelevan go: - Rostem saxbe, ew tenê şuxulê mine.

Gurgan pelevanê çil pelevana bû. Wexta Gurgan karê xwe kir here şêr, kurê Rostem- Bêcan, cedand tevî wî here.

Rostem go: - Bêcan, bêra meye çapê heye, were- herge tu gihîştîêyî here, xêr na- kerbe. Bêcan çû bêr anî, bejna wî bihustekî bêrê derbaz bibû. Rostemî zal nihêrî boşe, karê Bêcan kir û Gurganra verê kir.

Rostemî zal go: - Gurgan, wextê hûn dighîjne kanya rîspîtîyê, Bêcan bide razandin, tu here wanaya qirke paşê were deyl lêke. Gurgan, Bêcan xatrê xwe li cimetê xastin û rê ketin.

Çiqas çû Xudê zanibe, gihîştne kanya rîspîtîyê. Derxistin, nanê xwe xarin û ser şînayê paldan.

Gurgan go: - Bêcan, were em hinekî rehetbin, paşê emê herne şêr.

- Bra glîyê tebe. - pêra Gurgan qayîl dive.

Em bînin ser Bêcan, ça ku Gurgan palda, xewra çû. Bêcan bêyî Gurgan hespa xu syarbû, gurz kemedanê xu hilda çû şeherê qralî kafir. Ew ça kete şeher, cab dane qralî kafir, ku xudênasek hatye ser wan şêr. Çiqas pelevanê kafir hebûn rakirin pêşya Bêcan. Bêcan forma pincarê ew diçinîn. Cab dane qralî kafir, ku koka eskar tê. Bêcan jî berbi dîwana wî tê. Çiqa sêrberd, koçekê eyan hebûn hatine dîwanê. Wanaya dest bi sêra kir. Soqaqeke tengda wanaya Bêcan brîndar kirin. Em bizvirin cem Gurgan. Gurgan gava ji xewê rabû, Bêcanê çi? Bêcan tune. Gurgan hespa xu syar bû berê xu da şeherê qiralî kafir. Gava gihîşte şeher, ma ecêbmayî hesavê kevrê kelebeşta hebû, hesavê cinyaza tunebû. Ewanaya gişk forma xîbarê hûr, lê Bêcan nav wanda

ketibû forma zinarekî. Gurgan tirê Bêcan wefat bûye, por poşman zivirî cem Rostemî Zal, çi serê wan qewmîbû gişk yek- yek qise kir. Temamya cimeta Rostem dest bi şînê kir, çimko Bêcan ûrta mala Rostembû.

Em bizvirin cem Bêcan. Ew êvarê ser xuda te, serê xu hildide, ew jî nizane kuda diçe. Pir diçe hindik diçe, dighîje koçkserekî. Diçe hundur, dinhêre- va cîyê merîkî tenêye, ew nan duxe ser wî cîyî pal dide. Berî êvarê yek tê koçksêrê.

Xayê koçkserê go: - Selam elêkim, xortê delal.

Bêcan go: - Elêkim selam, mêvanim hazir bivîne.

Xayê malê go: - Navê te xêr, xortê delal?

Bêcan go: - Navê min Bêcane, ez kurê Rostemî Zalim.

Xayê malê go: - Ez jî ji xudênasame, em birakê hevin.

Xayê malê çi nêçîra ku anîbû çêkir wanaya xarin û paldan. Royê xayê malê diçû nîçîrê, lê Bêcan ser nivîna paldayî bû. Nişkêva çevê wî kete ser qutîkî, ya ku ber arîkêda bû. Ew rabû ser pîya, qutî jorda anî vekir, lê çi vekirin. Gava vekir- ma ecêbmayî, şkilek têda nîbû horî-perîk têdabû. Ewî li şikil nihêrî, xuva çû. . Êvarê birakê wî nêçîrê hat çi dît- ecêbeke reşe giran:wê Bêcan xuva çûye, xûn ber mayeye bûye ceger. Ewî av anî serdakir, derman da ber bêvlê, virda- wêda ser xuda hat.

Xayê malê go: - Kuro, çi te qewimîye, çima tu wa bûyî?

Bêcan go: - Te xaya vî şiklî anî, anî- xêr nanî ezê bimirim.

Xayê malê go: - Dixazî vê sihetê jî bimire, min hebûna dinê daye rokirin, tenê bona vî şiklî.

Were emê şerkin kî alt kir, helalya Xudê keçik û şikl wanra. Ew qîza giralî kafre, navê wê Gêlanfrûze. Ew tu kesî qaîl nave.

Ewana nanê xwe xarin, razan. Sivê zû, sive ser hevtê du mileta safî bû, li wana jî safî bû. Ewana teştya xwa xarin rabûne şêr.

Xayê malê go: - Emê îro şerê şûr- mertala bikin.

Bêcan go: - Birave, ez qaîlim.

Ewana wê rojê hetanî êvarê şer kirin xalî bin lingê wanda bû şova rakirî, toz quloz dibû forma bagerînkê, lê yekê, ya dinê alt nekir. Êvarê dest pê xwa şûştin. Xayê malê derman anî, herda birînê xwa derman kirin, nanê xwa xarin û razan. Roja duda xayê malê go:

- Emê îro şerê gurz kemeda bikin. Wê rojê hetanî êvarê ber hevdan, dîsa erd ezman dest tozê nedihate kivşê, xalîya nav dest pê wanda bibû gelî û newal, hetanî evarê ber hev dan- yekî ji yekî alt

nekir. Evarê dîsa xwa şûştin, xayê malê derman anî li xu xistin, nan xarin, paldan. Roja sisya wanaya gulaş girtin gelekî hev încirmîş kirin, berê êvarê Bêcan ew alt kir. Ewana hatine malê dîsa xwa şûştin, derman kirin, nan xarin, paldan. Sibê zû xayê malê şikil da Bêcan. Bêcan şikil dêst girt.

Xayê malê go: - Here ya min nebû, lê bira ya te bê sêrî!

Bêcan xatirê xwa li wî xast û rê ket. Dîsa Bêcan hat şeherê qiralî kafir, çû malek kêlaka şeher, nihêrî va pîrek tenê têdaye.

Bêcan go: - Selam, dayîka delal!

Pîrê go: - Ser çevara hatî, kurê min.

Bêcan go: - Dayka delal, tu mêvanara çawanî.

Pîrê go: - Mêvanê forma te malê axa bega peya dibin.

Bêcan go: - Minra koçiksera te mala her axayî çêtire. - Ewî qevza pişta xwa vekir çar - pênc zêr dane pîrê.

Pîrê go: - Çabikim, lawo?

Bêcan go: - Here bazarê her yekê me deste nivîn, xurek bistîne, bide du mşaka bira bînin.

Pîrê ku zêr çenga xwada dîtin, forma qîzeke çardesalî çing kir bazarê. Çi ku dilê wê xast stand, anî hat mala xwa rind da hev, gêzî kir hûrmûr têda cîda.

Êvarê pîrê go:- Xortê delal, vêspêda tu virî hê ez navê te nizanim, navê te xêr?

Bêcan go: - Navê min Bêcane, ez kurê Rostemî Zalim, bona surekî bûme mêvanê te.

Pîrê go: - Bona surekî, sola xwara bêje, lawo.

Bêcan go: - Dayê, gerekê tu orta min qîza qiralî kafir çêkî.

Pîrê go: - Lawo, wê pirsê tu teslîmî dîya xuke, ez serşya wême. Çiqas pêşeme ez diçim cem wê. Vê pêşemê na pêşemeke dinê ezê te bivim tevî xwa.

Roja pêşemê hat pîrê çû serşûştina Gêlanfrûzyê.

Gêlanfrûzayê go: - Tu çima derengî ketî, pîrê?

Pîrê go: - Ez bi qurba, Gêlanfrûza, qîza min eva çendik çend sale mala xalê bû, eva pênc şeşeke hatye, min dikir - nedikir xwa lê xilaz nedikir, digo na ku nebye ezê tevî te bem.

Gêlanfrûzê go: - Pîrê, xatrê xudekî tê carke dnê tevî xu bînî.

Pîrê hate malê temam Bêcanra gilî kir. Pîrê çû dikanê deste kincê xasî baha Bêcanra stand. Roja pêşemê serî heta niga guhast, ew kincana lêkirin teşî kulî da dêst, çarşev jî avîte ser sêrî tevî xwa bira dîwana Gêlanfrûzayê.

Gêlanfrûzayê, ku qîza pîrê dît gelkî ecêbmayî ma, ku haqas bejn bale. Pîrê ber Bêcan av li Gêlanfrûzayê kir, gulîyê wêye hermûşî vegirt. Herge pêşyê şikil ew dîn kiribû, îjar nedixast berê xwa li wê biguhêze. Ewana man hetanî êvarê, Bêcan qet xeber nedida.

Pîrê go: - Ew yeke şermokeye, Gêlanfrûza.

Wextê çûynê Gêlanfrûzayê go:-Pîrê, bira qîza te bal minbe.

Pîrê go: - Na şerme, ewê vir çi bike? - Lê çawa kir Gêlanfrûzaê îzina qîza wê neda. Gêlanfrûzayê kire ser carîya, wanra cure - cure xurek anîn, nanê xwa xarin, paşê tev çûne nav xas - baxçe. Êvarê waxta razanê Gêlanfrûzayê go:

- De qîzika delal, min şerm neke, wê çarşevê veke, ku em razên. Ewê pêşyê xwe tezî kir, kete cî, berê xwa guhast ku qîza pîrê kincê xwa bêxe. Bêcan hêdîka kincê xwa êxist, çû kete paşila wê. Ewê Bêcan hemêz kir. Bêcan jî ew hemêz kir û destê xu da ser zerşemkê wê. Ewê ça ku sûrtê xuyî nazik da ser sûrtê Bêcan texmîn kir, ku ev ne qîze- ew xapyaye. Lê îda ew jî bê hemdî xwe tesmîl bibû. Xu xamî avît. Sivetirê hê xewda bû, Bêcan rabû kincê xwe xukir, xu çarşev kir rûnişt. Hew wextekî Gêlanfrûza rabû îdî wextê nanê nîvro bû, ew zûzkava rabû kincê xwe xukir, ser çevê xwa şûşt, carîya nan wanra anîn, nan xarin, xura çûn nava baxê torkirî seyrangê, ma hetamnî êvarê, dîsa Gêlanfrûza pêşyê kete cî, paşê Bêcan pey wêra kete cî. Nav cîda êpêce wext derbaz bû, Bêcan bîr kiribû, ku ew li wir hatye çawa qîz.

Gêlanfrûzayê go: - Xortê delal çima him tu xu dixapînî, himjî dixazî min bixapînî. Hema şeva ewlinda min tê derxist, ku tu ne qîzî, fesala te ne ya qîzane. Minra bêje çika tu kêyî, ku hatî bal min, bavê min ku pê bihese wê tejî bikuje, minjî.

Bêcan go: - Gelanfrûza delal, ezjî ne yekî ayn aynim, ez kurê Rostemî Zalim, vir salek pêşda ew pelevanê qira eskerê bavê te anî - ew ez bûm, navê min Bêcan pelevane.

Paşî van gilîya Gelanfrûza gelkî şa bû, ku nişkêva bavê wê pê bihese jî, mêrê wê ne yekî kême, yekî angorî wêye. Çiqas wext wanaya usa derbaz kir, Xudê zanibe. Rokê jî ewana xewda şabûn, carîya Gêlanfrûzaye hate hundur- dît va xortek Gêlanfrûz hemêzkirî razaye.

Ewê cab da qiralî kafir. Qralî kafir pelevan şandin wî bigrin bînin.

Bêcan go: - Netirse, Gêlanfrûza delal, tenê tu minra şûr mertalekî bîne.

Gêlanfrûzayê ew peyayî padvala xwa (zêrzemîn) kir, ewî xwara şûrek mertalekîva nav çekada bjart, Gêlanfrûza ramûsa derket meydana şêr, yê qenc ew bû, ku li wir hazir nîbû. Ewî sê ro, sê şeva bi esker û pelevanê qiralî kafir şer kir, em bînin ser qiralî kafir. Ewî emirkir, porê qîza wî bibirin, ser çevê wê dena reşkin, paşopê kerêkin, kî ku rast pê tê tûkê. Roja çara gava Bêcan dît, ku Gêlanfrûza kirine wî halî şûr dest ket. Çil pelevanî dadanê, ku wî sax teslîmî qiralî kafirkin. Nîvî hatin kusîtinê, nîvî jî hatin brîndarkirin, lê Bêcan girtin. Qiralî kafir emirkir, ku Bêcan bavên bîra çilneherî, kevrê aşa bidne ser dêv. Wanaya Bêcan kirin bîrê, lê Gêlanfrûzayê pars dikir. Ewê nanê mirîyê xelqê hildida, herge parîk dixar nedixar, yê dnêjî Bêcanra êvarê danî qulka kevirra davîte hundur. Her carekê ew dihate ser devê bîrê, Bêcan lêlêbû xwa bikuşta. Rojekî ew duşurmîş bû:"Ez nikarim vira derêm, lazime cabê bidne bavê min bê min xilazke". Ewî Gêlanfrûzayêra go:

- Gêlanfrûza, tu dewrêşa li wan dera divînî- bêje wan, bê kurê Rostemî Zal vira girtîye, hûn mizgînyê jêra bivin, ew zêra bide we.

Rokê Gelanfrûzayê nihêrî du dewrêş li kûçê rûniştîne.

- Gelî dewrêşa, kurê Rostemî Zal vira girtîye, ez wî xayî dikim, ku hûn cabê bidne Rostem, ewê mizgînya we bide.

Herdu dewrêşa nihêrîn piştê hespê wan kulbûne naçin, hene, xoê kirine birînê wan, ewana frîn, ezmana ketin. Em bizvirin cem Gêlanfrûzayê. Bavê wê pê hesya bû, ku ew nan dide Bêcan, emirkir, kese nanê mirîya nade wê. Gêalanfrûza ma bê çare, çû cem dîya xwa.

Ewê go: - Dayê, bavê min xêrê nevîne, qîzê dinê alemê mêr dikin, min jî yekî angorî xwa dîtibû, ewî wê ez bistendama, pelevanê forma wî şeherê meda tune. Naka jî emirkirye ku kes nanê mirîya nede min. Dîya wê bavê wêra divêje, bav wê qirarê hildide.

Em bizvirin mala Rostemî Zal. Ça ku dewrêş cabê tînin, şabûn dikeve nava cimeta wî. Rostemî Zal bê eglebûn kincê bazirganbaşîya xudike, bazirganê xwa hildide diçe şeherê qiralî kafir. Ew îznê ji qiralî kafir dixaze- li wir xêretxanê vedike. Gêlanfrûz pê dihese bona xêretxanê tê li wir.

Dewrêş wê nîşanî Rostemî Zal dike. Rostem xura divê: " lê mala min xiravbûyî, Bêcan bona vê hatîye girtin, lazime ez wî girtîjî bihêlim". Dewrêşa gotinê:

- Rostemî Zal, kivşe tu ber xwa dikevî, ew ne qîzeke yaxe, gele merîya serî danîne tenê bona dîtna wê, ew boy kurê te ketîye wê rojê, bavê wê rîyê wê daye denkirin.

Ewana xwara xeber didan. Gêlanfrûza hat wir. Rostem legan tijî birinc kir da ber, ewê têr xar, yek jî kevir hestê xu kire navê, valayî torpê wê kir, ewê bir. Ew torpê birinc daliqande bîrê.

Bêcan go: - Gêlanfrûza, bîna bavê min li torpe hat.

Gêlanfrûzayê go: - Kula xu jî namire, de kerbe, nanê xwa buxe.

Ewî ça ku du perî li birinc xist kevir hestê bavê wî nav derket.

Bêcan go: - Gêlanfrûza, lê min digot tu hêrs diketî. A kevir hestê bavê min, ewê birinc daye te, ew bavê min bûye.

Gêlanfrûza go: - Bêcan, tu îda min navînî- min ber bavê te nan xar, ewî ez vî qilxîva dîtim.

Bêcan go: - Gêlanfrûza, tu boyî min ketî wî qlxî, hema tu li min dûrkevî ezê vê şevê xwa bîrêda bikujim. - Bêcam zanibû ku Gêlanfrûzê here îda ew navîne, ewî ew egle dikir, zanibû ku bavê wî wê şevê eseyî bê ser bîrê. Hê xevardan devê wanda bû Rosemî Zal hate wir, tevî destgirtîyê xwa.

Rostem go: - Bêcan, te vê rojêda nevînim, lê ka qewata mala me? Jêlava pê kela lêxe bira kevir belabe, ez naxazim hildim bira tu xuxa hildî.

Bêcan go: - Bavo, heyfa min diranê min tên, wê biwarin.

Rostem go: - Herdo destê xwe bide ser serê xwa û xu jêlava lêxe.

Bêcan go: - De hûn li vir dûrkevin, - ewî herdo destê xwa cot dan ser serê xu û xu jêlava lêxist, her pirtîkî kevir pekya cîkî, li kuderê ketin xiravkirin. Bêcan li bîrê derket. Ewî Gêlanfrûz bire himamê, da himamîşkirinê, deste kincê forma wêyî pêşîyê lêkir, hilda anî. Gava Rostem çev pê ket naz nekir, merîya nizanbû li wê bedewîyê çi xeverde. Ewana zivirîn mala xwa. Qîza wî jî- Fatime, hê dergîstî bû. Ew dergîstya Gurgan pelevan bû. Pey çûîna Bêcanra ewê nedixast Gurgan bidîta. Bavê wê gazî kir, bire cem xwa û go:

- Lawo, birê te şikir zivirîye, were em dewata we tev bikin.

Fatimê go: - Sebirke bavo, du sê roja bira Bêcan dergîstya xwa jî hinekî rehet bin, paşê.

Wê rojê na, sivetrê- rabûn nihêrîn va pelevanek ber derê Rostem sekinîye. Cab dan Rostem, ku pelevanek hatye ser wî şêr. Bêcan dixast biçûya, Gêlanfrûzayê xu avît nav dest pîyê wî, nehîşt.

Rostem go: - Bira Gurgan here.

Cimet gişk derkete temaşê. Pelevan Gurgan avît. Bêcan dixast biçûya, Rostem nehîşt.

Rostem go: - Lawo, ez ku herim tê dewsa min bimînî, tu ku herî ûrta minê diqele.

Rostem çû, ça ku gulaş girte- wî texmîn kir- pelewan xu ber wî avît, ewî şûr ber xu kişand, lê pelevan papax xu derxist. Rostem niherî eva Fatime, pey wê yekêra Gurgan xeyîdî nedihate dîwanê.

Fatimê go: - Ew gelkî qure dibe, bira bê em qewata wî bicerbînin.

Bavê wê go: - Terk bide Fatime, were em dewata we bikin, Gurgan jî ji me xeydîye.

Fatimê go:- Na, bavo!

Rostem gazî her çil pelevanê xu kir û qirara xu wanra go. Pelevan gişk razî bûn.Rostem yalîkî kulav girt, Fatimê yalê dinê.

Wanaya pelevan srêdora qiloz kirin lê tenê bin Gurganda kulav qul bû. Paşê Fatimê razîbûna xu da bona Gurgan.

Rostemî Zal heft şeva, heft roja ser kurê xwa, bûka xu, zevê xu, qîza xu kir def û dewat.

Ew çûn mrazê xu şabûn, hûn jî mrazê xu şabin.

## 10. EBÛZÊT

Wextekî padşak hebû, zefî dewletî bû. Kurekî wî hebû, rokî ewî gazî kurê xu kir û go:

- Lawo, ezî yê mirinême. Wexte ez dimirim, tu tucara ser text ranebî.

Mîrze Memûd go: - Bra glyê tebe, bavo.

Wext wedê padşê timam bû, rokî jî padşa çû remetê. Mîrze Memûd go: "Hezar dost, hezar djmnê bavê min hene, ca ez herim bnêrim çka wê bavê min ça teslîmî erdêkin".

Ewî hespa xu da anîn, hespê syarbû berê xu da mezela. Hê xo mezelra negîhandibû, nişkêva bû çrpîna xezalekî ber revî. Xezal banzda, Mîrze Memûd da pey. Xudê zanbe çiqas diçin, hesp bin Mîrze Memûdda kef da.

Hew wextekî Mîrze Memûd dinhêre xezala pêşya wî revî kete koçksera himber. Mîrze Memûd hesp ajote ber koçikserê, kire gazî dêwek lê derket.

Mîrze Memûd go: - Selam elêkim.

Dêw go: - Elêkm selam, ser çeva ser sera Mîrze Memûd, keremke malê.

Mîrze Memûd go: - Zef razîme ka nêçîra min, nêçîra min kete mala te.

Dew go:-Keremke hespê peyabe, em herin malê- nêçîra xwe bive.

Mîrze Memûd hespê peya dû, dizgîna wê darekîva kir.

Dew go: - Bide pêşîyê, Mîrze Memûd!

Mîrze Memûd go: - Ez nizanim, tu keremke pêşyê.

Dew da pêşya Mîrze Memûd da pey çûne hundur. Mîrze Memûd nhêrî va şîşek danye ser agir, usa sor bûye, bûye teraf. Mîrze Memûd xwera got, go: "te şeş dar min dayî, yaro eva bona min sor krye". Mîrze Memûd parava hêdî şîşê hildide û dide serê dêw. Dêw kire orîn û got:

- Te pêşya xu li min xist.

Çelek li wir bûye, Mîrze Memûd nigê wî kaş dike wî davê li wir. Ew divê: "De here têda genîbe, goştê heram".

Mîrze Memûd wan dera dikeve tu xezala navîne, paşê fem dike, ku ew sêra dêw bûye. Nişkêva glyê bavê wî dikeve bîra wî, ew zû- zû banzdide ser pişta hesp, berê xu dide text. Hetanî Mîrze Memûd dizvire Sorê çevşîn textê bavê wî hildide.

Xûşka wî jî dike qazvanok. Mîrze Memûd xûşka xu hildide paşda dizvire koçksera dêw.

Mîrze Memûd go: - Xûşkê, nebî, nebî bermalê dikî vê çelê.

Xûşkê go: - Na, Mîrze.

Çendek derbaz bû, rokî qîzkê go:"Çika ez bermalê têkmê, wê çibe?". Ewê çendekî bermal kire wê çelê. Rokî keçkê dengê nelînê bihîst, ew çû ber çelê guhê xu da ser nhêrî deng li wir tê.

Keçkê go: - Tu kîyî, çi dikî vir?

Dêw go: - Qîza delal, here ber dêrî çend znara bîne bavê çelê.

Qîzik zûzkava çû ber dêrî, çend znar anîn avîtne çelê.

Dêw go:- De naha here tawlê, bin afrê hespêda nava peyînda zncîrek heye- bîne ez pê derkevin.

Qîzkê çû tawlê nav peyînda zncîr anî, dahşte çelêda, sêrê zncîra dnêjî estûnêva kir. Dêw xu li zncîrê girt, derket.

Dêw go: - Qîza qenc, te ez xlaz kirim, Xude yazya me tev krye. Ezê te bistînim. Bi wî teherî dzîkî Mîrze Memûdva ewana ya xu dikine yek. Xudê zanibe- çiqas wede derbaz dibe, qîzik hemle dertê. Wextê weldandna wê pêra dighîje, ew nzane ça bike.

Rokî dêw go: - Qîzê xu nexaşî bavê, ku brê te go çibye bê- ez nexweşim, tenê şîrê şêr eyarê şêrda dikare min xlazke.

Rokî wexta hatina Mîrze Memûd xûşka wî xu nexaş davê, nalîneke wê erde, yek ezman. Gava Mîrze Memûdê belengaz dibîne- trsa zarê wî nagere.

Mîrze Memûd go: - Çi te dest daye, çi qewimîye xûşka mine hêsîr? Serê vî çîayî ne doxdire, ne hekîme, weylê min malxravî.

Xûşkê go: - Mîrze Memûd, hekîm ne lazimin, êşa min ya nav dile, minra şîrê şêr eyarê şêrda lazime.

Mîrze Memûd wê şevê westyayî, brçî hespê xu syar dibe, ew jî nzane kuda diçe, lê diçe. Pir diçe hindik diçe, Xudê zanibe, berbanga sibê rastî kalekî tê.

Mîrze Memûd go: - Selam elêkim, bavê kal.

Kalê go: - Ser çeva, Mîrze Memûdê minî delal. Tê vê berbangê kuda herî, te xêre?

Mîrze Memûd go: - Çi bêjim, bavê kal, xûşka min gelkî nexaşe, şîrê şêr eyarê şêrda dixaze.

Kalê go:-Mîrze Memûd were, lawo, heyfa te terkê bide, xûşka te bi yare.

Mîrze Memûd go:-Bavê kal, wekî tu ne mezin byayî mine tera glîk bgota.

Kalê go: - De Xudê tera, lê tu îşê mehekî bivî mêvanê min, ezê tera şîrê şêr eyarê şêrda destxim.

Mîrze Memûd go: "Ez van dera nenasim çendekî bimînim, çika Xudê çidike".

Ew çendekî wira ma, rokî kalêra got :

- Bavê kal, wa vala rok li min dibe salekî- diha başe ez herim, çika Xudê çi divê.

Kalê go: - Sebra xu bîne, Mîrze Memûd, sebra xu.

Em bînin ser kalê, ça ku gihîştine cîda, kavreke wîye xuyêr hebye şerjê dike, eyarê wê svik dike bê xoê radxe zaha dike, tjî şîrê bizina dike hazir datîne.

Rokî got, go: - Mîrze Memûd tu hazirî?

Mîrze Memûd go:- Ez zûda hazirim, bavê kal.

Kalê go: - Ev şîrê han bde xûşka xu bra sbe, sbe xurînî buxe.

Em bînin ser qîzikê û dew.

Rokî dêw derkete ber dêrî nihêrî wê syarek ça tê. Ew zvrî malê, go:

- Qîzê, brê te forma baê brûskê tê.

Qîzikê go: - Lê em ça bikin?.

Dêw go: - Qîzê, Mîrze Memûdî dilxrave bîne gede bipêçe, bive dayne serê rya wî, ewê gede tevî xu bîne.

Qîzikê kurê xu pêça, bir pêçeka wî danî ser rya brê xu. Mîrze Memûd nêzkayî koçkserêra kir, nşkêva dengê zara vrnî kete guhê wî. Ew wîyalî, wîalî filitî nihêrî va zarek li vir danîne. Ew li hespê peyabû, zaro hilda û got: "Welle ezê te xura xayîkim, herge kurî pişta minbe, xêr ku qîzî bmîne helala minbî". Mîrze zaro hilda anî malê, go:

- Selam xûşka delal, çawanî?

Xûşkê go: - Ser çevê min, ser serê min, Mîrze Memûd, - ew li nav cî derket.

Mîrze Memûd go: - Xûşkê, lê tu navêjî ew çîye te anîye, te zaro ku anye?

Xûşkê go: - Ezê çi bêjim, ezîzê min, qey tu wira zewicîyî- zara teye.

Mîrze Memûd go: - Xûşkê, hê meha min timam nebûye, ku zewcîm, zaro ku hat?

Xûşkê go:- Ez bi qurba, ez serê va çyayî tenê nav cîda, min trê eva çika çend sale tu çûyî.

Mîrze Memûd go: - Xûşkê, min ev zara erdê dîtye, xayîke bo xatre min. Herge kurbû ew darê pişta mine, lê xêr ku qîzbû- usa qrarbe ez nazewcim hetanî ew dghîje.

Xûşkê go:-Ez nexaşim,lê Mîrzê minî delal,bona xatrê te serê min ew oxre.

Xûşkê pêçeka zarê vekir û go:

- Mîrze, welleh şikir kure: hilbet Xudê zanibû ku birê te tunene, tu bê piştî, ew bona te şand.

Mîize Memûd go:- Xûşkê, navê wî Ebûzêt, rinid guh bide Ebûzetê min bra bçûkayîda şdyayî bê.

Xûşkê zaro avîte ber bêstan, zarê têr dixwer xura radza.

Pey xarina wî şîrîra xûşk carekêra ji mêrhizkirinê qetya.

Ewê gote dêw, go: - Terka min bide, eze brê xwera bijim.

Dêw go: - Ezê brê tera bêjim ku Ebûzêt kurê mine. Xûşka te tu dşandî şêr, ku tu nezvirî.

Em bînin ser Ebûzêt. Kes nzanbû şev mezin bû, ro mezinbû. Ew tam fember bû û gelekî jî aqil.

Ewî texmîn kir, ku wextê xalê wî te- ew mêrkê cem dya wî xu vedşêre. Wextê xalê wî diçû nêçîrê- ew hildkşya ser xanî, ew guhê xu dida ser dya xu û wî mêrikî.

Rokî Mîrze Memûd go: - Xûşkê, lazime ez bizewcim. Serê vî çyayî emrê min diçe, lê ez tişkî lê fem nakim.

Xûşkê go: - Mîrze Memûd, tera lazime qîzeke esilzade. Wext bide xûşka xu, çika ez duşurmîş bim, şeherê bavê meda qîza kî laîqî teye?

Sbetrê keçikê dêwra go:

- Lazime em cîkîda birevin, birê min dixaze bizewce.

Dêw go: - Eva mala mine. Ezê ecêvekî bînim serê wî û emê xura rehet bijîn, go, - ezê îro bivim dûpişkekî bisekinim li ser şêmîkê, gava ew bikeve hunudur, ezê li tepa wîxim binê nigê wîra derxim.

Em bînin ser Ebûzêt. Ewî gişk bihîst- gilyêd dêw û dya xu. Wextê evarê Mîrze Memûd nêçîrê hat ew çû pêşyê, xo kire qeda go:

- Xalo, gerekê ez beme ser styê te.

Mîrze Memûd nhêrî boşe, Ebûzêt da ser styê xu.

Wexta ewana ketine hunudur, Ebûzêt dûpişk dît û go:-Xalo, dûpişk!

Hetanî xalê lê nhêrî dûpişk unda bû.

Sbetrê xal çû dîsa rav nêçîrê, lê Ebûzêt dîsa dzîva çû ser qûmaxa xanî. Guh daê, dêw go:

- Qîzê, îro ezê bivim dûpişk bikevim sapoka wî. Ewî ku sapok pê kir, ezê lingê wîxim tepa wîba derê. Rojtra dine wextê razanê Ebûzêt sapokê xalê dzîva kirin paşla xu, paşê raza. Sbê zû Mîrze Memûd dxast bçya nêçîrê- lê gerya, negerya sapok nedîtin, nihêrî boşe,go: "Îşkîlya sapoka dest Ebûzête".

Mîrze Memûd deyl Ebûzêt kir, go:

- Ebûzêtê minî delal, te sapokê min nedîtine?

Ebûzêt go: - Bal minin, xalo, bise bidim, - ewî sapok dawşandin, ku bde xalê, nişkêva dûpişk lê ket, dîsa hetanî Mîrze Memûd dixast lexista, unda bû.

Rojtra dinê Ebûzêt nihêrî dêw go:

- Qîzê, bêje bra tera teyrekî bîne, donê teyr ser xarnêke bidê, wê yaxa meê lê xlazbe.

Êvarê qîzkê gotê brê xu, go:

- Mîrze Memûd, minra sibê teyrekî bikuje bîne.

Sibetrê Mîrze Memûd teyrek kuşt, xûşkêra anî.

Xûşkê pelava birinc çêkir, para xu dêw, Ebûzêt rûn lê kir, lê para birê, donê teyr lê kir.

Ewana rûniştibûn dora texte, ku nan buxun. Nişkêva Ebûzêt go:

- Pey- pey ev çi mişke?

Gişk li arîkê dinhêrin. Ebûzêt xarna ber xalê dide ber dêw, ya ber dêw- dide ber wana. Ewana nan duxun, lê xlaz nakin nişkêva dibe gmîn dew wira drêj dibe qîzik jî kêleka wî.

Mîrze Memûd go: - Ev çibû, Ebûzêt, ev dêwa ku hat?

Ebûzêt go: - Kumê niqitok serê wîbû, tevî me nan dixarin. Ewana dixastin te bikujin lê min tebaxa te wanra guhast. Wana donê teyr ser xarna te kiribûn.

Mîrze Memûd go: "Lê min malxravî, kalê rast digot, hebe tunebe Ebûzêt kurê herdane. Ebûzêt helal bû, lê xûşka min serxur bû, dixast bona dew min bikuje".

Pey wê yekêra Ebûzêt tenê dima malda. Gele wext derbaz dibe, de Xudê zanibe. Rokî Ebûzêt qêmîş nake kişmîşa bide pişîkê, pişîk ser antêxda dmîze. Tê wextê nanê nîvro dinhêre agir tune. Ebûzêt radibe ser dûmaxa xanî, dora xu dinhêre. Ew dûrva dûkî zrav texmîn dike. Xu li wî dûyî digre, diçe. Diçe dighîje wî agrî, dnhêre va pîrek ber agir velezyaye razaye,lê qîzeke forma horyajî ber xarinê hîştye.Du sîtil goşt daye ser agir.

Ebûzêt go: - Selam, qîza delal.

Qîzkê go: - Elêkim selam, ser çeva, ser sera.

Ebûzêt go: - Qîza delal, tu hine agir bide minda.

Qîzkê go: - Ewe xzmeta te?

Ebûzêt go: - Erê, qîza delal.

Qîzkê sê zexme û pelê agir daê, go: - Zû here hê pîrê ranebûye, yanê na wê min jî bikuje, te jî.

Ebûzêt çû lê dûrket, nişkêva duşurmîş bû, go: "Ez vêya xalê xura nebim, vêya bedewtir, bê qelen, bê xerc xalê minê yeke wa ku bîne?".

Ebûzêt goştê xu xar, agir vêsand careke dnê paşda zvirî, go:

- Qîza qenc, çi te veşêrim çi Xudê, ez hatime pey te: xalê min nêçîrvane, tu dîtî- begem krî, tu bal pîrê çi dikî xêncî şuxul û cefê, ryê eysanet te hzrete. Xalê min şêrê Xudêye, ware merin hê pîrê ranebûye.

Qîzkê go: - Lê xalê te gelkî bedewe?

Abûzêt go: - Eztexula, Alî şêrê Xudêye, tu dêw ber xalê min teyamîş nabin deşta şêrda.

Qîzkê go: - De bisekine.-Ewê nava destexanekî tijî goştê petî kir, pele agir hilda, tevî Abûzêt rê ketin.

Abûzêt gihîşte malê, perde girêda, bûk kire piş perdê, tendûr dada, goşt kire derdanê, da ser tendura vepesirî û hîvya xalê ma. Gava xal hat, ewî destê xu girt nava malê lîst.

Xalê go: - Xudê xêr ke, çi qewimîye, Abûzêt?

Abûzêt go:- Şikir Xude xêrkirye, ez dewata te dikim.

Gava Mîrze Memûd perde da yalîkî, nihêrî va qîzeke bedew pişda sekinîye.

Mîrze Memûd go: - Te ev qîza ku anîye, Abûzêt, ça anîye?

Abûzêt go: - Were destê xu bişo, here ba bermalya xu bira tera bêje çika min ew çawa anîye.

Em bînin ser pîrê. Pîrê heft rojê wê tam bû. Xewê rabû -ne agrê şuxulî dît, ne jî qîzik. Ew kete pey pirs pirsyara, bi salix sûlixa pê hesya ku Ebûzêt qîzik birye.

Pîrê go: " Gerekî ez Ebûzêt xalê wîva bikujim. Wanaya birê min kuştin bes nîbû, qîza min jî birin." Em bînin ser Ebûzêt. Ebûzêt bendî fela xubû, rabû çû dûrî koçksera xu mezelek veda, ber rûnişt.Abûzêt go: "Ez nahaga hesabê wê rastkim". Pîrê hema nêzkayî pêra gîhand, Abûzêt dest pê kir girya.

Pîrê go: - Çi te qewimîye, cûckê bêxayî?

Abûzêt go: - Pîrê can, Abûzêt qîza pîrê revandye vir çend roj pêşda, qîza pîrê ew kuştye. Eva mezelê wîye ez vedidim çika bikevê kûraya wî, drêjaya wî çawane?

Pîrê, ku pê dihese bona mirina Abûzêt, kîskê zêra ustyê xuva vedike dide Abûzêt çawa mizgînî.

Pîrê go: - Nahaka çi bikim?

Abûzêt go: - Pîrê, bikeve mezel, çika kûraya wî, drêjaya wî çane?

Pîrê go: - Gelkî kurê, ezê çawa derêm?

Abûzêt go: - Minetê nekşîne, ezê qevza xu dahêlme, tu xu lê bigre, derê.

Pîrê go: - Simlayî, - û xu avîte çalê.

Abûzêt go: - Pîrê, ez Abûzêtim, de here bigre xu, min qîza te xalê xura birye, ezê te jî bikujim.

Û xalî tijî ser pîrê kir. Abûzêt ziviri malê, dizîva gazî xalê kir û go: - Min pîrê kuşt.

Xalê go: - Ber bûka xu nebêje, bira ber xu nekeve.

Wextê Abûzêt glî dikir, qîzkê guhê xu dabû ser wan.

Bûkê go: - Mîrze Memûd, pîrê ne dya mine, ewê şev ez dizîme bona brê xu, lê bextê minra nizam kî, Xudê pêra be, brê wê kust, yaxa min lê xlas kir. Ez qîza padşême. Hema îrova karê me bike, em herin padşatîya bavê min.

Ewana gihîştin mrazê xwe, hûn jî bighîjin mrazê xwe, bimînin nava xaşî û şayada.

## 11. HEBKA HNÊR

Wextekî jin mêrik hebûn. Halê wan gelekî xaşbû, derdê wan ew bû ku bê ewled, tewled bûn. Rokî herdu duşurmîş dibûn, nişkêva dewrêşekî derî li wan vekir.

Dewrêş go: - Selam wera, meryê buhurtî.

Jinê go: - Ha ser çevara hatî, dewrêş baba, wekî em merîne buhurtî bûna, Xudê wê ewledek jî bda meda.

Dewrêş go: - Ez bona wê yekê hatime, hanê tera ev hinara hanê: gişkî spîke, lê tenê lê libekî buxe, -. û dewrêş ber wan endabû.

Jinikê ew hinara sipî kir gişk lê libek xar. Wext wedê jinikê timam bû ewê raza qîzek anî. Navê wê danî Hebka Hnêr.

Hebka Hnêr gelkî bedew bû. Dê bavê wê bona nezera çeva nedihîş ew dere devra, merya bivîne. Rokî qîzkê cînarê wan ber pencerêra derbaz bûn.

Hebka Hnêr go: - Hûnê wa kuda herin?

Qîzika gotin: - Emê herin ser qunyê avê, heta wextê ftara.

Hebka Hnêr xu li dê kire qeda eweku tevî wan çû.

Gihîştne qunyê, av dagirtin gişka, hat srya Hebka Hnêr. Ewê ça av hilçinî, nşkêva beqek li qunyê derket, banzda ser lingê wê. Ewê kire qîrîn û go:

- Kul, tu vê zivistanê ku hatî?

Beqê go: - Kul tebe, heft bavê tebe, serê mrîkî heft sala ser çoka tebe.

Hebka Hnêr gelkî grya lê qîzik ber dilda hatin. Ew zivirîn malê.

Ewê go: - Dayê, îro ser qunuyê beqekî banzda ser lingê min, min go kul. -Ewê go: - Kul tebe, heft bavê tebe, serê mrîkî heft sala ser çoka tebe.

Jinik gelkî ber xu ket, êvarê mêrê wê hat, ewê mêrê xura go.

Mêrê wê go: - Bra mal dernekeve, hema erd qulbe- emê li vir koçkin.

Ma, wext hat, ewana koç kirin. Pir çûn hindik çûn, Xudê zanibe, ber kelakî rûniştin ku rehetbin. Hebka Hnêr li wan dûr ket hinekî. Ewê libe kişmîş hilda, kûzbû destê xu lêxist, kulma xu tijî kir, ku bîne cem dya xu, nişkêva erd qulbû- ew unda bû, dîsa qolik hate girtin. Dya wê bavê wê gelkî geryan, lê ew nedîtin. Dor kelê çûn hatin ne derî bû, ne pencere. Gelkî geryan, carke dinê paşda çûne mala xu.

Em bizvirin cem Hebka Hnêr. Ew qulkêra kete afrê hespekî, nihêrî va afrê hespê tijî kişmîşin. Ewê cenga xu têda kir xar, li afi r peya bû. Nhêrî hesp hetanî zengya terêada undabûye, pêket gişik temiz kir, hesp tîmar kir, paşê zivirî kelê gerya, nhêrî va kelêda qusûra tiştekî tune, tenê xortekî cahal têda mirîye. Pêşyê ew trsya, paşda vekşya, lê paşê nifira beqê kete bîra wê. Ew hat rûnişt kêleka cinyaz, serê wî da ser çoka xu. Ewê hey radbû cîê hespê temiz dikir, nan dixar, carke dinê diçû serê cinyaz dida ser çoka xu. Usa Hebka Hnêr jî hînî wî cenyazî bû, de heft sala hema usa serê wî ser çoka wêbû, ewê lê dinihêrî. Mabû înye, deqa ku heft sal temam bûya, şîrqîn kete kelê, derî lê vebû- tevê avîte ser sifetê cinyaz. Koça mirtiva wirra derbaz bû, yek ji wan başqe bû û hate hundurê kelê.

Ewê go: - La min merimê, eva heft sale tu hundurda piziniyî, ka ezê çend deqa bidime ser çoka xwe, tu here hevki rihetbe.

Ça ku qîzkê serê cinyaz da ser coka wê, kir ku here, nişkêva axîn kete cinyaz, ewî tevizî da xu, rabû rûnişt. Nihêrî va mirtivek ber serê wî rûniştîye.

Ewî go: - Te mirazê min anî sêrî, ezî sondxarîme: kî ku mrazê min bîne sêrî ezê wê jî bistînim.

Xort ew mirtiv stand, lê Hebka Hnêr jî xura kirin xulamok. Xudê zanibe çiqas wext derbaz bû, rokî xort dixast here arş- vêrşê.

Ewî go: - Jinik, ez tera çi bînim?

Mirtivê go: - Mira bişkoşka, morîya, bazina bîne,- de mirtiv xişmişka gelekî hiz dikin.

Xort go: - Xulamok, lê tera çi bînim?

Hebka Hnêr go: - Ez tişkî te naxazim, xêncî kevrê sebirtaş.

Xort çû bazar ars- vêrşa xu kir, dixast bizvirya, nişkêva kete bîrê. Ew paşda zivirî cem kalekî porspî, yê ku kevir dirfotin.

Xort go: - Bavê kal, kevirekê sebirtaşê bide min.

Kalê go: - Lawo, tu hakasî cahilî, kevrê sebirtaşê çî terane?

Xort go: - Xulameke meye qîzîn heye, hetanî ez hatim ewê hîvî kir, ku jêra wî kevirî bivim.

Kalê go: - Lawo, tu cahilî, nezanî derdekî wê heye, te ku kevir da wê, xu pista dêrî veşerê. Çi derdê wêye - ewê ser kevirda bêje, axrîyêda wê bêje: "Kevir, ez biteqim, yanê tu?"Tu bêje: "Bira kevir biteqe".

Xort hate malê, çi ku jina wî xastibû dayêda.Gazî xulamokê kir.

Go:- Hanê tera kevir.

Xulamokê kevir hilda çû goma hespê û çi serê wê qewimîbû gişk kevirra go, axrîyêda go: "Ez biteqim, yanê tu, kevir".

Xort pişta dêrîda go: - Bira kevir biteqe!

Kevir destê qîzikêda bû pênc - şeş para. Xort gazî jina xu kir, go:

- Here gune te ustyê te, ez te nakujim, lê îz- toza te îro şûnda li vir nebînim.

Ewî Hebka Hnêr stand, ewan gihîştine meremê xu.

Emê jî bighîjine nêtê xu.

## 12. FERAT Û XOSROV

Şîrîn qîzeke bedew bû, delal bû, temîz, xûnşîrîn bû. Çevêd wê reş bûn, şêbiskê wê şê bûn.

Şîrîn çû bindarûkê: ew û qîzêd hevalêd xwe. Pişta xwe dabû darê, dara Xerîba jêra digotin, ew û hevalê xwe, qîz û bûk.

Şîrîn bi xwe qîza axakî bû. Ew axa zefî xurt bû, axakî usa xurt bû, wekî dinya dêstda zêrzelet diçû.

Şîrîn nava qîz û bûkada bû: qîz û bûk ber diçûn, dihatin, rihan, gul ber bîna wê. Seba çi? Seba wê yekê - qîza axê wan bû, xwe jî bedew bû. Hema Ferat û Xosrov - ew herdu jî nêçîrvan bûn. Ewana hatin, lênihêrîn qîz û bûke li bindarûkêne. Gava Xosrov, Ferat çev bi Şîrînê ketin, dilekî na, bîstûpênc dila hebandin: herkesî ji xwera aqilê xwe unda kirin. Hema Ferat merivekî zefî qewat bû, hema Xosrov merivekî zor bû, tu kesî neditirsya, gazî jinekê kir, wê pirsî, go:

- Eva çi tevaye, çi bindarûke, hûn çira hatine vê derê?

Go: - Tu zanî çi bindarûke, go, qîza Êmîn axaye, hatîye bindarûkê. Em gi jî pêra hatine, pêra eşq û kêfê dikin, bîna wê derê.

Xosrov go: - Gelo, qîza delal, navê qîza Êmin axa çîye?

Hilda go: - Şîrîne.

Go: - Mêrkirîye, yanê ezepe?

Keçikê hilda go: - Na, - go, - ezepe.

Eva pirsa jê pirsî, çûne mala xwe, hema derdê Xosrov Xosrovra bû,derdê Ferat Feratra bû.Gava gihîştin mala xwe,ewî ji dya xwera go:

- Dayê, go, ezî kêfsizim, go, ji minra cîkî dayne.

Xosrov jî ki gihîşte dya xwe, go:

- Dayê, ez nexweşim, go, ji minra cîkî dayne.

Xosrov li mala xwe ket cî, Ferat jî mala xwe kete cî.

Dya Xosrov ber sêrî sekinî, go:

- Lawo, go, ev çi hesabe, go, lawo, nanekî, xarinekê, hilbet, go, lawo, hesabê te çîye, çira wa bûyî?

Go: - Dayê, qe kerbe, dengê xwe meke, ya hatîye serê min, go, dîsa bra bê serê min.

- Eman lawo, hewer lawo, çira çi hatîye serê te? Vê sibê spî - sax çûn nêçîrê, hilbet çi hatîye serê te, tu wa bûyî?

Eva kezelika Xosrov dya xwera got, go:

-Dayê, wekî tu dixwezî ez hergav wa nexweşbim tuê min derdî, hemîn ezî nexweşim,diha çira pirsa ji min dikî? an na, tuê derdê min dermankî, ezê derdê xwe ji tera bêjim. Dêrmanê derdê min tuê peyda bikî?

- Go: - Lawo, çawa, çevê me li teye, paşê li Xwedê: wekî ez û bavê te derdê te derman nekin, bizanbî em bê aqîbetin. Bêje derdê xwe - çika derdê te çîye?

Go: - Dayê, wekî we qîza Emin axa Şîrîn xanim ji mira xwest, ezê kurtîê ji wera bikim, yan na- we nexwest, ezê wî derdî bimirim, ezê derdê Şîrîn xanimê bimirim.

- Ê, go, lawo, go, serîke, ew oxire, go, serê min jî, ê bavê te jî wê oxra tedave, lawo.

Em îja gilîya bînin ser Ferat. Ferat jî nexweş bû. Dya wî jê pirsî:

- Lawo, go, me bihîstîye Xosrovê hevalê te jî nexweşe, tu jî nexweşî. De hilbe derdê te çîye, nexweşya te çîye?

Hema Ferat merivekî usa bû - merdî- merdane bû, digo şuxulê xwe.

- Dayê, go, hergê Şîrîn te ji minra xwest - qîza Emin axa, hemîn xwest, eger nexwest - ezê dîn bivim, çola kevim, nexweşya min ewe.

Dya Ferat qîrîn jê hat, çû cem mêrê xwe, go: "Hal û hemalê Ferat ev hesav".

Mêrê wê jêra go: - Jinik, go, hinekî hurmeta me cem Emin axa heye, ezê bêjim, wê çi qsûrê ji kurê minra bivîne, xebera min bişkêne?

Evî rabû herçê merîê pirsa wî pêda diçûn, gilîê wî cem dihatin gotinê, ew meriv top kirin, pê şêwirî, şandin cem Emin axa. Tu nevêjî, berêda merîê bavê Xosrov jî çûne li mala Emin axada rûniştîne. Evana merîê Ferat ki çûn, ew jî çûn rûniştin: ne ew haj wana hene, ne ew haj wana hene. Ê herdu cîya jî haj hev nînin. Merîê terefa Xosrovda, merivekî hilda go:

- Emin axa, em ji êla tene, tu qe napirsî em ji bona çi hatine?

Êmin axa go: - Hûn ser çevara hatine, dewletîêd min.
Ewî dewletî hilda go: - Gerekê tu Şîrîn xanimê bidî Xosrov.
Go: - Pakî ella, xwestina jinê, edeta dinê.
Ew merivêd terefa Feratda çûbûn - çevêd hev nihêrîn: "Canim, ew fkira em hatine, ew jî hatine". Ew merivê terefa Feratda çûbûn, gelekî li wan gûc hat. Merivêd Ferat kere- ker rabûn solêd xwe kirin pê xwe, ji dîwana Emin axa derketin, çûn mala bavê Ferat, cem bavê Ferat, gotin:
- Em çûn, nebû. Xosrov berê merîê xwe şandibû, eva gilîya ji Emin axara kirin. Emin axa got: "Gele dewletîêd min, xwestina jine, edeta dinê". Hema Emin axa haj gilîê me nîbû, ki em ji bona wê yekê çûbûn, em rabûn hatin. Îcar niha tu çi dibêjî? Ewan mêrika berî me aşkera kirin, meê diha çi bigota?
Bavê Ferat go: - Ez zef razîme merîêd xwe, îlacekê hûn bibînin.
Go: - Îlac çîye?
Go: - Îlac ewe, merivekî bişînin cem bavê Xosrov, bra destê xwe ji wê yekê bikşîne, emê Şîrîn xanimê ji Feratra bixwezin.
Bavê Ferat merivekî xwe şand, go:
- Kuro, here bêje bavê Xosrov, bra destê me herdu bira nexe hevdu, destê xwe ji Şîrîn xanimê bikşîne, em bixwezin ji Feratra.
Ew wekîlê ji alîê Feratda çûbû, bavê Xosrovra got, go:
- Bavê Ferat zef selam li te dikir, go, gotîye, destê xwe ji Şîrîn xanimê - qîza Emin axa, bikşîne, emê bixwezin ji Feratra.
Xosrov hilda dest niqir (pêra- pêra):
- Mirina Ferat - dest kişandina me ji Şîrînê tune, emê koka hev bînin.
Merivê Ferat zivirî, pizmamêd Ferat rûniştî bûn, ewî merivî nav wanda go:
- Xosrov eva pirsa da destê min, gelek li min, gûc hat, go, "Here bêje, Ferat bimire jî, ez destê xwe ji Şîrînê nakşînim".
Pizmamêd Ferat ser çermê xwe perçe- perçe (hêrs bûn) bûn, gotin:
- Em xweşbin, Xosrov vê pirsê ser meda bişîne?
Nav wanda bû deweke giran: bera Xosrov û bera Ferat şûr tîj kirin û ber hev sekinîn, hema ew bû li hevxin. Nav bera Feratda Îsaê Xerîbî merîkî aqil bû, duşurmîş bû, ji wê îşê hanê bela jê tê. Hurmeta Îsaê Xerîbî ji gelekî li cem Emin axa hebû. Ewî şivka xwe girte xwe, çû dîwana Emin axa, jêra pante lêxist.

Emin axa cî nîşan da, go:- Îsaê min, keremke rûnî.

Îsa go: - Ez çi rûnêm xêr- xêrê bihurtîye.

Emin axa got: - Lawo, çi qewmîye?

Go: - Axa, herdu ber wê hevdu qir bikin.

Axê go: - Çima, lawo, ji bona çîye?

Îsaê Xerîbî go: - Bona Şîrîn xanimêye, çima tu nizanî, tu axaê meyî, çawa dibêjî em usa jî dikin.

Emin axa xulamekîra go:

- Here gazî herdu berake jî bike, bra bên.

Xulamêd Emin axa çûn, gazî herdu bera jî kirin.

Merivêd herdu bera hatin, tjî dîwana Emin axa bûn. Emin axa lênihêrî ewana bi serê poz hevra xeber didin, wê zrarê bigihîne hev: gişke genîne. Emin axa got:

- Lawo, hûn ela minin, çi li qewimîye?Hûnê seva qîzikekê koka hev bînin, çîye?Ez qîza xwe bona we nakin du perça, qîze,wê mêrekî bistîne.

Ji wan gundîya yekî hilda got:

- Herdu ber wê hevdu qir dikin.

Emin axa go: - Lawo, Germaşiv (navê gunde) bê ave, yek, paşê bazirganê min jî Qulpê tê nagihîje mezîlê - ji dest bagarê, dest tîpîê, gerekê hûn Qerehesarê virda /Qeza Îdirê) xanikê çêkin, bona bazirganê min bê li bihêwire. Ji alîê Bazîdê pêsîra Zîfirra (çîya) avê bînine ser Germaşivê. Lawo, diha ne li hevxin, ne jî hev qirkin. Kê ku ji we zû av anî, yanê jî xan çêkir, wê şûnda zû cav da min, ezê qîza xwe bidime wî.

Herdu bera jî dest kişandin. Xosrov bi xwe jî osta bû, Ferat bi xwe qewat bû, kevirê giran hildida.

Cmaet di dîwanêda rûniştî bû. Emin axa şand Xosrov û Ferat anîn.

Go:- Ferat û Xosrov, lawo, qîza min mîna hîveke çarde şevî pişt heft gira derê, ber pelte ewrê peşra, ew qender bedewe, nazike, ezê bidim we. Zanin çawa? Du qrarê min hene: qirarek xanê çêkin, ya din - ji qeza Bazîdê avê ji pêsîra Zîfrra bînin ser Germaşivê. Hûn zanin: ji we kîjanî eva yeka kir, qîza min ji wîra helal, diha çima hevdu qir dikin?

Ferat go: - Av anîn li min!

Xosrov jî got: - Xan çêkirin li min!

Axê emirî ser cimaetê kir, go:

- Xosrov çi ku dixweze, hûn gura wî bikin: kevira bînin ber destê wî, çemûrê bra ew çêke.

Lê Ferat go: - Axa, her lazimî mine merek, pale ne lazimî minin.

Emin axa merek ji Feratra çêkir ji pola, beraya wê nîv helebî, lê drêjaya wê helebîk.

Ferat hilda mera xwe, bra ber bi pişta Zîfr qeza Bazîdê here, avê bîne ser Germaşivê bona eşqa Şîrînê. Bra Xosrov hacetê xwe dîwardanînê hilde ber bi Qere- hesarê here, bona xanê çêke.

Xosrov xanê çê dike, Ferat avê tîne. Herneîse, Ferat av anî der xist pêsîra Zîfr, Xosrov jî xan nîvî kir.

Jina Emin axa fikirî, wekî Şîrîn xanimê wê ji dêst bigirin: çû nava gund gerya, nihêrî jineke belengaz wê ber derîkî rûniştîye, tzbîêd wê dêstdanin ji xwera dikşîne. Pîrkê serê xwe hilbirî, dît ku jina Emin axa serra sekinîye, kir ku ji ber rave, jina axê go:

- Pîrê, ranebe, tu pîrî, guneyî.

Pîrê go: - Çawa, tu jina Emin axayî, ez çawa ber te ranebim?- go: - Ez qurbana canê teme, tu çi digerî?

Jina Emin axa go: - Pîrê, hilbet derdekî min heye, wekî ez digerim.

Go: - Bêje, çika derdê te çîye?

Go: - Pîrê, tu surara çawanî?

Pîrê go: - Ez surara pakusteme, heta mirinê gilî ji devê min dernaê.

Go: - Pîrê, wekî usane, were em herin dîwana min, çi ku hebe ezê ji tera bêjim.

Jina Emin axa pîrê hilda bir otaxa xwe - jêra ezet- îkram kir, qurban, heyran. Pîrê ser îstola xwe rûnişt. Jina Emin axa go:

- Pîrê, wekî ew pirsa nha ez ji tera bêjim Emin axa bibhîze, wê min jî bikuje, te jî.

Go: - Hilbet wê bikuje jî.

Jina axê go: - Tu qe bi qirara axê û Ferat - Xosrov hesyaî? "Kî zû ji wana xanê çêke, yanê jî avê ji çîyê bîne gundê Germaşivê, ewê Şîrîn xanimê bistîne". Nha dilê minda jî heye ez qîzê nedime wana, niha tu çi rê minra divînî, em bi çi hesavî qîzê nedinê?

Gulşana pîr hilda go:

- Wekî tu min temiz xweykî, hişê min bê serê min, ezê rêke usa ji tera derxim, wekî yaxa te ji herdua jî xlazbe. Lê hema, - Gulşana pîr go, - ez çi bixwezim, gerekê hazir be.

Xanimê go: - Ser çevê min, çi bixwezî hazire.

Pîrê rabû îzina xwe jê xwest, hema jima Emin axa gele pere dane pîrê. Pîrê çû nava gund gerya, meriv, merîa pirsî, go:

- Gelo Xosrov xan çawa kir?

Go: - Welle, - ewan merya ji pîrêra got, - maye cêrgek, wekî Xosrov xanê çêke, kuta bike.

Go: - Lê Ferat çawa kir? Av anî, nanî ser Germaşivê?

Go: - Welleh, ew jî anîye ser pêsîra Zîfr, hindik maye welgerîne rûbarê alîê Germaşivê.

Pîrê zivirî hat cem jinikê, ji xanimêra got, jêra got:

- Hindik maye xan temambe, hindik jî maye av bê welgere rûê Germaşivê.

Jina Emin axa hilda got:

- Pîrê, heyrana teme, îlacekê bibîne.

Go: - Îlac ewe, go, ez te dixwezim du pût birinc bavêjê, hevanekê destxî, hevaneke kevn, hevanê tijî nanê sêlê bikî, tijî birinc bikî.

Çawa ku pîrê got, jina Emin axa usa qedand, jêra hazir kir, gazî pîrê kir, da pîrê. Pîrê jêra go:

- Ez ku çûm û hatim tope cewê te hazirbe, tu hazir bikî.

Ew merîê berê pîrêra gotibûn, pîrê çû ew merî dîtin, jê pirsî, go:

- Gelo ji Xosrov, ji Ferat kîjanê zû çûxûlê xwe biqedîne?

Wan merîya hilda got: - Feratê zû biqedîne, Feratê avê zû bîne.

Pîrê hilda tope cew, hevana nan, birinc, berê xwe da Zîfr, hilkişya serê çîyê, çû cem Ferat.

- Ferat, lawo, - go, - ez westyame, gele westyame.

Ferat jê pirsî, go: - Çira, dayê?

Go: - Ez îşev qe ranezame.

Go: - Çira ranezayî?

Go: - Dewat bû.

- Dewata kê bû?

- Go: - Dewata Xosrov û Şîrînê bû.

- Çawa?

Go: - Îşev- mîşev ez ranezame, go, eva jî nanê dewatê. Go, Şîrîn dane Xosrov, go, dewat kirin, go, xanî temam kir. Hevan derxist, go, - eva jî nanê wêye, go, dane min, welle ezê herim.

- Mexsûs?

Go: - Mexsûs.

Qîrîn ji Ferat hat, mer avît, hevraz avît, xwe serqot kir, serê xwe da ber: mer qafê wî ket, du qet kir, wêderê ket, mir.

Pîrê lênihêrî ki Ferat mir, ev top caw serî kir bin xalîê, serê din jî usa raxist ber bi gundê Germaşivê anî.

Pîrê hevana xwe hilda, berê xwe da xanê, gihîşte xanê. Xosrov dîwar datîne, maye cêrgek, ewê cêrgê jî temam dike.

Xosrov go: - Pîrê, go, tu ji ku têyî?

Go: - Ez ji gund têm. Of, lawo, ez gelekî westyame îşev.

Xosrov jê pirsî: - Dayê, çira?

Go: - Ez îşev -mîşev dewatêda bûm.

- Dewata kê bû? - go.

Go: - Ya Şîrîn û Ferat bû. Ha, go, hela binhêr av çawa dibiriqe tê.

Gava Xosrov lênihêrî (caw dibiriqe lola avê) av tê.

Pîrê go: - Dewata wana me kir, lawo, eva jî nanê dewata wane: Şîrînê Ferat stend.

Xosrov eva pirsa ki bihîst ji pîrê şaş û met ma, kuling hevraz avît, serê xwe da ber kuling, kuling jorda nik bû, Xosrov jorda xwe ji xanêda avît, mir.

Eva pirsa han pîrê hat ji xanimêra got, jina Emin axara.

- Xan ma nîvcî, Germaşiv ma bê av.

Rûê xanimê û pîrêda herdu jî çûn, negihîştin mirazê xwe.

Jina Emin axa gele qencî pîrêra kir, yaxa Şîrîn xanimê ji wan nêçîrvana xlaz bû.

De bira jinê usa,pîrê usa dinêda qe tunebin,qe xêrê wayê nevînin!

Gotina min ew bû, diha xilaz bû.

## 13. MÎRZEMEHMED Û BEQ

Padşak sê kurê wî hebûn.Rojekê kurê padşê gotine cêrîya xwe:

- Bêje bavê meda, bê hersê kurê te gotine emê bizewicin.

Cêryê jî çû gote padşê:

- Kurê te gotine emê bizewicin.

Padşê got: - Gelekî şame.

Çend roja şûnda padşê elamî şeherê xwe kir, got:

- Kê qîzike wan heye bira bixemlînin, sivê derxine baxçê topkirî.

Şeher gotina padşê qebûl kirin. Qîz xemilandin, derxistine baxçê topkirî. Hersê kurê padşê hatin sekinîn cîkî bilind. Destê xwe avîtne

cêva xwe, herekê sêvek derxist. Qîz kom bûn. Wana destpêkir: berê brê wanî mezin sêva xwe avîtê qîza - çû qîza kizîr ket. Paşê brê ortê avît - çû qîza wezîr ket. Peyra brê piçûk sêva xwe avîte qîza - çû kulikekî xwelya hêşîn ket.

Cimetê got: - Netêye, careke din jî bavêje.

Ewî carekî din jî sêva xwe avîte nava koma qîza. Dîsa li kulikê xwelya hêşîn ket.

Herdu brê wî jinê xwe bi def û zurne birin. Lê ew posîde hate mala xwe. Evarê rûniştibû, gelekî difikirî, got: "Hela ez herim wî kulikî binhêrim, ew jî Xwedê min qizmetê min kirye!"

Rabû çû ser kulik. Wexta ku lingê xwe li kulik da, jê beqek derket. Beqê xwe pêra avîte pêsîra wî. Ewî hingî avît. Ewê careke dinê xwe avîte pêsîra wî. Seheteke ber hev dan. Axirî gede beq hilda anî, avîte pêncera otaxa xwe, rûnişt gelekî fikirî. Beq pêra kêlimî, got:

- Xorto, navê xwe mira bêje.

Eva mehtelgirtî ma, dora xwe nihêrî tiştek nedît, fikirî, got:

- Navê min Mîrzemehmed.

Beqê got: - Mîrzemehmed, tu çima usa difikirî?

Ewî got: - Ya teva Xwedê, hilbet ezê bifikrim bona wê yekê, tu beq, ez benî însan, qat divê yek? Xwedê tu ji minra kirî derdekî.

Beqê got: - Mîrzemehmed, qe ber xwe nekeve, here ser wî kulikê, ku te ez jê anîme, ser bisekine, carekê bêje: "Lerîşan, Perîşan xûşka we gotîye, bira nesekinin bên, her çil cêryê xweva bên, Mîrzemehmed gelekî difikrêdane".

Ewî çû got, zivirî hat. Pey xwe nihêrî ku çil beq daye pey tên. Mîrzemehmed gelekî posîde bû. Derê otaxa xwe vekir, beq tijî hundur bûn.Mîrzemehmed gelekî kete xemêda.Perîşan,Lerîşan lê hatine rehmnda.

Mîrzemehmed razabû, wextekî dengek kete guhê wî. Rabû ser xwe, lê nihêrî du qîz serra sekinîne. Şeweqê avîtîye nav otaxê. Vana gote Mîrzemehmed:

- Kîjan ji me jina teye, kîjan ji baltûza teye?

Ew gelekî fikirî, got: - Ez nizanim.

Yekê got: - Ez jina teme.

Ya din got: - Ez baltûza teme.

Perîşan bû jina wî, Lerîşan bû baltûza wî. Mîrzemehmed gelekî şa bû, rabû çû mala bavê xwe. Bavê wî jê xeyîdî bû, bona wê yekê, wexta herdu kurê mezin jina xwe birin- herekê ji bavê xwera xelatek

birbûn, lê Mîrzemehmed tiştek ne birbû. Mîrzemehmed zivirî hate mal, cem jina xwe û baltûza xwe, got:

- Bavê min ji min xeydîye.

Jina wî got: - Çima, bona çi?

Mîrzemehmed got: - Bona wê yekê, me jêra xelat nebirîye, lema jî ji min xeydîye.

Perîşanê cêrîke xwe şande apincê bavê xwe. Ewî anî da Mîrzemehmed.

Perîşanê got: - Eva jî xelata bavê teye.

Mîrzemehmed apincî hilda. Perîsanê gotê:

- Bêje bavê xwe, bira ji xwe pêştir apincê nede kesî.

Ewî got: - Pak, ezê bêjim, - bir da bavê xwe, hişt hat.

Pey Mîrzemehmed ra bavê lê nihêrî apince mûkî wî zêre, yek zîve, got: "Eva ne şênê mine ez li xwekim". Da xulîm, got:

- Bive bide kurê minî mezinda.

Xulîm bir da. Ewî lê nihêrî - apincê ha mala wanda tunenin.

Xulîm pirsî, xulîm gotêda:

- Mîrzemehmed eva pêşkêş bavê tera anîye.

Hêrs bû û got: - Me herekê palton anîye, evî apincî anîye?

Brê mezin nîvê şevê tendûr dada, apincî avîte nav. Wê wextê Lerîşan û Perîşan, her çil cêryê xweva Mîrzemehmed xewda hiştin, bi hew ketin, ser koçka padşêra derbaz bûn û gotine padşê:

- Herke Mîrzemehmed mêre, bira pey me bê!

Mîrzemehmed sivê rabû nihêrî kesek tune. Hate bîrê pirsa jina wî, rabû berê xwe da mala bavê xwe. Çû, got:

- Bavo, kulfeta min çûye.- Îdî ji şerma negot " kanê apincî?"

Bavê got: - Lawo, ez wextekî hişyar bûm, dengek kete guhê min, gotin: "Herkê Mîrzemehmed mêre, bira pey me bê".

Mîrzemehmed çû ser hosta, xwera soleke hesinî û çomaqekî hesinî da girêdanê. Rabû berê xwe da berbi welat. Pir çû, hindik çû, bira Mîrzemehmed here.

Niha em xeber bidin ji herdu xûşka û çil cêryê. Wana berê xwe dan welatê bavê xwe. Gêdûkêra çûn. Çil cêrî qirbû û ew herdu gihîştine welatê bavê xwe. Bavê wan gotê:- Ka cêryê we?

Çi ku hatibû serê wan, ji bavê xwera qise kirin. Padşê ehid kir, wekî ew zavê wî ku ew yek anîye serê çil û herdu qîza,go-"bê welatê min, ezê goştê wî buxum".

Niha em ji Mîrzemehmed xeber bidin.

Mîrzemehmed gelekî bê, hindikî bê, bê rastî sê bra bê. Ew hersê bra gazî Mîrzemehmed kirin. Mîrzemehmed çû bal wan, selam da selama wî vegirtin. Cîkî xalî bû. Mîrzemehmed gelekî ditirsya, gote wan:

- Keremkin, pirsa xwe bêjin, rya min dûre, ezê herim.

Hersê bra gotê: - Sê kelmelê me sêrê hene, ser me pareveke.

Mîrzemehmed gote wan:-Sêra hersêka ji minra bêjin,ezê we pare vekim.

Go: - Heye kumekî me. Wexta meriv dide serê xwe batnî dibe. Heye sivrekeke me. Daynî ber xwe - çi cûre xarinê jê bixazî, wê bide. Heye tîrkevanekî me. Tu ku li syar divî, ku kîderê miraz dikî, wêderê datîne û diçî ber kîjan deryê polaê, vedibe.

Mîrzemehmed gote wan: - Ezê kevirekî bavêjim hûn pey herin bighîjine sêrî, kî ji wêda hat, ezê sivrekê bidimê. Kî ji we dû wî hat, ezê tîr kevan bidimê.

Kevir avît, ewana pey kêvir çûn. Mîrzemehmed ew kum, tîrkevan hilda, rê ket. Mîrzemehmed miraz kir here welatê bavê jina xwe. Ber koçksera jina xwe peyabû. Kum da serê xwe, lê nihêrî jina wî avê xwe dike. Derbaz bû jorê, ser kincê jina xwe rûnişt.

Paşê jina wî avê xwe dike, diçe jorê, gazî cêrya xwe dike:

- Kincê min bînin!

Cêrya wê diçin kinca bînin, dinhêrin kincê xanimê tunenin.

Yek tê divêje:- Xanim, kincê te tunenin.

Eva mehtelgirtî dimîne: "Çawa bûn kincê min?" Ewê got:

- Ehd- qesembe, ew kîye ser kincê min rûniştîye? Bira rabe, tek ji ruhê min pêştir, ez gilî- gotinê wîda heme.

Ew ser rabû, kumî sêrî çû, pêşberî jina xwe sekinî. Heta jina wî kincê xwe temam li xwe kirin, paşê pêra çû hundur. Ewana hatine dest rûyê hev, ketne ken, heneka. Du, sê roja şûnda Perîşanê cav şande pey xûşka xwe: "Lerîşan, nesekine were, eze nexaşim".

Xûşka wê nesekinî hat, lê nihêrî xûşka wê razaye. Eva hat serda girya, got:

- Lê tu niha çi dixazî, bêje?

Perîşanê got: - Xayê, porê teyî kurkirîbe, em çûn min mêr kir, belkî mêrê min hat, lê emê çawa bikin?

Xûşka wê divêje: - Xûzila bê.

Divê: - Belkî hazirbe.

Xûşka wê divêje: - Xûzil hazirbe, hemê nava paşla xuda xaykin.

Mîrzemehmed Jî pêş wana sekinîye, kumê xuyî batnî daye serê xwe. jina wî gazî dikê, divê: " Were!" Eva tê. Ewana gelekî bi hevdû şadivin, paşê çendek dikeve ortê, herdu xûşk Mîrzemehmedra divêjin:

- Malxerav, dernekeve derva, bavê me ji tera sond xarîye, yê te bikuje.

Mîrzemehmed divêje: - Lê ez çawa bikim, tu guman ji alyê minda tunene, belkî hûn gumanekê bikin?

Ewana jî hev dişêwrin, divêjin:- Belkî dya me teherekî bike.

Herd qîz xwe nexaş davêjine nava cî. Cêrîke xwe dîşîne cem dya xwe, divêjine cêrya xwe:

- Bêje dya me herd qîzê teye naxaşin, zû bike here ser.

Dya wana tê, dinhêre herd qîzê wê razane, nala- nala wane. Eva gelekî ser wanda digrî û divêje:

- Lê kula we çîye, hûn herd jî hevra nexaş ketine?

Ewana divêjine dya xweda:

- Dayê canê, em çûne welatê padşayê rohilatê. Perîşanê kurê wê stend, me hişt em hatin, belkî ew jî hat, bavê me jî jêra sond xarîye, bizanbe, wekî yê bê ewê eskerê xwe bişîne pêşyê, wê bikuje.

Dê divêje: - Xûzila bihata, minê nava paşla xuda xaykira.

Divêjin: - Belkî hazirbe.

Eva divêjê: - Xûzila.

Ewana gazî dikinê, gede tê. Ew xesya xwe têne dest- rûyê hev.

Sê roja xesî wêderê dimîne, paşê diçe difikire, divêje: "Ez çawa bikim, wekî padşa zavê min nekuje?" Eva padşêra xeber nade çend roja.

Padşa divêje:- Jinê, tu xudê xu, tu çima minra xeber nadî?

Xanim divêje padşê:- Pirseke min heye, tu biqedînî, ezê ji tera jintyê bikim, yanê na tu neqedînî, ez tu jintyê tera nakim.

Padşê gotê: - Jinê, tu xudê xwe, tenê ruhê min ji min nexaze, wekî dinê tu çi dixazî, ez biqedînim.

Xanim divêje padşê: - De kaxizekî binvîse, qolke, bide min, ezê bi tera li hev bêm.

Padşê gotina wê qedand, kaxiz dayêda.

Xanim divêje: - Zavê te hatîye.

Padşa xanimê dikute, wezîr, kizîrê wî dikevîne ortê. Xanim kaxiz nîşanî cimetê dide, divê:

- Qe padşa jî vira dikin? Eva kaxizê qol, pêçat kirîye, daye min.

Padşa lê dinhêre yê virek derkeve, divêje xanimê:

- Zava herkê minra çîroka Gul- Senemê anî, zavê mine, herke neanî - ezê kelekim.

Mîrzemehmed û xesya xuva hatine mala Pêrîşanê. Mîrzemehmed xatirê xu xast, li tîr- kevanê xwe syar bû, miraz kir li wî welatî rya çil rojî. Qewlda xesya xwe û jina xwe, gote wana:

- Çil rojî bijmirin, ez hatim, hatim, hêç ku ez nehatim, bizanbin ku ez hatime kuştinê.

Eva rê ket, çû hundurê hewşa Gul- Senemêda danî. Lê nihêrî merîkî tenê rûniştîye. Selam daê. Ewî got:

- Elêke selam. - xudanê heyatê gotê, - xorto, de keremke bêje qilxa xwe.

Mîrzemehmed pirsa xwe gotê bona çîrokê.

Ewî got: - Pak, ezê çîrokê ji tera bêjim sê roja şûnda. Bona wê yekê sê qewlê min û te heye. Sivê ku tu rabûyî, ser çevê xwe bişo, nanê xwe buxe, here kêleka otaxa min wêderê biger, paşê were.

Mîrzemehmed çû gerya, rastî erqekê hat. Lê nihêrî temam rûne dikşe hindirê erqêda. Eva metel ma. Zivirî hat gote xudanê xanmênda:

- Qe welatê weda kasivek tune, hûn vî rûnî bidinê, hûn ha lêdikin?

Ewî got: - Qeydê mala meye!

Mîrzemehmed gotê: - De çîroka Gul- Senemê minra bêje, min keleke.

Ewî gote Mîrzemehmed: -Du roj wextê te heye, du roja şûnda ezê tera bêjim. Sivê jî here bigere, were.

Mîrzemehmed çû gerya, rastî erqekê hat, lê nihêrî wekî têda qatix dikşe. Ew gelekî dişirmîş bû. Hat yêra xwe, dengê xwe nekir. Rûnişt.

Mêrik gote Mîrzemehmed:- Te qe çi dît?

Mîrzemehmed got: - Min tiştek îro nedît. - dûz negote wî.

Ma roja dinê. Sivê mêrik açarek da Mîrzemehmed, gote Mîrzemehmed:

- Here sîûneh otaxa bijmire, ya çilî derê wê veke, binhêre, dade, were. Ezê ji tera bêjim.

Mîrzemehmed çû, usa jî kir, lê nihêrî, derî dada hat.

Ewî gotê Mîrzemehmed:- De rûnê, ezê bêjim, te kelekim.

Mîrzemehmed şabû. Ewî destpêkir got:

- Ez hebûm Silo, min du jin anîn, herdu qebe derketin, min ew berdan. Paşê ez çûme qîza apê xwe - roja ku ji dya xwe bû, min anî. Şîrê teyr- teva xweykir, heta hate wextê mêra. Me hev sitand. Lê paşê min wêya kuşt.

Çil hespê min hebû, çil xulîmê min hebû. Min seva hespa rojê xulîmekî xwe kele dikir, bona wê yekê - ez sivê radibûme nava hespa, min dinhêrî - rojê sê hespe xûdayîne. Ji minra dûz nedigotin. Min sîûneh kuştin, ma yê paşin.

Ewî got: - Tu çima min dikujî, jina xwe bikuje, rojê diçê cem çil herabeşî, wanara derbaz dike, paşê tê, lema jî hespê te ha bûne.

Ez duşirmîş bûm, gote xulîm: - Lê ez çawa bikim?

Xûlîm got:-Çawa bikî? Tu kincê xwe bide min, kincê min li xuke, nava hespada bisene, ez jî herim tevî jina te razêm: dya mine, xûşka mine.

Min got: - Pak.

Kincê xwe hev guhêrî. Ez çûm nava hespa, xulîm jî çû tevî jina min raza. Wextekî şevê Gulê- Senemê morya xewê avîte guhê wî, deyl xûşka xwe kir, rabûn hatine nava hespa, gazî xulîm kirin: "Xulam, xulam, te hesp hazir kirye?". Min got:

- Xanim bibaxişîme, îro ezî nexaşim, were emê tevhev hespa zînkin.

Hesp zîn kirin, lê syar bûn rê ketin.

Xanimê gote min: - Bide pêşyê.

Min got: - Ezî nexaşim, bibaxişîne.

Dane peyhev, çûne ber devê zangekê peyabûn, hesp dane destê min. Çûne nava herabaşîya. Lê nihêrî, ku jina min çû nava sîûneh heva, lê baltûza min çû bal serkarê wana, derbaz kirin, zivirîn hatin.

Ezî pêşya wana rêketim. Hat, ez hiştim nava hespa.

Gulê Senem hat kete paşla xulam. Lezekê sekinî morya xewê guhê wî derxist, dey lê kir rabûn.

Kin bêjim. Min her çil herabeşî jî redkirin, jina xwe û baltûza xwe jî kuşt. - Paşê divêje Mîrzemehmed, - kuta bû, ezê te jî kelekim.

Mîrzemehmed divêje: - Pak, bihêle ez du rikat nimêja xwe bikim, paşê min bikuje.

Mîrzemehmed derdikeve heyatê, tîr- kevanê xwe syar dive, miraz dike welatê xezûrê xwe, bi hewa dikeve.

Silo divêje: - Ay bêbext, ez mirim, neçe.

Ewî guh lê nake û diçe. Silo jî xwe dikuje.

Mîrzemehmed çi çûye- jina wî, xesya wî roja wî jimirîne, sîûneh roj temam bûne, roja çilîye. Derketine li hewa temaşe dikin. Wextekî lênihêrî, ku li hewa notila teyrekî wayê tê. Ewana şabûn, mizgînî dane padşê. Mîrzemehmed hat peyabû, çû otaxa padşê. Destpêkir û got, temam ji padşêra şiro vekir.

Padşê qîza xwe bi def û dewat hêja da Mîrzemehmed.
Ewana çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî herin mrazê xwe şabin.

## 14. QERO

Wextekê du bira hebûn. Navê birê mezin Şemdîn bû, birê çûk - Rizgan. Herdu bira jî gelekî qoçax û mêrxas bûn. Ser rima destê Şemdîn nivîsî bû pênsid mêr, lê ya Rizgan - hezar pênsid. Şemdîn zewicî bû, lê Rizgan hela nezewci bû. Êla wan zef giran bû. Giregrê êlê şewra xwe danîn, wekî qîzekê laîqî Rizganra bixwezin. Pirs û pirsyara bihîstin, wekî êla wanda dewletîk heye, jêra digotin Emerê Pezgewir.

Sê qîzê Emer hebûn, hersêk jî mêrnekirî bûn. Giregrê êlê zef ji Rizgan teweqe kirin, wekî ew here mala Emerê Pezgewir - seva dîtina qîzêd wî. Rizgan gilîyê giregrê êlê texsîr nekir. Rabû çend qewas da ser xwe û çû mala Emerê Pezgewir, bû mêvan. Hema wî çaxî Rizgan qîza Emere ya biçûk begem kir. Emer jî gelekî şa bû, wekî mêrekî notlanî Rizgan wexta bive zavê wî, ew bextewerike zef zêdeye. Rojtira mayîn Rizgan dema xatirê xwa ji mala Emer xwastin û vegeryan mala xwe. Mizgînî êla Şemdîn û Rizgan belabû derheqa zewaca - dîtina wî qîza Emer.

Wedekî kin destpêkirin, def û zurna, dewat kirin Rizganra. Rizgan zewicî jêra heft roj, heft sev def û dewat kirin.

Rizgan û kulfeta xweva ji hevdû hizdikirin. Ew yek jina Şemdîn xweş nehat, ewê gelekî çevnebarî li jintîya xwa dikir. Wextekê Rizgan çû seferyê, lê jina wê pey wîra welidî. Xwedê kurek dayê. Lê jina Şemdîn caw da mêrê xwe, wekî nemekî Rizganra binvîse û bêje: "Jina te welidîye, jêra gedekeke gamêşa bûye. Naka tu çi dibêjî?" Şemdîn gilyê jina xwa texsîr nekir, rabû bi wî cûreyî nemek birê xwe Rizganra şand. Rizgan gava ew neme stand, xwend, gelekî berxwa ket, paşê nivîsî caba nema birê xweyî Şemdîn. Nemêda Rizgan nivîsî: "Birê min, Şemdîn can, seheta tu evê nema min distînî, ese, ese ewan ecêva malda nehêlî, wekî ez bêm, çevê min bira pênekeve".

Şemdîn gava nema ji Rizgan stand, emrî ser du qewazê xwe kir, wekî jina Rizgan pêçeka wêva bivine nava mêşe, wêderê herdûya jî bikujin û lêdin bên. Qewaza glîyê wî texsîr nekirin. Jina Rizgan û pêçeka wêva birin çûne nava kûreya mêşekîda - wêderê hîştin, çend

kincê wê û zarê jê şiqitandin. Nava mêşada çend teyrede kuştin, bi xûna wan teyreda ew kinc xûnêda sor kirin û birin çûn seva şedetyê.

Jinik pêçeka zara xwe hilda, nava mêşe gerya çû rastî şikeftekê hat û wê şikeftêda ma.

Wextekê nêçîrvanek nava mêşa nêçîr digerya, jêra digotin Ahmedê nêçîrvan, ewê jinkêra got:

- Xûşka min, tu vira çi diki?

Ewê got: - Ez nizanim, hal- hikyatê min ev.

Gelekî gunê Ahmed wê hat, gotê:

- Xûşka min, wexta usane were em herin mala me, çi cûre em, usa jî tu.

Êvarê Ahmed Gulîzer anî mala xwe, wekî kincê wê bide guhastinê, serê wê û zara wê bişo. Jina Ahmed jî gilîyê mêrê xwe texsîr nekir. Kurê Ahmed tunebû, lê qîzekê wê hebû. Ahmed ewê derecê xwe gelekî bextewar hesav kir, wekî kurê wî tunebû, Xwedê kur dayêda.

Kurê çûk roj- roj mezin dibû. Navê wî danîn Qero. Qero kurekî zef bedew û qoçax bû. Ewî wexta nava zarada dilist, timê zor kutî zarêd mayîn dikir, seva wê wekê jî timê nerazîtî pêşda dihat nava cînarê Ahmedda.

Qero çardeh salî bû, wexta xercberevkirîyêd êla Şemdîn û Rizgan tên mala Ahmedê nêçîrvan seva xercê heft sala bivin. Wexta ewana xerc berav kirin, Qero para pey wana dikeve, dike gazî, divê:

- Ez wera divêm, ewî xerc û xeracî pajda bidin, yanê na hûnê poşman bin.

Lê xercbirya glyê wî nekirin. Qero wexta xwe wanara gîhand avîte milê yekî, milê wî destva hat. Diranê yekî, duda jî kişand enya wanda kuta û gote wana, go:

- Vegerin herine malê xwe, wexta axê we heye, bira ew xwe-xwe bê xerc û xerecê xwe xwe- xwe bira bive, wexta axê weyî zore.

Xercberevkirê êla Şemdîn û Rizgan por- poşman paşda vegeryan, lêdan çûn. Wexta wana gilya yeko- yeko Şemdîn û Rizganra hûr gilî şirovekirin, Rizgan rabû defa hewarê da, eskerê xwe berav kir, çû ser êla Ahmêdê nêçîrvan şer.

Wî wextî Qero ber Ahmed sekinî û got:

- Bavo, tu qe berxwe nekeve, ezê herim cawa Rizgan bidim, yanê Xwedê wê bide min, yanê wê bide wî.

Hema wî wextî dya Qero gazî Qero kir, temî dayê, jêra got:

- Lawo, wexta tu diçî nava şêr, pêşya te wê derkeve Rizgan, ew merivekî gelekî qewate. Heta te heye, xwe ji wî bide xweykirinê, wekê heta qewata te tê ewî hilde dîl û bîne were.

Wexta defa hewarê dayê, Rizgan û Qero derketine meydana şêr. Ewana roja ewilin gelekî hevdû dane ber şûr û mertala, lê yek- yek alt nekir. Roja mayîn, wexta ewana dîsa dest bi şerê tekmerîtî kirin, ewê rojê Qero qewata Rizgan bir û ew hilda dîl. Êvarê Qero ew anî mala xwe. Destpêkir jêra hurmet û sîyanet kir, paşê destpêkirin mijûlîyê xwe. Hema wî çaxî dya Qero gazî Qero kir, gotê:

Go: - Tu here bêje Rizgan, bê mera mijûlîya bike. Herge ewî go: "Ez tiştekî nizanim bêjim", wî wextî wîra bêje, bê herge îzna te heye, pîredaykeke min heye, ew gelekî mijûlîya zane, bira bê beje.

Qero hete dîwanê, gote Rizgan, go:

- Rizgan çima tu qet kêfa xwe xweş nakî? Tewaqa me te heye,wekî tu mera îşev mijûlîkê bikî.

Ewî got:-Hûnê bibaxşînin, wekî bawarîya we min hebe, ez tiştekî nizanim, lê hergê hûn zanin, tewaqe dikim bêjin.

Ewî wextî Qero îzin ji Rizgan xwest, go:

- Pîredaykeke min heye, ew mijûlîya zefî zane, bera bê mera bêje.

Rizgan got:- Xem neke, bira bê, bêje.

Hema wî çaxî bin pîya herema cimetê perde vegirtin û ber perdê dya wî dest bi glîyê xwe kir. Ewê hema ew serhatî destpêkir, çi ku serê wê qewimîbû, yeko- yeko got. Pey gotina xwera nişkêva perde vekir, nêzîkî Rizgan bû û got:

- Eva ez, eva jî kurê te, ew wekî tu hildayî dîl.

Rizgan gelekî şa bû. Hema wî çaxî ewî gele û gelekî razilixya xwe da Ahmed. Pey razilîya xwera, çiqas ku xercê cimeta cînarê Ahmed hebû, temam bexşandê. Pey kutasya gilya, destpê bû çevronkayî, ew çevronkayî nava êla Şemdîn û Rizgan bela bû.

Rizgan û neferê xweva xatirê xwe ji mala Ahmed xwest û rê ketin berbi wetenê xwe çûn.

Muxdarekî kinda Rizgan duşurmîş bû derhega zewaca Qeroda. Lê ewî bihîstîbû, wekî Qero qîza Şemdînê birê wî gelekî ji hev hiz dikin.

Rojekê Rizgan û Şemdîn rûniştibûn xwera mijûlî dikirin.

Rizgan gote Şemdîn, go:- Şemdînê bira, tu divînî wekî wexta zewaca Qeroye, lazmatîye ewî bizewcînin, lê ez gelekî ji te teweqe dikim, wekî tu qîza xweî Gulîzerê bidî Qero.

Seva wê nêtê Şemdîn duşurmîş bû, got:

- Qîzeke min pêşkêşî Qero kir, bi wî qewlî, wekî Qero bikarbe here Erebistanê mihîna mîrê Ereba - Qemertay minra bîne.

Wexta Şemdîn eva gilya got, Rizgan gelekî berxwa ket, gotê:

- Xêra xwezil te qet tu soz neda, nek wekî te ew rê da pêşya Qero.

Ew gilî cûrekî ber guhê Qero ket. Qero gote bavê xwe:

- Bavo, nek wekî seva wê nêtê, wexta apê min dilê wî li Qemertay girtîye, wekî çi cûreyîbe, li kîderêbe ezê herim, bînim. Bi gilîkî, teweqa min ji bavê min heye, wekî tu îznê bidî ez herim.

Berê ewlin, bavê wî qayl nebû, lê wexta dît, wekî Qero nasekine, esey wê here, got:

- Here, Xwedê oxirê bide te. Lê ez zanim çûyîna te gele çetine, seva wê yekê xwera çend egîta bive.

Qero wexta rêket, elametî da, go:

- Ezê herim, lê çi caîze, wekî hinek ji mala xwe biqetin, minra raste rêbe, serîke ew oxire.

Qero terkeselatî dinê bû, gelekî çû, herge hindik çû, Xwedê bizane, ew rastî kanîkê hat, ji hespê xwe peya bû, ji kanîyê aveke sar xwer, pey wêra êreke telde nêzîkî kanyê xwera rehet bû. Hema wî çaxî ji wêderê awqasî jî ne dûr du qîzka kincê xwe dêxistin, wekî têkevine avê, avê xwekin. Ji wana qîzekê kincê xwe zû êxist kete nava avê. Wî wextî xortek nişkêva wanava derket. Ewî banzda ser kincê ewê qîzka ku ketibû nav avê, rûnişt. Lê qîzka dinê revî çû. Qîzkê nava avêda dît, wekî xort ser kincê wê rûniştîye, gelekî zarî, lavay kir, wekî kincê wê bidê, ew ji avê derkeve. Lê xort nedayê, xort got:

- Qîza delal, herge tuyê serê xwe minra têkî yek, ezê kincê te bidime te, yanê na, ew gilî nabê.

Qîzkê dît boşe, got:- Here, tu tesmîlî şûrê Qerobî.

Wexta qîzkê gilîyê xwe kuta kir, ew xeverdana wan herda Qero temam bihîstibû, gihîşte wê derecê, ewî diha tava xwe nanî, cîyê xwe rabû nêzîkî xort bû, bi gilîkî serê wî lêxist, ber bi cenmê şakir.

Wexta qîzkê eva qewmandina ber çevê xwe dît, Qero gote qîzikê:

- Wexta te hewarya xwe xwest, here tu azayî.

Qero kincê wê dayê û xwe- xwe xwe hevekî sepe kir, heta qîzikê kincê xwe xwekir, paşê Qero nêzîkî qîzikê bû, jê pirs kir, got:

- Eva çi êle?

Ewê got: - Eva êla erebane.- Paşê qîzikê xeverdana xweda zêde kir, derheqa ewî xortîda, êk neheqî wê kirîye. Qîzikê got: - Bavê min

pêşda gele sal zemana mîrtî li êla ereba dikir. Naka jî êla ereba xwera mîrekî teze kivş kirin, xût ew xortê te kuşt- ew kurê mîrê erebayî tezebû.- Qîzikê ji xort pirsî, got: - Xortê qenc, tu ji kîderêyî, bi çi nêtê hatî derketî nava êla me? Bêje, çiqa qewata min bighîje ez hazirim seva mirazgîhandina te.

Qero go: - Çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê, ez herge ji ku hatime, ku nehatime, lê ez hatime seva mihîna mîrê Ereba - Qemertay.

Wexta qîzikê eva gilya bihîst, duşurmîş bû, got:

- Qemertay xût mihîna bavê mine, ew mihîn timê qeyd, çîdar kirye, lê mifta kilîta qeyd çîdara cem bavê mine. Wexta usane tu sebir bike heta ez cûrekî ewê mihînê ji bavê xwe didizim, qeyd çîdarê lingê Qemertay vedikim tînim dighînime te.

Qîza mîrê Ereba wexteke şev mihîna Qemertay zîn, bûsat kirî anî da destê Qero. Qero wexta Qemertay sîyarbû, Qemertay bin Qeroda rû ezman, steyrk parevedikir. Qemertay Qero dive êreke cimcime, davêje nava qunya, vedigere tê mal.

Wexteke şev mîrê Erebayî kevn, xayê Qemertay, dibhê hîre-hîra Qemertay, radive ser xwe, bala xwe didê, wekî qeyd çîdarê Qemertay vekirîne û Qemertay dora konê reşî erebî diçe tê. Mîrê Ereba gazî qîza xwe dike, divêjêda:

- Hebe, tunebe eva yeka kirna teye, were minra rast bêje, te Qemertay dabû kê, yanê na ezê serê te lêxim.

Qîza wî dît boşe, bavê wê serê wê wê lêxe, qîzikê xwe mikurî, got:

- Bavo can, çi te veşêrim, çi Xwedê, hal hewalê min, kurê mîrê Erebayî teze ev bûye.

Çawa qewimî bû qîzikê yeko- yeko bavê xwera şirovekir, çawa min berhingê wera gotibû. Bavê wexta eva yeka ji qîza xwe bihîst, gotê:

- Lawo, wexta glîkî usa hebû, ustyê te bişkê, lê te çima minra negot, wekî min bi hubreza xwe Qemertay pêşkêşî Qero bikira. Minê temî bida Qero, wî çaxî Qemertay îda tu zîyan nedida Qero.

Em bêne ser Qero. Wextekê Qero ser hişê xweda tê, bala xwe dide çi binhêre? Ew heta nîvî ketîye nava tîla cimcimê. Bi cûrekî radive, ji cimcimê derdikeve, bi halekî qolayî rê dikeve, berê xwe dide dîsa êla mîrê Ereba, tê dighîje êlê. Evê carê jî bê xwe sepekirin mala mîrê Ereba dive mêvan. Xût wî çaxî qîzikê mizgînî da bavê xwe, got:

- Bavo, çevê te û min ronik, Qero hatîye!

Wexta mîrê Ereaba eva yeka ji qîza xwe bihîst, şabûna lingê wî li erd negirt, wekî Qero bê qezîya vegeryaye, hatîye. Ewê rojê mala mîrê Erebayî kevn eşq û şabûn, lê mala mîrê Erebûyî teze şîn û girî bû.

Êvarê, wexta êla ereba gişka çira- beysûzê xwe vêxistin, hema wî çaxî Qero pê hisya, wekî îzna wana tunene çira vêxin. Qero got:

- Wexta usane çirê bînin, ezê bi destê xwe vêxim. Hergê qewazê mîrê Ereba bên vira- ezê bi xwexwa cava wan bidim.

Mîrê Ereba tu cava Qero neda. Çira dane vêxistinê. Mala mîrê Erebayî teze manê şaşmayî, wekî îro êla wîda şîn û girîye, mala mirê Erebayî kevnda şabûne. Ewî gazî çend qewazê xwe kir, û got:

- Herin binhêrin çika ew kêye hatîye mala wî? Herge mêvane teglîf bikin bînin, çirê jî vêsînin.

Xulam- xizmekara berê xwe dane mala mîrê Erebayî kevn. Çi bivînin? Wê xortek konda rûniştîye, meriv ne bixwe, ne bide- li ewî xortî mêzeke. Xort nîne, husilcemaleke. Lê ewana çi bikira, îda ne êvarxêrî,hema gotê xort, go:

- Xorto, mîrê Ereba te teglîf dike. Û emir kirin ser mîr jî, wekî çirê bitemirîne.

Wexta Qero eva bihîst, cava wana da, go:

- Ez nayêm,çirê jî vênasînin. Herine bêjin mîrê Ereba çi we ji min bihîst.

Qewaza xwestin wekî çirê vêsînin. Qero go:

- Destê xwe nedinê, lê wexta hûn tiştekî usa bikin - hûnê poşmanbin.

Lê wana guhdarî nekirin. Qero û wanava kire şer. Qero diranê yekî, duda kişand enya wanda kuta û got:- De herin!

Ewana por û poşman vegeryan cem mîrê Ereba û yek- yek qise kirin. Mîrê Ereba eskerê xwe şand ser Qero şêr. Qero wexta bihîst eva yeka, rabû şûr, mertalê xwe girêda û derkete meydanê şêr.

Qero usa kir, êk qencbû ji mala xwe derneketîye. Xût deşta şêrda Qero lêxist serê mîrê Ereba firand.

Pey kuştina mîrê Ereba, nava êla erebada pêşda hat edlayî. Mîrê ereba dîsa hate kivşkirinê mîrê kevn. Mîrê Ereba gelekî razilixya xwe da Qero û rabû hespê xwe - Qemertay zîn, bûsat kir û temî da hespê. Hespê fem kir, wekî îda xweyê wî Qeroye.

Qero rabû syarbû û dil xatrê xwe ji mala mîr xast û rê ket. Ew rîya wekî ew çûbû nava heft rojada, lê vegerandinê vegerya nava sê roja. Mizgînî kete nava êla Şemdîn, Rizgan, Cav dane Rizgan, go:

- Çevê te ronik, Qero hat, mihîna mîrê Ereba - Qemertay jî anîye.

Qero mihîna mîrê Ereba - Qemertay peyabû û dizgîna wê da destê apê xwe, got:- Pêşkêşî te!

Wexta Qero hesp pêşkêşî Şemdîn kir, Şemdîn jî qîza xwe bi hub rez pêşkêşî Qero kir. Pey wê gotinêra destpêkirin def û dewat, bona Qero heft roj û heft şev defê xistin.

Ewana çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî mirazê xwe.

## 15. DÛRGER OXLÎ Û SEMEND

Hebû tunebû padşak hebû. Şeherê padşêda pîreke kesîb dima. Hebûn, tunebûna pîrê bizinek bû. Rojekê pîrê diçe cem padşê dibê:

- Padşaî saxbe, bêje şivanê xwe bira bizina min tev pezê tekin.

Mixdarek dikeve ortê, bizina pîrê nayê dotinê. Pîrê radibe diçe cem padşê, dibê:

- Padşaî saxbe, şivanê te bizina min didoşe.

Padşa dibê: - Pîrê, nav heft kerî pezda çima qe pez tune, wekî şivan bidoşin, rabin bizina te bidoşin?

Padşa gazî şivana dike, dibê:

- Gelî şivano, hûn çira bizina pîrê didoşin?

Şivan dibêjin: - Padşaî saxbe, heft kerî pezê tene, em çira şîr têr naxun, wekî bizina pîrê bidoşin?

Pîrê por- poşman vedigere diçe mal. Şivan xwe bizina pîrê dikine qerewil. Pez wexta ber bi mal bû, bizina pîrê revî çû kete şkeftekê, şkeftêda pêçekeke zara bû. Bizinê gahanê xwe dikire devê zarê, zarê têr dixar, bizin careke dinê digihîşte kerê pêz.

Şivana pêçek hilda hatin cem padşê, gotin:

- Padşaî saxbe, bizina pîrê evî tifalî didot.

Cav diçe pîrêra, wekî dizê şîrê bizina wê dîtine. Pîrê radibe diçe cem padşê, dibê:

- Padşaî saxbe, ne min ewlede, ne min tewlede, ewê zyarê bide min ezê xwera xaykim.

Jina padşê jî teze welidîbû, jêra kurek bibû. Padşê gote pîrê:

- Ezê zyarê bidime te, kingê min zar xwest, tu wî çaxî hilde bîne, ezê navê herda hevra lêkim.

Çend meh ketine ortê, padşê wezîrê xwe şand pey pîrê, wekî zyarê bîne. Wezîrê padşê û pîrê zyaro hildan anîn cem padşê.

Padşê navê kurê pîrê danî Dûrgar oxlî, navê kurê xwe Semend. Kurê pîrê û kurê padşê cem hev mezin bûn, kincê wana yek bû, xarna wana yek bû. Çend sal ketine ortê. Herdu zyaro mezin bûn. Kurê padşê rokê diçe dîwana bavê xwe, digere, wira şiklê qîzekê dibîne, gazî bavê xwe dike, dibê:

- Bavo, ev şiklê kêye?

Bavê wî dibêje: - Karê te wî şiklî neketîye, ew xûşka heft dêwane. Min nîvê hebûna xwe daye ancax ew şikla gihîştîye min, lê paşwextyê min nikarbû xwera banya. Kî bixaze wê qîzê xwera bîne gerekê dêwara bike şer, kîngê dêw alt kirin, wê wî çaxî xûşka wan xwera bînin. Gele esker ser wê qîzê hatine qirê, kesekî nikarbû xwera banya.

Kurê padşê çaxê wan gilya dibhê, medekirî diçe cem kurê pîrê. Kurê pîrê dibêje:- Semend, tu çima usa medekirîî?

Semend dibê: - Min bihewe.

Dûrgar oxlî dibêje: - Dêmek, Semend, tu gilyê xwe min vedşêrî?

Semend çi bavê wî jêra gotibû, wîra gilî dike. Dûrgar oxlî dibêje Semend, dibê:

- Wekî usane, em gerekî çiqa xortê hevalê me hene, em gerekê kêfê daynin û xwera kêf bikin, wî çaxî serê gilya emê vekim, çika kî mera tê, wekî em herin wê qîzê tera bînin.

Xortê hevalê wana gişk top dibin, xwera kêf dikin, wî çaxî Dûrgar oxlî dibêje:

- Gerekê em herin xûşka heft dêwa Semendra bînin, kê ji we wê mera bê?

Yek soz nadine wan. Kêf xilaz dibe, herekê diçe mala xwe.

Wira dimînin Semend û Dûrgar oxlî. Dûrgar oxlî dibê:

- Semend, yeke serîke ew oxire, tu here mera du kihêla bîne û şûr, mertala mera hazirke, emê sibê berê xwe bidine wê oxirê.

Sibe safî dibe, herdu syar dibin û ber bi mala dêwa diçin. Diçine ber derê dêwa, dîna xwe didinê, derê wana nayê kivşê. Kî alî dizvirin dîware. Dûrgar oxlî pihînekê dide dîwêr, dîwar hildişe. Diçine hundur, dîna xwe didinê - qîzek ser nexşê kerge rûniştîye.

Dûrgar oxlî dibêje, dibê:- Xûşka min, birê te kîderêne?

Qîzik dibê:- Birê min fêza gêlî eskerê padşêra dikine şêr Padşa hatîye destê zorê min bive. Wî çaxî Dûrgar oxlî û Semend sîyar dibin, berbi wana diçin. Dûrgar oxlî rêva dibêje Semend, dibê:

- Semend, wextê em diçin, emê silavê bidine herdu alîa, kîjan alî silava me vegirt, emê herin pişta wan.

Ewana diçin, dinhêrin herd alî jî rûniştine nan duxun. Dûrgar oxlî selamê dide wana. Eskerê padşê yek- yekî nabe xayî, dengê xwe nekirin, lê dêwa selama wan vegirt. Dûrgar oxlî û Semend çûn cem wan rûniştin. Dûrgar oxlî gote dêwa û Semend, got:

- Kîngê zengil xistin yek we ranebe, ezê tenê tême şer, kîngê ez hatime kuştinê, hûn wî çaxî têne şer.

Zengil xistin. Dûrgar oxlî şûr mertalê xwe kin girêda, hespê şîn boz sîyar bû, nav wana ket. Dûrgar ewana gişk qir kirin, yê sax ew bûn, mala xwe nehatibûn. Dêw hev şêwirîn, birê xweî çûk pêşda şandine mal, wekî haziryê bibînin bona hatina wan xorta.

Birê çûk çû mal. Dûrva dîna xwe dide dîwar hilşyane. Careke dinê pajda vedigere, dibêje birêd xwe, wekî dîwar hilşyane. Birêd wî medekî xirab tênê. Dûrgar oxlî dibêje:- Çi bûye, çi qewimîye?

Ew dibên, wekî dîwar hilşandine, xûşka me birine.

Dûrgar oxlî dibê: - Dîwar min hilşandîye. Em hatin me derê we nedît, min pihîn lêda, çûm hundur xûşka we ser nexşê kerge rûniştî bû, wêya mera got, wekî hûn û eskerê padşê dikine şer.

Careke dinê ewana tevaî diçine mal. Nanê xwe duxun, xwera xeber didin, birê qîzêyî mezin dibê:

- Dûrgar oxlî, gele esker hatin ser me şêr, lê yekî em alt nekirin. Ez rezadilya xwe xûşka xwe pêşkêşî te dikim.

Dûrgar oxlî dibê: - Çawa xûşka we, usa jî xûşka min, ez pêşkêşî Semend dikim.

Wira birê qîzê gişk qayîl dibin. Ewana dibêjine Dûrgar oxlî:

- Em îzna we çend roja nadin.

Dûrgar oxlî qaîl dibe. Dûrgar oxlî dibê birê qîzê, dibê:

- Emê rojê herin nêçîrê, bira Semend û xûşka we malda bin.

Ewana gişk diçine nêçîrê, Semend û xûşka dêwa dimînin malda. Semend û qîzik gelekî hevra xeber didin nava baxê torkirîda. Qîzik serê xwe dide ser çoka Semend, radizê. Semend destê xwe nava porê wê digerîne, kilîteke çûk dikeve destê Semend. Semend şaşmaî dimîne. Radibe çiqa xanîê wan hebûne, gişka dicêrbîne, kilît ya derîkî naê. Dide fikra xwe çika ew çi kilîte? Padval(binerd) dikeve bîra wî, ber bi padvalê diçe. Derê padvalê vedike, dîna xwe didê dêwê heft serî padvalêda girêdaye. Wexta dêw çev Semend dikeve, dibê:

- Semend, tu ser çevê minra hatî, tu ewê teşta nan û sîtla avê bîne ber min.

Semend teştê û sîtilê dibe ber wîya, ew duxwe û xwe zincîra dixe diqetîne. Yekê dide Semend, Semend erdê dikeve, dixeriqe. Xûşka dêwa hiltîne, diçe.

Êvarê, wextê birê qîzê û Dûrgar oxlî tên, dîna xwe didinê, ne qîzike û ne Semende. Dûrgar oxlî gele hêrs dikeve, dibê:

- Ewî qîz hildaye birîye, wekî bavê wî bêje: "Semend qîz anîye".

Birê qîzê çûk ber bi padvalê diçe, dîna xwe didê padval vekirîye. Diçe hundur dinhêre - Semend xûn ber gol bûye, xeriqîye. Gazî Dûrgûr oxlî dike, dibê:

- Dêwê heft serî me padvalêda girêdabû, me nanê wîya hindik didayê, wekî zincîra neqetîne. Lê Semend nan gişk daê. Zincîr qetandîye û xûşka me birîye.

Dûrgar oxlî avê ser Semendda dike, Semend tê ser hişê xwe. Birê qîzkê dibêjine Semend, dibêjin:- Te çira derî vekir?

Semend wî çaxî dibêje:- Min derî vekir û nan dayê, xwe zincîra xist, zincîr qetandin, tepek da min- ez xeriqîm.

Dûrgar oxlî dibêje: - Gelî bira, hûn virabin, ezê herim şerê dêwê heft serî. Hergê min qîzik anî, xa anî, hergê min nanî, hûn îzna Semend bidin bira here şeherê xwe.

Dûrgar oxlî syar dibê diçe. Diçe mala dêwê heft serî, dîna xwe dide dêw razayê. Qîzik xwe davêje dest pîê Dûrgar oxlî, dibê:

- Tu çawa hatî, usa jî vegere, yanê na, wê rabê te bikuje. Heft roja radizê, hefta jî hişyare, eva roja sisyane wekî razaye.

Dûrgar oxlî dibêje qîzikê:

- Ez çawa bikim, wekî wîya bikujim?

Qîzik dibêjê: - Şûrê wîya nava qîr- qetranêda nikandîye, hergê te şûrê wî kişand, tê pê wê wîya bikuji, lê hergê te nekişand, tu şûr wîya nikarin.

Dûrgar oxlî destê xwe davêje şûr, şûr dêstva tê. Wî çaxî qîzik dibêje:

- Tenê yekî lêxe, wextê te lêxist, ewê tera bêje: "Heyrana xortê çême, yeke dinê jî", tu wî çaxî lênexî, yanê na tu lêxî, wê saxbe.

Dûrgar oxlî şûrekî dikşîne sêrî, dêw dibêje:

- Heyrana xortê çême, yeke dinê jî.

Dûrgar oxlî dikene, şûr datîne û qîzê hiltîne tê.

Wextê Dûrgar oxlî pey qîzikê ket, wekî ji dêwê heft serî bistîne, heft birê qîzikê peynê tewlê gişk ser pişta Semend dane derxistinê. Wextê Dûrgar oxlî wanava xuya kir, wana pêra- pêra kincê Semend dane guhastinê, gotine Semend:

- Dûrgar oxlîra gilya nekî.

Dûrgar oxlî qîzik anî, şevek cem dêwa man, xatirê xwe wana xwestin, ber bi şeherê padşê çûn.

Caw çû padşêra, wekî Dûrgar oxlî û Semend qîzik anîn.

Semend û Dûrgar oxlî hatin perê şeher. Dûrgar oxlî gote Semend:

- Em seheteke xwera rehet bin, bira hespê me jî biçêrin.

Ewana xwera razan. Sê kevotik hatine ber wan danîn. Nav wanda kevotkekê got:

- Hergê hûn hişyarin, guhdarbin, hergê razaîne, bira bê xewna we. Padşê bihîstîye we qîzik anîye, hêrsa wî rabûye.Ewe faytonê jerdadaîke. Wextê hûn sîyarbin, hûnê cîda texdîrbin. Faytonê sîyar nebin. Pira dîsa jerdadaî kirine, ser pirêra neçin. Ber palata xwe bîr kolaye, xalîçe ser raxistine. Wextê hûn diçin tejîkê xwera bibin, tejî kura diçe, hûn wirra herin. Xarina para we jerdadaî kirine, wextê hûn ser xarinê rûdinîn, pişîkekê xwera bibin, xarinê bidine pişîkê, pişîk pê mir, wê xarinê nexun. Wextê tu wan gilya gilîkî, tê cîda bibî kevir.

Dûrgar oxlî radive ser xwe dibêje Semend:- Em rêkevin, ez tera dibêjim, tu gura min derneê, yanê na ezê te bikujim.

Wextê diçine nava şeher, faytonê dişînin pêşya wana. Dûrgar oxlî nahêle faytonê syarbin, ew syarî diçin. Diçine ber bi pirê, didine nava avê, ser pirêra derbaz nabin. Wextê avê derbaz dibin, Dûrgar oxlî dibêje xortekî, dibê:

- Mira tejîkê bîne!

Xort tejîê tîne dide Dûrgar oxlî. Tejî kura diçe, Dûrgar oxlî wirra diçe. Diçine palata padşê. Wanara naz- nemet tînin. Wî çaxî Dûrgar oxlî nahêle Semend û qîzik nan buxun. Xortekî dişîne pişîkekê jêra tîne. Parîê ewlin dide pişîkê, pişîk pêra- pêra işk dibe. Dûrgar oxlî wî çaxî pişîkê nîşanî Semend û qîzikê dide, paşê pişîkê hildibre nîşanî cimaetê dide. Dûrgar oxlî dibêje padşê:

- Çi gilyê te kirine, ez gişka hesyam!

Semend pêra- pêra bavê xwe cihê bû.

Padşa dişurmîş dibe, çika çawa bike, wekî wana bikuje, qîzikê xwera bîne. Gazî pîra sêr dike, zêra didê, wekî herda bikuje.

Pîrê tîremerê xwe berdide, wekî here Dûrgar oxlî û Semend bikuje. Lê Dûrgar oxlî ew çend rojbû qerewil sekinîbû, dîtîye, wekî tîremer tê, şûrê xwe dikşîne tîremer dikuje, dike tebaxê, datîne ser îstolê. Wî çaxî Semend hişyar dibe dinhêre Dûrgar oxlî şûrê xwe tezî kirîye.

Semend dibêje:- Tu dixwezî min bikujî?

Radibe diçe cem bavê xwe. Ew bavê xwera gilî dike. Padşa emir dike, wekî Dûrgar oxlî daraxacê xin. Dûrgar oxlî tewaqe ji padşê dike, wekî mecalê bidê çend gilya bêje. Dûrgar oxlî derheqa jerdadaîna pirê, faytonê, xarinê û kolana bîrê dibêje, cîda dibê kevir. Semend û qîzik gelekî berxwe dikevin.

Çend sal dikeve ortê, Semendra kurek dibe. Ew xewna xweda dibîne, wekî kurê xwe bive ser kevrê Dûrgar oxlîda şerjêkin,wê Dûrgar oxlîê sax bibe. Semend dibêje jina xwe, dibê:

- Min xewneke wa dîye, wekî em kurê xwe ser kevrê Dûrgar oxlîda şerjêkin, Dûrgar oxlîê saxbe.

Qîzik dibêjêda: - Hê em cahilin, paşileke me kure, yek qîze, were em bibin şerjêkin.

Ewana kurê xwe dibin şerjê dikin. Dûrgar oxlî sax dibe.

Dûrgar oxlî û Semend şeherê padşê dertên diçine şeherekî din. Bi xebata xwe ebûrê xwe dikin.

Ew çûn gihîştin mirazê xwe, hûn jî bighîjin mirazê xwe.

## 16. MÎRZE MEHMED Û KRASZÊRÎN

Hebûn, tunebûn sê bira û bavek. Bavê wan hertim wanara digot: "Lawo, meçine çîyayê gula", lê nedigot bona çi. Her pirsa wî ew bû: "Neçine çîyayê gula".

Bavê wan kal bû, rokê texdîr bû. Berî texdîrbûnê gunê xu jî kiribû ustyê wan, bona ew neçûna wî çîyayî.

Dû mirina bavêra, birê mezin sed esker hilda, çu seyrangêda. Pir çû, hindik çû, gihîşte çîyayê gula. Xeysetê wî çîyayî jî ewe, rojê carekê zîpik û baran lê dibarî. Evana dîtin gulêd cûre - cûre, xulyê cûrekî, hewa cûrekî, ha dîtin heta berê êvarê. Ewir tijîbûn, zîpik barî. Ewana gişk qefilîn.

Sê roja şûnda birê ortê dusid esker hilda, çû gerêda, got:

- Ezê hem herme gerê, hem jî birê xwe bivînim.

Wextê çû, çû gihîşte menzîlê, kîjanê ku birê mezin çûbûyê. Ewî gulî û başbûna wîra dît, go: "Bavê me çi merîkî çevnebar bûye, nedihişt em bêne vira gerêda" Ewan jî geryan, xarin, kêf kirin. Rabûn ber bi tîtîxa birê xwe çûn, nêzîk bûn, zîpikê ew jî kuştin, wana cinyazê yê berîn nedîtin.

Ji çûyîna birê ortera neh roj kişand. Îja birê çûk çû: sêsid mêrî tev çûn, gihîştine çîyayê gula. Ewî got: "Eva dera ha başe, loma birê min mane, îro neh roje nayên". Ew wira ser kanîkê nan xarin,vexarin, star bûn çûn. Ew jî hê haji wê zîpikê û mirina bira eskerava tunebûn. Derketine çîkî- dîtin wekî dusid esker û birê ortê gişk qir bûne. Ji wana pênsid mêtrî wêda jî sed esker û birê mezinva qir bûne. Ewî gote esker:

- Şûnda vegerin, eva îcateke, wekî evana bê birîn, bê dexme qir bûne.

Lê ewî esker nikar bû, esker îda ketibû. Birê çûk tivingê birêd mirî hildan, lê ew zanibû eva nişkêva diqewime, birêd wîye alîyê şêrva hazirbûn, zûzû nedihatine kuştinê. Bi vê yekê jî ew ji wira vegerya, hinekî dûr kete. Dîsa qewimî ew. Eskerê wî hatibûne kuştinê, lê ew nîv ruhî filitî. Halê wî nemabû, hişê wî çûbû. Hespê ew hilda bir weletekî dinê. Ew pir çû, hindik çû, nizanim, dighîje welatê padşakîda. Kêleka şeher hesp wî dixe, nigê wî zengîêda dimîne, hema hesp wî erdêra dikşîne. Xûlamê padşê dûrva dibîne, diçe divêje padşê. Padşa divêje:

- Zû here bîne vir.

Tên wî wî halîda dibînin, hesp digrin, nigê wî ji zengîê derdixin, divine cem padşêda. Pir dimînim, hindikî dimînim, nizam. Bi gotina wana çar roja ne hişî xu bûye, bi destî hekîmê padşê ew hate xelaz kirinê. Îda nizam, ew xwe pak bûye, yanê hekîm ew pak kirine? Aha ewî ba padşê mûxderekî derbaz dike. Qîzeke padşê jî hebû. Padşê got:

- Ezê qîza xwe bidime te.

Ewî jî nihêrî wekî nabe, terkê ji wî nakin, ew qîzik stand- bi def û zurne. Mixderê heyşt meha ew li wira ma. Axir merema wî çûyîna welatê wî bû. Ewana jî razî nedibûn ew biçûya.

Huba wetenî şîrîn bû, ew berê xwe dane welatê bavê xwe. Qîza padşê jî du meha giranbû. Padşê jî wîra got:

- Lawo, hanê eva îcata min bive, wextê jina te zarbe, tê bizanbî kure, yanê qîze?

Ew çûn, wextekî kinda gihîştine welatê bavê xwe. Welatê bavê wîda kesek nemabû, heta xan- manê wan jî xerabe bûn. Wira bûne mêvanê sepetkarekî. Ewî sepetkarî wanara got:

- Lawo, tu nabî kurê min, yanê jî zavê min? Ez haqasî dewletîme, kurê min tunene, were bive kurê min.

Ewî got: - Zef pak, - û bû zevê wîda.

Ewî anî du ode nîşanî wî dan, gi zêr, zîv, tiştê qîmetlî, îda nizanim çi bêjim - ku tunebû. Got, wekî "Ev herd odana jî tera, lê evê dinê jî mira". Ewî got: "Ê, pak, çima evî du ode beranberî yekê kirin, hilbe ku ewê yekêda emel heye". Ewî dest pêkir, kilîta gerya. Şev bû, kilît nava rûyê wîda dît, bir pê ewî derî vekir. Nihêrî, çi binêre, şiklê qîzekê mîna rojê wa xênîda. Ew ket, xuva çû. Qîza sepetkar dinêre ew tuneye, îda zane, tê dinêre rastî jî usane. Wî dive mal, pasê dereng ew xuva tê. Ewî dewa xuyê şikil kir, ewê got: wekî "Ewa heye Kiraszêrîne- danzde sala pey ketine, heta naha nikarin bînin".

Ew berê xwe da wî welatî, kîjanî ku Kiraszêrîn têda dima. Ew çû, kalekî serê rê bû, ji wî kalî pirsî:

- Ev hersê rê kîjan pake, kîjan pîse?

Got: - Eva ya çûne- hatinêye, ya dinê cara tê, cara jî nayê, lê evê heçî kes çûye, hê nehatiye.

- Hema ezê vê rîyê herim.

Ewî berê xwe da wî welatî, çû. Pir kişand, hindik kişand, ew gihîşt wî welatî, kîjanî ku Kiraszêrîne têdabû. Ew bû mêvanê pîrekê. Mixdarekî ma. Pîrikê îda zanibû ew bona çi hatîye. Ewî jê pirsî:

- Lê ez çawa bikim, wekî bibînim?

Got:- Mêrê wê zîvkere, bazina çêdike, li mehela zîvkerada lap kutabûna wan gişka, mêrê wê rûdinê. Tu here ba wî, tê selamê bidêyî, ewê seheteke şûnda selama te vegire. Yê bêje: "Navê qulixê xwe bêje, binêrim çi dixazî?" Tu xwe şaş meke, fikrekê bike, binê tê çi bêjî, wekî tu wî alt bikî. Navê wî jî Ehmede.

- De, dayka pîr, xatirê te.

Ew çû, pirs kir,-. Hoste Ehmed ku bazina çê dike?- nîşanî wî dan,- ew çû ba wî.

- Selam elêkîm, hoste Ehmed.

Sihetekî şûnda: - Elêke selam, beje çi dixazî?

- Bazinekî zêrîn çêke.

- Zêrekî bide here, êvarê were ezê çêkim bive baznê xwe.

Çar zêr danê, ew çû, êvarê hat. Bazinî hazir bû, lê wî begem nekir: serda jî deh zêr dan û vegerya bona sivê çêke, ew here bîne. Ew çû mala pîrê.

Ehmed jî rabe here mala xwe, heft derê wîye pola hene, her heftra jî hêrse- hêrs vedike. Jin pêdihese dertê, divê:

- Ehmedî dîn- harî, çima derya usa dikî?

Ehmed qe dengê xwe nekirî diçe bê mede rûdinê, jinêra navêje, wekî bazinê wî begem nekirine.

Sivê dîsa hatibû, bazin hazir bû, wî ha lê nihêrî, dîsa ne bi dilê wî bû. Ewî hilneda. Ewê rojê kulme zêr dîsa dane wî, bona sivê here hilde.

Ehmed diçe derya dîsa hev asêdike. Jin pê dihese, divê:

- Çi bûye, îro du roje tu ha bi hêrsî?

- Dêrî bigre, were ez bêjim.

- Bêje!

- Îro du roje, xortek hatîye ez ji deh zêra bazinekî çêdikim, begem nake. Nizam jina wîya çawa jine, wekî begem nake?

- Helbet, mervê ku ji deh zêra bazinekî begem neke, helbet jina wîya bede. Sivê çûnê, ewî bazin begem nekir, xura weyne mala meda mêvanîda.

Sivê bazinin hazir bû, ewî dîsa hat- begem nekir.

Got: - Mîrze Mehmed, îro em herin mala me mêvan.

- Pak, em herin.

Ew tev çûn wira. Wî dît, çi bivîne? Heft derîê polakirî ser jina wîda dadayîne. Ew çûne mala wana. Jinikê nan anî. Ser çevê xwe girtibû, çeva pêştir tiştek nedît. Ew herdi jî serxaş bûn, heta sivê.

Sivê çûnê, jinikê gotibû: "Mêvanê xwe îro jî weyne, bê- Mîrze Mehmed, kuda diçî, êvarê werê zêrê xwe jî bive, dîsa mêvane minî".

Ew çû mala pîrêda, go: - Kuda çûbûyî?

- Mala Ehmed.

- Çi gotin û çi dane te?

- Tiştek negotine, ne jî dane.

- Te cêva xwe nihêrîye?

- Min nihêrî sê kav têdane.

Pîrê got: - Îşev jî here!

Ew çû, dîsa ew dîtina berê dîtibû, tenê vê carê rojê jinikê dît. Dîsa ew serxaş bûn heta sivê, wextê hatinê, go:

- Mêvanê xwe dîsa weyne.

Ehmed gote: - Îro jî mêvanê minî.

- Bira.

Ew çû mala pîrê, pîrê go: - Kuda çûbûyî?

- Mala Ehmed.

- Çi dane te?

Nihêrî holeke cêva wida. Ewî gote pîrê:- Evana bona çine?

Go:- Îşev jî here, were ezê bêjim.

Dîsa gilyê xwe wekiland.

Hate mal pîrêda, go: - Çi dane te?

Nihêrî. Gûzanekî almast cêva wîda.

- Îro ez bêjim, kav kirine cêva te, tu zanî here bilîze, hol jî usa, lê gûzînva wê stîyê te jêke. Tu îşev diçî nîn nexwe, tu bixwî, tê serxaşbî, wê serê te jêke.

Ew herd jî çûne mala wana. Nan anî.

- Keremkin, nîn buxun.

Ewî nan nava kincê xuda berdida pêsîra xwe, lê Ehmed xar û serxaşbû, ket. Ew dimîne metel. Ew nihêrî derê perdê vebû, Kiraszêrîn hat, milê wî girt.

- Rabe, bextê te birî.

Ew çûne mezîla wêda, ewî got: "Eva dive mi şerjêke",ewî nizanbû, wekî xura helal hesav dike: heta sivê defa wan herda lêket, sivê zû jêra got:- Sivê herî kîlomêtirek ji me wêda xan- manekî daynî, çêkî.

Ew hatin ba Ehmed,ew jî ranebûbû, teze rabû wextê çûna wan.

Jinê go:- Îro mêvanê me meyne.

Ew çû şeher, çiqa pale destê wî ketin ser xan- manekî dane xevatê. Wedekî kinda da hazirkirinê.

Kiraszêrînê jî ji mala xwe heta mala wî bin erdê da kolanê, bona hatina ba wî. Hat, ew mûxdarekî derbaz kirin.

Got:- Ehmed, sê cara gazî te kirîye, tu jî gazîke, ezê bêm her tiştî çêkim.

Ew diçe Ehmed bîne mala xwe mêvan. Kiraszêrînê kelmelê mala wêdabû bin erdêra kişandibû, bazinê mala xuda anîbû dardakiribû, xwe jî rûniştibû. Ew çûn gişkî hazire, sekinîne. Ehmed ma metel, dilê xuda divê: "Eva mala ji mala mi çêtire, jin ji jina mi bedewtire, bazin jî baznê mine".

- Ehmed, nîn buxwe.

- Naxum, ezê herim, - lêxist çû.

Mala wî jî sê kîlomêtra dûrbû.

Kiraszêrînê kel- malê ku anîbû dîsa birin, danîne şûnê, xwe jî rûnişt mala xweda. Ehmed wextê ji ba wan çû, bi lezî, bi rev çûbû mal, derê xwe hev asê kiribû, jin pêhesyabû, ku hat.

- Ehmed, çi bûye tu îro ha dereng hatî û xwe jî ha bê medeyî?

- Mala te xerav nabe, were ez bêjim. Ewî mêvanê me ez birme mala xwe mêvanî. Min digot: "Jina min bedewtir, mala min paktir di dinêda tune", lê ewî ez dîn kirin, bazinekî mîna bazinê me darda kirî, maleke mîna mala me jî wira, jina wî jî hema mîna te, hela jî te bedewtir.

- Lê mervê kulme zêr bide, bazinekî bide çekirinê, xwe jî begem neke, helbet wê jina wî ji jina te bedewtirbe.

Sivê Kiraszêrîn dîsa hat, çawa wê şeva berîn, du şeva jî dîsa usabû. Şeva çara go:- Mîrzemehmed, deva bikire, emê herin.

Ewî deve kirî , paşê çû gote Ehmed:

- Îro diçî mal, sivê were mala me, bive dabêre were.

- Zef baş.

- Kiraszêrîn, ew mêvanê me bar dike, gote mi: "Were mala min, dabêre, bîna min bê te der nayê", rabê derê ser belexanê, ez te dûrva bibînim, bira bîna min derê.

Kiraszêrîn çû dizîkava çêrek jî bin çerşeva xweda bir. Ehmed wêda çû. Çerşeva xwe avîte ser çêrda, hat destpêkir binerdêra mil kişand. Heta Ehmed çû, ewa jî mal da barkirin.

Ehmed du roja mala wanara çû, gere du roja jî vegere, dike çar roj. Roja çara hate nêzîk dît, jina wî naê kivşê, divêje: "Ewî kopoxlî ez danavî kiribûm, ancax çû". Diçe ber belexanê, divê:

- Jinê, were, jinê were, - dinhêre nehat, diçe divê, - çima naêyî?

Dest davê çersevê, dibe terpînya çêr bela dibe. "Wey min mala xwe dest xwe şewitandîye, wey mirim, belabûm, teqyam",- xwe belexanêda davêje bela dibe.

Em xeberdin ji jina wîye berîn: radizê kurekî tîne. Ewa jî hinekî mezin dive, diçe kab dilîze. Hevalê wî divêjin: "Hela ewî binhêrin, qe kesek bavê wî nas nake". Digrî tê mal.

- Hûn navê bavê min mira bêjin, kî bûye û çi pê hatîye?

- Lawo, bavê te padşaye. Na, ne padşaye. Serê xwe hildide û diçe welatekî. Padşayê wî welatî jî tunebûye. Teyr ber didin, diçe serê wî datîne. Ewî dikine hundur, teyr dîsa diçe ser wî datîne. Cara sisya jî datîne, dikine padşa.

Em xeberdin ji Mîrzemehmed û Kiraszêrînê.

Ew çûne mala wî xezûrê wîyî sepetkarî, yê ku şiklê Kiraszêrîn bal bû. Wextê ewî dît, ku Kiraszêrîn anîye, xwe revî bal padşê şikyata, wekî "Mîrzemehmed jina min standîye". Padşa jê dipirse:

- Herkê jina teye, çî wê bal te heye?

- Şiklê wê îsal bîstpênc sale wekî min daye kişandinê û wî wextîda jî jina mine heta niha.

- Celat, Mîrzemehmed bivin cîk bikujin, kirasê wî weynin.

Celat birin cîkî xewle, qêmîş nekirin bikujin, lê kirasê wî xûnêda kirin, anîn dane padşê. Padşê îna nekir wekî kuştune, got:

- Kanî binêrim xûne yanê na?

Wextê nihêrî, nava kincada qaîşek dît, vekir nihêrî eva heman ew kêre, kalkê wî daye bavê wîda, bona zanibe wîayê kur bîne, yanê qîz. Ev mervê ku da kuştinê - bavê wîye. Gazî wan celata dike:

- We ewî merî kuşt, yanê na?

Celat tirsa divêjin: - Erê.

Bi halekî didine înakirinê, bona herin Mîrzemehmed bînin.

Em xeberdin ji Kiraszêrînê û ji sepetkar.

Kiraszêrînê îstikana jerê dabû destekî xwe, kêra çirtme jî destekî xwe go: "Ezê îstekanê ser xwedakim, kêrê jî zikê xwera".

Hatin Mîrzemehmed dîtin, anîne bal padşê.

Padşê wîra got:- Ez kurê teme.

Gazî tucar kir: "Bira bê", - hatinêra go: "Celat" serê sepetkar çû alîkî, cendek jî alîkî.

Ew çû jina xweye berîn - dya padşê jî anî. Çil şevî defêda û usa jî ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî herin mirazê xwe şabin.

## 17. QESAVÎ COMERD

Qesavî Comerd wextekê xort bû, ezep bû, hê nezewicî bû. Ji dê û bavê xwe ew tenê bû. Dê û bavê wî duşûrmîş bûn, go: "Emin ew kure, gere kurê xwe bizewcînin". Bavê wîya rokê jêra got:

- Lawo, emin, tuyî, gere em te bizewcînin.

Go: - Bavo, hûn zanin.

Bavê Qesavî Comerd rabû qîzek dît, jêra xwestin. Salek, dudu sekinî, dewata Qesavî Comerd kirin, jina wî anîn, peyakirin.

Avayê wîya başqe bû, dergîstya wî anîn wî avayî. Dewat belabû. Qesavî Comerd hat cem dergîstya xwe. Hinekî rûniştin, xeberdan ewî dergîstya wîva. Şev gelekî wan çû. Qesavî Comerd dîna xwe dayê jina wî diçe tê, naedile, go:

- Evda Xwedê, çima tu naedilî, were rûnî?

Go: - Ez qolincî bûme.

Lê Qesavî Comerd femkir, wekî jina wîya girane, wextê wê welidandinêye, ku biwelide. Qesavî Comerd jêra got:

- Evda Xwedê, go, ez zanim tu giranî, wedê teye - tê razêyî. Go, rehet razê, go, ezim tuyî - kes tunene. Go, Xwedê şedebe ezê starkim, ez tu cîya glîyê te nakim. Qe şerma xwe neyne, rihet biwelide, ez jî bivim pîrka te.

Jina Qesavî Comerd raza, kurek anî, Qesavî Comerd jî pîrka wê bû. Cîyê jina xwe danî, kir nava cîya, xwerin jêra hazir kri, xwerna xwe xar. Zara wêya nava kinckada pêca, şebeqê ew zar hilda bir ber derê dya xwe, bavê xwe. Dêrî xist. Dya wî derî li wî vekir, go:

- Qesavî Comerd, te vê şebeqê xêre?

Go: - Dayê, şikir min xêre, ez derketim ber dêrî, şaqînya zarek kûçê dihat. Ez gihîştimêda - eva zara hana nizam kê avîtye. Min jî hildaye anîye cem te.

Dya Qesavî Comerd go:

- Lawo, tu nizanî kure, yan qîze?

Go: - Dayê, ez nizanim, hanê binhêr.

Dya wî vekir, dî wekî kure. Dya wî şabû, go:

- Şikir pake, kure. Emê xweykin. Lê kê çiçik bidê?- Paşê dya wî gotê, go, - Lawo, were emê duakê bikin belkî şîr bikeve bistanê dergîstya te - pê xweykin.

Û dya Qesavî Comerd ew gede anî da bûka xwe, go:

- Lawo, vî kurî bide ber dilê xwe, emê duakê bikin Xwedê, belkî şîr bikeve bistanê te, tu pê xweykî.

Teslîmî bûka xwe kir, vegerya çû mala xwe.

Sekinî sivetirê, Qesavî Comerd çû dya xwera go:

- Dayê, mizgînya min tera, şîr ketîye bistanê bûka te.

Dya wî şabû, go:- Lawo, wekî usane, wê xweyke.

Usa jî gede xweykir, mezinkir.

Heta kutasîê jî - dê bavê Qesavî hew zanibûn Qesavî Comerd ew gede erdê dîye.

## 18. ÇÎROKA ZAL

Carekî yekî go:- Zal kal bûye û guhada jî giran bûye, ezê ewî bicêrbînin- kanê Zal hewarara çawane?

Ew çû dîwana Zal û gotê:

- Apê Zal, - divê, - filan derê şere, koka pelewana anîne. Em neçine hewarê?

Zal cava wî da, go:- Lê tu heta niha hê sekinîyî?

Zal emir dike ser pelewanê xwe, wekî kergidanê wî bikşînin. Ewana kergidanê wî kişandin. Zal syar bû, çû. Wî çaxî ew pelewan jî çûbû mala xwe. Çaxê ew hat, ji pelewana pirs kir, go:

- Ka Zal?

Wana go: - Te Zal xapand, Zal çû filan derê.

Ew rê dikeve, rêva dighîjê, dike- nake Zal nabihê. Ew ditirse, destê xwe rima wî kilît dike. Çaxê Zal milê xwe bilind dike, ew hespêva bilind dive û destê xwe lê berdide, qalim dike gazî, wekî wî nas bike, lênexe, divê:

- Apê Zal, hewar derewe...

Zal divê: - Qeda vê dinê, derew jî hatine dinê?

Dizvirin. Wî çaxî pelewanekî din xwe dike rengê dewrêşoka, guhê qantirekî ber barê dinê digre, serê rîya herda disekine. Dixweze qewata wan bicerbîne. Lavaya wana dike, divê:

- Gele sîyara, barê min barkin.

Zal emrî ser pelewanê xwera hatî dike, divê:

- Alî wî dewrêşîke, barê wî barke.

Ew jî rimê qulpê barra dike, lê dike- nake nikare.

Peya dive, dîsa nikare. Zal peya dive, destê xwe dike bin bêr û bilind dike. Dewrêşok divêjê:

- Xwedê mala te ava bike, te dinya welgerand. Here, here.

Pelewan û Zal herdu tên. Zal texmîn dike, wekî pelewanê wî berxwe dikeve. Jêra divêje:

- Flankes, Elî, çima berxwe dikevî? Dest ser destara heye- heta ber perê esmana. Jêra serhatya xwe divêje, divê:

- Wextekî ez çardesalî bûm, kergidanê min heft salî bû. Ez çûm erqekêra derbaz bûm. Pîrekê garisê xwe raxistibû. Wextê kergidanê min bîna xwe berda, her liveke garis çû alîkî û pîrê nifir min kir, go: "Syaro, belkom tu bela xwe destê Enterî Qop bivînî". Wextê pîrê mira wisa got, ez zivirîm cem wê, min jê pirsî cîê Enterê Qop. Ewê jî nîşanî min kir. Ez çûm. Elî can, çima berxwe dikevî? Dest ser destara heye- heta ber perê esmana. Ez çûm min dît. Enterê Qop orta golê bûz qulkirbû, têda sovaî dikir. Carna jî selê bûzê sîngê xwe dixist û digot: "Eman, ez germa şewitîm". Min gurzek avîtê, ewî qe guh nedaê, lê wextê min gurzê duda avîtê, ewî gurzê min girt, got: "Qurban, tu çi min dixwezî? Vê sivê te xûna xwe kirye kevçî raberî min kirye. Niha tu jî bûyî Zal, Rostemî Zal, yanê Elîê şêr?". Elî can, ewî ne navê te jî hildida.? Çaxê min gurzê sisya avîtê, ewî gurzê min hewa girt, hat ta porê xwe kişand, ez girêdam û çû. Paşê hat ez vekirim, go: "Here". Min jêra go: "Welle Zal ez bi xweme". Got: "Lê malava, min xewna şevê dîtîye? Tê mrazê min bikî, hindik ma min te bikuşta". Ez dame pey xwe, em çûne mixara wî. Ewî du mêşok sike hilda û gote min:

"Me herin". Min jê pirsî: "Herne ku?". Go: "Êla mîrê ereba. Emê herin dilkeyta min bînin". Em çûn. Dor wî şeherî sûrkirî bû. Em çûn nêzîkî wî cîyê dilketya wî têda bû. Ewî gote min: "Zal, van sika singê vê kelêda bikute, em hilkişin jor". Min selekî mezin hilda, sikêda singê kele. Wexta min kevir lêda, deng kete newalê. Ewî go: "Te hemî me dane hesandinê". Ewî mêşoka sika pê devê xwe girt û pê destê sax sike dike singê kelê. Pê destê dinê dikuta. Bi vî cûreyî ew çû serê kele, ez mam jêrê. Wextekî şûnda min dengek bihîst ji serê kelê, gotin:

- Derga vekin, erxayîn razên, pêz û dêwêr berdin. Me Enterî Qop girt, kire bîra çil herêmî.

Ez rabûm, singê kelêva hilkişyam, pey Enter çûm. Ez çûm min dît çil herafbaşî serê xwe dane ser bîrê. Min zifeqalê xwe kişand, ew çil herafbaşî serê wan jê kir, lê min nikarî beroş bida alîkî, wekî Entar derketa. Entar mira got: "Zal, wa wêda here sîûneh otaxa bijmêre, ya çilî dilketya min têdane, tu here bêje wê. Ew neyê veneke, kes nikare veke". Elî can, ez çûm cem wê. Ewê got: "Biceme, ji ber çevê min here. Tu kêyî?". Min jêra got: "Ez Zalim, min herafbaşî kuştine, lê nikarim beroş bidime alîkî, wekî Entar derxim". Ewê şimik ser lingê xweva kir, hat em çûn cem bîrê. Ewê lingê xwe da beroş, dev da alyê dinê. Wextê Enter xwe hlavêt, derket, ez ber bayê wî ketime bîrê. Paşê jina wî ez derxistim. Enter ez şandime jêr. Ez binya kelêda sekinîm, ewî hesp jorda avît. Ez tirsa çûm dûr sekinîm. Ewî kire gazî: "Te girt?". Min got: "Ez vira sekinîme, lê te hesp dûrî min avît". Hesp erdê bû loş û wisa jî yê duda. Paşê ez çûme serê kelê, ew hate jêrê. Ew cîyê lê sekinî min cîyê dinêda avît, lê ewî dîsa revî hate wê tûşê hesp sax peya kir û em hersêk sîyar bûn ber bi mixara wî çûn. Elî can, çima ber xwe dikevî? Dest ser destara heye- heta ber perê esmana. Elî can, em rêva cîkî êwirin. Enter raza. Lê êla mîrê ereba pê me ketin. Ez rabûm çûme pêşya wana. Min û wana kire şer. Min zilfeqalê xwe rast avît - birî, çep avît - birî. Serê min ber minda bû. Lê tu nevê paşî min Enter jî alîyê parava li wana dixe. Bi wî cûreyî nişkêva zingîn şûrê min hat. Min got:

- Eva xelqê xerîb nîbû.- Lê min qet fema Enter nedikir. Çaxê min temam birîn, ez hatim cem qîza mîre ereba. Min jê pirsî: "Ka Enter?". Ewê got: "Enter hatibû şer". Çawa ewê wisa got, min pêra- pêra fem kir, wekî çaxê zingîn şûrê min hat, ew Enter bûye min kuştîye. Elî can, heta min kergidanê xwe av da, hatim, dilketya Enter jî xwe ser Enter kuşt. Min herdu jî çelkirin, ez hatim. Çima ber xwe dikevî? A, eva jî serhatya min.

Û wê gotinê şûnda percê Elî hinekî danî.

## 19. AŞIQ QERÎB

Qerîb merîê Îranê bû. Bavê wî zef dewletî bû. Bavê wî emrê xwedê hate ser, mir. Ew xwe jî zaru bû, hema xûşkeke wî jî hebû. Ewî mala bavê bêcer nedikir. Mala bavê xwe temam pûç kir. Ma ew, dya xwe û xûşka xwe. Zef belengaz bûn. Rojekê dya xwera got, go:

- Dayê, em nikarin vira îdare bikin.

Hema cînarekî wan hebû zef dewletî bû. Ewî hizdikir, wekî Qerîb belengaz bive. Rojekê go:

- Qerib, - go, - tu vira nikarî serê xwe xweykî, - go, - çima tu naçî Tvlîsê. Here tu dya xweva, xûşka xweva Tvlîsê. Herin Tvlîsê, - go, - hûnê rind serê xwe xwey bikin.

Ewî dya xwera go, got:- Dayê, werne em herne Tvlîsê.

Hema wî çaxî jî maşîne tunebûn, gere bi lingê xwe herin.

Dê go: - Lawo, karê me bike, emê herin. Heywanekî bîterke, emê hêdî ji xwera herin, serê xwe hildin ji xwera herin Tvlîsê.

Hatin heta ber Erez, dîna xwe danê ava Erez zef tê, nikarin derbazbin. Ber avê rûniştin. Qerîb girya, go: "Xwedê, tu çêkî, ez îdî nikarim vegerim. Av jî nahêle em herin, ez çawakim?". Hew lê nihêrî sîyarek serra sekinî. Sîyarekî hespêkî bozî syarbû. :

Go:- Belengaz, tu çira digrîyî?

Go: - Av rê nade me, em derbazbin.

Sîyar jêra go:- Qurba tuyê kuda herî?

Go: - Ezê herim Tvlîsê.

Go: - De were terkûya min, ez te derbazkim.

Qerîb avîte terkûya xwe derbazî vîalî Erez kir. Qerîb danî, îja vegerya dya wî bîne. Dya wî jî anî derbaz kir, ma xûşka wî. Çû here xûşka wî bîne.

Qerîb go: - Dayê, ewî em derbaz kirin, hema em xapandin. Çû here xûşka min birevîne.- Gelekî fikirmîş bû.

Ewî syarî çû xûşka wî jî anî.Go:- Dayê, erê welle şikir, xûşka min jî anî.

Go: - Qurba, here, Xwedê oxirê bide we. - Tasek ji cêva xwe derxist ewî syarî da Qerîb, go:

- Eva tasa Cahseneméye, - go, - de here, tuê mirazê xwe Tvlîsê bivînî.

Hew lê nihêrî sîyar lê unda bû. Evana jî ketin rîya xwe, berê xwe dane Tvlîsê. Çûn derketin Tvlîsê. Xerîb bûn, nava Tvlîsêda digeryan,

kes nas nedikirin. Ji xwera digeryan. Çûn xwe dane ber derê dikanekê. Xweyê dikanê dîna xwe dayê, ev mervê han merîkî xerîbe, ne mervê Tvlîsêye.

Go:- Qurba, tu çi merivî vêderê sekinîyî?

Go: - Axa, ez merîkî xerîbim, kesî nas nakim, ez meryê Îranême.

- Qe, - go, - kesî te heye, yanê tu tenêyî?

Go: - Welle xûşkeke min heye, dya min heye.

Go: - De here xûşka xwe û dya xwe bîne, were.

Ewî xûşka xwe û dya xwe jî anî, hema navê dikançî Xoce bû.

Xoce şandin mala xwe. Çûn, herin.

Go: - Qurba, mala minda bisekin ji xwera.

Man muxdarekî cem wan. Hema wexta Xrdinevî, Xrdinevî tas tijî kir da Cahsenemê, go: "Eva tasa Qerîb".

Muxdarekî ew ma cem Xoce. Xoce jêra go:

- Qerîbê min, - go, - ezê te bizewcînim.

Go: - Axa, tu zanî!

Çil meryê Xoce hebûn, dewletîyê hevalê wî hebûn.

Go: - Gelî dewletya, min dil heye ez Qerîbê xwe bizewicînim.

Go: - Wekî tu dizewicînî, em çil merîne, herekê me zêrek - dike çil zêr qelenê wî.

Ew çil merî, çûn mala bavê Cahsenemê rûniştin. Cahsenem nîşan kirin ji Qerîbra. Vegeryan hatin. Xoce go:

- Qerîb, min tu zewicandî.

- Axa, - go, - tu zanî, ewkî te ez zewicandime, - go, - ezê çi bêjim?

Qerîb çû gote dya xwe, go:

- Dayê, zanî Xoce ez zewicandime.

Dya wî go: - Lawo, Xwedê bimbarek bike.

Çend roj kete wê ortê. Hema Qerîb nizanbû Cahsenem jêra xwestine, nizanbû Cahsenem maşoqa wîye. Cahsenem jî nizanbû Qerîb.

Sekinî. Qerîb rabû serê xwe hilda, çû ser kanyê serê Gocor.

Ser kanyê ji xwera rûniştibû, dîna xwe dayê qîzek hat, ew aceqizîbû, carya Cahsenemê bû. Gava çevê wê Qerîb ket, hubya Qerîb zef pirî kete dilê wê. Ji eşqî Qerîb qûna cêrê xwe da ber avê, devê cêrê xwe berjêr kir, go: "Belkî ez vira bisekinim, têr Qerîb bivînim".

Qerîb jêra go: - Xûşkê, te çima devê cêrê xwe berjêr kirye, qûna wê daye ber avê?

Go: - Tu çima ji min ra divêjî xûşkê? - go, - ez heme aceqizî, tu çima minra divêjî bacî?

Go: - Ez ji tera divêjim bacî, tu çima ji ser avê naçî?

Evê go: - Ez ji bona te naçim, - go, - navê te çîye?

Go: - Navê min - Qerîb.

Go: - Wekî te ji minra gotîye bacî, ezê ji tera divêjim - bira.

Go: - Ezê herim ji xanima xwera bêjim: "Min Qerîb dî li ser kanyê, minra go bacî, min jî jêra go - qardaş".

Qerîb jêra go: - Tu kîyî?

Go: - Ez carîya Cahsenemême.

Go: - Wekî tu carîya Cahsenemêyî, ez jî maşoqê Cahsenemême.

Go: - De wekî tu maşoqê Cahsenemêyî, keremke were, ez te bivim nava xas baxçe, ezê Cahsenemê bînim bême cem te.

Qerîb xwera anî hat. Qerîb çû nava baxça. Aceqizî av bir çû Cahsenemêra. Cahsenem gelekî lê hêrslemîş bibû.

- Ka ava te, eva sê sihet heye hê te çaya min navîtyê?

Go: - Xanim, ez çûme ser kanyê, - go, - min Qerîb dît.

Ji efendîyê xwera bêjim, go:- Kanê?

Go: - Min anîye nava bax.

Hema Cahsenem rabû here nava bêx, aşiq Qerîb zef fikirmîş bû, go: "Evê ez anîm nava bax, wê min bikujin". Kete koka darê, xwe veşart.

Cahsenem hat, dîna xwe dayê kesek nava bax tunene. Gazî Aceqizê kir:

- Ay kopoxlî qiz, - go, - tu min dixapînî. Kanê te digo min Qerîb anîye nava bêx? Kanê Qerîb?

Go: - Xanim, welle min anîye. Min anî kire nava bax û ez hatim. Qerîb dîna xwe dayê, Cahsenem bû parçe agir canê xwe ket ji bona Qerîb, wekî Qerîb nedît, Qerîb rabû derket. Cahsenemê dîna xwe dayê Qerîb hat, ewêd xewna xweda dîbû, hema heq Qerîb bû. Xirdinevî tas dabûye. Ew, Qerîb milê xwe milê hevdu hilkişand çûne otaxa Cahsenemê. De maşoq bûn, gelekî ji xwera xeverdan, laqirdî kirin, hevdu şabûn.

Cahsenemê go: - Qerîb, - go, - çî te heye?

Go: - Dya mine, xûşka mine, malê min, - go, - tune. Tiştekî min tune. Qelenê te jî tune, - go, - ez bidim.

Go: - Talaşa qelen mekşîne, ezê qelenê xwe ji ber pişta xwe bidim.

Go: - Ew jina qelenê xwe ji kîsî xwe bide, - go, - ez wêderê qebûl nakim. Ez gere qazanc bikim, bidim.

Gelekî ji xwera wêdrê xeverdan. Qerîb îzna xwe jê xwest, rabû hat. Qerîb hate cem dya xwe go:

- Dayê, min Cahsenem dît.

Xûşka wî jêra got:- Qerîb, - go, - ez çûme ser kanyê avê. Du kurê dewletya ser avê bûn. Yekî ji yekîra go: "Zanî, Cahsenem dane merîkî kesîv. Kereke wî heye".

Aşiq Qerîb go: - Bera usabe, qirarbe, ezê serê xwe hildim, herim weletekî xerîb. Hetanî ez qelenê wê neynim, ez tucara venagerim.

Wê şevê sekinî, sivê rabû go:

- Dayê, ezê herim. - Sazê xwe darda kir, go, - dayê, bira ev sazê min bisekine heta ez têm.

Sazekî din avîte milê xwe, hat ber avayê Cahsenemêra derbaz bû. Cahsenemê gazî kirê, go:- Tuyê kuda herî?

Go: - Ezê herim xerîbyê.

- Meçe, - go.

- Ezê herim, heta qelenê te neynim,go,ez nayêm.Du merya ten daye min.

Ew meryê ten dabûyî, ewî dixwest Cahsenem bisîtine. Bavê wê nedidayê.

Ewêderê kirasekî zirxê da Qerîb, xwe kir derket çû. Hema ew meryê dilê wî ketibû Cahsenemê, çû dû. Du merî. nava şeherda dîtin, merîê dînik oxrîreş.

Go:- Wekî hûn herin. Qerîb rêda bikujin, çiqas pere, zêr bixazin ezê bidime we.

Herdu merî pey Qerîb ketin, çûn. Wextekê çûn gihîştin Qerîb. Hema Qerîb ew nas nedikirin, nizanbû bona kuştina wî çûne. Herdu wêderê bûne hevalê Qerîb, go:

- Emê ji tera bêne welatê xerîbyê.

Hema Qerîb çi qazanc dikir, dibûn sê para. Weke mehekê Qerîbra geryan. Herdu merîya go:

- Emê çawa Qerîb bikujin, merîkî zef başe?

Rojekê gotin:- Qerîb, were wî krasê xwe bide me.

Qerîb rabû krasê xwe da wana. Herdu xwe ji Qerîb vedizin, berê xwe dane Tvlîsê vegeryan. Nava mêşeda terewilek lêxistin kuştin. Krasê wî xûnê dan, birin çûn dane wî merivî, go:

- Me Qerîb kuştîye, hanê eva krasê wî.

Ew bera wêderê çi ji heqê xwe bistînin, bira bistînin.

Qerîb jî çû, çû derket şeherê Helebê. Ne beled bû. Gelekî nava şeher gerya. Çû rastî qawexanek hat. Qawexane qe rojê arşvêra wî nedibû.

Go: - Xoce can, ez merîkî kesîbim, - go, - îşev min xwey nakî?

Ewî jêra go:- Qurba, - go, - ez merîkî belengazim. Dêmek, ez te xweykim, hema cîyê min jî tenge.

Qerîb hat qawexana wî rûnişt, sazê xwe batlemîş kir, saz xist. Herkî ewî merî rojê du misîn qawe difrotin, mşterî hatin tijî qawexanê bûn, ewê şevê heta deh misîn qawe firot, êpêce alvêra wî bû. Çiqa mişterî hebûn welgeryan ser qawexana wî ji bona sazê Qerîb.

Çika pere dihatin Qerîbra, nîvî dida wîya, nîvî ji xwera dihîşt. Nava mehekêda dengê Qerîb nava Helebê bela bû. Çiqas sazbend hebûn bi carekêva mişteryê wan welgeryan ser Qerîb. Sazbenda sazê xwe hildan çûn cem padşa şkyatê Qerîb kirin, go:

- Em saz naxin. Merîkî xerîb hatîye vira risqê sazê me birîye. Emê sazê xwe daynin.

Padşa şand Qerîb anî. Gazî sazbenda kir, anîn sera padşa, dêmek, herça aşiq bûn Qerîbva bend avîtin ber hev. Qerîb sazê gişka jê stend, gi bend kirin. Padşa Qerîb girt hefs kir. Bera Qerîb bimîne hefsêda, emê bêne cem Cahsenem Tivlîsê.

Heft salê Qerîb temam bûn. Cahsenem dane mêr. Cahsenem bû agir, bê mene xwe ket ji boyna Qerîb. Çevê wê rîya Qerîb bû. Qerîb jî nedihat. Hema dya Qerîb pey Qerîb usa girya, herdu çevê wê kor bû, zef jî belengaz bû.

Mala mêrê Cahsenemê cav da bavê Cahsenemê:

- Karê xwe bike, emê dewatê bikin.

Cahsenem rabû çû cem dya Qerîb, go:

- Dayê, îsal heft salê Qerîb, Qerîb nehat. Wê dewata min bikin. Rave em herin bigerin belkî em Qerîb bivînin.

Rabûn, çûn gelekî geryan. Ji nava şeher derketin, çûn serê Gocor. Çûn dîna xwe danê bazirganekî serê Gocor danîye. Çadira bazirganbaşî vegirtîye.

Cahsenemê go: - Dayê, ezê herim cem vî bazirganbaşî, çika bazirganbaşî kuda here?

Go: - Bazirganê we yê kêderêye?

Go: - Bazirganê me bazirganê Helebêye.

Bazirganbaşî dest kire cêva xwe, du zêr derxistin.

- An, - go, - ay qîza min, - go, - a ji tera van herdu zêra pê şuxlê xwe bivîne.

- Axa, - go, - zêr min nelazimin. Merîkî min, - go, - çûye xerîbîêyê. Anemetekî min heye, - go, - ez bidime te, gere tu bidêyî. Herkê te dî bêje bera bê.

Dest kire cêva xwe tasek derxist, tasa piçûk, go:

- Ji boy xêra xwe tu bivî. Heta çil şevî gerekê xwe bighîne min. Hergê neyê, bêje, wê dewata min bikin.

Vegerya hat cem xasîya xwe. cem dya Qerîb. Dya Qerîb jêra go:

- Te çawa kir?

Go:- Min tasa xwe şand.

- Ê, te jêra nego, tasê çawa bikî?

- Na, min nego.

- De here cem bêje, bona xêra xwe, xeratxanekî veke, herça merîyê tê xêretxanê, bera wê tasê avê bixun. Kîjanî serê tasê girt ew Qerîbê mine.

Keçikê hat dîsa usa jêra got, çawa min ji tera got. Ewê dîsa usa got ji bazirganbaşîra:

- Bazirganbaşî, - go, - bêjê bera nesekine ,bê!

Ew vegerya çû yêra xwe. Bazirganbaşî barkir, berê xwe da çû derket Helebê.

Bazirganbaşî derkete Helebê, nava Helebê xêretxane vekir. Xêretxane wê tasê şerbet bela dikir. Ewî bazirganê xwe temam xerc kir, kesî serê tasê negirt. Qrarê wî bû, de. Tişte destê bazirganbaşîda nema. Bazirganbaşî rabû go: "Sera padşê aşiqê padşê zefin, - go, - ez herim cem padşê, belî nav wanda be". Çû nav wan gerya, dîsa kesî serê tasê negirt. Ji wêderê jî derket hat.

Hema di hefsêda Qerîb gotibû dergevan: "Kê roja padşa syar dive diçe nêçîrê, cavê bide min".

Rokê padşa syar bû, çû here nêçîrê. Dergevan cav da Qerîb. Qerîb derket derva, çû pêşya padşê, padşara go:

- Ez merîkî xerîbim. Te ez di hefsêda bîr kirime, tu qe halê min napirsî?

Go: - Ez çi halê te bipirsim?

Go: - Te îsal çend sale, te ez avîtime hefsê, yara min jî welatê xerîbyêdane, ez merîkî xerîbim, hatime qurbetyê.

Padşa jêra go: - Here, min tu berdayî. Hema tu Helabê nesekinî. - Qerîb berda.

Qerîb nava kûça Helebêda hat nav bazara Helebê. Sazê xwe xist, sitra, go: "Ez Qerîbim". Heta derkete serê şeherê bazarê wîalin, xurce zêr jêra hat. Hingê ew bazirganbaşî rast hat, jêra go:

- Tu aşiqî?

Go: - Ez aşiqim, merîkî xerîbim.

- Wekî tu merîkî xerîbî, - go, - îro tu mêvanê minî.

Bir çû mala xwe. Ewê tasa Cahsenem tijî şerbet kir da destê Qerîb.

Qerîb go: - Ev tasa mine!

Go: - Na, qurba, ev tasa, - go, - tasa bavê mine. Bavê min wextekê bazirganbaşî bû. Cerd hatibû pêşya bazirganê bavê min. Bavê min şêlandibûn. Eva tasa wane cem min mabû. Kî vê tasê bive xay, ew dizê bavê mine.

Herdua wêderê dême qirka hevdu girt. Şikyatê wan çû cem padşa.

Go: - Eva tasa kî lê bive xayî, ew dizê bavê mine.

Padşa go:-Qerîb bigrin,-lê bazirganbaşî rabû ber padşa sekinî, go:

- Eva tasa, tasa Cahsenemêye, şandîye ji Qerîbra. Kî serê vê tasê bigre - ew Qerîbe. Ma sê ro dewata wê bikin. Hergê tu sê rojada derketî Tvlîsê, tuyê bighîjî Cahsenemê, herge tu derneketî wê bivin, dewata wê bikin. Min ji bona xêra xwe bazirganê xwe temam xerc kir, ez te digeryam, heta min tu dîtî. Here Tvlîsê bighîje mirazê xwe.

Qerîb rabû, xorca xwe avîte milê xwe, ji nava Helebê derket. Xwe da fêza şeher. Dilê wî seva Helebê zef xirav bû. Zivirî go: "Min heft sala naz û nemetê te xar, Xwedê te şên bike, Heleb şeher". Derkete fêza şeher, nmêja sivê kir, hilkişya serê çîyê. Gelekî fikirmîş bû: "Sê rojada ezê çawa derkevime Tvlîsê, Xwedê?"

Dîna xwe dayê, wê çivîkek bûye maşoqa gulekê. Gul orta derya şîlanêda bû. Çivîk dorê çû, hat, nikarbû xwe bighîandayê. Çvîkê sîngê xwe li devya şîlanê xist. Kelemek sîngê wê ket, pişta wêra avît. Çivîk wêderê mir.

Qerîb gelekî fikirmîş bû, go: "Ev heywaneke ji bona maşoqa xwe li şîlanê dixe, ez jî herim xwe zinarekîda bavêjim. - Go, - ez naghîjme Tvlîsê, îda boşe".

Hate ser zinêr, du cara hat qêmîşî xwe nekir, ruhî şîrîn bû. Cara sisya sond xar, go: "Ezê xwe bavêjimê". Kir zinêrda xwe bavêje, para sîyarekî gazî kir:

- Lo, lo, xorto!

Piş xwe filitî, syarek jorda sekinî. - Kuro, - go, - tê kuda herî?

Go: - Ezê herim Ezurmê

Go: - Were terkûya min. - Go, - çevê xwe bigir, çevê xwe veke.

Lê nihêrî eva Ezurm.

- Qurba, - go, - eva Ezurme.

Peya bû, nmêja nîvro Ezurmê kir. Hew lê nhêrî sîyar dîsa ber sekinî.

- Kuro, - go, - tê kuda herî?

Go: - Ezê herim Qersê.

Anî Qersê. Peya bû ji terkûya wî, nmêja esirê rasta Qersê kir. Xurca xwe hilda rê keve, dîsa sîyar têra derket.

- Kuro, ne te digo, ezê herim Qersê?

- Na, - go, - axa, ezê herim Tvlîsê.

Avîte terkûya xwe, êvarê meqrebê serê Gocor sekinî.

- Qerîb, - go, - dya te pey tera çevê wê kor bûne. Dezmala xwe, - go, - derxe, kefa devê hespêxe. Ez zanim, - go, - kes te bawar nake, wekî te çevê dya xwe sax kir, paşê, - go, - wê te bawar bikin. - Go, - de îjar dewata teye, here bighîje Cahsenemê. Dewata Cahsenemêye.

Çû ser kanîyê. Dîna xwe dayê, xûşka wî hat ser kanyê avê. Qerîb xûşka xwe nas kir, hema xûşka wî nas nekir, go: "Çevê wî nola çevê Qerîbin, - go, - ne Qerîbe".

Go: - Xûşkê, ez merîkî xerîbim, kesî nas nakim. Divê tu îşev min bivî mala xwe, xwey bikin îşev?

Da pey xwe, bir çû mala xwe. Dya wî go:- Lawo, ew kîye te anîye?

Go: - Dayê, merîkî xerîbe.

Dê digirya. Go:- De bera bê ji xwera rûnî, guneye.

Qerîb go: - Dayê, ew çi saze darda?

Go:-Lawo, ji kula min teze meke, go, kula ya kevne,go, çî te saz ketîye?

Go: - Dayê, tu bidî xatrê Xwedê, paşê xatrê wî tu ser dinelî, - go, - tuyê vî sazî bidî min, ez teselekim çika çawa saze.

Go: - Ew sazê kurê mine. Îsal heft sale çûye xerîbîyê, nizam heye, nizam tune, nizam. - go, - de rave saz bîne.

Wexta Qerîb dest avîte saz, deng bi saz ket, qîzê go:

- Dayê, - go, - eva Qerîbe.

Go: - Lawo, xalî serê min û teve, kî zane Qerîb heye, tune?

Qerîb go: - Dayê, bide xatrê Xwedê, divê şeherda îşev dewate, bira xûşka min bide pêşyê, dewatê nîşanî minde. Ezê herim dewatê. Îşev çi pera bînim, ezê bidime we. Xurca zêra jî bera cem teve.

Xûşka wî da pêşîyê, bir. Dilê wê nedixwest, wekî here dewatê. Xûşka wî bir, dewat nîşan dayê, vegerya hat.

Ew meryê jêra Cahsenem nîşan kirbû, ew merî ber dêrî rastî Qerîb hat, go:- Tu çi merîyî?

Go: - Axa, ez aşiqim, sazbendim.

Go:- De were tu jî sazbandê me, em herine dewatê. - Bir çû orta dewatê cem xwe da rûniştandinê.

Hema gelek sazbend dewatêda hebûn.

Go: - De îja dora aşiqê teye, aşiqê te bera bendekê duda bêje, - sazbenda gote.

Qerîb go: - Ez Qerîbim,
Min nmêja sivê kir Helebê,
Min nmêja nîvro kir Ezurmê,
Ya esirê - dûza Qersê,
Ya êvarê - serê Gocor.
Men Qerîbim, ez Qerîbim!

Evî çawa sazê xwe xist, Cahsenemê dengê sazê wî nas kir, perde qetand, xwe avîte pêsîra Qerîb.

Cimetê go: - Tu ne Qerîbî, - go, - tu derewa dikî, - go, - tu divêjî:

Min nmêja sivê kir Helebê,
Min nmêja nîvro kir Ezurmê,
Ya esirê - dûza Qersê,
Ya êvarê - serê Gocor".

Eva tu derewa dikî. Kê tu anî?

Go: - Xirdinevî ez anîme.

Go: - Nîşana Xirdinevî cem te heye?

Go: - Çiqa kor hene, bîne ez sax bikim. Dya min jî kor bûye, bînin ez sax bikim.

Ewlin şandin dya wî anîn. Dezmala xwe çevê dya xwe xist, çevê dya wî saxbûn. Çiqa kor nava şeherda hebûn anîn. Dezmal çevê wan xist, çevê wan sax kir. Cimet ser bû du bendîtî. Bendek bû alîyê Qerîb, bendek bû alîyê dergîstîyê. Nîvî go: "Ji wîra", nîvî go: "Ji wîra".

Meryê aqilbend gelek wêderê hebûn, go:

- Emê xûşka Qerîb bidin dergîstîyê Cehsenemê, emê Cahsenemê jî bidine aşiq Qerîb.

Wêderê ew dane wîya, ew jî dane wîya. Dewatê wan kirin. Çûn mrazê xwe şabûn, tu jî mrazê xwe şabi.

- Tu jî mrazê xwe şabê.

Kuta bû çû.

## 20. ROSTEM Û KURÊ WÎ GURGÎN

Wextekê bavê Rostem- Zal, diçe rawnêçîrê. Zal wextekê daxlî nava mêşekî dive. Dinhêre ji orta mêşe dûkî zirav dikşe. Zal xu dû digre diçe. Diçe lê dinhêre dêwekî qeher sîtilek daye ser agir, qeysî têda dikelin. Heskê têda dike qeysîya duxwe. Zal hêrsa wî radive. Radive ser lingekî, gurzekî li dêwê qeher dixe. Dêw divêje:

- Laqirdyê xwe min neke!

Tê Zalê digre, dest pîê wî girêdide, datîne pêşberî xwe, kincê wî jê dêxîne, heskê qesyada dike duxwe, lê dendika pirî canê Zal dike. Canê Zal gişkî reş dike. Dêwê qeher jêra divêje:

- Tu kîyî, tu mira bûyî Zal, hatîyî gurza min dixî?

Li wî zemanî derew tunebûn, ewî rast jêra got:

- Ez Zalim.

Dêwê qeher got: - Navê te heye, lê hereketê te tune.

Dêwê qeher Zal berdide, Zal dide sondê, divê:

- Nisleta mala we gerekê ser vî mêşeîda nayê.

Zal dêstda sond duxwe û ad dike, divê:

- Nisleta mala me tu kes neyê vî mêşeyî.

Dêwê qeher Zalê berdide, Zal tê mala xwe. Zal jina xwera divêje:

- Avê germke, ezê avê xwekim.

Jina wî avê jêra germ dike. Zal avê li xwe dike.

Du sal, sê sal wî ortê derbaz dibin. Rostem jî sî- çil salî dibe. Rostem timê li çîya digere seva kêfê. Rostem van gilyê dêwê qeher ji bavê xwe dibhê. Lê navê Rostem gelekî belayî nava dinê bibû, wekî Rostem gelekî egîte.

Rostem radive diçe xwera raw û nêçîrê. Rostem bîrden diçe rastî wî mêşeyî tê. Rostem lê dinhêre dûkî zirav ji nav mêşeda hildikşe. Ew xwe li wî dûyî digre, diçe. Diçe lê dinhêre dêwekî qeher wê agir dadaye, xarinê xwera çêdike. Rostem radive ser lingekî, gurezkî dêwê qeher dixe. Dêwê qeher qet talaşa wî nîne, lê Rostem hêrsa wî radive, divê: "Dive qewat milê minda tuneye?". Rostem careke dinê gurzekî lê dixe. Ew dêwê qeher radive Rostem nola berxekî digre, dest û pîê wî girê dide, datîne ber darekê, diçe xarna xwe çêdike. Heta ew xarna xwe çêdike û duxwe, dêwekî firinde tê Rostem dixe nava lepê xwe, dive orta ada heft bera dixe xar. Dest û pîê Rostem vedike, davêje zîndanê.

Em bên ser mala Zalê. Zal pey salix- sûlixê Rostem dikeve, wekî zanibe Rostem kuda çûye. Zal salixê Rostem hiltîne, wekî Rostem girtine birine orta ada heft berada avîtine zîndanê. Lê Zal kalbû, pelewanê usa qewat tunebûn, wekî biçûna Rostem bidana berdanê. Hê kurê Rostem Gurgîn pelewan sêzde- çarde salî bûye, gava nava şeherda diçe, li zarê şeher dixe tê. Yê guhê wî radike, yê milê wî cî derdixe, yê dîwara dixe dipelçiqîne. Hê Gurgîn pelewan haj girtina bavê xwe tunebû. Ewî hew zanibû Zal bavê wîye. Ew dîsa şeherda diçû, lê nihêrî, wê zyar xwera kap dilîzin. Gurgîn lingê xwe kapê wan dixe, kapê wan ji hev bela dike. Yekî keçelok pêsîra wî digre, jêra dide xebera, divê:

- Tu qoçaxî here heyfa bavê xwe hilde.

Gurgîn tê malê, pêsîra dya xwe dikeve. Dya xwera divêje:

- Bavê min kîye, kanê bavê min, rast divêjî bêje, tu rast nevêjî, ezê te bikujim.

Dya wî divêje: - Lawo, bavê te Zale.

Gede divêje: - Na, rast bêje, bavê min ne Zale.

Dya wî lêdinhêre boşe, jêra divêje:

- Bavê te dêwe firinde girtine birine ada orta heft bera.

Gurgîn pelewan divêje: - Karê min bikin, ezê herim, tu seknandina min tune, ezê herim.

Lê Gurgîn panzde- şanzde salî bûye. Berî hingê Gurgîn pelewan dabûn ber destê pelewanê xurt, hînî gurz kevend, şûr û mertal, tîr xevtandinê kirbûn. Dya Gurgîn pelewan cavê dide kalkê wîya, wekî: "Nevîyê te nasekine, divê, ezê herim heyfa bavê xwe hildim". Kalkê wî dinhêre boşe, Gurgîn pelewan nasekine, wê here. Kalkê wî karê wî dike, wekî Gurgîn here.

Gurgîn pelewan şûr, mertalê xwe hiltîne û şeherê xwe dertê. Pir diçe, hindik diçe, wextekê daxlî tixûbê dêwê reş dive. Gurgîn pelewan lê dinhêre, dûkî zirav ji koçik serekê dikşe. Gurgîn diçe ber darê koçk serê. Gurgîn lê dinhêre qîzkekê serê xwe hetanî çiçika pencera derxistîye. Qîzik Gurgîn pelewan divîne, dilekî na, bîstûpênc dilî dihebîne. Lê heyfa qîzikê gelekî li Gurgîn tê, Gurgînra divêje:

- Tu vandera here, hê bavê min ne hatîye, wê te carekêra hûfî xweke.

Gurgîn pelewan qîzkêra divêje:

- Te nan, aveke xwe bida min, paşê te ew kul bikira dilê min. Gurgîn ji qîzkê dipirse, divê, - bavê te kê rê çûye, rîya wî nîşanî minde.

Keçik rîya bavê xwe nîşan dide, divê: - Vê rê çûye.

Gurgîn dide ser rîya wîya, diçe. Diçe ber perê mêşe disekine, divê: "Dêw ku hebe wê bê ser min". Gurgîn her wextekê lê dinhêre qûre- qûr li mêşe ket. Tê nêzîk, Gurgîn lê dinhêre dareke çinarê kokêva rakirîye, daye ser milê xwe, çi cûreyî terewil bixazî çiqlê wê darêva girêdaye, dar daye ser milê xwe wêda tê. Dêw tê ji nav mêşe dertê. Gurgîn pelewan lê dike qîrîn. Dêwê qeher cîb- cî disekine, divêje:

- Çêjkê gurê çîya, tu van dera?Ezê te têxim şîva xwe îşevin.

Dêwê qeher hêrsa wê radive, dara ser milê xwe davêje Gurgîn, lê Gurgîn telîmdar bû, li ber dara wî revî, xwe da alîkî. Toz dûman li erdê ket. Dêwê qeher got:

- Hê tu lê binhêr, ha! Lema divên:"Ax bû, bû ax", çû: pirtîk nema- têxista ber kurya dranê xwe.

Gurgîn pelewan li ber wîya zivirî, got dêwê qeher:

- Buxwe, paşê bişêkrîne.

Gurgîn pelewan şûrekî li stikurê dixe, dêw dikuje, guhê dêw jê dike erdêra kaş dike ber bi koçik sera dêw diçe. Ber derê koçik sera dew disekine, divê:

- Qîza qenc, te tirs li min difirandin, de binhêre, ev guhê bavê tene.

Qîzik dêrî lê vedike, diçe hundur. Qîzik jêra emek, xurek tîne. Gurgîn pelewan duxwe. Kêçik tîne cîyê xwe Gurgînva tevayî datîne. Gurgîn dikeve cî, keçik jî tê dikeve paşla Gurgîn. Gurgîn şûrê xwe tezî dike, dide orta xwe û keçikê. Keçikê gote Gurgîn:

- Çi qisûra min heye te şûrê xwe tezî kir-danî orta min xwe?

Gurgîn got: - Min sond xarîye, heta ez sonda xwe neynim cî, ez serê xwe tu kesîra nakim yek.

Keçikê got: - Sonda te çîye?

Gurgîn got: - Bavê min girtine, birine orta ada heft bera. Tu gerekê mira salix bidî.

Keçikê got: - Ez cî nizanim. Apê min ji bavê min mezintire, ji me wêdatire, ew herke cî zanibe.

Sive li wan safî dibe. Keçik emek, xurek jêra tîne. Gurgîn nanê xwe duxwe. Keçik rîya koçik sera apê xwe nîşan didê, Gurgîn diçe.

Gurgîn pir diçe, hindik diçe, dikeve tixûbê dêwê sor. Gurgîn diçe ber koçik sera dêwê sor disekine. Qîza wî dertê, divê:

- Xortê delal, tu tîyî, ez avê bînim, yanê birçîyî, ez nan bînim, yanê jî na, here hê bavê min ne hatîye. Bavê minê te bikuje.

Gurgîn dide ser wê şiverê diçe ber perê mêşe disekine. Lê dinhêre dêwê sor ji nava mêşe derket, darek ser milê wîye, tijî teyr- terewilin pêva girêdaîne. Gurgîn lê kire qîrînî, ew dara ser milê xwe li Gurgîn wer dike. Gurgîn li ber direve, xwe dide alîkî. Toz, dûman li erdê dikeve. Dêwê sor divêje:-Binhêre, pirtîkî nema min bavîta ber kurya diranê xwe.

Gurgîn li ber dizvire, şûrekî lê dixe dike du qeta. Guhê wî jê dike, erdêra kaş dike, ber bi koçik sera dêwê sor tê. Tê ber dêrî disekine, divê:

- Qîza qenc, lê binhêr, te payê bavê xwe dida, eva guhê bavê tene.

Qîzik dêrî lê vedike, Gurgîn diçe hundur. Qîzik emek- xurek jêra tîne, Gurgîn nan duxwe. Qîzik cî datîne. Gurgîn dikeve cîyê xwa. Sive safî dive, keçik radive cîyê apê xwe nîşan didê. Gurgîn dide ser rê diçe. Diçe tixûbê dêwê sipî. Diçe ber koçik sera dêwê sipî disekine. Qîzikek dertê, divê:

- Xortê delal, tu çi dixazî ez tera bînim, yanê na here hê bavê min nehatîye, wê te bikuje.

Gurgîn divê: - Bavê te kîalî çûye, rê nîşanî minde, ezê herim.

Qîzikê rîya bavê xwe nîşan dayê. Gurgîn da ser rê çû. Nêzîkya berê êvarê bû, Gurgîn lê nihêrî dêwê sipî ji nav mêşe derket. Teyr, terawil bê hesav girtibûn bi darekêva girê dabûn, dar danîbû li ser milê xwe. Gurgîn lê kire qîrîn, dêwê sipî nêzîkayî Gurgînra kir, dara ser milê xwe bi teyr û terewilava lê war kir. Toz, dûman li erdê ket. Dêwê sipî got:

- Binêr, pirtî goştê wî nema min bavîta ber kurya diranê xwe.

Gurgîn li ber fitilî, şûrada qet- qetî kir, guhê wî jêkir, mînanî du lebenda erdêra kaş kir, anî ber koçik sera dêwê sipî. Keçikê derî lê vekir, Gurgîn çû hundur. Keçikê emek- xurek jêra anî. Gurgîn nanê xwe xar. Keçikê jêra cî danî, Gurgîn kete cîyê xwe û raza. Sive safî bû. Gurgîn rabû gote keçikê:

- Cîyê dêwê firinde nîşanî minde.

Keçikê gotêda: - Dêwê firinde orta ada heft beradane, tu nikarî herî. -Keçikê gotêda, - dêwê firinde mehekê radizê, mehekê jî hişyar dimîne, diçe digere. Tu here ber berê, tu alyê rastê binhêr. Zinarek heye, tu zinar welgerîne, gemek bindane. Gemê derxe, li avêxe-hespekê derê, gemê bixirîne dêv, lê sîyarbe, derbazî wî alîbe.

Gurgîn bi wê formê dike, derbazî wîalî dibe. Hespê berdide. Gurgîn diçe nava şeher, diçe nêzîkî koçik sera dêwê firinde. Ber sûrekê xwera rûdinî, lê dêwê firinde bîstçar rojê wî temam dibin, wekî ji gerê bê.

Qîza dêwê firinde koçik sera xweda berjêr dinhêre, lê dinhêre xortekî delal ber sûrê rûniştîye. Qîza dêwê firinde carîke xwe dişîne dû Gurgîn pelewan. Gurgîn pelewan radibe diçe. Qîza dêwê firinde Gurgîn dilekî na, bîstûpênc dila dihebîne, divê:

- Xortê delal, tuyê van dera, tu seva çi hatîyî van dera?

Gurgîn pelewan divêje: - Qîza qenc, bavê min vira girtîye, ez hatime berdim.

Qîzik jê dipirse: - Navê bavê te çîye?

Gurgîn divêje: - Bavê min Rostemî Zale, vira girtîye.

Qîzik divêje: - Welle bavê min anîye xistîye zîndanê.

Du roj wedê bavê keçikê mabû, wekî bihata. Keçik radive Gurgîn vedşêre. Bavê keçikê tê, radizê. Keçik Gurgînva diçin ser zîndanê, Gurgîn gazî Rostem dike, divê:

- Rostem, tu min nas dikî, ez kîme- yanê na?

Rostem usa bûye, ji tutar ketîye, ancaxî deng jê dertê. Gurgîn Rostem ji zîndanê derdixe. Rostem çev Gurgîn dikeve, xwe ji pêra davê pêsîra kurê xwe.

Qîza dêwê firinde Rostem dive himamê, himamîş dike, hildikşîne riştê hetanî mehekê. Bîstûneh rojê bavê keçikê temam dibin.

Keçik Gurgînra divêje:- Here meydana şer bisekine.

Lê Rostem Gurgînra divêje: - Tu tene pê nikarî, min bive, pişta min bide darekê ez rûnîm. Çaxê tu wîya gulaşê digrin, tu berbirî min bîne, ez dest bavêjim lingê wîya, belkî tu erdê dixî.

Bi wê formê jî dikin. Sî rojê dêwê firinde temam dive, ji xewê radive. Lê Gurgîn pelewan nehere ser neherê radihêle, divêje:

- Dêwê mixeneto, were em şerkin, ez mîna te ne mixenetim, te bavê min mixenetî girt, were em şerkin.

Gurgîn û dêwê firindeva şer dikin, ya yekî alt nake.

Dêwê qeher divêje: - Were em gulaşê bigrin.

Şûrê xwe datînin, tên gulaşê digrin. Rostem neherê lê radihêle. Çongê dêwê firinde sist dibin, pişt xweva dinhêre, eva Rostem. Qudûmê çongê dêwê firinde sist dibin. Gurgîn zorê dide dêwê firinde, berbirî bavê xwe dibe. Rostem dest davêje lingê wîya digre, ber bi xwe dikşîne, Gurgîn dêwê firinde erdê dixe.

Qîza dêwê firande jorê dike gazî, divê:

- Nekuje heta ez têm.

Qîza dêwa firinde tê, şivekê tîne dide Gurgîn, divê:

- Lêxe bêjê: "Tu bivî hespêkî berî".

Gurgîn pelewan lê dixe, divê:

- Tu bivî hespê berî.

Wê derê Gurgîn, Rostem û qîza dêwva mal û eşyaê dêw çik hebû hildan, çûn ber devê berê. Gurgîn gem li avê xist, hespê berî derket. Hersêk li herda syarbûn, çi eşyaê wan hebû ber xwe kirin, derbazî wîalî bûn. Çûn koçik sera dêwê sipî. Qîza dêwê sipî û eşyaê wî hildan. Çûn koçik sera dêwê sor. Wê derê jî qîza wî û çi eşyaê wî hebû hildan- bi forma bazirganekî çûn daxlî nav şeherê bavê xwe bûn.

Wê derê her xortekî qîzek danêda, Gurgîn xwe jî qîzik istand. Wê derê kêf kirin û dewat kirin û çûn mirazê xwe şa bûn,hûn jî herin mirazê xwe şabin.

-Em zef ji te razîne!

## 21. STÎYA AL Û FERXÊ

Xelîfe û Adîyan bûbûne destebirakê hev. Miclîsa Xelîfe tijî bûye, Adîyan rabû, got:

- Xelîfê bra, hemik jina min jî girane, jina te jî girane, emê ber destê cimetê qewlekê, yan jî emê kaxezeke xwe bikine yek: jina min raza qîz anî, jina te jî kur anî, ezê qîza xwe bidime kurê te. Lê hergê jina te qîz anî, jina min kur anî, tu qîza xwe bide kurê min.

Xelîfe divêje: - Birabe.

Xelîfe û Adîyan qewl û qirarê xwe hevra girêdan. Mehekê şûnda Adîyan dimire. Çend roj derbaz divin, jina Adîyan radizê kur tîne, jina Xelîfe jî radizê qîzekê tîne.

Du, sê roj derbaz dive, kurê Adîyan ji colanga xwe radive ser xwe rûdinî, divê: "Dayê".

Dya wî jî radive xwe dixe, divê: "Ev çi ecêve?, - divê, - kurê min eva du, sê roje bûye, radive ser xwe, rûdinê û xever dide".

Kurê wê divê:- Dayê, here bêje apê min, bê: "Te û bavê min hevra çi qewl û qirar girêdane?".

Dya wî diçe cem Xelîfe, divê:

- Kurê min îro du- sê roje bûye, rabûye xever dide, rabû ser xwe rûnişt, gote min: "Here bêje apê min, bê, ewî bavê min çi qewl qirar hevra girêdane?"

Xelîfe jî divê:

- Me xwera, hevra henek kirîye, ewî jî rabûye usa divêje?

Jina Adîyan çû cem kurê xwe, got:

- Lawo,apê te gotîye:"Min, Adîyan xwera laqirdî kirine,ewîjî usa divê?"

Navê kurê Adîyan Ferxê bû, navê qîza Xelîfe StÎya Al bû. Ferxê gote dya xwe, got:

- Dayê, here bêje apê min bira bê vira.

Dya Ferxê çû cem Xelîfe, go:

- Were, kurê min gazî te dike.

Xelîfe got:- Hela were, min evî çêjikê kurîşana binhêre.

Miclîsa Xelîfe gotin:- Xelîfe, here binhêre, çika çi divêje? Kesî dîtîye wekî zara sê rojî meryara xeberde? Here binhêre, bêjê, çika wê dinya çawabê?

Xelîfe diçe mala Adîyanê brê xwe, divêje:

- Berxê, elêkime selam.

Ferxê jî divêje:- Elêkim selam, ser sera û ser çevara hatî, apo can,-. divêje,- Te, bavê min hevra soz dabû.

Divê: - Çi soz dabûn?

Ferxê divêje: - Gelî cimet, bavê min û apê min çi hevra soz dabûn de hema hûn bêjin.

Cimaet jî divêje:- Erê welle raste, wekî Xelîfe û Adîyan hevra soz dabûn, wekî gerekê tu qîza xwe bidî Ferxê.

Xelîfe divê: - Adîyan mirîye, ezê çawa qîza xwe bidime Ferxê? Ez qîza xwe nadimê.

Cimet jî divêje:- Îdî tu karê me pê neketîye.

Xelîfe û cimet çûne malê xwe.

Çend roja sekinî, Ferxê diçû cem qîza Xelîfe, şev diketine colangê. Rojê Ferxê radiza, êvarê dibû stêrkekê diçû cem Stîya Al.

Rojekê jî jina Xelîfe çû gote Xelîfe, go:

- Hela were jina birê te çi dike? Kurê xwe anîye kirîye bera qîza te.

Xelîfe got: - Ew çi ecêve, tu kes tirsa min newêre, wekî kevirekê bavêje mirîşka min, îja ew tîne kurê xwe dike bera qîza min?

Xelîfe go: - Gelî xulam- xizmekara, herin gazî jina birê minkin, bira bê ezê gulîê wê jêkim.

Xulamê wî çûn gazî jina Adîyan kir, anî nava miclîsê.

Xelîfe go: - Tu şerm nakî, wekî kurê xwe tînî dikî bera qîza min?

Jinik jî sor dive, divê: - Ez çima tînim? Evarê sê qewaza bişîne, bira bên binhêrin çika ez tînim yanê xwexwe tê?

Xelîfe divêje: - Gelî qewaza, herin ber Ferxê bisekinin çika xwexwe, yanê dya wî tîne?

Êvarê sê qewaz tên. Yek ber dêrî disekine, yek ber kulekê disekine, yek jî ber bêşîka wî disekine. Jina Adîyan radizê, dive nîşev.

Ferxê dive stêrkekî kulekêra difire diçe.

Yê ber dêrî divê:- Çû! Yê ser kulekê divê:- Çû!

Yê ber bêşîkê divê:- Çû!

Tev diçine cem Xelîfe. Divê:

-'Xelîfe, Ferxê bû stêrkekê, kulekêra hate cem Stîya Al.

Xelîfe sivê çar hespê nêr tî, birçî dihêle, bêşîka Ferxê orta wanda datîne û ber wana tijî ket û once dike, wekî refesa bidine hev, wekî Ferxê orta wanada bipelçiqe û derî ser Ferxê û hespada dadidin û diçin.

Hesp jî devê xwe ji oncê derdixin, yek ber serê wî disene, yek ber lingê wî disekine, yek ber kêleka wî disekine, yek jî ber kêleka wîye dinê disekine û hulm- gulma xwe berdane Ferxê. Ferxê jî kete xeweke şîrin û raza.

Sivê Xelîfe hate tewla hespa, dîna xwe da Ferxê û hespa, ecêvmaî sekinî. Cimeta dora wî gotine Xelîfe:

- Tu çima nahêlî mirazê herda hevdu bive?

Xelîfe jî divêje:- Qet nave.

Çendekî disekine. Wedê şivanê Xelîfe kuta dive. Kê bive şivan gere heft sala bive şivan, paşê heqê wî bidinê. Qîza Xelîfeye mezin diçe ber avê, dîna xwe didê, va şivanek kulav lêye wê tê, şivantîyê dixaze. Qîza Xelîfe divêje:

- Şivano, were bive şivanê mala bavê min.

Qîza Xelîfe dide pêşya şivên, dive herema bavê xwe. Qîzik divê:

- Bavo, min tera şivanek anîye.

Şivan jî divêje:-Ezê heft sala bivime şivanê te, salê mîyê te bizên cêwî bînin, herdu jî mê, wekî lingê pezeke te xûn bive, tu serê min lêxe, lê gerekê tu qîza xwe bidî min.

Xelîfe jî divêje: - Birabe!

Cimetê jî divê:- Ne jina kurê destebirakê teye?

Xelîfe jî divêje:- Ehe, ew çîye, wekî ez qîza xwe bidimê? Wê şivan qazanc bike, wekî ez qîza xwe bidimê?

Xelq jî divêje:- Tu zanî.

Xelîfe divêje:- Birabe, ezê qîza xwe bidime te.

Şivan gopalê xwe hildide, diçe ber pêz, em bînin ser Ferxê û Stîya Al.

Ew herdu jî mezin bûne, îdî hevra gihîştine, deh- donzde salîne. Çaxê pezê Xelîfe tê, Ferxê û Stîya Al milê xwe dikutine hev, diçine cem pêz. Îdî Ferxê jî mala xwe piş guhê xweva avîtîye. Ferxê pêz dide bêrî. Stîya Al jî pezdoşe. Roja Ferxê û Stîya Al nehatana nava pêz, pez direvya, ne dihate nava bêrîyê. Ferxê û Stîya Al tên kilamekê divêjin, pez tê bêryêda top divin. Stîya Al pêz didoşe, Ferxê pêz dide bêrî.

Rojekê jî şivan Ferxê û Stîya Al cem hev divîne. Diçe divêje Xelîfe:

- Hal- hewalê qîza te û Ferxê waye.

Stîya Al jî divê Ferxê, divê:- Kuro, bireve, şivan ez û tu dîtin, çû bêje bavê min. Bavê min wê bê me bikuje.

Xelîfe jî xulamê xwe dişîne. Xulam tê divêje wana:

- Herin, - divêje Stîya Al, divê, - te gele emek min dîye, ez tiştekî ji tera navêjim.

Hela Ferxê û Stîya Al nava baxê sêva, şivan pezê nîvro tîne, dîna xwe didê, wê Ferxê û Stîya Al cem hev xwera razane. Lê wî çaxî Stîya Al hişyar bû, rabû gote Ferxê, go:

- Rabe, şivan dîsa em dîtin, îja wê vê carê bavê minê bê, wê te bikuje, rave bireve.

Ferxê dîna xwe dide, wê va Xelîfe hat, şûrê wî dêstdane. Ferxê revî. Xelîfe da pey. Ferxê çû mala xalê xwe. Navê xalê jî Ûsiv bû.

Xalê wî got:- Kuro, çi bûye?

Ferxê jî got:- Xalo, welle hal-hewalê min, apê min eve.

Ûsiv rabû Xelîfêra gotêda, go:

- Tu şerm nakî, tu bêyvar nakî, wekî ez te têkme xalî, berdim hela.

Xelîfe çû. Ûsiv Ferxê anî malê, gote jina xwe:

- Rabe Ferxêra qawê bavêje, niha Ferxê birçîye.

Jina xalê Ferxê rabû qawe Ferxêra avît. Ferxê û xalê wî nan xarin, razan.

Çend roj derbaz bûn, idî Ferxê digot: "Ax, Stîya Al". Stîya Al jî digot: "Ax, Ferxê". Xûşka Stîya Al jî digotê: "Hela binhêre vê, çika Ferxê yekî çawane, seva Ferxê axe- axa wêye". Stîya Al divê:

- Hela were, em mena kinc şûştinê herin, binhêre çika Ferxê yekî çawane?

Stîya Al dide pêşya xûşka xwe, diçine nêzîkî mala xalê Ferxê-kinc şûştin. Ferxê dîna xwe dayê, va Stîya Al kinca dişo. Revî çû cem Stîya Al. Çaxê xûşka Stîya Al çev Ferxê ketin, cîda xeriqî.

Sihetekê şûnda xûşka Stîya Al ser xweda hat. Kinc kuta kirin, çûn. Stîya Al gote xûşka xwe, got:- Te Ferxê dît?

Xşûka wê gotê:- Welle tu, ew laîqî hevin.

Çiqa roj bû xalê Ferxê digot: "Ax bira, ax bira". Rokê jî Ferxê go:

- Xalo, tu çima hero divêjî: "Ax û ax bira".

Xalê wî jî got:- Çaxê şerê kafiryê xalê te çû eskeryê, îdî nizam heye yanê mirîye?

Ferxê remildar bû, go:- Xalo, ezê va remilê bavêjimê, çika heye? - Ferxê remiê avîtê, go, - welle, xalê min heye, destê wî jî firîye, destê xwe zêr kirîye-. Ferxê got: - Ezê va herime cem xalê xwe.

Xalê rabû çû hespekî rind xarzîyê xwera zînkir, nanê heft- heyşt roja pet, karê Ferxê kir. Ferxê hespê xwe sîyar bû, rê ket û çû. Pir çû, hindik çû, de nezan bû, hê nedabû serê rîya. Hişê wî sêrî çûbû, êpêce birçî bû. Çû rastî gundekî hat. Ewî nizanbû wekî nan pêra heye. Çû cem hewleçî, gote hewleçî, go:

- Tu tasa hewle bide min, ezê hespê xwe bidime te.

Lê wî çaxî Ferxê ewqas rê çûbû, hespê wî jar bûbû. Hewleçî got:

- Kerek ji hespê te çêtire, gotê- ezê girkekê ji hewlê çêkim bidim te.

Hela wî çaxî Ferxê hesp nedayê. Ferxê da ser rê, çû rastî çîmanekê hat, got: "Mala min xiravbe, min hespê xwe kuşt".

Ferxê got: - Hela nanê devê min tune, lê xu nanê hespê min heye?"- Ferxê ser wî çîmanî peya dive. Ew çend roj bû, wekî Ferxê raneza bû. Çaxê Ferxê peya bû, xurckê ser pişta hespê dît, idî şa bû. Ferxê peya bû, gote hespê:

- Bimbarek, heta pişta te mîna berê neve, ez te sîyar navim.

Nav du- sê rojada hespê Ferxê berê bû. Ferxê ji xewê rabû, dîna xwe da hespê wê usa bûye, ji berê çêtir bûye. Ferxê şa bû, rabû çû ser kanîyê, av xar, çû wekî hespê sîyar be, hesp nehate dest. Ferxê got:

- Bimbarek, tu halê min navînî, xu tu min vira nahêlî?

Hesp avaş bû. Ferxê hespê girt, sîyar bû, çû. Nava du- sê rojada gihîşte şeherê Qiralî Kafir. Çû mêvanê pîrekê, go:

- Pîrê, tu mêvanara çawanî?

Pîrê jî got:- Mêvan, mêvane Xwedêne, welle cîyê min tune.

Ferxê zêrekî didê pîrê, divêje:- Han tera van zêra, cîyê min jî bike, cîyê hespê min jî bike.

Pîrê çev zêra dikeve, şa dive. Cîyê Ferxê û hespê wî dike. Êvarê Ferxê sê zêr dide pîrê, divê:

- Here mira du dest orxan û doşek bîne, xwera jî kinca bikire.

Pîrê şa dive, diçe nava şeher, du dest orxan, doşek dikire, xwera jî kincê baş dikire, gazî du mişaka dike, divêje:

- Werin van lihêfa bivine mala min, ezê zêrekî bidime we.

Mişak lihêfê pîrê hildide, têne mala pîrê. Pîrê jî temam dive xanimekê. Çend roja disekine. Rokê jî Ferxê gote pîrê, gotê:

- Here bêje xalê min, bira bê filan derê. Ezê bêm bivînim.

Pîrê jî divêje:- Xalê te padşê meye, birabe, ezê herim.

Pîrê radive diçe mala padşê, divêje:

- Welle xarzîkî te hatîye vira.

Padşa divê: - Xarzîê min kê?

Pîrê jî got:- Idî nizanim, her wa gotîye min.

Lê bereka wana remildar bû. Padşê remlê dîna xwe dayê wekî kurê Adîyane. Padşa şa bû, xulamê xwe şande pey Ferxê. Xulam çûn, Ferxê anîne cem padşê. Xalê wî şabûna usa ew hemêz kir, kite parxanê Ferxê şikestin. Miclisa xalê Ferxê gotê:

- Mala te xirav be, te Ferxê kuşt.

Xalê devê xwe ji sûretê Ferxê derxist, dîna xwe dayê Ferxê xeriqîye. Li xwe xist. Ferxê birin hemamê, himamîş kirin. Mehekê duda ma.

Xalê wîyî dinê jî dîsa dibû "axê- axa" wî. Ferxê gotê:

- Xalo, tu çima dikî axe- ax?

Xalê cav dayê, got:- Lawo, îsal heft salê mine ez pey horîkê digerim, dikim- nakim nikarim bigrim.

Ferxê got: - Xalo, tu zanî cîyê wan kîderêye, ez herim horîê tera bînim.

Xalê gotê: - Lawo, tu dikarî bînî?

Ferxê got: - Çî terane?

Gote xulamê xwe, gotê:- Ferxê bivin cîyê horîê, bira mira horîkê bîne.

Wana karêt girêdan û çûne bin baxê torkirî. Xulamê wî got:

- A, horî têne vira, dikevine avê û dertên diçin.

Bû germa nîvro. Ferxê dîna xwe dayê va bû pire- pira kevotka hatin danîn. Ji libsê xwe derketin, kincê xwe existin, ketne avê. Ferxê jî xwe ber darê veşartîbû. Ferxê rabû, çû ser kincê horîkê rûnişt. Lê hevalê wê rabûn, kincê xwe li xwe kirin, rabûne çûn. Lê ya Ferxê ser kincê rûniştibû, ewê rabû got:

- Ferxê can,ser kincê min rabe, ez xwekim herim, bighîjime hevalê xwe.

Ferxê got: - Qet nave, tu ya xalê minî.

Ewê jî got: - Birabe, de ser kincê min rave. - Soz ji Ferxêra da.

Ferxê rabû, kincê wê dayê, gazî xulamê xalê xwe kir.

Xulamê xalê Ferxê cav dan, gotine padşê, gotin:

- Welle Ferxê horî girtîye.

Xalê Ferxê şa bû û karêtê syarbû û çûn horîê bînin. Çûn horî anîn. Qet guh nedane Ferxê. Ferxê wêderê ma û Stîya Al kete bîrê. Girya, girya, gele girya, idî hat bibece dîna xwe dayê, va sê horî hatin. Xûşka wane biçûk gotê:- Lêlê, eva çima digrî?

Xûşka wane mezin got:- Ew Ferxêye digrî seva Stîya Al.

Horîyê xûşka xwe biçûkra got:

- Bira Xwedê heve bedewya wê bida me, wê çi bya?

Horîya got: - Wekî hinekî dinê ji bigrî, wê biteqe.

- Êlê, - go, - xûşkê, emê çawa bikin?

Go: - Emê dua bikin, bira postê kevotka jorda bê xarê, emê herin Stîya Al bînin.

Dua kirin, postekî kevotka jorda hate xarê. Ferxê hew çevê xwe vekir, Stîya Al va ber hazire. Şabû û hevra ketine heneka. Hinekî sekinî. Ferxê gote Stîya Al, gotê:

- Dive te wê derê mêrara lîstîye?

Stîya Al girya, go:- Mala te xiravbe, tu şerm nakî gilyê usa divêjî? Xeyîdî, go: - Gelî horya, ez ji we dixazim- hûn min bivine şeherê bavê min.

Ferxê çevê xwe vekir,Stîya Al tune.Dîsa girya, got:"Min çi serê xwe kir?".

Idî kal bû, rabû da ser rê, çû nava heft- heşt rojada gihîşte şeherê bavê xwe. Çû mala xalê.

- Selam, xalo.

Ewî jî got:- Îro tu min kaltirî, tu çima divêjî min "Xalo?"

- Ê, xalo, ne ez Ferxême.

Xalê wî xwe xist, gote Ferxê, go:- Ne Stîya Al mirîye.

Ser hevda giryan. Ferxê, go:

-Xalo,were tu min bive ser mezelê Stîya Al,ez hinekî dilê xwe hêsa kim.

Çûne ser mezelê Stîya Al. Lê Ferxê idî ji wir venegerya. Ew û Stîya Al çûn wê dinê çûn mirazê xwe şabûn.

## 22. ROSTEMÊ ZAL

Rostemê Zal gelekî mezin bûbû. Go, usa mezin bûbû nêzîkaya sed pêncî sal, go, emrê wî hebû, go, çevê wî, eva burîê wîye jorîn, go, dihat, dikete bjangê wî, diket ser çevê wîda. Nikarbû, wekî dinyayê rind bivîne, usa mezin bûbû. Lê wî çaxî Elîê Şêr hebû. Gotina gotya, Elîê Şêr wexta hate dinyayê, wî çaxî gelekî Elî hizdikirin. Elî cahil bû, gotina gotya, cmiet disekine, divê:

- Rostem ha mezin bûye, dîsa wê xîret bike, wekî ku ravê. Xîreta wî heye? Em bêjin ser Meke Medînê bûye şer, kafir avîtîye ser Meke Medînê, ka wê bikarbe here? - Apo him guha gran bû, himjî çeva belengaz bû, him jî meznayê- mezin bû.

Gotin:- Apo, go, - Ser Meke Medînê kafir hatîye, ser Meke Medîne şere.

Go: - Kergidanê min bikşînin!

Em nizanin kergidanê wî çiqasbû. Rostem çi bûye, usa jî kergidan syar bûye. Gotina gotya, digo, sêsid şêst û şeş çiqlê darê hebûye, dara sipingdarê. Ew, gotina gotî ser milê wî bûye. Hespê xwe syar bûye, hespê wî jî pîr bûye, ew jî kal bûye. Ajotîye çûye.Para cmietê gotîye:

- Filankes, gotîye, me Rostem şand, Rostem here ser Meke Medînê, hema carekê wê dara xwe bihejîne, wê kaf- kûnke, me çi kir? Yek kare pey keve, bêje: - Hewarî derewe. Kesî clet nekir, go:

- Em herin, go, hêrsa wî hatîye, wê me bikuje. Go, tu Elî, go, qedrê te heye, go herge tu vegerînî?

Gotina gotya, Elî hespê xwe syar bû, Dundulê syar bû, para pey ket, gelekî kire gazî, Rostem nebihîst, dest avîte dara ser milê wî. Ewî gava ser milê xwe xar kir, Elî pêva rabû hewa. Carke din xwe ji darê berda, zivirî pêşyê:

- Apo! Go: - Çîye?

Go: - Hewarî derewe.

- Ça, go, derewe?

Go: - Hewarî derewe.

Go: - Derew jî anîne dinyayê?

- Erê welle, go, derewe.

- E, go, mirin başe- wekî usane.

Elî, Rostem rex hev ketin syarî, Elî gote Rostem:- Apo! Wexta min dest avîte dara ser milê te, go, qe granî milê te nehat?

- Welle, lawo, go, min ew texmîn nekir, go, wexta ez çûme Mihardê, go, çivîkeke oxirê hebû, go, ser dara milê min datînî. Go, wexta ewî çivîkî ser danya, te bizanbya oxira min açixe. Lê mi zanî ew çivîke danîye. Go, mi usa texmîn kir.

Elî nola tiştekî hilimdilmaî bû, xeyîdî, "Çawa, go, eva min hesav dike çivîk?". Rostem dîna xwe da medê Elî, Elî xeyîdîye.

- Elîê min, go, were, go, emê qaskê vî çîya Qaf bigerin, emê herin, em hemîn hatine.

Elî go: - Em herin.

Wî çîyaîra digotine Qaf. Çûn derketine wî çîyayî. Rostem hazir çû şikeftê, çû hundurê şkeftê. Elî jî pey çû, kumê Elî kete tiştekî. Elî nihêrî, dêna xwe dayê, evan diranê meryane, eva qafê serê meryane. Zvirî derket, go:- Apo, go, ew çîye?

- Elîyê min, go, dest ser destara heye, hetanî ber perê ezmana. Go, hinekî, go, min go, çvîka oxirê ser dara min datînî, go, min texmîn kir, dilê xweda niha te gotîye "Rostem ez ha hesav kirime". Bona te min tu anî vira. Eva Zalê bavê mine, eva qafê wîye, welle, dest ser destara heye, hetanî ber perê ezmîna.Bavê min Zal jî hatîye kuştin. Min bona wêderê tu anîyî vira.

Ser wê derê, go, hinekî perça Elî danî.

## 23. SILÊMAN PÊXEMBER

Sixrî Cin maşoqê dya Silêman pêxember bû. Topek fêza gundê wî bû. Hergav forma teyra dihat, dihat semta wê topê, jê vedicêniqî rîya xwe dadigerand. Rojekê Silêman ji dya xwera got:

- Dayê, ca Sixrî Cin pirske, çika çima tê ser wê topê, rîya xwe dadgerîne?

Sixrî Cin rokê dîsa hat cem dya wî. Dê jê pirsî, go:

- Sixrî Cin, go, tu çima ji wê topê rîya xwe dadigerînî?

Go: - Wê topêda heye mala mora miqerim, wekî ew mor destê kêdabe- çi ku bixweze dinyalikêda wê biqedîne.

Dê Silêmanra got, çawa ku Sixrî Cin gotibû - kurê xwera got. Silêman rabû, pale girtin, berdane çîyê, erd kolan, boşe anîn, boşa bêjing kir, go:

- Kîjanî pirtî hesin jî bivîne têda - bîne bide mi, ezê zêrekî bidimê.

Pala kola, boşa bêjing kir. Rojekê mor kete bêjingê boşekî. Boşe lênihêrî zef gistîleke başe-mor hesavî gistîla bû, go:"Ez herim evî bidim Silêman pêxember,go, gele pere wê bidê".Bir çû cem Silêman, go:

- Silêman, min tiştekî baş tera dîtîye.

Silêman lênihêrî, ji destê boşê girt, lênihêrî ku more. Mor kir tilya xwe, cab da pala, go:

- De bela bin, her kes herin malê xwe, go, ez gihîştim mirazê xwe.

Wê wextê Silêman boşe hingêda aza kirine -bê heq, bê xerc.

Silêman miqarim kire tilya xwe. Wekî mor badida çar melek ber disekinîn, digo:

- Silêman, em dinê xirav bikin, yan ava bikin?

Digo: "Bira avabe, em jî navda bin". Wekî Silêman çi bigota, ewana diqedand. Mora miqerim destê wîda bû - padşatî dinê tevî kir.

Cihûdek kêlekê wîda hebû. Cihûd pîrek dî, pîra wî bû, go:

- Wekî tu wê morê ji Silêman bidizî bidî min, ezê berembêrî te zêra bidim te.

Rojekê Silêman çû serê xwe şûşt, mor ji tilya xwe derxist, danî ser îstolê, pîrê mor hilda, zû- zû xwe gîhande cihûd. Cihûd mor kir tilya xwe, mor tilya xweda zivirand, çar melekê miqerim li ber sekinîn, go:

- Em dinê xirav bikin, yan ava?

Go: - Dinê xirav nekin, mala Silêman bihêlin, Belqîza jina wî û bi minva hildan bivin ada bera, Silêman jî cîda bihêlin.

Evan mala Silêman bi Belqîzaêva hildan birin çûn, adek berêda danîn. Wê wextê pişîkek Silêman, bocîyê wîva birin çûn. Silêman wextekê rabû ser xwe, çi rave? Tenê, wehîd, belengaz maye. Silêman rabû terkeselatî dinê bû, go: "Ez pêxember, min padşatî dinê dikir, niha xelq min bivîne ez vî halîdanim, saxî ji minra naxweze".

Rabû serê xwe hilda û terkeselatî dinê bû. Çû derkete şeherekî, çû mala merivekî. Eva meriva jî torçî bû. Evî diçû royê mesî digirtin berê, danî ji xwera difrot. Ewî Silêmanra got:

- Silêman, go, ez mesîya bigirim bînim, tu jî bifroşe.

Qîzeke wî jî hebû, go:- Ezê qîza xwe jî bidim te.

Ê, Silêman Belqîzêr unda kiribû, wê qîzê çi bike, îda rojê xwe derbaz dikir. Ew bira wî halîda îda ji xwera arişvêrşa xwe bike, em bêne ser Cihûd.

Pişîka Silêman û tûlê wîva rojekê bi hev şêwirîn. Tûlê go:

- Pişîk, mala te xirav be, go, Silêman pêxember parîê devê xwe dida min, pişîk, tu jî ser pêşa wî radizayî, go, niha evî cihûdî em anîne...

Pişîkê go: - Em çawa bikin?

Tûlê go: - Tu nikarî morê ji tilya wî derxî, bighînî min?

Pişîkê go: - Eva min anî, gihande te, lê îja ada berêda emê çawa bikin?

Tûlê go: - Bighîne min, ez sovekarim, ezê te derxim.

Pişîk li ber cihûd telya. Cihûd rokê razabû, pişîk çû ber telya, pêçîya wî alast, mor ji tilîyê derxist û xwe gîhand tûlê. Tûlê pişîk da ser pişta xwe û li berê ket. Pir hat, hindik hat, hat kêleka berê. Tûlê go:

- Pişîk, ka morê bide min. Go: - Çira?

Go: - Ez morê bînim, bêm te xilaz kim, tu morê bidî Silêman?

Pişîkê go: - Tûle, tî gevezeyî, tê morê têxî devê xwe, tê çev terewila kevî û biewtî, morê ji devê te bikeve. Go, min derxe kêleka berê ezê bidim te.

Tûlê go: - Na, bide min, tu nedî ,ezê te bavêm berê.

Pişîk ma neçar,girt da tûlê. Hatin nêzîkî berê, wekî xilaz bin, derkevin, tûlê çev bi mesîya ket, go: "Hew- hew" mor ji dêv ket.

Pişîkê got:- Xadê mala te xirav kiro, min ji tera negot, tî gevezeyî, tî biewtî, morê ji devê te bikeve? Go, min him mora cihûdê feqîr anî, him jî negîhand Silêman.

Tûlê û pişîk por poşman ji berê derketin, her yek alîkî çû. Em îja bên ser torçî. Torçî rojekê tora xwe avît berê, mesîk derket. Anî hat malê, qîza xwera got: mesîkî girî navda bû, go:

- Evî ji mera bikelîne, go, yê maîn bira Silêman bifroşe.

Qîzê zikê mesî qelaşt, lênihêrî mesîk ji zikê wî derket, wê formê heft mesî, yek ji zikê wî qelaşt, mor ji zikê wî derket, keçikê mor girte xwe, go:"Ezê êvarê vê bidime Silêman, ev tiştekî başe". Êvarê Silêman hat, şîva xwe xarin û ketin cî, ji xwera razan. Silêman pişta xwe keçikê da dike her wexta. Keçikê go:

- Silêman, berê xwe midake, min tiştekî baş dîye, ezê bidim te.

Silêman go: - Çika çîye?

Go: - Gistîlkeke zef başe!

Usa niqitî qelbê Silêman, go: "Gelo divê mora min bê?". Eva rabû berê xwe keçikêda kir, keçikê gava dayê, lênihêrî ku mora wîye. Mor ramûsa û kire tilîya xwe.Mor zivirand,çar melek li ber sekinîn,go:

- Em çawa bikin?

Go: - Herin mala cihûd, cihûd dewsêda bihêlin, mala wî bi Belqîzaêva hildin bînin.

Evana çûn cihûd dewsêda hiştin, Belqîzar bi malêva hildan anîn dewsa mala Silêman danîn. Û tezedan def û dewat xwera kirin, qîzik jî anî kir berdestîya Belqîzerê.

## 24. HIKYATA OSMAN

Osman diçe ber derê meçîtê radizê, dinêre qîzekê dey lêkir. Çevê xwe vekir - qîz. Qîzê jêra go:

- Kuro, Osman, çira vira razayî? Were em herin, bavê min gazî te dike.

Osman rabû keçikêra çû cem bavê. Bavê wê jêra go:

- Kuro, Osman, qe cî tunebû, tu hatî ber derê meçîtê?

Osman go: - Ez xerîbim, belengazim, ez hema hatim vira razam.

Go: - De here, Osman, min da te.

Osman hat dîsa dewsa xwe raza. Osman xwe soldurîbû. Sive safî bû, çû nava şeher ji xwera cîk dît, serê kûçekê dikana sola vekir, sol dirût. Çiqa solê wî şeherî hebûn dihatine ser wî, çêtir meriv tunebû. Bû solduryê mala padşê. Her tim diçû- dihat mala padşê. Gele qedrê wî hebû. Rokê jina padşê îtmas kir, go:

- Cîkî bidin min, ez ji xwera avayî çêkim.

Jinik jî çû padşêra got, go:

- Osman sinetkarekî başe, soldurîyê mala meye, gere tu hin erd bidêyî ji xwera çêke mal avayî. Belengazî serê kûçêye.

Padşê şande pey Osman, got, go:

- Çi dixwezî?

Go: - Padşa xweşbe, ez kulfeta xwe, em serê kûçê radizên. Tewaqe dikim cîkî bidî min ez ji xwera avayîkî lê çêkim.

Go: - Here, min qasî çermê gakî erd da te.

Osman cem padşa hat, jina xwera eva gilî got. Çûn çermê gakî istendin, kirine avê nerm kirin. Pê ket usa zolkir, zirav zolkir û raxist erdê. Cav da padşê, padşara got:

- Min qasî çermê gakî berawird kirîye, îzna te hebe ez ji xwera avayî çêkim.

Lê padşa go: - Kuro, lo, qasî çermê gakî avayî lê tê çekirinê?

Go: - Padşa xweşbe, - go, - zefe hela, - go, - ber avayê min erdê zêde jî bive.

Padşa, lele, wezîrra go, go:

- Lele, wezîr, go, herin çika binêrin, çika eva çi çerme avayî jî girtîye, hela hê zêde jî dibe.

Lele, wezîr pêra çûn, lê nihêrî nîvê alîkî Stembolê girtîye. Hatin cav dane padşa, gotin:

- Çermeke, ne girêdan jê heye, ne dirûn tê heye, çermeke gişk.

Padşa bi xwe gotibû, kaxezê wî jî qolkirbû, lele, wezîr jî xwexwe şihad.

Wezîr go: - Padşa xweşbe, - go, - te dayê, dayê!

Padşa go: - Wezîr, de min dayê, wê ji xwera avayîkî çêke.

Osman ûste berdanê, avayîkî usa çêkir, hela hê ser avayê padşêra. Hema, Osman kurekî wî hebû, navê wî Ahmed bû, dişande meytûbxanê, dixwend. Heniz meytûbxana zarê padşêra dixwend. Ahmed ki dixwend, qîzek dihat kêlekê rûdinişt, ewê jî dixwend.

Qîz ew qender bedew bû, meîja reş gerdenêra dixwên bû, nola hîvêke çarde şevî ber ewrê reş serî bide, ew qender bedewbû. Kêçikê Ahmed heband, Ahmed jî keçikê heband, terka hevdu nedidan. Rokê meytûbxanê derketin. Êvarê keçikê go:

- Ahmed, tu mêvanê minî, were em herin mala me. Go: - Em herin.

Herdua da dû hev, çûn şeher derketin. Ahmed go:

- Qîza qenc, - go, - emê kuda herin?

Kêçikê go: - Ahmed, - go, - ez qîza padşê peryame.

Ahmed da dû çû. Lê nihêrî bax û baxçeye, avayîkî têda çêkirîye. Çûn nava baxçêda, ser kanîkê rûniştin, kanîk hebû. Keçikê go:

- Ahmed, tu li vir bisekine, ez herim cavê bidim dya xwe.

Dya xwe anî hat nava bax, dya xwera got:

- Eva evdê serreş min jê hizkirye, gere hûn min bidinê.

Dya wê çû ji bavê wêra got. Bavê şand pey Ahmed û keçikê. Ew hatin. Lê nihêrî herdu jî layîqî hevin, go:

- Lawo, - go, - here, helalya Xwedê min tu dayî.

Ahmed bû zevê padşê perya. Padşê perya jêra got:

- Ahmed, lawo,çi kêmasya te heve, tu ser minda bêyî, emê kêrî te bên.

Wê êvarê Osman (Osmancix) nihêrî kur nehat. Ew, dêva lê geryan, nava şeherda wê li ku bivînin? Wê şevê heta sivê xew nekete

çevê wan. Xulese, sê şeva Ahmed usa ma mala padşê perya. Ahmed qîza padşê peryava car din hatin îşkolê. Ahmed êvarê keçik xwera hilda bir mala xwe. Bû qîrîna dê û bavê wî, go:

- Lawo, tu îro sê roje tu kuda çûbûyî?

Go: - Bavo, - go, - min çû eva qîza han ji xwera xwest.

Rabûn gelekî bi Ahmed û bi keçikê şabûn, kêf kirin, eşq kirin.

De Ahmed kêmasya wî çi hebû ji mala xezûr danî. Îja avayîkî usa çêkirin, hela hê koçka padşa baştir.

Padşa bihîst ki Osmancix avayîkî usa çêkirye, avayê wî çêtir, şande pey Osmancix, go:

- Ezê serê te lêxim, te avayî ji avayê min çêtir çêkirye, çi bûrxa te heye tu çêkî? Hebûna te, qewata te çiqas heye, te ev avayî çêkirîye?

Go: - Hebûna min tiştek tune. Go, - çi hebû min sol dirût ji xwera qazanc kir, avayî da çêkirinê.

Îzna wî da, go: - Ezê filan sehetê serê te lêxim.

Osmancix hate mal. Jin û kurva, bûkêva lê nihêrîn- rengê Osmancix bûye rengê heywaê. Jê pirsîn:- Çi li te qewimîye?

Go: - Padşa cav da min, go, sivê filan sehetê wê serê min lêxe.

Bûkê go: - Nikare serê te lêxe!

Bûkê çi kir? Rabû ew û Ahmedva lêxistin çûn mala padşê perya. Padşê perya go:

- Lawo, hûn herin, hûnê sivê bivînin.

Ew zivirîn hatin. Wê şevê sekinî heta sivê. Sivê safî bû. Sivê xêr ser weda bê, ser wanda jî hat. Ehelîyê şeher rabûn lê nihêrî usa dora şeher çadir- xêbet lêxistine, hesabê steyrê ezman heye, hesabê çadira tune. Hesabê gul û gîhê heye, hesabê çadir- xêbeta tune. Cav dane padşa. Padşa go:- Du mervê xwe bişînin, çika ev esker kêye, çika çira dora şeher girtine?

Alyê padşada du- sê meriv çûn, pirsîn. Cav dane wan merya, go:

- Esker, - go, - eskerê Osmancixê hatîye, tu peyabe, bera Osmancix ser text rûnî.

Diha padşa metel ma. Esker dora şeher zeft kir, padşa peya kir, padşê hurum, Osmancix danîn dewsa wî.

Xelas bû diha.

## 25. ROSTEM Û XARZÎYÊ WÎ MEHMED

Rojekê bavê Rostem- Zal, radive diçe seyrangê. Dûrva dêwekî divîne û diçe bal wî.

Divê:- Selam elêkî!

Dêwê dengê xwe nekir, bi zimanê fariza selam dayê, dîsa dengê xwe nekir. Xulese, Zal bi çi cûreyî selamê dide, dêw dengê xwe nake. Dêw xu jî kêranek tijî teyr - tû kiribû dabû ser êgir dipet, dixar. Zal li wira sekinî, hêrsa wî girt, gurz kemêd ji situyê xwe anî xar, gurzek anî serê dêwda lêda. Lê serê dêw qet ji kivava şaş nebû. Zal hat biteqe, tîr kevan ji istuyê xwe anî xar, yek avîte istuyê dêw. Tîr kevan ortêda qetya, dîsa serê dêw ji kivava şaş nebû.

Zal ne mêrê revêbû. Zal li wira por- poşman sekinî heta dêw ew teyr- tû pet xar, paşê jî rabû, wira gole av jî hebû, ewî ew gola avê temam xwer, hate bal Zal, gote Zal:

- Te go selam?

Xulese, Zal bi çi zimanî selam dabû, dêw yeko- yeko selamê wî vegirt, û paşê gote Zal:

- Were tu mira bêje, ew çi hola zarabû te serê min xist?

Zal got: - Ew ne hola zarabû, ew heye gurz kemedê mine, giranya wî sedçil pûte.

Dêw got Zal: - Lê ew çi bendê xavbû, te avîte serê min?

Zal got: - Ew ne bendê xave, ew tîr kevanê mine, wekî ez bavême çîya, ezê jorda bînim.

Dêw got: - Navê te çîye?

- Navê min Zale.

Got: - Zal tuyî? Rostem kurê teye?Go:- Erê.

Dêw got: - Min çiqa melle, şêxa, pîra pirsîbû, minra digotin: "Kuştina te bi destî Rosteme". Îsal heft salê mine, wekî ez ji welatê xu revîme hatime vira, - gote Zal, - de here.

Zal por- poşman vegerya hate mal. Zal gelekî kal bibû. Rokê cimet dora Zal top bibûn, ji xura xever didan. Zal got:

- Hela binêrin, Rostemî ne vire, ezê wera meselekê bêjim?

Rostem wê sihetê soranî ji ber xwe kişand, ser cimetêda sekinî. Rostem got:- Bêjin ne vire! -Cimetê got: - Ne vire!

Zal got: - De herin dêrî kilîtkin, kilîtê bidine min.

Kilît anîn dane Zal. Zal kilît kire bin çoka xwe. Çevê Zal nedidît, zef kal bû. Dêw çi anîbû serê Zal, Zal yeko- yeko ji cimetêra qise kir.

Rostem wê sihêtê çû gote dya xwe:- Karê min bike, ezê herme şêr.

Sivê rêket. Zal got:- Lawo, kuda diçî?

Got: - Bavo, te êvarê çi digot?

Zal metelma, zivirî. Lê xarzîyê Rostem jî hebû: navê wî- Mehmed bû, xwe jî donzde salî bû. Mehmed lê nihêrî xalê wî çû, ewî da dû çû, çû gihîşte xalê xwe.

Mehmed got: - Xalo, ez jî yê bêm.

Go: - Tê bêyî, were.

Herd hevketin, çûn. Rostem û Mehmed çûn welatekî başqe, çadira xwe vegirtin, rokê- duda li wê derê geryan. Rokê Rostem hundurê çadirêda razabû, lê Mehmed derkete derva, lê nihêrî, lê wê derê kolikek dît. Kêranek da destê xwe kete hundur kolikê. Lê nihêrî, çi bivîne? Eyşan xanim rûniştîye, dêw serê xwe danîye ser çoka wê.

Eyşan xanimê got: - Belengaz, zû derê, dêwê te bihese- te bikuje.

Mehmed got: - Rave em herin. Mehmed destê xwe avîte milê Eyşanê, ji bin serê dêw kişand, serê dêw li erdê ket. Mehmed Eyşan xanim bire ser xalê xwe û gote Eyşan xanimê:

- Binêr, nevî tu xalê min rakî.

Eyşê got: - Birabe.

Mehmed dît, wekî dêw ji kolikê hindik maye derê, bi kêran gihîşte dêw. Hetanî dêw ji devê kolikê derket, ewî dêw mest kir. Û paşê dêw gihîşte Mehmed. Ew mabû dêw Mehmed bikuje, Eyşan xanim girya, hêsreke wê kete ser sûretê Rostem. Rostem rabû ser xwe. Dît, çi binêre? Xanimek ber sêrî rûniştîye. Rostem got:

- Tu çima digrîyî?

Eyşan xanimê got: - Hela binêre!

Rostem nihêrî dêw hindik maye Mehmed bikuje. Rostem rabû gurz- kemendê xwe hilda, çû şêr. Gurzek anî serê dêw, serê dêw firand.

Mehmed li kêranê xwe erdêda kuta. Eyşan xanim Rostem stand.

Wî welatî dît, wekî Rostem Zal hatîye ser wana şêr, eskerê xwe top kirin, hatine ser Rostem. Rostem û Mehmed eskerê wî welatî tev qirkir. Padşê lênihêrî, diha eskerê wî tev qirbû. Qîza padşê ji bavê xura got:

- Bavo, tu sî eskerî bide min, ez herim Mehmed dîl bigrim bînim. Lê bavo, tu gerekê ji mira sond buxî, wekî "Ez Mehmed nakujim" (Sond wî çaxî sond bû).

Padşê qîza xura sond xar, wekî "Ez nakujim".

Sivê qîza padşê çû ser Mehmed, esker tev qirkir. Qîza padşê destê xwe avîte Mehmed, hilda da ser hespê. Dest avîte memkê xwe, Mehmed girt avîte hizûra padşê.

Padşa ji Mehmed pirsî:

- Te çima eskerê min tev qirkir?

Mehmed got: - Min çewa eskerê te qirkir, ezê usa jî te bikujim.

Axir qewl- qirarê qîzê- bavê hebû, wekî dest nade Mehmed. Bavê nizanbû çi bike.

Qîzê got: - Bavo, Rostem waye, nava meyta digere, eger dixazî here pêşya Rostem.

Padşê got: - Qîza mine delal, tu were ez bi Rostem nikarbim.

Qîzê got: - Bavo, qewata te jî ya deh gamêşane, ya Rostem jî ya deh gamêşane. Hûnê herin heta nîvro gurz- kemenda têkine şer, yek we yekî alt nake. Tu Rostemra bêje: "Daha base, me hesp qirkirin, were em guleş bigrin". Wî çaxî Rostemê dûrbînê binêre. Ezê zimanê Mehmed qulkim, darêda dardakim, ewê bivîne. Qewata pênc gamêşa wê ji Rostem kêmbe, lê yê te qewata pênc gamêşa wê li te zêdeve. Wî çaxî tê Rostem bikujî.

Lê qîz jî dixaze bav bê kuştinê, belkî Mehmed bistîne.

Bi ser wan gilî- gotina qîzê, bavê xwe şand. Bav çû pêşya Rostem. Qîzê jêra çi gotibû, bi gotina qîzê destpêkir kire şer. Hetanî nîvro gurz- kemenda kirne şer. Nîvro şûnda padşê gote Rostem:

- Were emê guleş bigrin.

Rostem got: - Were.

Destpêkirin guleş girtin. Padşê got:

- Hela binêre, min çewa zimanê Mehmed qulkirîye darêda darda kirîye, ezê usa jî zimanê te dardakim.

Agir serê Rostem ket. Rostem bi milekî ew girt, dûrbînê nihêrî Mehmed qîzêva ketine kêf heneka. Qewata pênc gamêşa li Rostem zêde bû, Rostem padşê hilda avîte erdê û kuşt. Sîyar bû çû cem Mehmed. Zêr, zîvê mala padşê hildidin, divin. Qîzê jî Mehmedra divin, usa jî diçine mala xwe mrazê xwe şa divin.

Hûn jî mrazê xwe şabin.

## 26. ÇIL ÇOP

Rokê padşa dikeve ber mirinê. Divêje kurê xwe, divê:

- Lawo, min gele zulm kirîye, wê te kelekin.

Pera dide pîrê, dişîne nava xelqê, divê:

- Hûnê kurê padşê bikine padşa.

Xelq divê:- Erê lê, çimkî padşê zef xêreke rind me kirîye, ma dora kurê padşê?

Kurê padşê radive, xûşka xwe hildide, diçe. Pir diçin, hindik diçin, diçin cîkî xikî- xalî, disekinin. Dinhêrin dêwek ji wêda tê. Eva xûşka xwe dişîne serê çîyê, divê:

- Eger min ew kuşt, were, yanî, ewî ez kuştim, wêda here.

Xulese, kurê padşê dêw dikuje. Wira herdu dîsa diçin. Dinhêrin tam - taşekî waye, divê:

- Xûşkê, ezê herim hindur, tu vira bisekine, eger ez zû derketim, xwe derketim, yanê derneketim, bihêle here.

Heman ew tam taş jî ê dêw bûne. Ewana vira çendekî ebûr dikin. Kurê padşê diçe nêçîrê, dinhêre çawane, serîkî rûtî waye, divê: "Ez Çil Çop êtîmim, min çil qetil kirîye, ezê bikim çil yek qetlî". Kurê padşê digîjê hûr dike, paşê diçe. Sivetirê divê: "Ez wêda çûm min ew dît, ez îro wêda naçim". Dîsa tê wî serî divîne, dîsa usa divê. Kurê padşê navê wî Mîrze Mehmed bûye. Ew digîjê wî serî temîz dişewitîne. Hildide, paşê tê mal, dike torpekî, darda dike.

Rokê xûşka wî malê gêzî dike, derê torpe vedike, divê: "Eva pîsokê welatê meye". Hinekî duxe, dinhêre bêteme, hildide davêje derva. Keçik bi wî hemle dimîne. Rokê Mîrze Mehmed tê divê:

"Ez kurê padşême, xûşka min ser minra yar girtîye, divê, welle ezê êvarê herim xûşka xwe bikujim". Tê şûr dikşîne, ku xûşka xwe bikuje. Gede di zikê dya xweda dike qîrînî, divê:

- Xalo, ez tera divêm, çî te bi dya min neketive.

Mîrze Mehmed dimîne metel. Rokê diçe nêçîrê, tê xûşka wî zar bûye, kurek anîye, kirîye hêlekanê, dihejîne. Dîsa Mîrze Mehmed şûr dikşîne herda tev bikuje, lê gede dîsa dike qîrînî, divê:

- Ez tera divêm ser hurmeta xwe bisekine, yanê na, ezê te pirtî-pirtîkim.

Mîrze Mehmed dîsa dimîne metel.

Em niha ji padşê xeverdin. Rokê padşa divê:

- Canim, heyna dêwê sorda qe pez û dewarê me newêrbû ji dor mala dûr keta, lê îro du- sê roje, wekî pez, dewar diçe sînorê dêwê sor diçêrin.

Wira du lawik radivin, îzina xwe ji padşê distînin, divên:

- Emê herin cem dêwê sor.

Ew herdu lawik diçin dinhêrin zareke waye. Ew herdu lawik divêjin:

- Heyran, here bêje xuyê malê, bira bê.

Divê: - Gilîê xwe bêjin, xuyê malê ezim.

Ew dikin, gede dike, gede her yekî du diranê wan dikşîne netikêda dikute, divê:- De herin.

Ev diçin, padşa dinhêre evana dikenin, divê:

- Welle dêw mirîye, wana ji xwera gele zêr, zîv anîne, lema dikenin, - paşê padşa dinhêre, wekî diranê wan herda netikêda kutane.

Wira Çil Çop êtîm tê cem xalê xwe, divê:

- Miqatî malêve, ezê herime nêçîrê.

Ji wir rê dikeve, diçe meclîsa padşê. Padşa tîne esker berev dike, diçe ser herda.Çil Çop êtîm hema ji wira tê, diçe cem padşê heywaneta, divê:

- Padşaî saxbe, gerekî tu esker bidî min.

Padşa emir dike, çiqas heywanetê qewat hebûye, tewî dide Çil Çop êtîm, ew tîne tê. Rûvî divê:- Ezê qaîşa biqetînim.

Hirç divê: - Ezê pişta bişkênim.

Xulese, her yek tiştekî hildide situê xwe, wekî eskerê padşa altkin.

Çil Çop êtîm dîsa eskerê padşê qir dike, heywanet dikşîne dive didê. Dinhêre, wekî du merî girtine. Çil Çop êtîm zane, wekî yek kurê apê xalê wîye. Ew reca dike, wan herdu merya dide berdanê. Tê mal, divêje:

- Xalo, tu çima nezewicîyî?

Divê: - Ka ezê kê distînim?

Çil Çop êtîm diçe qîza padşê hildide tê. Ji mala wan wêda kevirekî reş hebû. Ew tê, ber kêvir. Dêwek dertê. Keçikê ji Çil Çop êtîm distîne. Çil Çop êtîm divê:

- Ne axir min ji xalê xwera anîye?

Dêw divê: - Jina xalê te xûşka mine.

- Lê, - divê, - ez çi bikim?

Dêw divê: - Sê jinê min nava berêdane, eger te anî, were jina xalê xwe bive, lê te nanî, ez tu jina nadime te.

Mîrze Mehmed diçe nêçîrê, hema kurapê xwe divîne, hildide tîne malê.

Çil Çop êtîm ji wir diçe. Ne min got, Çil Çop êtîm ji surê bû. Çû derkete devê berê. Nihêrî, tu gemî naxevtin. Ew wira diçe cem padşê, divê:

- Gemîkê bide min.

Wira padşa gemîkê, du gemîçya dide. Ew pir diçin, hindik diçin, dinhêrin, destekî morî -mircan derkete pêşya gemîê. Çil Çop êtîm milê wê digre, kaş dike, divê:

- Ya bedî îsan, her paşê ezê nêta te meyaser kim.

Xulese, herdu xûşkê dinê jî usa dike. Gemî diçe, dertê erdê za. Sê xûşk têne gazî Çil Çop êtîm dikin, ew hevdu divînin, divêjinê:

- Tu me ji xwera divî, yanê na?

Divê: - Na, wlle, hal û hewalê min eve.

Ew divêjin: - Xuzla em bîst sala jî di berêda bimana, ne ku te em dêwra bibrana.

Diçin dertêne welatê xwe. Sê xûşk dûrva disekinin, divêjin:

- Here, ewê jina xalê te berde, wê bêje, kanên jinê min? Bê, jinê çi, halê çi? Dêwê wî çaxî biteqe.

Ewana çawa ji Çil Çop êtîmra divêjim, ew jî usa dike, dêw diteqe.

Çol Çop diçe, her sê xûşka jî tîne: duda dide xalê xwe, yekê jî dide kurapê xalê xwe, yekî jî ji xwera distîne. Çil ro, çil şevî defê dixin.

Ew çûn mirazê xwe şabûn, em jî hatin mirazê xwe şabin.

## 27. TAHAR- MÎRZE, ZOHÎREB, GULÎZER

Sltan Etem padşa bû. Wextekî jina wî û jina brê wî hemle derketin. Sltan Etem gote brê xwe:

- Were emê şertnemê girêdin, wekî jina te zaro bû - qîzbe, wekî jina min zaro bû - kur anî, tu gerekê qîza xwe bidî kurê min. Bi sozekê kîjan kur û qîzbûn bidine hevda.

Wextekî jina birê Sltan Etem zaro bû. Kur anî, lê jina Sltan Etem zaro bû, qîz anî. Bi wê yekê ew qîz, kur mezin bûn. Lê ew haj tu tiştî tunebûn, yanê bavê wana şertnemê hevra girêdabûn. Navê qîzê - Zuhîreb, navê gede - Tahar- Mîrzebû.

Tahar û Zohîreb diçûne mektebê, lê herdu qet hev nediqetyan, hevra diçûn, hevra dihetin. Rojekê şagirtê mektebê belabûn, Tahar û Zohîreb tenê man mektebêda. Tahar gote Zohîreb, got:

- Ew ktêba ser serê qutîya mezin qet dersdarê meyî molle nîşa me nekirîye.

Bi gotinêra Zohîrebê ew kitêb anî. Gava kitêb vekir, kaxezek ortêda bû. Gava Zohîrebê kaxêz xand, nihêrî eva şertnema wê û Taharê, wekî bavê wana hevra girêdane. Bi wê yekê eşqîn kete dilê herda, usa herd hevra şabûn, lê bi şabûna wanara usa herd hevra ketine xewê, razan. Gava dersdarê wanî molle derda çû, ecêvmayîn ma, wê sihetê ziviri çû cem bavê Zohîrebê - Sltan Etem padşa, jêra got:

- Hal - hewalê kurê brê te û qîza te eve.

Gava ku Sltan Etem bihîst, şande peyî birê xwe û jina wîva.

Ew herdi jî kuştin. Gava kuştina herda hevalê Tahar -Mîrze bihîstin, çûn Taharra gotin, wekî: "Dê, bavê te kuştine, wê te jî bikujin".

Bi wê yekê Tahar û herdu hevalê xuva revîn, şeherê wî derketin:padşê kire ser qewaza, wekî "Tahar- Mîrze kîderê hebe minra bigrin bînin". Bi gotina wîra qewaz pey Tahar- Mîrze ketin. Şev kete ser Tahar- Mîrze, nava baxekîda razan. Agirê wan jî kêleka wan duşxilî. Wextekê qewaz wanva derketin. Serê herd hevalê Tahar-Mîrze xewêda jêkirin û deyn Tahar- Mîrze kirin. Kirine dîl, birin çûn heta nêzîkî şeher- sêlav gele rabûbû. Pirak tenê hebû, gava hatin ber pirê sekinîn, Tahar got:- Tucar ez ser pira nemerdara derbaz nabim, ezê avêra derbazî wî berîbim.

Qewaza gotin: - Brabe.

Avêra derbaz bû, lêdan çûn cem padşê. Padşa gazî celat kir, wekî serê Tahar lêxe. Lê Zohîrebê ew yek se kir, destê kincê carîya xwekir, çû dîwana bavê xwe, binhêre wê çawa Tahar- Mîrze bikujin. Lê çaxê celat sekinîbûn Tahar çevê xwe gerand bin çarşevêda Zohîreb nas kir, kela wî tijî bû û got:

- Padşaî xweşbe, du soza bide min ez xeberdim.

Sînotê padşê îzin dan, wekî xeberde, lê wî çaxî padşê got:

- Tu xeberde, hema wekî te navê Zohîrebê hilda, ezê serê te lêxim.

Sînotê padşê gotin: - Padşaî xweşbe, xwe navê qîza te tenê Zohîreb nîne, îznê bide bira çend gilya bêje.

Tahar saz hilda, ha bi derdê xwera got. Bi sazda navê Zohîrê hilda û pêra girya.

Sûdê padşê rûnişt, wekî Tahar sirgûnkin. Usa jî sirgûn kir, welatê xwe derxist.

Tahar çû şiherekîva derket, çû nava şiher, ber derê dikana xoce rûnişt. Xoce dîna xwe dayê xortekî delal vanê sekinîye, derê dikanê dada û jê pirsî, got:

- Xortê delal, dive tu xam bî, usa vira sekinîyî?

Ewî got: - Erê welle, ez ne beledim.

Xoce gotêda: - Were tu bibe kurê min, ez bibim bavê te.

Ewî got: - Brabe.

Usa jî bir çû mala xwe. Qîzeke xoca hebu, Tahar û qîza xoce bûne xûşk bira, hevra diçûne seyrangê.

Wextekî xoce bazirganê xwe barkir bive şiherekî dinê xercke, lê xoce temî da qîza xwe, wekî:

- Tu Tahar rojê bivî baxekî, hetanî ez vedigerim têm.

Qîzikê got: - Brabe.

Bi wê yekê Tahar xûşka xweva çûne nava bax.Xûşka Tahar got:

- Tahar, ezê serê xwe daynim ser çoka te, razêm.

Tahar got: - Brabe, xûşka min.

Usa jî raza, serê wê ser çoka Tahar bû. Tahar destê xwe nava porê xûşka xwe gerand, nihêrî - kilîteke çûçik. Dît û hêdîka serê xûşka xwe danî ser potê xwe. Çû nava bax gerya, nihêrî derîkî çûk wanêye. Kilît lê anî, vekir. Kete hundur, nihêrî bilbil wê dixûne ser gulêda. Tahar metelmayî ma. Bilbil xand- xand û çû hat. Nişkêva bilbil ker bû, çevê wî çûn ser hev, wê sihetê, wê deqê gul bişkivî. Gava bilbil çevê xwe vekir, wekî gul bişkivîye, xwe pêra kelam xist. Kelem sîngê wî ket, pişta wîra da der. Tahar ma şaş û girya. Bilbil gotê:

- Tahar can, tu negrî, bra êl halê minda bigrî.

Tahar kerba xeriqî. Gava xûşka Tahar hişyar bû, nihêrî Tahar tune, pêra- pêra destê xwe bire nava porê xwe, dît kilît tune. Çû nava baxê bilbil. Gava derî vekir, nihêrî Tahar xeriqîye, hêdîka rakir, bir çû malê.

Tahar go:- Ez zef we razîme, we hetanî niha ez xayî kirime, diha ezê herim, - û destûra xwe li xûşkê xast, çû berbi welatê bavê xwe.

Gava çû nîvê rê, bavê wî xoce rast pê hat, jêra got:

- Lawo, tu çira diçî?

Ewî got: - Bavo can, ez qedrê te bîr nakim, dîsa ezê te biqesidim.

Û destûra xwe ji bavê xwest, çû.

Çû bal çemê şeherê bavê xwe, dîna xwe dayê şivanekî vaye.

Gote şivîn:- Selam elêkim!

Şivan got: - Elêkim selam!

Tahar gote şivîn: - Navê te xêr?Ewî got: - Navê min Delû Çoban.

Ewî got: - Delû Çoban, ez pirsa gilîkî te bikim, tuyê wê nas bikî?

Ewî got: - Erê, ezê nas bikim.

Tahar got: - Gelo halê Zohîrebê çîye?

Ewî got: - Nebî te temê xwe destgirtya min xirab kirîye? Destgirtya mine, îsal hevt salê mine, wekî ez bûme şivanê bavê Zohîrebê, wekî xura bînim.

Tahar got: - Te binbarekbe, çira min çi gotîye?

Lê Delû Çoban qestîka digotê, çika Taharê çi bêje. Lê Delû Çoban Tahar nas dikir û gotêda:

- Tahar can, ez te nas dikim, tu kurê Ahmedî, apê te padşaye ewî bavê te û dya te kuşt seva Zohîrebê. - Delû Çoban gote Tahar, - ezê te bigînim mirazê te, lê dergîstîya te xûşka mine.

Delû Çoban gava diçû nava şiher, pez bela dikir, qet kesek devra nedisekinî. Tirsa Delû Çoban, wana derî, pincarê xwe digirtin.

Delû Çoban Tahar hilda, çû mal. Gava çû mal, ewî dya xura got:

- Dayê, te ev çomax dîtîye, ezê parxanê teda hûr- hûrî bikim, wekî tu îro Tahar neghînî Zohîrebê.

Dya wî got: - Brabe, vê sihetê.

Ewê şand çend sêv anîn, kire sinîkî,gustîlka Tahar kire nava wan sêva, bir çû bide Zohîrebê.

Gava pîrê sêv bir da Zohîrebê, Zohîrebê lê nihêrî gustîlka Tahar navda, got:

- Pîrê can, xweyê vê gustîlê kîderêye?

Pîrê got: - Mala medaye. De wekî isane, ezê herim Tahar bînim bêm.

Zohîrebê destê kincê carya da pîrê, wekî Tahar xuke, bê bal we. Bi vê yekê çû bal Zohîrebê. Lê wana teze hev dîtibû, ew ketibûn xewa şîrîn.

Wê sihetê pîrê çû dîwana padşê, got:

- Ne tubî, ne navê tebe, Tahar hatîye bal qîza te, mi hêşka dît, wekî herda serê xwe pencerêra derxistibûn.

Padşa got: - Pîrê hey nabe?

Pîrê got:-Padşayî xweşbe, xwe ez derewa nakim, hizkî ezê vira bisekinim.Bira qewazê te herin binhêrin,hergê rast nîbû,tu sere min lêxe.

Usa jî padşa qewaz û wezîrê xwe şandne koçka qîza xwe. Lê carya Zohîrebê, nave wê Melek Sînem bû, ew jî dilê wê wezîrê padşê hevda gele hebû. Gava wezîr çû ber koçiksera qîza padşê sekinî, zengilê xist, Melek Sînemê hat derî vekir, nihêrî ecêveke qewîn, got:

- Wezîr, ev çi ecêve, hê qîza padşê razayê.

Wezîrgotêda-Bira rabe,emê bên binhêrin,hela Tahar vegeryaye yanê na?

Melek Sînemê dizîkava gotêda:- Erê welle vire, hema hêja hat gihîştêda, û dîsa jêra dizîkava got, - çawa ez tu hev hiz dikin, ew jî usa. Wezîr dizîkava gotêda:

- De wekî usane, here Tahar têke nava lihêfê, bira bide ber pencerê, ezê bêm pişta xwe bidimêda, bira qewaz bên bigerin.

Ḩema usa jî kirin. Qewaz çûn hundur, lê nihêrîn tiştek tune û vegeryan çûn cem padşê, gotin:- Welle me tiştek nedît.

Wêderê sere pîrê lêxistin. Lê Zohîrebê gote Tahar, got:

- Bi vî teherî nabe, ezê herim hosta bînim, bira qutîkî çêke dewsa cîyê te, wekî ez te têkim wê qutîyê, bavêjime ser rûyê berê, kindirekê bavêjimê, pencerêva girêdim. Gava dive êvar, îjar ezê te bînim bal xwe.

Bi wî teherî muxdarekî derbaz kirin. Rojekê ba rabû, lêxist kindir qetand, usa jî Tahar ser rûyê berê ket û çû.

Gava êvarê Zohîrebê nihêrî kendir qetyaye, Tahar tune, hêja xwe reş- mişot kir, wekî ewê Tahar destê xwe daye der.

Lê em bêne ser qîza Xosrof padşa. Ew çil caryê xweva devê berê xura seyrange dikirin. Wextekî Gulîzerê dîne xwe dayêda, wê tiştek ser rûyê berê ketîye, hêdî- hêdî jorda tê. Gulîzerê gote caryê xwe, got:

- Ew tiştê ser rûyê berê tê, herge zêr, zîvbû, qirarbe ezê bidime wêda, lê herge merivbû, qirarbe ezê bistînim.

Û gotina wêra carya sovekarî kirin, ew qutî girtin, anîn.

Gava derê qutyê vekirin, nihêrîn xortekî bedew wê têda razaye. Gava deyl lê kirin, ewî çevê xwe vekir, got:

- Zohîreb!

Gulîzerê gotêda: - Malxirab, ka Zohîreb?

Ew ma metel. Lê Gulîzerê cav bavê xwera şand: "Çevê te ronayî, wekî min xwera mêrek dît, ez dihebînim". Gava bavê Gulîzerê bihîst, zef şabû, ewî got:

- Wekî çend padşaler hatine xazgînî, ewê mêr nedikir, lê ewê bi dilê xwe mêr dîtîye. Wekî mere wê ne layîqbe, ezê bikujim.

Gulîzerê got: - Brabe!

Lê gava padşê Tahar dît, ewî jî heband û helalî qîza xwe daêda. Tahar gote padşê:

- Padşaî xweşbe, ez qîza te dihebînim, lê meremeke min heye, heta ez neynime serî, ez tu zawacê nakim.- Û ewî serhatya xwe padşêra got.

Padşê jî esker dayêda, wekî here ser bavê Zohîrebê şerke, bide altkirinê, Zohîrebê bîne. Lê hema wî qrarî Gulîzerê gotêda:

- Wekî Zohîreb min ne rintirbe, ezê sere te lêxim.

Tahar- Mîrze qebûl kir gilîyê Gulîzerê. Usa jî esker hildan, çûn şer bi serkarya Tahar û Gulîzerê. Ew çûn dora şeherê Siltan Etem girtin. Gava Siltan Etem nihêrî ecêveke qewîn, ewî got: "Tu şerê padşa mera tune, wekî şer hebûya wê berê hingê elametî min kirana, paşê bihatana dora şeherê min bigirtana". Lê Tahar- Mîrze û Gulîzerê çend qewaz şandin dû padşê, gotin, wekî: "Padşa bra bê vira, em hatine çevronaya wî". Usa jî padşa û wezîr, wekîlê wîva anîn hatine çadira Tahar û Gulîzerê. Lê padşê ew nas nedikirin. Tahar ew nas dikir. Gulîzerê gazî çend xortê baş kir, got:

- Destê Siltan Etem piştêva girêdin.

Wana ew gilyê xanimê qedandin. Xanimê gotê Tahar, got:

- Tu jî were Zohîrebê nas dikî? Were em bikevin faytonê herin Zohîrebê bînin, pêş çevê wêva Siltan Etem bikujin, bra dilê wê rihetbe.

Bi wê yekê çûn Zohîreb anîn hatin bal bavê wêyî Siltan Etem. Sûd rûnişt, got:- Siltan Etem, te çira brê xwe û jina wîva kuşt, seva qîza xwe? Ew jî te bi rezadilya xwe şertname girêdabû, wekî: "Ezê qîza xwe bidime kurê te", lê tu çira poşman bûyî?

Bi wê yekê jî sûdê jêra xezakirin da birînê, padşa kuştin. Ew melle gevezetya wana kiribû, ew jî kuştin.

Lê Tahar- Mîrze şand ew şivan anî, kire wezîrê xwe, xwe- xwe jî bû padşa. Gulîzer û Zohîreb jinêd wî bûn. Ewî ew esker paşda şande cem padşayê wan.

Bi vî teherî ew çûn gihîştin mirazê xwe, hûn jî bighîjin mirazê xwe... Hûn jî ser çevê minra hatine.

## 28. CIBIRÎ

Cibirî axayê êla hekara bû, hezar malêd wî hebûn sere xwe bû, hê nezewicî bû. Xelqê gotê: "Wextê zewaca teye, here bizewice!".

Cibirî sibekê rabû, sîyar bû çû alîkî. Xulamê wî Ahmed jî, dar hilda alîkîda çû.

Cibirî sê roja çû gerya, tu jin nedîtin, roja sisya zivirî hate mala xwe.

Xulamê wî rabû çû, go: "Axaê min, tu jina navîne, ez herim jinekê wîra werînim, bibînim".

Xulamê wî lêda çû. Çû rastî du dewrêşa hat, got: "Qe qîzê baş tunene, axayê xwera bistînim". Dewrêşa got:

- Here binê berîadane, here bibîne, hergê layîqî axayê teye, jêra bixweze

Ew derbaz bû, ji wana veqetya, berbi qesta mire ereba kir, çû gihîşte wêderê, kete êla mire ereba. Lêda çû, go: "Ez ku bibim mêvan, kêderê?". Kete nava êlêda, çû rastî konekî hat, go: "Eva kona hema başe, biçûke, ezê herime vî konî heyanî sibê, binhêrim çi dibe". Çû hundur, rûnişt, pîrê gotê:

- Mêvanê qenc, tu seba çi hatî, tu kuda têyî, kuda diçî, çira neçûyî maleke layîqî xwe?.

Ewî gotê: - Ez Ahmedê xulamê Cibirî axame, hezar hevsid malêd wî hene. Ez hatime vira, min nav- dengê qîzekê bihîstîye, ez dixwezim wîra bixwezim.

Pîrê gotêda: - Raste, qîzeke baş vira heye, hema me nedîtîye, em nizanim çi rengîye, çi rengî nine, çika çawane, hergê tu xwe- xwe çûyî dîtîye, pak, hergê te nedît, hemîn nave û nave.

Ew rabû sibê, rabû got: - Pîrê, torbekî minra bîne, ar têxê.

Kincêd xwe guhast, xwe kire forma parsekçîya, çû sekinî nava konê mala bavê wê qîzikê, pişta xwe da kon, berê xwe da perda Binefşê, go: "Belkî derkeve, ez bibînim, çika çawane, belkî bixwezim axê xwera". Usa sekinî heta êvarê. Dêna xwe dayê, tiştek nedît. Êvarê zivirî çû mala pîrê.

Go:- Min tiştek nedît. Hatin- çûyna mala bavê wê zef bû: destek dihat, yek diçû, min nikaribû ew bidîta.

Ma sibê. Ew sibê rabû dîsa çû, çû wê derê, dîsa sekinî, dîsa tişt ne dît. Wa du roja derbaz kir, roja sisya çû mala bavê wê sekinî. Mêvanê mala bavê wê nehatin, hatin- çûyîna mala bavê wê tune bû.

Dya wê gotê:- Binefş, çevê te vî beynzadîbe, heta ez herim mala cînara, vegerim bêm û tiştekî bidmêda.

Binefşê got: - Eva mina cesûsaye, ne nan dixwe, ne avê veduxwe, hema eva sê roje mala bavê minda sekinîye. Go, ezê metelokê bêjim, çika wê çawa be, go:

-Herê beynzedeyo, gerîdeyo,
Bira dayka min bê nava êleyo,
Bide te avranekî jêd şevêyo.
- Ez ne beynzade, ne gerîdeme,
Ez aşiqê bejina teme.

Go: - Tu çawa zanî -
Ez yeke çawa me,
Wekî tu aşiqê bejina minî?

Go:- Herê beynzedeyo, gerîdeyo,
Dayka min bê nava êlêyo.
Bide te destê kincê boxçêyo.

-Ez ne beynzedeme, negerîdeme,
Kanîya pêş mala we kevirê zere,
Binefş yeke çevqelişîye pişt hutike
Li ber perdê dere dere.

Binefş hema wî çaxî ber perdê derket, gotêda:

- Tû çi zanî eze yeke wame,- û pê dara lêxist derîra deranî.

Wî çaxî Ahmed gotê, go:- Binefş, min ten te da, min go, belkî tu ber perdê derkevî, wekî ez te bibînim, çika tu yeke çawanî.- Gotêda, - ez Ahmedim, xulamê Cibirî me, hezar hefsid male wî hene, go, ez bona hizkirina dine hatime, min nav û dengê te bihîstîye, ez hatime te bibînim. Tu qîzeke başî. Ezê te axayê xwera bistînim.

Binefşê go: - Wekî usa rast divêjî, here, heya çil rojî wera molet, go, hergê hûn hatin, hemîn hatin, nehatin, hûn xwera, ez xwera.

Ahmed xatir jê xwest, hate mala pîrê, kincê xwe guhast, xatirê xwe ji dya pîr xwest kete sere rîya xwe. Da rîya xwe, hat, bîst rojê wî temam bûn, ew jî gihîşte mala xwe. Paşê çû ji dya Cibirîra got:-Dayê, ez hatim.

Jinikê jî go:- Ha, Ahmed, mala te xirav be, go, îro bîst rojê teye, tu kuda çûbûyî?....

Go- : Ez çûme, min qîzeke layîq kurê tera dîtîye

Gotêda:- Cibirî sond xwerîye, gotîye, gava Ahmed were ber çevê min, ezê lêxim bikujim, çira ji êlê revîye?-. Dya Cibirî rabû pêşya Ahmed ket, bir dîwanê, gotêda:

- Cibirî, Ahmed hatîye, bona xatirê min Ahmedra tu tiştî nevêjî.

Cibirî gotêda: - Bila were, go, qurbana teve, ez tiştekî nakim.

Cibirî çû sere Ahmed, Ahmed jî çû mile wî, paşê gotêda:

- Tu kuda çûbûyî

Gotêda: - Ez çûm, min tera qîzek dî binê Berîya, mala mîre ereba, nave wê jî Binefşe, yeke usane, wekî layîqî teye, layîqî mala teye.

Go: - Rave heyştê sîyarê tûnsizî cahil çaxê hevravin, kincê wana yekbin, hespê wana yekbin, çekê wana yekbin, bîne were, emê herin binê Berîya.

Ewî rabû nava êlê ket, defa hewarîê lêxist, civand heyştê sîyarê tunisîzî cahil, got:

- Emê herin dewatê.

Kar- tivdarekê xwe kirin, efendim, sibê rabûn, rê ketin. Dane rîya xwe, çûne binê Berîya. Roja çilê wana temam bû. Qîzikê jî çil girê benekî xist, go: "Çira derengî ketin?". Û pêra -pêra êvarê ewana xwe gîhandin kanîyê. Devê kanîê peya bûn.

Qîzik jî derdikeve, tê qesta avê. Ahmed û Cibirî pêşda tên. Cibirî û Binefş hev begem kirin: ewî ew qebûlkir, ewê ew qebûl kir: hevdu hizkirin, hev qebûl kirin.

Binefşê go: - Syarbin, werin mala bavê min, got, hergê bavê min go - naleke min binê lingê hespê te da, tu nan bixwe, hergê nebû hemîn çû.

Ma nîvro. Cibirî dêna xwe dayê, wekî nan anîn dîwanxanê.

Mîr gotêda:- Keremke, were ser nan, nan bixwe.

Cibirî nehat. Nehate ser nan, nan nexwer.

Mîr go: - Çira tu nayî ser nan, nan naxweyî, go, were, naleke min binê lingê hespê te da.

Nan xwerin. Ewana rojekê, du roja, sê roja man, rokê jî Cibirî gote mîr

- Bila karê me bike, îzina me bide, emê herin,- paşê jî tijî nav destmalê zêrkir, got:-eva qelinê qîza te.

Mîr jî got: - Eva qelinê qîza min nîne, qîza min bê qelene.

Cibirî jî go:- Ew qelinê qîza te nine, min hema usa go, ew bona xulamane

Mîr jî ew zêr belayî ser xulam- xizmetkara kir.

Êfendim, wê şûnda rabûn, wekî herin. Mîr got:

- Niha qîza xwe nikarim bidime te, heta karê wê bibînim, bîst roja şûnda werin bibin.

Cibirî jî qayîlî dît. Lêdan çûn, çûn gihîştin yêrê xwe, kartivdarekê xwe kirin, dewatîê xwe temî kirin, wekî ki werin, dewatê.

Hema wî çaxî kurapê Binefşê, Dewrêşê Nerih ser êla mîra erebada girt. Binefşê revand, anî xwera. Ewî heft sala ew xastibû, hema nedidane wîya. Mîrê ereba jî meriv şandin pey Cibirî, got:

- Em Dewrêşê Nerih nikarin, hat dergîstîya te bir, hergê dikarî here bibe.

Sîyar tê, Ahmed dûrebînê dinhêre, dive: "Sîyarekî nexêrêye, wekî wa nava toz û dûmanêda unda bûyîye". Sîyar hate gihîşte wana, go:

- Cibirî, mîre ereba gotîye - em Dewrêşê Nerih nikarin, hat dergîstîya we bir, hergê dikarî here bibe.

Wî çaxî merivê êla Cibirî gotin: - Em nikarin wa herin.

Cibirî go:- Ahmed, defa hewarêxe, em herin ser şer

Ahmed gotêda, go: - Em niakrin şer, go, em hezar heftsid malin, lê ew zefin, go, were em herin bi rêncberîyê.

Cibirî got:- Ezê te bikim axa, te daynim dewsa xwe, ezê herim, dergîstîya mine, hergê min hiz bike, ezê bînim, hergê na, hemîn çû.

Cibirî rabû karê xwe kir, da rêda çû. Efendim, lê da çû, çû êla Dewrêşê Nerih, rastî şivanê wî hat, go:-Şivan, bereket be!

Go:- Ser çeva, ser sera.

Go:- Eva çi peze?

Go:- Pezê Dewrêşê Nerihe, ez jî şivanê wîme.- go:- Lê tu çi tevayî?

Go: - Ez jî şvanim, dixwezim rêncberîyê bikim.

Gotêda:- Tu vira rûnî, ez herim cem Dewrêşê Nerih, herkê ewî hizkir, ezê bêm te bikim şivan.

Rabû çû, gotêda:- Dewrêşê Nerih, merîkî baş hatîye dixweze bibe şivan.

Gotêda:- Here bişîne, bila were cem min.

Şivan rabû pêşîê ket, bire cem wî.

Got:- Dixwezî bibî şivan?

Got:- Belê. - Kire şivan.

Hergê heqê wî deh pez bû, kire bîst û kire ber hogeca.

Zivistan bû, hogeçê wî çû qijila, axila, destê wî ji malê qetîya, çû. Binefş ne dît. Kerî -sûrîê xelqê gişk qirbûn, lê kerîê wî- yê Ahmed, tişt

pê nehat. Hogeçê xelqê carekê qirbûn. Cav biharê hat, go:- Welleh, hogeçê Ahmed tişte pê nehatîye. (Cibirî nave xwe danî bû Ahmed). Cav hate Dewrêşê Nerih. Ewî jî tocarek hilda çû qijlê, dêna xwe dayê, hogeçê wî tişte pê nehatîye. Hogeçê xwe gişk firot û Ahmed hilda anî kir ber pezê zayîn. Heqê wî carêkê tezekir.

Ahmedê te îjar çû ber mîya, efendim, ser kete mîya, mî zan, anî bêrîê xwe danî, pezê xwe dot. Rojêkê mîk nehate bêrîyê. Ahmed rabû dest avîtê, ser xweda anî, mîê xwe bada, bişkoşkê wî qetandin û xencera wî Binefşê dît, go: "Welle, eva dergîstîyê mine, eva du sale hatîye, newêre, xwe eyanke". Du jinê bêrîvan jî ji wî hizdikin, hero hevra şer dikin. Berî jî bin pencera Binefşêye.

Cibirî ew nas dikir, lê hema Binefşê heta wê rojê nas nedikir. Mêrik dihelya, Binefşê go: "Eva xencera pişta wî ya wî çaxîye, min wî çaxî dîtîye, wextê ewî ez dîtim". Ahmedê te jî rabû pezê xwe bire çêre. Wê rojê jî baran hat û pez anîne gund. Şivan terbûbû sekinî bû, lê dîsa rabû, wekî pezê xwe rake bibe çêre. Binefşê heta wê rojê tu kesîra xeber neda bû, wê rojê xeber da, go:

- Xadê xiravke male, eva şivana terbûye, telîl bûye, evê vê şevê çawa here ber pêz?

Dewrêşê Nerih gotêda: - Binefş, îro te xeverda, bila adbe, îşev sev xatirê te, ezê herim ber pêz û rabû çû dewsa Ahmed.

Ahmed lêda hate ber tendûrê rûnişt. Binefşê got: " Ezê metelekê bêjim, çika çi dibêje, ez wî nas dikim".

Go: - Xencera Cibirîê min, madane,<br>
Şewqê daye elba şîr bêrîya mîane,<br>
Par vî çaxî Cibirîngê min axê êla hekara bû,<br>
Îsal Dewirêşê Nerihra bûye şivane.

Ewî go: "Welleh, go, evê ez naskirime, duh xencera min dîtîye, ez naskirime".

Binefşê go:- Îşef şeve, şeve reşe.<br>
Destekê Cibrîngê min bîst û şeşe,<br>
Şayşa meke desteka te mezin têlî Binefşe.<br>
Go, îşev şeve, şev şilîye,<br>
Guhêra Cibrîngê min avherîye.

Xasîya wê gotê: - Çira tu îşev rehet nabî? Dewrêşê Nerih sibê wê were malê.

Hilda gotêda:- Xasîya mine libsî kerê,<br>
Tu fem nakî tu xeberê,<br>
Îşev pêştir min navînî li vêderê.

Xasîya wê xeydî, da rîya xwe çû, go: "Minra gotîye libsî kerê".

Binefşê go:- Lûrî, lûrî, lûrî...
Landika Cibirîê min ji dara dare tere,
Minê danîye, ser hostakî kere,
Cibrîngo, tamar çeva keto,
Dayka te rêwîye, êvarda wê rê here.
(Binefşê nave kurê xwe jî danî bû Cibirî).

Paşê Binefş rabû, çû dest avît Cibirî, go:

- Tu çira îsal du sale Dewrêşê Nerihra bûyî şivan, tu bihatayî, em biçûna, - rabû, çû tewla Dewrêşê Nerih, du hesp anîn, kelimelê xwe lêkirin, çûn, dane rîya xwe çûn.

Kurik landikêda girîya, xasîya wê kes nedihîşt herine cem kur, go: "Minra daye xebera". Sibe pak bû, dêna xwe danê Cibirî tune. Efendim, hewar birin Dewrêşê Nerihra. Dewrêş axa hat mal- ne jinik dît, ne tişt, kur jî landikêda hê digirya...

Cibirî jî bê şer, bê hewar- gazî, jina xwe hilda bir çû. Cab çû mala Cibirî, go:

- Welleh, Cibirî jina xwe anî!

Ahmed def û zurnava çû pêşîê. Heft roja, heft şeva dewat kirin hêja ew çûn gihîştin mirazê xwe.

Mirazê te jî zarê tebe.

## 29. SÊ XORT

Sê zort radibin, wekîk xwera herin hec, xwera îmanê bikirin. Diçin dikevine rê: pir diçin, hindik diçin, diçin şkeftekê. Êvar ser wan tê, diçin dikevin hundur. Divê:- Emê îşev xwera starvin, sivê ravin herin.

Wextekê sivê radivin, dinhêrin qeya ser wan bûye yek, kevir gihîştine hev, derê şkeftê hatîye girtin. Divê:

- Kuro, were em gunê xwe bêjin, gunekar nav meda hene, belkî derî li me vebe.

Hevalekî gote wana, go:

- Bise, ez gunê xwe bêjim. Go, zanî gunê min çîye? Go, go, wextekê ez bavê xwe odêda razayî bûn: ew pîkî raza bû, ez pîkî. Bavê min şev tî bû, go: "Kuro, here tase av bavê xwera bîne". Go, zivistan bû. Go, min tasa avê tijî kir, ji kurin anî, ez heta hatim - bavê min

razaye. Min îda dey li bavê xwe nekir, tasa avê da ser destê xwe sekinî. Wextekê bavê min çevê xwe vekir: "Lawo, go, tu hê sekinîyî?". Çermê destê min qawirme binê tasêva rabû. A, go, welle, gune eve.

Şikeft qasî kulekekê vebû, hela xwe gunekar hesav kirîye.

Yê din go: - Bise, go, ez gunê xwe bêjim.

Go: - De bêje. Em gunê xwe rast bêjin, wekîk şkeft me vebe.

Go:- Wextekî, go, em gele dewletî bûn, mala bavê min. Me pêncî pale girtibû, berî zevîê dabû. Wextekê nanê nîvro me anî. Xortekî desa wî studa ser me sekinî, gote bavê min: "Pale îda te nelazimin, ez bixebitim?". Bavê min go: "Îdî nanê nîvro hatîye, ezê nîvheqî bidime te". Go: "Erê, apo, ez jî zanim nanê nîvro hatîye". "De, go, lawo, rave nanê xwe bixwe, rave tevî pala bixevte". Ewî xortî nanê xwe xar, rabû desa xwe hilda, go: "Apo, go, ez merîkî xerîbim, ezê başqe bixevtim". Ew pêncî pale kete milekî zevîyê, ew pale tenê kete milekî zevîyê. Êvarê ewî qasî wî pêncî paleyî drût. Bav syar bû, pêşêda çû, go:

- Lawo, tu êvarê palera bêyî.

Êvarê pale hatin, palê xerîb tune. Bavê min go:

- Lawo, ka palê xerîb kuda çû?

Go: - Em geryan, negeryan nava cînara, cîkî me pale nedît.

Bavê min sekinî, ew heqê wî da kavirekî. Kavira wî sekinî, sal din bû berdîr, sala dinê kavir za berx anî. Bavê min dihat ser kevanyara digot:

- Şîrê wî başqe bidoşin.

Ez çi serê te bêşînim, hirya wî jêra difrot, şîrê wî dikla dikire rûn - jêra difrot. Rûnê wî başqe dikir, toreqa wî başqe dikir, hirya wî heta paîzê - paîzê difrot.

Heft salê palê temam bûn: pêncî pezê wî gihîşte hev.

Rojekê me dî: ew pale hat, bavê min ber dêrî rûniştî bû. Selam da bavê min.

- Lawo, go, tu çi merîyî?

Go: - Apo, go, wextekê ez van malara xebitîme, nizam kîjane, go, çend kapêkê min sere. Go, gelo nizam wê heqê min bidin, yan nadin?

- Lawo, go, kêremke em herine mal.-Çûn.

- Qîzê, xort birçîye, nan jêra bîne, - xort çû rûnişt. Ewê nan, xarin anî ber, - go, lawo, bixwe notla mala xwe.

Xort nanê xwe xar, vekişya. Xort hingê go:

- Xwedê duaê li mala te bike.

- Lawo, go, ewê tu lê digerî, gendî ezim. Lawo, go, naha pezê nîvro bê: heta nîvro bisekine, ezê heqê te bidime te.

Û sekinî. Pezê nîvro hat, bire ber bêrîê, go:

- Lawo, eva bêrîya pezê te başqeye. Tu usa bizanbe - gulma şîrê te me herame, biska hirya te li me herame. A, go, kurê min, eva pêncî pezê keda te, li te helalbe, bive here, Xwedê oxirê bide te.

Xort rabû pezê xwe ajot û çû.

Go: - Apo, gele te razîme, şên bive mala te.

Go: - Gunê min kirîye, eve, - hela xwe gunekar hesab kir, ha.

Û devê şkeftê temam vebû, ma hinek vebe. Gotine hevalê xwe dinê:

Go: - Qurba, tu jî gunekarya xwe bêje, wekî derê şkeftê temam vebe.

Go: - Ezê îja bêjim, sirya mine. Go, wextekî mala me gelekî dewletî bû, go, peynê meyî pêz hewqa danî bûn ser hev, qasî grekî bû. Teyrek, go, dihat ser wî peynê me, hêlîna xwe çêdikir, cûcikê wî mezin dibûn, diçû. Wextekî xulam usa binê peyn kola bû, neqer kiribû, cîyê tewlê direşandin, peyn direşand. Binê peîn vala bû, peyn hilşya. Heta em gihîştinê - cûcikeke wî teyredeyî binda fetisî. Go, gunekarya min jî eve.

Şkeft temam vebû.

Go: - Rave, go, wekî usane heca me qebilî, gunekarîya me tunene.

Û vegeryan hatine malê xwe.

## 30. ÇERXÊ FELEKÊ

Mûsa pêxember cem rebê alemê buhurtî bû. Diçe çîyakî nona vê Elegeza me, dinêre konek vaye vegirtîye, qîzek ber kon diçe tê - qîzeke usane meriv şerm dike lê binêre: bedewe, mîna zêr diçirûse, bedewya wê meriv şaş dimîne, zef bedewe. Dilê wî havijî keçikê dive.

Divê:- Qîza qenc, tu min nastînî?

Keçik divê: - Wekî ez te bistînim, qelenê min girane, dikarî qelenê min bidî?

Divê: - Ez Mûsa pêxemberim, wekî ez nikarbim qelenê te bidim, îda kî dikare bide?- Divê,- qelenê te çîye?

Divê: - Qelenê min kîlo kevirê qîmetlîye.

- Ê, divê, ew kevirê qîmetlî ku hene?

Divê: - Flan berêdane. Kevirekî reş nîşangî wî heye. Wekî meriv têkeve wê avêda -wir kevirê qîmetlî heye.

Mûsa pêxember diçe ber wê berê. Cem wî kevirî xozneber hebûne berê, xoznebera dike avê kevira derdixe. Kîlo kevirê qîmetî ji berê derdixe. Dixe derdana xwe, terkûya hespê xwe girêdide, lêdixe tê. Tê diçe Elegezê, dîsa diçe ber wî konî. Dinêre qîzik ne ber kone: pîreke porê wê sipî ber kon diçe tê. Pîrê tê peşya Mûsa pêxember.

- Ha, Mûsa pêxember, divê, te qelenê min anî?

Bala xwe didê qîz nîne, qîza wê rojê nîne - pîre. Divê:

- Pîrê, here min dûr keve.

Divê: - Çima Mûsa pêxember, divê, tu poşman bûyî? Ne wê rojê min qelenê xwe tera kivş kirîye, te çûye qelanê min anîye.

Mûsa bala xwe didê, canim pîrêke, porê wê çîlî qerqaş.

Divê: - Pîrê, tu û emelê xwe, here, ji min dûrkeve.

Mûsa pêxember dajo, hinekî jê dûr dikeve. Pîrê ew qîze, zanî, ketîye dilqekî mayîn.

Divê: - Mûsa pêxember, tu poşman bûyî?- divê:- Hergê tu poşman bûyî, gilîkî min heye tera bêjim.

Mûsa divê: - De bêje!

Divê: - Wekî tu poşman bûyî, wekî usane min berde û here.

Divê: - Çawa te berdim?

Divê: - Sê kevira erdê hilde têxe destê min, bêje - tu xûşka minî.

Mûsa kûzî erdê dive, sê kevira na, deh kevira dike destê wê, divê:

- Min tu berdayî.

Berdana jinê wî çaxîda bûye edet.

Mûsa pêxember dajo, hinekî jê dûr dikeve, ser stuê xwe dizvire, lê dinhêre, dinêre pîrê nîne - dîsa qîza wê rojêye, bedewe. Divê:

- Qîza qenc, te çima ha kir? - axir kirîye xûşka xwe, îda nikare.

Keçik divêje: - Lê, çerxê felekêne, lê çi divêjî?

Mûsa pêxember divê:-Wekî çerxê felekêne,çerxekê dîsa nîşanî minde!

Mûsa pêxember disekine ser pişta hespê, dinêre sê xort wêda tên. Mûsa pêxember serpişta hesê sekinîye. Keçik divê:

- De tu bala xwe bidê.

Jinik ser rê, rîya şoşê bûye, hema ser rê dive kulîca zêr disekine.

Ew her sê peya tên dinêrin kulîca zêr vaye - eva zêrin. Mûsa pêxember hê ser pişta hespê guhdarî dike. Hersa peya dibin-dinêrineva zêr. Divê: -Welle, Xwedê da me!

Dudu kurapê hev bûne, yek xerîb bûye. Ew herduyê kurapê hevdu, ewê hevalê xwe xerîbra divêjin, divê:

- Ha tera deh qurişê hana, here stansîya Elegezê, vira Elegezê, baltekî bîne, em îca evan zêrê hana têxin sê cîya, bê balte nave, bê hacet nave.

Ew herduyê kurapê hevdu yek yekîra divêje:

- Wekê hevalê me balte anî, ezê dest bigirim bikujim, bira zêr bigîjin me herda.

Ewê çûye balte bîne, evê xerîb, ew ji dide aqilê xwe: Elegezê, stansîê katekî jerê perwede dike. Divê: "Ezê bidime herdu hevalê xwe kate, bira bixun pê bimirin, bira zêr bigîjin min", ew jî usa divêje, ha. Katê xwe tîne, baltê xwe tîne, çawa digîje hevalê xwe, Mûsa pêxember hê li ser pişta hespê guhdarî dike, ew jinik jî hê li wê sekinîye, bûye zêr sekinîye. Çawa digîje hevalê xwe, ew herduê kurapê hevdu, yek balte dest digire, balte lê dixe ewî xerîb dikuje. Ew herdu kurapê hevdu, hêmîn ew kuştin, divê:

- De werin, em katê xwe bixun, îjar em zêrê xwe bikin du cîya.

Kate dixun, herdu jî dimirin, axir jere, kate jerê perwede kirîye, dilê wan axir hevra ne saxbûn, her sê jî çûn.

Keçik çik radive ser xwe disekine, ser rê hemîn bûbû zêr - çik radive serxwe disekine.

Divê: - Mûsa, çawane?

Mûsa pêxember divê: - Erê welle, çerxêd felekêne!

Mûsa pêxember wê hingê divêje: - Heft xwezil wî evdî felek pêra yarbe, ne xwezil wî merivî, felek pêra neyar be.

Xlaz bû.

## 31. SERHATÎYA KESÎB

Merivek hebû, kesîb bû, dikir- nedikir têr nedixwer: Xwedê nedidayê.

Jinê gotê: - Hey xwelî serê teve, go, Etman, kuro, go, rave mêşok hilde, hevîrekê me bêxwêye, here ji minra hine xwê bîne were.

Ewî rabû mêşokê xwe hilda, ji wira here Kaxabêrê - bona xwê. Lêda çû, kevirek- min dayêda, kevirek- yê din dayêda: xulese, pûtek xwera top kir, lêda hat, go: "Ezê bivim herim mala xwe". Hevrazek kete pêşîyê, ew hevraz bû çîyayê Felek hate pêşîê, bînaya çeva, go:

- Kesîb, go, ezê te bavêjme baxê cinetê, tenê sond bixwe, wekî ji kesî xeber nedî.

Go: - Birabe!

Avîte bax. Çû gerya, dîna xwe dayêda merivek wê ketîye avê, avê daye heta lêva wî, dike qare- qar digirî, nav avêda divêje: "Bidin xatirê Xwedê, avê bidin min".

Etman lê dinhêre. Etman divêje:

- Tu nav avêdanî, tu çima avê naxwî, qîre- qîra teye?

Etman bala xwe dayê, xwê li piştêye, dîsa berê xwe daye hevrêz, ber bi mala xwe diçe. Etman go: "Xwedê mala min xirav bike, ez ketibûm baxê cinetê, min çima jê xeber da?".

Careke dinê bînaya çeva hate pêşîêda, go:

- De were destê minda sond bixwe, wekî ji kesî xeber nadî.

Go: - Qirarê Xwedê be, ez tu kesîra xeber nadim.

Dîsa ew avîtin baxê cinetê. Xwera çû bax gerya, dîna xwe dayêda merivek nan tijî ser sêlê kirîye, daye ser serê xwe, qîre-qira wîye. Divêje:- Bidin xatirê Xwedê, ez birçîme, nan bidin min!

Etman lêdinêre, Etman divêje: "Ew çiqa merivekî axmaxe, wekî nan ser serê wîye û dike qare- qar divê -ez birçîme".

Dilê Etman ber Etman qebûl nekir, go: "Qê ew dîne, wekî nan ser serê wîye û naxwe". Etman jêra go:

- Tu heywanî, nan ser serê te, dayne erdê, nanê xwe bixwe. Ewî jorda nanê xwe danî erdê, jêra bû qismet:

Go:- Xortê qenc, îsal heft sale, ew nan ser serê mine, min fem nedikir nan bixwera.

Dîsa dîna xwe dayê xwê li piştêye. Li hevrazê diçe, lingekî pêşda davêje, du linga para davêje. Lê, go: "Hilbet nave qismetê min, min çima ji wîra go?".

Dîsa bînaya çeva eyan bû û dîsa hate pêşya wî, jêra go:

- Xwedê te stendîye, min tu dayî sondê, wekî ji kesî xeber nedî. Çi kula te hebû, ji xelqê xeber bidî? Careke din, go, tu dest minda tobe bike, bê- ez ji kesî xeber nadim, ezê dîsa te bişînim cîyê te.

Careke dinê avît, çû cîyê xwe, çû xwera gerya. Dîna xwe dayêda, hinek xwera syar bûne kêfê dikin, hinek xumarê dilîzin, nîvî jî xwera kampanî danîne kêf dikin. Ji wan derbaz bû, dîna xwe dayê merivek xwera ser pişt velezyaye. Dîna xwe dayê mêrg- çîman tijîne, erdê şîn, temiz, xortekî mîna Mecît ber çar dewarane. Ew herçar dewar çûn,

anîn hatin, berî ser sîngê wî dan, pirça sîngê wî vediroje, dewar dixun. Etman lêdinêre, divê: "Ca wî axmaxî binêre, xwera velezyaye, dewar xwera ser sîngê wî diçêre". Dilê Etman qebûl nekir:

- Kuro, go, tu çima dêwêr berî wî çîmanî nadî, tu tînî berî sîngê wî didî?

Dîsa dîna xwe dayê xwêya wî ser piştê, dîsa hevrêzra hildikişe. Bînaya çeva careke dinê hate pêşîê, go:

- Etman, Xwedê mala te xirav bike, çi kula te xelqê hatîye, tu wanara xeber didî, go, destê minda qirar bike, wekî kesîra xeber nedî.

Etman go: - Ez ji kesî xeber nadim.

Dîsa avîte êra wî. Çû dîna xwe dayêda kevirekî usa mezine, sed pût, dusid pût, weke heyşt- deh meriv lê civîne, heryekî têlekî zirav avîtine, yek wa dikişîne, yek alîyê dinê, her yek alîkî dikşînin. Etman xwera ser wana dinhêre, guhdarî wana dike, go: "Canim, ew çiqa axmaxin, tiştekî fem nakim dinêda, herekê têlek avîtîye, wekî wî kevirî bileqînin, wekî deh- panzda ga bavêjin, nikarin ji cî bileqînin". Dilê wîda bû kulek, go: "Ew merivne axmaxin, qirarê Xwedê be, wekî ser pişta minda heft pût be, ezê wanara bêjim". Gazîkirê, go:

- Bisekinin!

Ew her heyşt- deh jî sekinîn!

- Qurba, go, çi divêjî?. Em xebeta xwe dikin, tu divêjî bisekinin?

Go: - Hûn axmaxin, evê bi zincîrê kotanê ranakin, hûn nikarin rakin, îjar we têlê koça avîtîye, her yekî we alîkîda dikişîne.

Dîna xwe dayê dîsa mêşokê xwê li piştêye, ketîye hevraz diçe. Dîna xwe dayê, felek hate pêşîê, jêra got:

- Kuro, min tu çar cara avîtî cinetê, te careke dinê xelqê xeverda hatî, de were ez tera mesela wana bêjim. Qurba, sifte tu çûyî cîyê avê, merîê avêda, çima ew meriv kor bû, av ber çevê wî bû, kulê ketibû, nikarbû av bixwera? Ew merîkî usayî tima bû - li paletîyê cêrê wî tijî av bû. Jineke dinê hate cem wî, go:

- Bide xatirê Xwedê, avê bide min!

Sê cara hate cem wî, ewî axrîyê av nedayê. Ew heft sal avêda bû, av nebû qismetê wî.

Ê nan ser sêrî, Xwedê mala te xirav bike: sele ser serê wî bû, çima nikaribû bixwera? Ew merivekî usayî tima bû, merivekî birçî hat cem wî, go:

- Bide xatirê Xwedê, lêvek nan bide min. - Ewî nan nedayê. Îsal heft sal nan ser serê wî bû, dikire qare- qar, Xwedê nekir qismetê wî.

Ya dewar berî ser sîngê wî didan. Ewî dewarê pûtîê xay dikir. Ewî perê distand, nedida dewarê xelqê, lê ji ber afirê dewarê pûtî derdixist, dikir ber afirê dewarê xwe. Mena wî ew derbû, wekî te çû jêra go, ew jî gihîştine êra xwe.

Ê kevirê, ew kevirê çarsid pûtê, çima deh- bîst meriv lê civyabûn, qe merivekî aqil nav wanda tunebû, wekî ew têlê koça ranedibû, lê te çima wanara got? Zanî ew kevir çîye? Ew kevirê mesib bû, ji minra êzdî dibêjin, ji wîra gurc dibêjin ... herkesî ji xwera dikişîne, dêmek heftê du milet îsanet heye, her milet dixweze ji xwera bive here.

Ezê rîya te kin bibirim, tu rîya xweda here mala xwe, te go: "Ez navêjim", lê te gilîê xwe nekir, dêmek te ez xapandim, nexwest baxê cinetêda bimînî.

Kesîb go:- Bira ez wa bimînim, tek serê xwe bim, nava der û cînarê xwe.

Kuta bû.

## 32. KOR Û BELENGAZ

Wextekî hebû tunebû du meriv. Ew herdu meriv rabûn çûn xwera cîkî dûr xevatê. Gelekî xevitîn û herdu heval hatine bal hev, gotin: "Wekî bese me çi qazanc kirîye û em herin mala xwe". Ewana lêdan hatin nava şeherê Bexdayê. Yekî got:

- Bisene, ezê hurmûr mala xwera bistînim.

Lênihêrî merivekî kor rast hat û gelekî azarîkir, wekî- "Ez guneme, çend manat pere bide min".

Û ev merîya duşurmîş bû, got: "Wekî min qazanc kirîye bîst quriş pere, wekî ez quruşekî bidim, nonzdeh quruş besî mala minin".

Pere dane kor û lê dûr ket. Hinekî lê dûr ket û careke maîn lênihêrî dîsa ev merîyê kor hate pêşya wî, got, wekî- "Ez guneme, dîsa quruşe pere bide min". Eva duşurmîş bû, got, " wekî guneye, ezê quruşekî jî bidimê, hîjde hev besî minin". Û gava ewî kîsê quruşa derxist, ewî kor işqem kîs girt û kire gazî:

- Hewar werin, evîa perê min ji min distîne!

Xelq tije ser bû û xelqê got: - Kuro, eva kore, guneye, tu çira perê wî jê distînî?-. Û pere ji vî merî stendin dane ewî kor.

Mêrik por- poşman sekinî û duşurmîş bû. Dîna wî kor bû, kuda kor çû û ewî da pey wîya. Lênhêrî kor derî vekir û çû hundur, ew jî pey çû, çû hundur.

Kor zanibû ew pey çûye, sekinîbû ber terîya dêrî. Kor ew perê mêrik destê xweda dihejandin, digot: "Eva jî risqekî başe". Gava ewî pere bilind kirin, mêrik dest hildan. Kor kenya, got:

- Hetanî birê mezin pey neçe,yê çûk nayê.

Doşeka xwe hilbirî ewê kor û kîsa zêr derxist û careke dinê destê xweda bilind kir. Mêrik carka maîn ew zêr jî dest girtin.

Dikene dîsa kor û divê: - Hetanî birê lapî mezin neçe, birê dinê nayên.

Mêrik dixweze ewana jî bigire, lê kor kîp herdu milê mêrik digire. Û dibêjêda:

- Kuro, wekî tu herî ber perê ezmana, tu destê min xlaz nabî. Ya qenc ewe, wekî tu mirazê min bikî, min xewna xweda dîtye yê mirazê min bike - tuyî.

Mêrik duşurmîş bû got: - Bêje, çika mirazê te çîye?

Kor gotêda: - Tu herî mesela Ûsivî qaweçû mira bînî. - Paşê kor gotêda, go:- çima ez hewcê perê te bûm, hela were binhêre çiqa zêr, zîvê min heye, wekî tu mirazê min bikî, ezê wan zêra gişkî bidime te.

Mêrik divê: - De cî bêje, em herin,- û herdu têne bazarê.

Kor hespekî mêrikra distîne û ew lêdide diçe: zef, hindik -em nizanin, rastî helabaşî tê. Helebaşî lê dikine gazî:

- Kuro, eva cîyê meye, tu çawa mêrî, wekî cîyê me digerî? - Helabaşî çil hev bûne.

Merik dibêje: - Kuro, usa ne heqê îsafêye, wekî çil merî bajo pêşîya merîkî. Wekî hûn mêrin yek- yek werin em şerkin.

Serkarê helabaşîya divê: - Raste!

Mêrik serkarê wan hevra şerdikin. Mêrik lêdixe wîya dikuje, û yê maîn jêra dibin desda.

Helabaşî mêrik hiltînin dibin cîyê xwe. Mêrik dibêje wan:

- Ez ne hewcê zêrê weme, wekî hûn qoçaxin- sê meriv mira werin.

Mirazekî min heye, wekî hate sêrî, ezê hespa jî wera bistînim, wekî hûn wî eşyayê xwe biguhêzin malê xwe.

Sê hev radivin mêrikira diçin şeherê Ûsibê qewaçî, şeherê Bexdayê, kêderê Ûsivê qewaçî dimîne. Dipirsin cîyê Ûsivî qewaçî. Cava wî didin, divên:

-Flan kûçê xêretxanê bela dike, dide kesîva- kûsîva.

Ewana diçine cem Ûsivê qewaçî. Ew jî qawê dixun, lê Ûsivê qewaçî kesekî mêvan xweynake. Evaya gelekî ber digere, wekî here mala wî, ew nahêle.

Ûsivê qewaçî diçe mala xwe û mêrikê belengaz pey diçe, kincê xwe diguhêze, diçe dikeve nav avê û tê ber derê Ûsivê qewaçî. Gelekî tewaqe dike, gelekî lava dike û rîya xwedê lê dibire:

- Ez guneme derî li min veke.

Ûsivê qewaçî derî vedike. Cîyê wîya datîne ber tendûrê. Mêrik radizê. Ûsivê qewaçî dora cîyê belengaz ar direşîne, wekî çi bike, belengaz nizanbe. Lê belengaz hişyar bûye. Ûsivê qewaçî radibe qamçîyê xwe hiltîne, derîkî vedike û dikeve hundur. Belengaz, ew jî radibe dide pey diçe ber dêrî xwe ditelîne. Lêdinhêre wekî meymûnek grêdaî bûye û kulfeteke belengaz. Ûsivê qewaçî meymûnê dukute, dide ber qamçîya û vedigerê ser wê kulfetê, pê şa dibe, dixweze vegere. Belengaz pêşya wîya vedigere dikeve nav cîya, wekî ew nevîne. Gava Ûsivê qawaçî tê dinhêre, wekî nav cîyê xwe derketîyê, ar xrav kirîye (wî çaxî jî hevalê belengaz ber dêrî sekinî bûne. Ewî wanra gotibû, " wexta dengê min hat, hûn werine hundur, wekî hûn neyên, wê min bikuje").

Hêrs dikeve, şûrê xwe hiltîne dixweze bikuje, belengaz dike qarîn.Gava dike qarîn, ew hevalê wî diçine hundur û îd newêre bikuje.

Belengaz dibêje hevalê xwe:

- Hûn îdî herin, wekî kuştina min hebe destê vî merîye.

Hevalê wî dertên û ew dimîne cem Ûsivê qewaçî. Dibêje:

- Tuyê mrazê min bikî, tuyê serhatîya xwe mira bêjî.

Ûsivê qewaçî dibêje:

- Kîngê te mirazê min kir, ezê jî mirazê te bikim.

Belengaz jêra dibêje, divê:

- Wekî usane tu bide qamçîyê xwe, here meymûnê bukute û ezê jî bidim şûrê xwe bêm. Ezê bêjim:" Kuro, çima, meymûn bêxaye?Ez xayê wême. Wî çaxî ezê şûr hildim ser te, tu qest xwe bavêje erdê, ezê meymûnêra bêjim: - Ez xayê teme.

Û wî çaxî belengaz dibêje:

- Ezê meymûnê şîretkim, bra dua bike, wekî jinik rabe mîna berê bê û bira jinik dua bike, meymûn jî bive merî û emê paşê meymûnê bukujin.

Usa jî dikin. Dua dike, jinik radive serxwe û jinik jî dua dike, meymûn jî dibe merî. Meymûnê dixapînin, paşê dikujin.

Wexta meymûnê dikujin Ûsivê qewaçî digîje mirazê xwe, bona wê yekê ew jina Ûsivê qewaçî bû. Meymûnê nifir kiribû, wekî ew usa belengaz bûbû. Wexta jinikê dua kir, çevê ewê kor sax bûn.

Belengaz vegerya hat, hevalê xwera hesp stendin, dan wana ew çûn. Zivirî hate şeherê Bexdayê cem ewê kor. Nîvê rê ewê kor hate pêşîyê got:

- Te mirazê min kir, çevê min sax bûn, were çiqa xizne dixwezîzêr û zîv xwera bive.

Belengazê te rabû, xwera qedera zêr barkir û zivirî ber bi mala xwe, nava neferê xwe.

Ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî herin mirazê xwe şabin.

## 33. QENCÎ -QENCÎYA TÎNE

Hebû tunebû dewletîk hebû. Hespê dewletî zef bedew bû. Dewletî çiqa roj bû diçû hespê xwe didît, paşê diçû malê. Rojekê jina wî dibêje:

- Hela were minra bêje çika tu min zef hiz dikî, yan hespê?

Dewletî dibêje: - Evda Xwedê, hesp hestûkî hereme, ezê çawa hespê ser tera bigirim?

Jin dibê: - Na, sibê hespê xwe bişîne meydanê, çika bahê hespê te çiqa radibe?

Dewletî dike- nake xwe lê xilas nake. Gazî xulam dike, dibê:

- Were evî hespê min zîn, gemke, bive rêva bêje: "Ez vî hespî difroşim". Kê çiqa da tu deh zêra zêdeke, belkî nekirin, çika bahê wî çiqas dertê.

Xulam heta êvarê hespê digerîne. Bahê hespê dertê sî zêr.

Jina dewletî xwe dixemlîne, çevê xwe kil dide, zêra dide ber enya xwe, kofîê dide serê xwe, dide pêşya xulam diçine meydanê. Lê dewletî dibêje xulam:

- Çiqa zêra didine te, tu jina min nefroşî, çika bahê wê çi dertê?

Xulam jinê dide pêşya xwe û rêda dike gazî:

- Ez vê jinê difroşim!

Bazirganbaşîk tê nêzîk, dibê:

- Qurba, tu rast difroşî?

Xulam dibê:- Belê.

Bazirganbaşî dibê:- Bahê wê çîyê?

Xulam dibê: - Bahê wê sî zêr.

Bazirganbaşî dîna xwe didê, kincê jinikê xwe kirne hêjayî pêcnî zêrîye. Wexta xulam dibê- sî zêr, bazirganbaşî derdixe sîûpênc zêra didê, jinê dêst digre. Xulam dibê:

- Ez nafroşim, bahê wêya çil zêre.

Bazirganbaşî pênc zêra jî didê. Xulam dîsa poşman dibe, pêncî zêrî dixweze. Bazirganbaşî tepekê dide nava çeva, xulam dixeriqe, dikeve. Bazirganbaşî jinê hiltîne, dikeve gemyê ber bi şeherê xwe diçe.

Bazirganbaşî birê Qesavî Comerde. Gesavî Comerd rojê pênc dewara şerjê dike, saxî xêra xwe bela dike.

Wextekê xulam ser xada tê, dîna xwe didê jin ne wire. Vedigere diçe mal. Dewletî dibê:

- Xulam, ka jina min?

Xulam ça hatibû serê wî jêra dibêje. Dewletî dibêje:

- Xulam, çil rojî min sebir bike, herkê ez hatim gihîştime mala xwe, xa hatim, herkê nehatim, xa mala min te helalbe.

Dewletî sîyar dibe diçe. Diçe şeherê Qesavî Comerd. Dinhêre ber bûdkekê cimet xwera goşt dikşîne dibe. Ew xwera dûr disene wana dinhêre. Heta êvarê wira disene. Wexta goşt xilaz dibe Qesavî Comerd dûrva wîya dibîne, dibêje xulamê xwe:

- Here bêje merîyê han, bira bê xwera goşt bibe.

Xulam diçe cem wî merî, dibêje:

- Were xwera goşt bibe.

Dewletî dibê: - Ez zef razîme, mala min ne vî şeherîdane, ez mêvanim.

Xulam vedigere dibê: - Hal- hewal eve.

Qesavî Comerd xwexa diçe pey wî. Silavê didê, dibê:

- Tu ji kîderêyî?

Dewletî dibêje: - Ez şeherê bazirganbaşîda dimînim.

Qesavî Comerd wîya dibe mal. Xwera gelekî xeber didin. Qesavî Comerd dipirse menya hatina wî. Ew yek- yek Comerdra gilî dike.

Qesavî Comerd dibêje:

- Qurba, tu nanê xwe buxe, ezê jina te vê sehetê bînim.

Comerd dibêje xulamê xwe, dibê:

- Here mala birê min, bêjêda, bê: "Qesavî Comerd digot, ew jina anîye bira bişîne, mêrê wê hatîye bibe".

Xulam diçe cem birê Qesavî Comerd, gilyê Qesavî Comerd jêra dibêje. Ew fîncana ber xwe kewkî xulam dike, serê xulam dişkêne.

- Min jin, - dibê, - te û Qesavî Comerdra nanîye, wekî ez bidim.

Xulam vedigere tê. Qesavî Comerd wexta dîna xwe dide xulam, serê xulam şkestîye, dî- îda lê napirse, çika jin çima nanîye? Kere ker

radibe dewletî dide pey xwe, şûrê xwe hiltîne, ber bi mala birê xwe diçe. Diçe mala birê xwe, birê wî ber wan disene. Ne selamê didine birê Qesav, ne jî lê dipirse, çika jin çima neşandîye. Şûrê xwe ber xwe dikşîne, serê birê xwe difirîne, jina dewletî didê, dibê:

- Qurba, de hilde here şeherê xwe.

Qesavî Comerd dîsa dest bi goşt belakirinê dike. Çend sal dikevine ortê, Qesavî Comerd kesîb dibe, tenê nivîna wî şevê dimîne. Rojekê Comerd dibêje jina xwe:

- Mera şerme, wekî em vî şeherîda pars bikin, were em koçkin herin şeherekî maîn.

Radibin nivînê xwe û zarê xwe hiltînin ber bi şeherêkî diçin. Dîna xwe didinê ber derê malekê cimet top bûye. Qesavî Comerd dibêje jina xwe:

- Hûn virabin, ezê xwe wê cimetê bigrim herim, çika îdarekê naynim?

Wexta diçe nava cimetê, dewletî wîya nas dike, lê ew dewletî nas nake. Dewletî dibêje xulamê xwe:

- Evî merivî bibine ser texte.

Qesavî Comerd parî nan duxe, parîyê duda devra dinhêre. Dewletî dibêjê:

- Tu çima nanê xwe rehet naxwî, dibe hevalê te hebin?

Qesavî Comerd dibê: - Belê, jin, zyarê min dera hanin.

Dewletî xulamê xwe dişîne jin, zyarê wî tîne ser texte. Nanê xwe dixun û radibin wekî herin. Dewletî dibêje:

- Hûnê kuda herin?

Qesavî Comerd dibê: - Ezê herim çika xwera xanîkî nagirim bikevimê?

Dewletî divê: - Cîkîda neçe, ezê tera xanî destxim.

Wana faytona xwe dike dibe herama xwe. Defa hewarê dixe, cimet gişk top dibe, radibe dibêje:

- Cimet, eva birê mine, ketîye tengasyê. Herekê alîyê xweda çi jêra tînin, bînin.

Yek çêlekê pêşkêş didê, yek niîvîna, yek pez.

Halê Qesavî Comerd dibe mîna halê dewletî. Çend meh derbaz dibe. Rojekê kurê dewletî diçe mala Qesavî Comerd. Gelekî xwera xeber didin, kurê dewletî xewra diçe. Jina Qesavî Comerd mîna kurê xwe gede hiz dikir, destê xwe da ber serê gede, ew jî xwera raza. Qesabî Comerd dêrîda tê, dîna xwe dide jina wî, xortek tevayî razane.

Soranyê hiltîne dide ser zikê gede, xwe jorda davê ser, soranî çar tilya erdêda diçe. Gede dimire. Jina Qesavî Comerd dike qîrînî.

- Te mala xwe xirab kir, kurê dewletî kuşt!

Şev jinik radibe diçe mala dewletî, dewletî hişyar dike, jêra her tişt gilî dike.

Dewletî dibê: - Herin cinyazê wî bînin extexanê, sibê rabin bêjin: "Hespa kurê dewletî xistîye kuştîye".

Radibin cinyazê gede tînin datînine extexanê û sibê gilî dikin, wekî hespa kurê dewletî kuştîye. Cimet kurê dewletî heq dikin.

Çend meh dikevine ortê, jina Qesavî Comerd dibêje mêrê xwe:

- Mêrik, du kurê me hene, lê kurê dewletî tunene, were em kurekî xwe bibin bira dewletî bikuje, belkî dilê wî rihet dibe.

Radibin, kurê xwe hiltînin diçine mala dewletî, dibêjin:

- Dewletî, evî kurê me bikuje, belkî dilê te rihet dibe.

Dewletî dibêje: - Hûn herin, ezê kurê we bikujim, wekî dengê wî nekeve guhê we.

De, bavê gede vedigerin mala xwe. Dewletî gazî merîkî şeherê xwe dike û kurê Qesavî Comerd didê wekî xweyke.

Çend meh dikeve ortê, kurê dinê jî dibin, wekî dewletî bikuje. Lê dewletî nakuje û dîsa dide merîkî, wekî xweykin.

Wextekê wetenê Qesavî Comerd dikeve bîrê. Ewana îzna xwe dewletî dixwezin, wekî vegerine şeherê xwe. Dewletî dibê:

- Deh roj sebir bikin, paşê herin.

Dewletî gazî wan merîyê kurê Qesavî Comerd xay kirine dike û her kurekî qîzeke xwe dide. Tê wextê rêkirina Qesavî Comerd. Dewletî gazî Qesavî Comerd dike, herdu kurê wî nîşan didê, dibê:

- Tu van xorta nas dikî?

Qasavî Comerd dibê: - Na.

Dewletî dibê: - Ev xortana kurê tene. Her kurekî -min qîzeke xwe dayê, bimbarek pîrozbe. - Wî çaxî dewletî jî şirovedike çi qencî Qesavî Comerd jêra kiribû û dibêje:

- Qencî - qencîya tîne, minet vê ortê tine.

Ewana diçine dest- rûyê hev, îzna xwe dixwezin. Qesavî Comerd kurê xwe û bûkêd xwe hildide ber bi şeherê xwe diçe.

De ew çûn herin mirazê xwe şabin...De hûn jî herin mirazê xwe şabin.

## 34. GÊLA XERÎB

Şê ferx bû maşoqê Gêla xerîb. Ji rohilat çû roava bû maşoqê wê. Sê brê Şê ferx hebûn: Sicadîn, Nasirdîn, Meleferxedîn.

Çû cem brê xwe, go:- Gelî bra!Go: - Çîye?

Go: - Gerek hûn herin Gêla xerîb minra bînin. Wekî hûn neynin, bratîê wera nakim.

Hersê bra syarbûn ji roava çûne rohilat, Gêla xerîb ji Ferxra anîn.

Anîn. Serşirîka pexîl jê hilanîn.

Serşirîka şêwrek danîn, go:

- Ewê rû - rûmetê me nava tî- têriza hilanî.

Hersê xûşk destê hev girtin çûne cem girtîê Şamê.

Şkyatê Şê ferxê Adîya kirin pêye.
Go: - Merîkî bişîne bra bêye.
Şande pey anî.
Wê çil şevî bavê zîndanêye.
Heta ew bê, ewê îcatekê bînin serê Xerîbêye.
Ew hat, Şê ferx birin,
Birine cem girtîê Şamê,
Şê ferx girtin avîtine zîndanê.
Wî çaxî Gêlê go:
- Çil şevê me nabûye temame,
Girtîê Şamê çima şandiîye pey Şê ferx xeber û cabe,
Ez nizanim çi pirs û hewale?
Xerîbê go:
- Weyla min xerîbê, dil bi kulê, dil bi kovanê,
Min daye orta xwe û welatê bavê xwe-
Deşt û zozan, çya û banî:
Evan serşirîka çi ecêbek serê min anî.
Xerîbê go:
- Weyla min xerîbê, xerîbeke tenê,
Kesek tune kêleka min rûnî- minra bike gilî û gotinê.
Ezê ne saxim,
Hatîye ser min ferwara mirinê.
Gêla xerîb nexweş bû, kete nava nvînê.
Ser xwe dike hezn, girî, şînê:
"Çawa çevê xwe digerînim,
Kesî dora xwe navînim omda êşanê lêzim xûnê
Çil şevê min temame".

Ew tî bû. Şirîk serra sekinî bû, ewê zanibû avê bixweze, şirîkê jerê bidinêda. Av xwest.

"Ezê bixwezim tase ava sare".
Ewê gava tas ava ser dixweste,
Wan şirîka fîncaneke jerê çêkir, da deste.
Xerîb çevê xwe vîalî wîalî digerîne,
"Saxbûna min, lazimî min nîne",
Tasa jerê digire weldigerîne,
"Aw zarê min sebebê mera nemîne".
Sê roja çû havînê (sê roja sax ma),
Ser xwe dikim hezn, girî, şînê,
Weyla, go, min cahilê, min caxê,
Ezê çawa bibim mêvanê qebristanê?".
(Emirê xwe da te mir).
Birin nava mezel heqkirin.
Çil şevê Şê ferxê Adîya cem girtîê Şamê temam bûye.
Hingî girtîê Şamê îzina wî daye-
Çika pey te halê Gêla xerîbê çîyê?
Şê ferx hat, go:
- Ezê hîvya xwe têkime yek- yekmîne,
Av û zarê me erdê nemîne,
Çawa nehîşt bext û mraz hev bivîne.
Go, bera ad, qrar, şedebe,
Rênga wan bira, wê malê, wan serşirîka pêşya min neve.
Şê ferxê Adîya çawa çevê belek ji hev hiltîne,
Carê yek tas çevê belek hêsira dibarîne.
"Weylê, go, min sêfîlî, min sergedanî,
Min bêxwey, bê xudanî",
Ketîye serê çya û banyane.
Şê ferx, gava çevê xwe digerîne,
Kerî pez wê li çyaê blind divîne.
Go: "Şvano, slam".
Go: "Elêkim slam", - şvan slava wî elêk vedaye,
Go: "Şvano, tu bidî xatirê yekê, yekmîne,
Min te gelek reca, dîlek û hîvîye,
Were bêje min xebera rastîye,
Eva çil şevê mine çûme,
Bêje - pey min halê Xerîba min çîye?"

Şvan go: - Şêx ferxo,
Go, min hasê neke mala xudê,
Navê rebîye, hey Şê ferxê Adyano,
Tu ketî serê çya û banyano,
Tu ketî pey salix - sûlixê xerîbano.
Şvan go: - Şê ferxo,
Bese min hasêkî mala xudê, navê rebîye,
Bajo, here çika halê Xerîba te çîye?
Şvan go: - Ne hewcê xudêye- meriv bêje xerîba pirsa rastîye,
Here binhêre halê Xerîba te çîye?
Şê ferx go: - Dîsa ad, qrar, şede be,
Renga wan bra, wê malê, wan serşirîka pêşya min neve.
Go: - Weylê min sêfîlî, min sergedanî,
Ketî serê çya û banyanî,
Ketî pey salix û sûlixê xerîbanî.
Şê ferxê çevê xwe digerîne -
Gavanekî di himberî xwe divîne,
Dajo cem gavîne.
Go: - Gavano, slam.
Gavan slam elêk veda, - hatî ser sera, herdu çeva.
Go: - Gavano, min te gele reca, dîlek û hîvîye,
Çika were bêje min xebera rastîye,
Eva çil şevê min ez çûme -
Çika pey min halê Xerîba min çîye?
Gavan go: - Ez wîkim îlahîye,
Bese min hasêke mala xudê, navê rebîye,
Bajo here bizanbe,
Hela pey te halê Xerîba te çîye?
Gavan go: - Şê ferxo,
Ketî serê çya û banyano,
Ketî pey salix û sûlixê xerîbano,
Ew jî gilîê rast nego.
Şê ferx go: - Mizgînîye, çîye, ez bidimê?
Şê ferx go: - Ezê hîvya xwe têxime yekê yekmîne,
Av û zarê me sebabê mera nemîne,
Çawa nehîşt bext û mraz hev bivîne?
Şê Ferx çevê xwe digerîne,
Golikvanekî devê rê divîne

Şê Ferx dajo cem golikvîne,
Slavê dide golikvîne,
Divê: - Were bêje xebera rastîye,
Eva çil şevê min ez çûme,
Çika wera bêje min - halê Xerîba min çîye?
Golikvan go: - Şê Ferxo, keremke peyave erdêye,
Te pirsa rastî ji min divêye,
Rastî heye, ji boy navê Xudêye.
Go: - Şê Ferx, sê mehê havînê -
Gêla Xerîb nexweş ket nava nivînê,
Çevê xwe digerîne omid êşana dora xwe navîne.
Go, Şê Ferx, çil şevê Xerîbê temame,
Navê emekê gaê cot -
Tase avê kanyane ser lê herame.
Xerîb çevê xwe wîalî- wîalî digerîne,
Omid êşana dora xwe navîne:
"Saxbûna min lazinî min nîne".
Gêla xerîb dixwest tase ava sare,
Ewan serşirîka çêkiribû îstekanek fîncana jere,
Girtin dane destane.
Dîsa omid êşana dora xwe navîne,
Tasê digire weldigerîne.
Erê, Şê Ferxo, sê roj çûne ji havîne,
Ser xwe dike hezin, girî, şîne,
Welle, go, îro sê roje bûye mêvanê goristîne.
Qudûmê Şê Ferx şkestin, dîsa sond xar, go:
-Rênga wan bra, wê malê,
Wan serşirêka pêşya min neve,
Şê ferx dajo melûl- melûl nava qebiristîne.
Reca û dîleka dike dergevîne,
- Dergevano, derge ber min hilîne,
Dîndara Xerîba xwe bivînim.
Dergevan go: - Ez wîkim yekê yekmîne,
Heta neve hizkirina yekê jorîne,
Dîndara Xerîba xwe nevînî.
Rebê min kir ferware,
Cbrahîl kirîye xare,
"Bide Gêla xerîb zman û zare,

Wê bide destê Şê Ferxê Adîye xeber û cabe".
Şirqîn kete qebiristîne,
Şê Ferxo çevê xwe ji hev hiltîne,
Qesrek spî himberê xwe divîne,
Dîndara Xerîba xwe têda divîne.
Şê Ferxo go: - Gêlê, slav!
- Sed car slav, - Gêlê slava wî elêk veda,
Hatî ser serê min, herdu çeve.
Herê, go, Şê Ferxê Adyano,
Tu ketî pey pirs - hewalê xerîbano,
Go: - Gêlê, suxunê!
Bese bêje min vî gilî, vê gotinê,
Ne te cahile cane, ne wextê te û mirinê?
-Herê, go, Şê Ferxo!
Çil şevê min temame,
Navê emekê cot, tase ava sar min herame,
Go, min dixweste tasa ava kanyane sare,
Ewan dabû destê min fîncanek jere,
Min jî kerba girtibû xare,
Go, Şê Ferxo, sê rojê havînê -
Ez ketime nava nivînê,
Weyla min cahilê, min canê,
Îro sê roje bûme mêvanê qebirstînê.
Şê Ferx go: - Gêlê, ji Suxunê,
Bese bêje min vî gilî, vê gotinê,
Te cahile can, ne wextê te mirinê.
Go: - Şê Ferxo, here, bera tu xweş bî,
Sorguleke nava gulane geşbî.
Axirsongî cîmiskenê min ax û ferşbî...
Dergevana derge ber dadan,
Sê ferx hatîye sekinîye nava mezelekî sikî sarda,
Borî mabû destada,
Dîna xwe dayê - qesra çi, Xerîba çi?
Şê Ferx go: - Ad û qrar be,
Rênga wan bra, wê malê, wan serşirîka pêşya min neve.
Hêja zan bû, Xerîb mirîye.
Şê Ferx divê: - Weylo, dilo, sêfîlo, jaro,
Dil bi kulî braîndaro,

Heylo dilo, cîê kulan û derdano,
Welatê xerîba bêxay, bêxudano, sêfîlo, jaro.
Şê Ferx wê diçe, xwera melûl borê xwe syar bûye,
Ketîye rê diçe.
Kanîkê li devê rê dîye,
Çar horîê bejnzirav ser kanîê danîye.
Şê Ferx dajo ser kanîye,
Çar gêlê bejnzirav wê dîye.
Şê Ferx horîya dike slave,
Horya slav elêkvedidaye:
"Hatî ser serê me, herdu çevane,
Hey Şê Ferxê Adyane".

Şê Ferxo go: "Eva çawa navê min zanin, ez navê wan nizanim?- Go, ez çi bêjim, - duşurmîş bû xwera, go:

- Gelî horîya, çi kanîya li ber ava,
Min ser dîye çar horîê bejnzirave,
Ez xerîbim, ez nizanim we herçar gela çi nave?
Gêla mezin cav didaye:

Go:-Navê min Xate Fira, - çû welatê Bewalate, çû çya ket.

Lê navê min rêzanava dihate.

Gêla dinê go: - Navê xaye, mehbûbim çiqa cî û dinyaye, - ew jî firî çû, - navê min rêzanava xuyaye.

Dudu çûn, dudu man.

Gêla din go: - Navê min Fate, mehbûbim çiqa cî - welate, navê min rêzanava dihate. Firî çû welatê Berwelat. Sê çûn, ma yek.

Gêla din go: - Navê min Hebîbe,
Herçê bigire qedrê xelqê xerîbê,
Bandê jêra hebe risq û nisîbe.
Gêlê go: - Şê Ferx, keremke em herin nava reza, -
Milê wî girt, dilê wî kirî, tevda gulan, baxçan, qeza,
Rojê sedî bivînî dîsa mehbet ezim,
Ez him gulim, him baxçeme.
Ez pirsê ezîz melik ferxedînim,
Ez maşoqim hatime dîndara te bivînim,
Xwe ez Gêla Xerîb nînim.
Şê Ferxo go: - Weylê aqil, çil sewdaê,
Te çima ez kirime vê xetê, vê belaê.
Hevalê te çûne, tu çira vira mayî?

Go: - Herê Şê Ferxo!
Ezim azga pezê kûvî,
Serê min hilnaê zêr û zîvî.
Rojê hezarê mînanî te ber min dikin hîvî.
Hingê Şê Ferx go: - Gêlê, ez canekî pir xişmetim,
Ez ax û topraxê mala bavê xwe derketim
Notla tevîk baranê semêtê te diketim.
Go: - Şê Ferxo, ezê bivim kevotkeke perxumarî,
Ezê bifirim herim ezmanê pîkî terî,
Kese min neke tuçare,
Xênî yekê cebare.
Hingê Şê Ferx cav didaye, go:
- Gêlê, ez divime kevotkekî perkurim,
Hewl- qewata ezê bifirim,
Ezê nîvekê ezmîn rê te dabirim.
Ewê Gêlê go: - Ez bivime mere,
Ezê heft tebekê erdêda herime xare,
Kese min nake tu çare,
Xênî yekê cebare.
Şê Ferx got: - Ezê mergira tera kim,
Te çarde tevekê erdêda xarkim.
Hewl- qewata Xudê, ezê te xwera hevalkim,
Tê kuda ber destê min xilazbî?
Horîê go: - Bejna min kel hêkim jine,
Hed û dused naçine bine,
Ew kilît mftê divêjî - destê mala bavê mine.
Şê Ferx hingê go:
- Bejna te kela hindavda,
Ez şûrekî heqîê pêva darda,
Ew klît -mftê tu divêjî-
Ne destê mala bavê tedane,
Destê mala bavê mindane.
- Şê Ferx, - Gêlê go, -
Ezê bivim nexweşekî pir grane,
Ezê têkevime nava cî û belgîyane,
Cîê bivine ber sîya darane,
Lêzim - xêzimê bên: - Nexweşo, çi dermane?
Ezê jî bêjim: - Sêva sor dermane.

Sêva sor darê anî xar, ser sîngê horîê danî.
Horîê go: - Şê Ferxo, were here herça te got, ew bes,
Klît mfta bîne, veke zer memikê atlas.
Gava klît mftê anî,
Gava ser memikê danî,
Binda nihêrî hulekî reşî nûranî.
Şê Ferx go: - Keremke em herin dîwana mêrane,
Ez û tu daynin dewake grane,
Çika her pênc ferzê heq kîjane.
Dest avîtê kire brê xwe...
Fêrza giran biratîye, birê axîretê...

## 35. ROSTEMÎ ZAL

Efendim, carekê cara, çîrok hate zara, reme li dê û bavê hazir û guhdara.

- Yê te jî!

Hebû, tunebû padşak hebû, navê wî Rostemî Zalbû. Şeherek hebû, lê zyak bîter bû, go:

- Çawakin, çawa nekin, em bişînin Rostemî Zal belkî bê, îlacekê bike.

Du merîya dişînin: Rostemî ne male, çûne cem Zal, cem bavê Rostem. Zal duşurmîş bû. Al hat, nevîê wî, go:

- Kalê, çima duşurmîş divî?

Go: - Ez çawakim? Lo bavê te mal xeydîye çûye, îro jî cmaet hatîye seva min, ez jî kalim, nikarim herim.

Go: - Kalê can, ezê herim.

Go: - Lawo, tu nikarî. Dikarî şûrê bavê te wê kalênda: te kişand, derxist - tê herî.

Wexta Al dest avîtê, nola çirpîkê kaşkir, derxist. Zal gazî pelewanê xwe kir, kîjanî qoçax bû, daê, ew Alva çûn.

Çûne nêzîkî şeher, devê gelîkî, herd xorta, go:

- Zyaê nha bê, hûn vra bisekinin, heta zya tê.

Al û pêlewenva sekinîn. Wextekê lênihêrî zya jorda hat. Pelewan revî, Al sekinî. Go:

- Kuştina mala Zalê heye, reva mala Zalê tuneye.

Destekî xwe da devê şûr, destekî xwe da poça şûr kuta devê zyê. Usa lêda poçêva derxist, xet- xetî kir. Guhê zyê jêkir, kire cêva xwe. Pelewan, wexta Al zyê kuşt, jorda hat, gote Al:

- Bide min wan guha.

Al gote, go: - Nadim!

Go: - Nadî, emê hevxin.

Al go: - Qrarve, em herine cem kalikê xwe, ezê bêjim - min nekuştîye, pelewan kuştîye.

Pelewan go:- Na, yan gere em hevxin, yan gere bidî min.

Al nedaêda. Al û pelewan hevxistin. Al cahil, zar bû, pelewan qrid bû. Wexta destê xwe namila Al dixist, hercar du kîlo goşt lê radikir. Al girt daêda, go:

- Bra welatê bavê min- min heramve.

Pelewan guh hildan, çû. Gote Zal, go:

- Ne tuvî, ne jî nevîê teve. Çawa zya hat, nevîê te biecî, mir.

Zal got:- Bra nevî qurbana teve, wekî te hêsîrê wî şeherî xlazkirîye. Em bînine ser Al.

Dermanê hekîmê berîda ser brînê xwe, nava du rojada qencbû. Terkeserî dinê bû. Çû çyakî, rê çadireke şpî lêdaye, wê kulfeteke têdane. Go:- Roj xêra te, evda Xwedê!

Go: - Ser çevara hatî, Al, - kulfetê Al naskir.

Go: - Evda Xwedê, çi kulfetî?

Go: - Ez qîza flan paşayîme, bavê min ez dame gedê kurê apê min, kerê zncîrkoj: dilê min têda tune. Boma wê yekê salê bharê min tîne vira, paîzê tê min dive.

Al û keçik wira hev distînin.

Mehekê, hergê deh rojve -wêderê dimînin. Keçik cavê dişîne kerê zncîrkujra. Kerê zncîrkuj şabûna lingê wî nagihîje erdê. Tê wekî dilketîê xwe bîne gund, vegerîne bîne gund. Keçik yaşîkekê(qutî) çêdike, Al dike yaşîkê, o hûr- mûrê din tev dipêçe, dide pişta kerê zncîrkuj. Kerê zncîrkuj wexta pişt dike tê ser cewêra banz dide, Al dikene. "Hey, divê, nepaka nepak, te ser minra yar girtine". Tîne koçk sera bavê xweda, nava cmetêda datîne, divê:

- Ne tuvî,ne jî padşatya teve, qîza te pey nepakîê geryaye, eva jî yarê wî.

Al digirin, divin kela zîndanê. Keçikê mal derdixin. Keçik postekî evdila xwe dike, nan berav dike, Al kela zîndanêda xwey dike.

Mehek, du meh dîmîne, Al divê:

- Evda Xwedê, ezê bimirim, cavê bide mala me.

Keçik sivê radive, serê heft rya disene, dinhêre bazirganek tê. Divê:

- Xûşkê, dûr here, barê bazirganê min şûşeye, devê delîlê qolozvin, temamê bişkên. Çi te mraze, bêje - mrazê te bidine te.

Nemekê dide, divê: - Mrazê min ewe, evê kaxezê bidine mala Zalê.

Wexta bazirganbaşî kaxezê dixûne, divê:

- Xûşkê, qrarve, rya hedt roja têkime rojekê, mrazê te bînime sêrî.

Bazirganbaşî kaxazê dide destê Zal. Zal gava kaxezê divîne, wexta Alî xweşe rûbarê dnêye, cahvê dişîne Rostemra.

Gava cahvê didine Rostem, Rostem diçe cem axaê xwe, divê:

- Ez Rostemî Zalim.

Divê: - Xwedê malka te xravke, te çima ez gunekar kirim? Îsal çend sale tu bûyî minra rêncber, te ez gunekar kirim.

Go: - Heqê min te helalve, tê bibaxşînî, ez îdî va çûm.

Rostem hate mal, cem Zal, go:

- Ez çawa bikim: bi şer herim, yan bi qencî?

- Na, go, lawo, bi şer nave- bi qencî.

Rostem rabû bê glî, gotin, rabû, çû. Kêleka wî şeherî, êra Al têda girtî xêretxane vekir: Kîjan kesîb - kusîb hatin bê pere xwerin, çûn. Rojekê jina Al çû, wekî nan berevke, bîne bide Al kelêda. Cmetê gotêda, go:

- Kêleka şeher xêretxane vebûye: çû xarin, glî- gotin dixwezî here bîne bide girtîê xwe.

Gava keçik çû, Rostemî Zal çev keçikê ket, şkilê keçikê nihêrî, gote berdestîê xwe, go:

- Bûka min eve, xwerinê bidinêda, pey herin, çika eva kuda diçe.

Gava bûkê nan hilda, çû, Al gotêda:

- Bîna nanê mala bavê min tê.

Jinikê gotê, go:- Evdê Xwedê, mala bavê kîdere, ev der kîderê?

Go: - Eman, na, heq- neheq mala bavê min hatîye. Go, here xwe rind bixemilîne - bavê min wexta çev keve, bra bêje - eferim kurê minra, wekî seva vê kulfetê hatîye girtinê.

Bra keçik xwe bixemlîne, em bînine ser xevatçîê Rostemî Zal. Ewan go:- Bûka te ser flan kevirî kelê sekinî.

Rostemî Zal hat, Al ji kelê derxist. Duşurmîşbû, go: "Ez herim, xelqê bêje Rostemî Zal ne mêrbû". Al kere -ker hilda bir, - "Eseî, go, ezê sivê ravime şêr". Elametî da padşê. Sivê xû dey li şêr kirin.

- Bavo, çi serê me kirîye, eva hanê kirîye.

Rostemî Zal dey li wî kir. Kerê zncîrkuj sekinî. Rostemî Zal gihîştê, dey li hev xistinê kirin, gulaş girtin.

Heft ro, heft şeva nola şovê kotanê erd bin pîê wana radibû. Yekî yek altnedikir. Al gote jina xwe, go:

- Mala Zale bi tena merîya alt dike.

Gava keçik jorda hat, dest avîte dareke spingdarê, çend hevek teşkê xezûrê xweda, lêda:

- Ha, go, mala Zalê, mala Zalê jî eve, pêpenîê qaf terikîyo: îro heftê teye, tu hela têjkekîra ketî gulaşê.

Irinê Rostemî Zal radive, kerê zncîrkuj jorda gava tîne, derbekê erdê dixe, ruhê wî jê distîne.

Rostemî Zal vedigere bûka xwe, Al hiltîne, Xwedê oxirê bidê. Ber bi malê tên.

Gava cavê didine Zal, kalikê Al, divê:- Hat Rostem û Alva.

Digihîjine mal, gazî pelewan dike, divê:

- Pelewan, ne te digo zîya Ai kuştîye, Al dest xweda biecîye?Têjikê mala Zelê gere nebiecin.

Al yeko- yek gote kalikê xwe:

- Wexta em çûn pelewan revî, zya min kuşt. Ez zar bûm, hate minra gulaşê, stara goşt ser min nehişt. Min girt guhê zyê daêda. Go, pelewan, raste?Go: - Raste!

Pelewan anîn kapek avîtine stu, paşya faytonêva girêdan, hela hê dajo, diçe...

Ew gihîştine mrazê xwe, hûn jî bigihîjin mrazê xwe.

- Mrazê te jî kurê teve, zef razîme.

## 36. HÊMZÊ PELEWAN

Wextekê Hemze pelewan caihl bû. Çû go:

- Ezê herim şerê Enterê qop.

Lê Enter navê Hemzê bihîstibû. Xewna şeva gere mrazê wî biba, bi destê Hemze mrazê Enter biba.

Hemzê lêdide diçe, dîna xwe dide, rastî pîrekê tê. Pîrê hine nan raxistibû erdê. Çaxê Hemze çû, bi qewata Hemze ew nanê wê - çawa ku bak rave, rête nava xwelîê. Jinikê go:

- Axir min çi kiribû, go, ez belengaz- eva nana dabû xwera hev, minê bibhêra bona îdara xwe. Here, belkî tu tesmîlî Xudêbî, rastî Entar bêyî, Entar bela te bide.

Hemze duşurmîş bû, go: "Canim, ez Hemzevim, pelewan ser minra tunebûn: eva jinikê, ev ten minda- "Belkî tu ber gurzê Entar kevî?" Careke din Hemze rabû, gote jinikê:

- Ez hîvî te dikim, tu cîê Entae minra bêjî. Go, ha tera kulme zêr, pîrê, îdara xwe bike. Lê cîê Entar minra bêje.

Jinikê gote Hemze, go:- Çîyakî mîna vî çîyaê Elegezê, rêk têra zirav tê, bikeve wê rê here: wêderê cîê Entarî qope, cîê wî wêderêye.

Xwetirê xwe jinikê xwest, go:

- Ezê îda herim. - Hemze rêket, çû.

Çû dîna xwe da, golek hebû - wê golêda Enter dikeve avê. Ewê usa bûz girtibû, qasî vî texteî qalim. Enter wê bûzê ker dike dewsa sabûnê canê xwe dişo. Hemze duşurmîş bû, go:

Hey mala min xrav nebîyo, haqa navê min hebû, ev çawa pelewane, wekî zivistanê ketîye ava sar, bi bûzê dewsa sabûnê canê xwe dişo? - Hemze go, go: "Yeqîn ez gurzekî li vîxim, eva gere bive xwelî, bisene". Ewî gava gurz hilda, bîne li Enterxe, Entar destê xwe avîtê gurz hema li hewa girt. Enter nava avêda qe dengê xwe nekir.

Go: - Ay benî adem, tu çira hatî şerê min? Îsal heft salê mine ez qaçax bûme ji bona Mêrînîgar. Mêrînîgar jine, dilketya mine: bona wêderê padşa ez aksor kirime, hatime vî çîyaî. Lê tu nizam tu kêyî - nizan Rostemê Zalî, yanê Qereman Qatilî, yanê Hemze pelewan bi xewna şeva? Xewna şeva min dîtîye - mrazê min bi destê wî bive.

Hemze duşurmîş bû, go: "Hey mala min xravneve, wexta mrazê wî bi destê minve, ev çawa pelewane, ketîye avê?Qewata wî ya min zeftire. - Hemze careke dinê go, go:- Gere ez vî sax nehêlim". Hemze gurzekî dinê anî lêxe hê Entar nava avêda. Entar dîsa destê xwe bilind kir, girt, qet nehîşt bikeve erdê gurz. Entar avê derket, gihîşte Hemze, dest pê Hemze pê bendê hespê xwe girêda û qerpûza zînva darda kir, xwera çû rehet kete avê. Têr ava xwe li xwe kir û ji avê derket, hat gote Hemzê:

- Ay benî ademê xwedê, tu çi ji min dixwezî? Ez hatim qaçaxbûm, derketim serê vî çîyaî. Ez nizanimêda tu Rostemê Zalî, yanê Qereman Qatilî, yanê jî Hemze pelewanî? Mrazê min bi xewna miva gere bi destê Hemzeve.

Hemze duşurmîş bû ji bona navê xwe, go: "Ez çi bêjimê îja, ez girtîme îdî, go, eve gere ez bêjim".

Go: - Welle, ez xwe- xwe Hemzeme.

Entar got, go: - Wellê mala te xravbîê, te çira pêşda negote min, wexta min eva dereca tera kir?

Wêdere gihîşte Hemze, Hemze vekir, go:

- Mrazê min bi destê te, îsal heft salê mine, Mêrînîgar dergîstîya mine, padşa nade minda. Ez jî aksorkirime, qaçaxkirime - hatime serê vî çîyaî. De îja were, mrazê minê destê teve, ka tê çawa bikî?

Rabûn Enter, Hemze çûn. Çûne ba koçka Mêrînîgar.

Enter gote Hemze:- Eva cîê Mêrînîgare. Çil cot pelewan ber derê Mêrînîgare. De, go, çika tê çawa Mêrînîgar bînî, ez mrazê xwe şabim.

Entar, Hemze rabûn pêpelîng çêkirin. Enter gote Hemze, go:

- Bîne van sika, a di dîwarda bikute, em pêva hilkişin.

Hemze girt kevir hilda, ske da dîwêr li skê da. Bû gure -gure kêvir. Enter gote Hemze, go:- Tu çi dikî? Şeher me hesya - wê me bigirin, me bikujin. Go, de tu bide min, îja dora mine.

Entar ske da dîwêr, pê vî destê xweyî seqet, qop li skê dida, skê diçû cîê xwe digirt. De usa çiqa pêpelîng hebû, çêkirin. Çûne derketin qatê jorîn, ê hefta.

- A, go, eva cîê Mêrînîgare, - Enter gote Hemze, go:- Çil cot pelewan niha wêderê razaye, serê vê bîrê. Go, em gerekê van pelewana serê wan jêkin, bikujin, îja em herin belkî em Mêrînîgar derxin.

Ew pelewan kuştin. Çûne ber derê Mêrînîgar, Mêrînîgar derxistin, anîn hatin.

Hemze go: - De em gihîştine mrazê xwe. De were em bajon herin.

Entar gote Hemze:- Îsal heft salê mine, çawa ez çolê ketim, aksor bûm, îro ez gihîştime mrazê xwe. Heta şerekî nekim, ez naçim!

Hemze gotêda, go:- Entar, tu û Mêrînîgar herin dera han rûnên, a li jora han, go, ezê temê şerkim: go, tu mrazê xwe şave.

Entar Mêrînîgar rûniştin. De ew heft sal bû Entar ranezabû, serê xwe danî ser çoka Mêrînîgar, ew raza, xewra çû.

Eskerê şeherê şa derket, hat pey Entar, Hemze ketin. Hemze vegerya ber şêr. Enter razaye. Hemze gote Mêrînîgar:

- Nevî, go, tu dey li Entarkî. Gava Enter rabû ez li ber şerim: go, em haj xwe tunene. Go, bû nisla mala Zalê - tjî çevê me xûn dive, em îdî kesî nas nakin: dive ezê Enterxim, bra Entar pey min neê.

Entar serê xwe daye ser çoka Mêrînîgar, razaye. Mêrînîgar dinhêre şerê Hemze û eskerê şa. Mêrînîgar digirî. Hêsrek ji çevê Mêrînîgar dikeve ser sûretê Entar. Entar çevê xwe vedike, dîna xwe didê, divê:

- Aî, Mêrînîgar, tu çima usa bêbext bûyî? Îsal heft salê mine - dilê min teda hebû, tu îro poşman bûyî? Çawane?Ez hatime gihîştime mrazê xwe, tu poşman bûyî?

Mêrînîgar got, go:

- Entar can, ez poşman nînim, Go, carekê rave dîna xwe bide Hemze, şerê Hemze û eskerê şa. Xûnê da zengûê hespa.

Entar paşê xwe hisya:

- Te çira minra pêşda nedigot?

Entar rabû gurz û kemenê xwe grêda, dakete nava şêr.

Lê Hemze haj nîne, ne Entar hajê heye. Ewî alîkî lêda Enter, Hemze alîkîva lêda. Wextekî deng li şûrê Hemze ket. De wî çaxî herda hev nas nekir. Hemze lêda Enter kuşt. Idî esker tam kuta bû.

Hemze vegerya hat, go: "De ez herime bêjime Enter, em ravin herin". Hemze vegerya het bal Mêrînîgar, go:

- Ka Entar?

Go: - Ne Enter hate nava şêr?

Go: - Hey bêbext, ne min tera got - nehêle Entar pey min bê şêr. Deng bi şûrê min ketîye, êqîn bizanbe Entar kuştîye. De rave, em herin nava cinyaza, belkî em Entar bivînin.

Diçin nava cinyaza digerin, cinyazê Entar divînin, tînin tên. Ew, Mêrînîgar Entar çel dikin. Hemze divêje Mêrînîgar:

- Di wexta Entar çûye, min hûn gîhandin mrazê hev - mrazê we nebû. De were, tu hesavkî tu ji minra, ez jî bi tera.

Mêrînîgar got, go:

- Hemze, îsal heft sale dilê min Entarda heye, tu hinekî hêdî here, ez ser tirba Entar du gilîya bêjim, ezê dîsa werim, emê herin, îdî ezê kuda herim? Ezim - tuyî.

Hemze hinekî wêda çû.

Mêrînîgar lêda xwe kuşt: "Paşî Entar gere ez sax nemînim".

Hemze rabû pê şûrê xwe tirba herda temîz kola, herdu tev kirine tirbêda û cîda hişt, hat.

Ew îdî wêderê kutabû.

## 37. SÊ RÊWÎ

Rêwîk rêda çû. Xêlekê çû, hevalekî dinê jî hat gihîştê - bûn dudu. Xêleke dinê jî çûn, yekî dinê jî hat gihîştê, bûne sisya. Hersê gihîştine hevdu, yekî ji hevalê xwe pirsî, go:

- Hûnê herine ku?

Go: - Emê herine xwera bixebitin, herne xebatê!

Ewê jê pirsî, go:- Welle ez jî wê bême xebatê, ez jî wê wera bême xebatê.

Gelekî çûn, hindikî çûn, Xwedê zanibe, ketine nava mêşekî. Terî kete erdê. Li wêderê hevalekî go:

- Emê îşev li vira xwera bihêwirin.

Şîva xwe danîn, şîva xwe xarin. Hevalekî go:

- Qurba, go, em sê hevalin, dudu me razên, yek me qerewilîê bike. Wexta xewa wî hat, bra yekî me rake, yekî dinê bisekine.

Hevalê wî ji pêra razî bûn, go:-Brabe!

Dudu razan, yek hişyarma. Ewê hişyar ma, ew durgar bû: de şevê paîza drêj, ewî tevşûyê xwe derxist, breka xwe derxist, ji dar qîzek çêkir, pişta wê da darekê, sekinî. Merî hewas dike lê binhêre. Wexta xewa wî hat, gazî hevalê xwe kir, go:

- Qurba, rabe, îja dora teye, tu qerewilîê bike, îja ezê razêm.

Ew raza. Ew hevalê wî ku rabû, ew jî terzî bû, maşînya wî pêra bû. Pêş xweva, gava bala xwe dayê, merîk sekinîye. Ewlîn fikar kir, tirsya. Paşê rabû çû cem, lênihêrî ji dara qîzeke delal çêkirîye, go: "Hê, eva hevalê meyî oste, ev çê kirîye?"

Terzî go: "Welle ez jî wê deste kinc bibirim, lêkim". Terzî deste kinc birî, maşînya xwe dirû, lêkir. Qîzik usa delale, merî hewas dike lê binhêre. Gava xewa wî hat, deng li hevalê xweyî dinê kir, go:

- Qurba, îja tu rabe, qerewilîê bike.

Hevalê wî rabû, lênihêrî kulfetek himberî wî sekinîye, çû destê xwe avît, lênihêrî bû repîn ket, xwe- xwe ji xwera got: "Ewê dûrgar çêkirîye. Hevalê minî terzî kinc lêkirine, ez jî dua qebûlim. Ezê çok bidim, duaî Xwedayî xwe bikim, belkî Xwedê ruh berda berde". Çok da erdê, gelekî ebabetî Xwedê kir, bi hizkirina Xweda, Xwedê ruh berda berda. Bû qîzeke usa, merî ne bike, ne bixwe, lê binhêre.

Sibe safî bû, herdu hevalê wî rabûn, lênihêrîn, wekî qîzikek kêleka hevalê wan rûniştîye. Dûrgar go:

- Min çêkirîye, keçik dighîje min!

Terzî go: - Min kinc dirûne, lêkirine, digîje min, nagîje te!
Duaqebûl jî go:- Na, min dua kirîye, dighîje min!
Hersêka qirka hevdu girtin. Duaqebûl merîkî aqil bû, go:
- Qurba, çima em şer dikin, li hevdu dixin. Em herin cem xelîfê Bexdaê, para kê me ket, bra xwera bibe here.
Herçar hevdu ketin çûne dîwana xelîfe. Xelîfe go:
- Qurba, bêjin, çika gotina we çîye?
Ewî dûrgar go: - Xelîfeî saxbe, em hersêk hevalê hevin. Em rêda dihatin. Şev em nava mêşekîda man. Sehet, sehet yekî me qerewilya me dikir. Min eva kêçika hana darin min çêkir: wexta min hat, ez razam, eva hevalê min rabû - qerewilîyê bike. Ew jî terzîye, deste kinc ji kîsê xwe dirû, lêkir. Paşê dey hevalê me dinê kir, ew rabû, qerewilî kir. Ewî jî duaqebûle. Ew jî ber xudaê min dua kirine, Xudê ruh berda berdaê. Ez dibêm - ji minra, min çêkirîye, terzî dibê ji minra - min kinc lêkirine, duaqebûl jî dibê - ji minra - min ber Xudaê xwe dua kirîye, Xudê ruh berda berdaye.
Xelîfe go: - Qurba, te dar çêkirîye, bistîne heqê xwe, go, terzî, te kinc lêkirine, bistîne heqê kincê xwe, lê evî merî dua ji Xudayê xwe kirîye, Xwedê ruh berda berdaye, para wî dikeve.
Bi wê formê hersê heval ji hev bela bûn, çûn…

## 38. ÎSMAÎL

Hebû padişak û sê kurê wî. Ew padişa gelekî dewletî bû. Pir hindik wext derbaz bû padişa ket mir, man hersê kurê wî. Ewana dest pêkir hebûna padişê dan belakirinê. Bi wî teherî ewan hersê bira çar-pênc sala tevhev derbaz kirin. Wextekî jî ewana usa kesîv bûn, diha tiştek mala padisêda tune bû, wekî bifrotana û ebûrê xwe bikirana.
Birê mezin got: - Birano, ebûra me ha nave, hûn herd li ber malêbin, ez herim karê.
Gotinê: - Tu ku herî, gere mehekê zêdetir nemînî.
- Belê, ez mehekê zêdetir namînim, we ku dît mehek derbaz bû, ez nehatim, gere hûn ser minda bên.
Ew herd birê din hatin ser pirsa wî û man - nan wîra dane petin û şandine karê,gotin:- Mesekinî, zû were!
- Belê, ezê zû bêm.

Ew birê mezin pir çû, hindik çû gihîşte bajarekî. Ewî bajarîra digotin Yemen. Ew nava şeher gelekî gerya, nişkêva çû rastî dewletîkî hat.

Ewî got: - Selam, dewletî!

- Elêkî selam.

- Tu xulama nagrî?

- Belê, hema ez jî xulama digeryam, - dewletî got, - ez xulama bi vî tiherî digirm: heye tajîke min û guhdirêjeke min. Ê ku li ba min xulam bin, gerek ew mira hertim çalya ji mêşe bîne bi guhdirêjê, yek jî gava ku çû mêşe, gere tajîye jî xwera bive. Eger tajî berî wî hate mal, tajîyê xarna wî buxwe, lê eger ew berî tajîyê hat, ewê xarna tajîyê buxwe. Lê meha xulam gere bidime pênc manatî.

Bi wî teherî ew li ba dewletî bû xulam. Lê nebya jî nebû, çimkî herd birê wîye din li mal birçî bûn. Ewî hertim guhdirêj dibire mêşe, dar dihanîn, lê tajî hertim berî wî dihate malê û xarna wî dixar. Bi vî teherî ewî li ba dewletî du- sê roja xulamtî kir, axirîyê ji birçîbûna ket mir.

Xeberdin derheq birê ku li mal mabûn.

Ewan herd birê ku mal mabûn, bihîstin, ku birê wanî çûbû karê, hatîye kuştin. Birê ortîn gote bire xweyî çûk.

- Îsmaîl, tu li ber malêbe, hela ez herim binhêrim, çika serê birê me çi qewimîye?

- De tu ku çûyî jî, zû were!

- Belê, eger ez nehatim, tu jî were.

- Çend roja bisekinim, ku tu nehatî, ez bêm?

- Deh roj temam bûn, were.

Bi vî teherî birê ortîn Îsmaîl da serwaxtkirinê û li ber malê hişt, xwe lêda çû. Pir çû, hindik çû, wextekî jî çû gihîşte Yemenê. Ew jî li nava Yemenê gerya, pir gerya, hindik gerya, nişkêva ew jî çû rastî wî dewletî hat, got:- Selam, kalê!

- Elêykî selam!

- Dewletî, xulama nagrî?

- Belê, hema ez jî xulama digerim. Ev pêleke, ku yekî mîna te hatibû ba min bûbû xulam, hertim mira çalî ji mêşe danî, axiryê teyax nekir, ket mir.

Ewî fem kir, ku birê wîye, îdî wê çawa bikira, nedibû. Ew jî kerba birê xwe li ba kalê bû xulam. Bi vî teherî ewî jî du- sê roja li ba wî xulamtî kir, axiryê ket mir: çimkî tajî hertim ber wî dihate mal, xarna wî dixar.

Xeberdin dereq Îsmaîl.

Îsmaîl gava ku dît birê wî nehat, ewî ji mal hîşt û berê xwe da Yemenê. Pir çû, hindik çû, wextekî ew jî gihîşte Yemenê, rastî wî dewletî hat, got:- Selam, dewletî!

- Elêkî selam!

- Dewletî, xulama nagrî?

- Belê, hema ez jî xulama digeryam. Îsmaîl can, berî te jî min du xulam girtin, lê teyax nekirin, birçîbûna ketin mirin.

Îsmaîl li wêderê fem kir, wekî birê wî bûne. Îsmaîl got:

- Dewletî, ez nola wana tera bazar nakim û ne jî pera ji te dixazim, lê tenê gere orta min û teda xeyd tunebe.

- Bele, hema ez jî ser gotna teme.

Îsmaîl kerba herd birê xwe li ba kalê bû xulam.

Ew sibê rabû, guhdirêj da ber xwe, tajî jî da pey xwe, çû mêşe. Gava ku çû mêşe, tajî bir zinarekîda avît û guhdirêja xwe barkir hate mal û xarna xwe xar, got:

- Axa, xu tu nexweydîyî?

- Na, lawo, axir me bazar kirîye, kîjan ji me bixeyde, gere em cote çarux ji çermê wî jêkim, ez nexeydîme, , tajîke - bûye qurbana te.

Bi vî teherî sive safî bû. Îsmaîl dîsa guhdirêja xwe da ber xwe çû mêşe. Gava ku çû mêşe, bir guhdirêja xwe zinarekîda avît, çermê wê jêkir û ser darekîra kir, hate mal. Gava ku hate mal, got:

- Dewletî, min guhdirêj zinêrda avît, xu ji min naxweydi?

Ewî got: - Malava, guhdirêjeke min bû, diha xeydandin li ku ma?

- Tu xeydîyî?

- Belê, ez xeydîm.

Îsmaîl got: - Herkê usane, ez dikim cote çarux ji çarmê te jêkim. Ser wê qirarê Îsmaîl cote çarux ji çermê dewletî jêkir. Ew mir. Îsmaîl heyfa herd birê xwe ji wî stend,hebûna mêrik xwera hilda, lêda çû mala xwe.

## 39. MÎRZE MEMÛD Û BERAN

Mîrze Memûd rastî merîkî fqare tê. Dinêre ew merîê fqare du berxêd sava (virnî) havîtîye ber dêlkekê dimêjîne. Mîrze Memûd guhdarî dike, bala xwe didê, nihêrî evan berxa hevra gotin:

- Wekî ku me şîrê mîya têr bixara ...

Ê nêr go: - Minê şevekê hezar mî banyana ber berên.

Ya mê jî go: - Ezê bibûma maka hezar pezî.

Mîrze Memûd ew herdu berx jê kirîn, bir çû mala xwe, havête bin mîkê mêjand. Xweykir, rind mezin kir xwera, berî nava pezê xwe da. Îjar beranê xwe temam frot, hezar pezê wî ma bê beran. Wext-miqeder temam bû, ewî kir beranê xwe berdêda, bire nava pêz, beran berdaê. Beren da pey mîkê. Mî ser kendalra banzda, piş xweva nihêrî beran pey neçû. Mîê gote berên:

- Malxirav, tu çira pey min naêyî?

Berên gote mîye: - Tu na, hezar hevê mîna te hene, ez wekî ser kendêlra banzdim, dawa min grane, wê biqete, îjar beranê dinê wê min bikenin, wê bê: "Çiqa bêhiş bû, pey mîê ket, ser kendêlra banzda, dawa xwe qetand, dera han sekinî stuxar bû". Lê hema hişê min hebû, min gura te nekir, ser kendêlra min banz neda, ez slamet mam, usa jî sozê xwe min anî sêrî, nava şevekê hezar mî min anî beran.

Mîrze Memûd temî şvanê xwe kir, go:

- Ez qurba, tu îşev guhêrêda miqatbe, çika beranê me kêleka kîjan mîê mexel tê. Svê binêr dîsa, çka kêleka wê mîêye, anê na?

Şvan bi vê formê mqatî lêkir, nihêrî beran êvarda kêlêka mîê mexel hat. Şvan mî texmîn kir. Svê dîsa rabû nihêrî, beran dîsa kêleka wê mîê mexele, qe kêleka xwe neguhastîye.

Mîrze Memûd hate nava pêz, go:- Şvan, çawane?

- Şvan go: - Çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê, çawa ku beran êvarda kêleka wê mîê mexel hatîye, usa jî ez vê sivê rabûme, dîsa usa kêleka mîê bûye, mexel bûye.

- Ê, go, ez gora bavê xwe ...min mala xwe xrav kir, beranêd xwe frot, pezê min jî stewir ma, bîne stuyê berên jêke, bavêje cenimê.

Wextê ku beran mexel bû, hingê tevîzek canê berênda çû, berên go: "Mala min xrav bû, îşev mişev hezar mî min anîye beran, îja wê serê min lêxin?".

Îja beran ku cî rabû, mîk çû cem berên, lingê xwe berên da, miqande berên, berên gote mîyê:

- Hey malxirav, tu çi ji min venagerî, êvarda hezar mî min anîye beran, bihêle qasekê ez hêsa bim.

Hingê dilê xayê wî baristan bû..

Ev bû çîroka min..

## 40. SILTO

Heft kurê merîkî hebûne. Ewî sond xar, wekî "Heta heft qîzê ji dê û bavekî tunebin, ez kurêd xwe nazewcînim".

Her heft kurêd wî mêrîkî rabûn, çûn, terkeselatî dinê bûn. Çûne rasteke dûz. Lê dinihêrin, wekî dûkî zirav radibe. Xwe li wî dûyî digrin, diçin. Diçin, dinihêrin - eva pîra merivxur û heft qîzê wê. Li wira bûne mêvan. Pîrê dor wana diçe û tê, divêje:

- Ev mêvana ser çevê mira bên!

Navê brê wanî mezin Silto bûye. Divê êvar, brê mezin tembê dide brêd xwe, divê:

- Wekî pîrê cîê we datîne, hûn qîza xewra bikin. Kumê wana bikin serê xwe, yê xwe bikin serê wana.

Êvarê pîrê heft cî danîn. Qîza mezin kir paşla kurê mezin, ya ortê kire paşla kurê ortê, usa wî cûreî her heft jî kire paşla wan xorta. Ewana qîza xewra dikin, kumêd xwe li qîzara diguhêrin.

Pîrê şev diranê xwe tûj dike, tê dora wan. Destê xwe dipelîne, heça ku kolozî sêrî bûye, ew serê wana jê dike û diçe. Sivê safî dive gazî dike, divêje:

- Rabin, min porê we kurkirno, rabin îro savarekî rind çêkin, dil gurcikê her hefta bavêne ser, heta ez têm.

Silto got: - Erê.

Pîrê got: - Min serê we kurkirno, hûn şîna xorta dikin?

Silto rabû wekî birevin. Radibe tendûra pîrê dadide, savarekî çêdike, dil, gurcikê heft qîza davê ser û serê wan hefta dide ser hev, û sapokê xwe kulekêda darda dike, hundurê wana tijî agir dike û diçin bajarekî maîn.

Gava ku pîrê bi hêrs tê, dinihêre wekî qîzêd wê kesek xanê nake, gava ku dêrî vedike, dinihêre serê her hefta li wêderêye û savarê jêra bi goştê qîzê wê çêkirine. Pîrê dinihêre wekî sapok kulekêda dardanin. Divêje:- Silto xwe hazir kirye heta ku ez têm. - Gava ku devê xwe bi hêrs davêje sapoka, agir ber pêsîra wêda dirije û dişewitîne. Pîrê divêje:

- Eva çi bû Silto serê min kir?

Silto û birêd xwe diçine bajarekî xwera dixebite. Lê pîrê zehlê wî bajarî biribû. Kesî pê nikarbû. Padişaê şeher gazî cimetê dike û elemetya dide, wekî "Kîjanê ku pîrê saxî bigre bîne vira, ezê beramberî wana zêra bidim".

Silto dest sîngê xwe dixe û divê:

- Ezê bînim, mira postekî nêrya û dusid zengilî bînin.

Padişa wê sihetê dide anînê û qutîke pola. Silto radibe diçe.

Pîrê li nêçîrê bûye. Silto cîê xwe li mala pîrêda çêdike, nêzîkî hêlîna dîkê pîrê. Postê nêrî temamî zengil dike.

Pîrê êvarê tê mala xwe, westyayî xwera radizê, çira xwe vêdisîne. Silto dest davê dîkê pîrê, dîk dike gazî: "Wî, pîrê, Silto ez birim". Pîrê gava pîçkê vêdixe, dinêre tişte tune, dîsa radizê. Dîk dîsa dike gazî: "Pîrê, Silto ez birim". Pîrê îdî ranave û xewra diçe. Silto sera disene û dike zinge- zing. Pîrê "Simila- simila" divêje.

Silto dibê: - Ez ruhistînim, hatime ruhê te bistînim, rabe bikeve hundurê qutîyê.

Pîrê devê wê nagere, radibe dikeve qutîyê. Silto derê qutîyê pê du kilîta dadide û dide pişta xwe diçe nava dîwana padişê datîne. Lê Silto berê zû cîyê xan- manekî dîwarê wî pola kiribû. Silto ser pîrêra disekine û dike gazî:- Pîrê, zanî ez Siltome, - û direve.

Gava ku pîrê usa dibhê, firkê dide xwe, qutî ji hev bela dibe. Dikeve nava şeher, heça ku rast tê digre dixeniqîne. Dipirse cîê Silto. Jêra dibêjin. Ew gava diçe, deryê pola dadayî bûye, serê xwe lêdixe, derî qul dibe, serê wê têda dimîne. Silto serê wê lêdixe, usa destê pîrê xilaz dibe.

Paşê bi şîrê pîrê herçê kuştî gişka radike, da qîzêd pîrê jî,wana jî rakir. Hêjka şayî dikeve nava şeher. Pesnê Silto didin ku heqê pîra merivxur derket. Silto qîzêd pîrê jî xwe û brêd xwera anî.

Gihîştine mirazê xwe.

## 41. DAÛD PÊXEMBER

Daûd bavê Aqûb bû.Îdî mezin bûbû, gazî kurê xwe dike, divê:

- Ezê bimirim, were ez hebûna xwe nîşanî tedim.

Bir çû derê hebûna xwe vekir, lê derîk hebû- ew derî venekir, nîşan nedayê.Kurê wî go: "Canim, çira nîşanî min neda?" Çû rûyê wîda kilît dît, hat derî vekir.Dît merîk têdane, got:- Tu kîyî?

Go:- Ez Sixrîcinim, go, bavê te heft sale min girtîye, gotîye: "Bive birê min", ez nebûme, ez girtime,-divê,- ezê bivim birê te, te derî min vekir.

Aqûp Sixrîcin aza dike. Daûd hişyar dive, divê:

-Ka kilît,-kurê xwera divê,-te çi kir?

Divê:- Mêrik minra gotîye: " Min ferza biratîyê nedaye bavê te, ezê bidim te".

Gote kurê xwe:- Ez dimirim, tu neyêyî ser mezel, bira cimet bê min heqke, tu neyêyî!

Daûd pêxember mir.Wexta mir, kurê wî go: "Çawa ez neçim ser mezel?" Wexta diçe ser mezel, kareke xezalê dikeve pêşîyê.Dide pey kar: vira na-dere han, vira na- dera han...Terî kete erdê, kar jî unda bû.Wêderê ma heta sivê.

Sivê rabû, dîsa ew kar ber nigê hespa wî derket, dîsa da pey kar.Da pey, çû gihîşte gundê Sixrîcin.Çû mala Sixrîcin. Ewî go:-Bira, te xêre?

Gilîyê xwe temam jêra got.Sixrîcin go:

- Ew qîza padşêye, tu ku karî wê bigrîî? Lê sivê ew tev du kevotka wê bê xwe ser kanîyê avêxe.Hergê bikarbî ser kincê wê rûnêyî-tuyê wê bigrî, yan na tu nikarî wê bigirî.

Wexta kevotk têne ser kanîyê, tê ser kincê wê rûdinî. Meyanê digire, hildide tîne.

Lê jineke Aqû hebû, kurê wî hebûn.Meyane gotêda:

- Minra nevêjî here dewata, cîya, yan na îdî tu min navînî.

Dewat bû gundda. Gava çû dewatê bû kevotk, firî çû welatê xwe.Wexta çû, Aqû pêxember jî çû mala Sixrîcin, go:

- Bira, hal û hewalê min û Meyanê eve.

Go:- Bira, ezê çawa bikim? Bere-tuyê çawa herî? -Go,- şiva qudretê sivrik-wekî ser rûnê, kumê cina, cem apê mine-wekî herî hildî, tuyê bighîjî,- dişîne cem apê xwe.

Ap divê:-Lawo, lê îtbar heye, dîsa wê bîne bide?

Divê:-Wê bîne!

Didê, diçe devê berê sivrikê datîne, şivê dixe digihîje wî alî berê. Diçe mala pîrekê.Kumê cina datîne serê xwe, zîyar ditirsin.Pîrê divê:

- Bidî xatirê Xwedê, te zîyarê min tirsand.

Kum serê xwe derdixe, divê:

- Ez pey Meyanê hatime!

Divê:- Meyanê aksor kirine, gotine - te evdê serreş stendîye, bîna merîya te tê.

Pîrê diçe gazî dîya Meyanê dike, divê:

- Zevê te hatîye, were.

Tê divîne xortekî baş, diçe padşêra divêje, divê:- Ha, ha...

Divê:- De bira bê, ez bivînim.

Aqû divîne, divê:-Here, min qîza xwe da te!

Meyanê hiltîne tîne, dîsa derbazî avê dive, diçe gundê Sixrîcin, şiv, kum dive dide apê wî, Meyanê hiltîne tîne.Meyanê tîne, du jinê wî divin.Ji jina pêşin deh kurin, ji Meyanê du kur divin- Ûsiv, Bînamê.

Aqû, wexta çeva belengaz dive, divê:

- Kî here dermanê çeva bîne?

Diçin: Bînamê, sê-çar hev hevra diçin, lê Ûsiv-sê,çar hev tev diçin.Rêva tî divin. Bîrek rastî wan tê, Ûsiv dadixin avê derxe.Ûsiv avê derdixe, Ûsiv bîrêda dihêlin, de çevnebarîyê lê dikin.

Aqû divê:- Ka Ûsiv?

Divê:-Em çi zanin Ûsiv çawa bûye?

Ûsiv bîrêdane. Bazirganek tê ser bîrê datîne.Xulam diçin avê bînin, divînin avêda merî heye.Derdixin -zef bedew bûye. Bazirganbaşî datîne ser devekî xwera dive Misirê, dive bazarê wîya bifroşe. Jina padşayê Misirê dinhêre bedewe, divê:

- Çi bidim?

Divê:- Kaşa wî zêr!

Zêr dikşînin - Ûsiv ranave. Ûsiv xanimêra divê:

- Çenge xalî bike nav, ezê ravim.

Usa Ûsiv dikire, tîne tê, çawa dike Ûsiv berê xwe nadêda.Tîne dîwara otaxê temam eyne dike.Wexta eyne dike, Ûsiv deverû xwe davê erdê.Dîna xwe dide-boşe, destê xwe davê berstûya wî, dîsa ranave.Diçe şikyata padişê.

Padşa Ûsiv dike kelê. Kelêda du girtî xewn divînin: yek xaçparêz, yek îslam-kurmanc bûye.Ûsivra xewnê xwe divêjin.Ûsiv divê:

- Helalî xewnê xwe bugihêzin, ezê xewnê we bêjim.

Evana xewnê xwe hev dugihêzin, Ûsiv divê ewî îslam:

- Sivê wê te berdin, yê dinra divê- sivê wê te bikujin.

Ewî kurmanc sivê berdidin, yê xaçparêz dikujin.

Padşa xewn divîne.Telal dikine gazî:

- Kê xewna padşê şiro veke?

Ewî îslam divê:- Merîkî min heye, ew merî kelêdane.

Ûsiv berdidin, tê dîwana padşê, padşa divêje:

- Min xewn dîtîye - heft gayê têr hatine erdê, heft jî çûne ezmana. Divê,- padşayî xweş be, heft sala nanê usa bê, zef bê, heft sala jî wê xelayîbe.

Padşa divê:-Wekî usane, bive xeznedarê min, nan bikire.

Ew heft sal temam dive, padşa divê:

- Ûsiv, ez birçîme!

Ûsiv zane, ji arê dara du totik çêkirî bûye, totika dide- padşa dimire.

Wexta dive xelayî, Aqû divê kurê xwera:

- Têra hildin herin nan bikirin.

Birê Ûsiv têne cem Ûsiv.Ewana Ûsiv nas nakin, lê Ûsiv wana nas dike.Bînamî jî wanra hatîye. Wexta koda genim çap dikin, Ûsiv ew kod û dezmalê xwe dike têrekîda. Têr didirûn,, digerin-kod tune. Bira divên:

- Bînamî dizîye!

Ûsiv zane kod kuye, lê divê:

- De wekî Bînamî dizîye, hûn herin, ezê Bînamî bigirim.

Wexta nan bar dikin, tên, Aqû divê:

-Bîna Ûsiv tê!

- Çawa? - divê,-Ûsiv tune, ewî din jî girtine.

Divê:- Na, bîna Ûsiv tê!

Têr vedikin, dezmalê derdixin, çevê padşê dixin,çev qenc divin.

Em bên ser jina padşê. Ûsiv jinikê- Zelîxê, distîne, birê xwe, bavê xwe tîne cem xwe.

Ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî mirazê xwe şa bin.

## 42. HEMZE Û BABA

Wextekê du bira hebûn. Navê yekî Abas bû, navê yê dinê Zerzan bû. Du kurê wan hebûn. Ulmê wanda hebû, wekî kurê wana wê bivine pelewan. Wana kurê xwe birin çolê, dane xweykirinê.

Rojekê qiralê dêwa remil avît, wekî du xort derketine, wê wanara şer bikin. Qiral rabû qewazê xwe şandin nava êla herdu bira, go:

- Here xercê heft sala bistîne!

Usa jî kirin.

Em bêne ser kurê Abas û Zerzan. Navê yekî Baba bû, yê dinê jî Hemze bû. Ewana heft sala usa çolê derbazkir. Rojekê Hemze xewna xwe dît, wekî jêra hespek û deste kincê batinî hatîye nava Mêrgezerê. Baba û Hemze sivê rabûn, wana got:

- Her yek xwera başqe here.

Hemze çû dîna xwe dayê- Eşqerî dêmzer hatîye nava Mêrgezerê. Gava çev Hemze ket, kire hirîn, teyr hewa hişk bûn. Hemze got:

- Bimbarek, Xwedê tu mira pêşkêş şandî, wekî ez dêwa qirkim, pirkim.

Eşqer xwe spart Hemze. Hemze çevê wî ramûsa, lê sîyarbû hat ber cîyê xwe. Gava Baba rêva çev pêket, revya. Hemze kire gazî:

- Baba, nereve, Baba nereve!

Baba revya çû, serê wî kevirê şikeftê ket, serê wî şkest. Hemze çû gihîşte Baba. Baba got:

- Helestûrî - kelestûrya, te nego hundurê wî tifalî diqetînim.

Wê carê Baba jî usa xewna xwe dît, wekî çekê wî jî hatine.

Sivê Baba rabû gote Hemze:

- Her yek xwera başqe here.

Baba çû, nihêrî hevana wî û kewkanya wî nava qetê zyada bû.

Hemze dizîva çû nihêrî, wekî çekê Baba hatye ber çevê Baba, ketîye nava qetê zya, newêre bîne. Hemze milê Baba girt, avîte ser çekî wî. Baba çekê xwe ramûsan. Rabûn hatin.

Qiral dîsa reml avîtin, wekî du zilam rabûne, wê wanara şer bikin. Qiralê dêwa qewazê xwe şand, got:

- Herin nava êla wana, xercê çarde sala jê bistînin. Herkê nedan, bîzê hesin çêkin, ber nenikê wana bikutin.

Baba û Hemze ew çend roj bûn birçî bûn. Hemze got:

- Baba, rave here çika halê malê me çine û mera hine nan bîne.

Baba rabû çû. Nava xelqê wana şîne, girîye, star tu malada nemaye. Çûne pêşya Baba. Anîn hatin cîkî, hine nan dane Baba û xwe avîtine Baba, wekî Baba Hemzera nevêje, hela Hemze zaroye, qewata xwe nestandîye, dêwê Hemze bikuje Baba dane sondê, wekî nevêje. Baba çû.

Êvarê Hemze hat got:- Baba tu hatî?

- Erê, ez hatim.

Hemze got: - Baba can, lê halê malê me çine?

Baba got: - Mala te avabe, halê wana wê çi be? Ro- miro xurê wana goşt, qelîye, xwera kêf dikin. Mîna mene, wekî ro- miro birçîne?

Hemze got: - Baba, lê tu çima medekirîyî?

Baba got: - Lê ezê çi bikim?

Hemze got: - Baba, rast divêjî, bêje, yanê na - ezê te bikujim.

Baba rabû çû derva, ser kevirekîda girya.

Hemze pey çû, dîna xwe dayê, Baba wê digrî û divêje: "Kevir, ez helestûrî -pelestûrra navêjim. Kevir, tera divêjim. Welle, qiralê dêwa qewazê xwe şandîye nava malê me xeraca bîst salî jê dixwezin û bîzê hesin tûje kirine ber nenikê wanda kutane". Baba got: "Keviro, welle hergê tişte hunirê teda heye xwe kivşke, yanê idî tu ewî".

Gava Baba usa got, ferxê Hemze rabûn û herdu rabûn çûn nava êla xwe.

Mervê êlê hatine pêşyê, gotin:- Hemze û Baba can, hûn çima hatin? Hûn hela zarone, dêwê we bikuje.

Hemze hat qasidê dewa yek kuşt, yê dinê yek topal kir, yê din kor kir, şande cem qiralê dêwê, got:

- Herin bêjin qiral, Hemze gotîye, bira xeraca xwe heft sala minra bişîne, yanê neşîne - bira karê xwe bike şerê min wî şere.

Ewana çûn gotne qiralê dêwa:- Hal- hewalê Hemze û Baba waye.

Qiralê dêwa duşurmîş bû, got:

- Lazime em gazî Hemze, Babakin, bira bên nava me.

Ewî qasidê xwe şandin pey Hemze û Baba. Ewana rabûn çûn. Rêva Baba got:

- Hemze, ez naêm.

Hemze got: - Baba can, tu çima naêyî?

Baba got: - Were destê minda qirarke, wekî bêy min tu tiştekî nakî.

Hemze destê Babada adkir, wekî bêy wî tiştekî nake û çûne cem qiralê dêwa.

Gotin: - Hûnê herne kîderê?

Wana got: - Emê herin mala Xoce bizir.

Ewana çûn mala Xoce bizir.

Sivê qiralê dêwa çil cot pelewanê xwe şîret kirin:

- Ezê gazî Hemzekim, bînim dîwanê, hûn hazirbin, hema ew kete hundur, çû rûnişt, hûn herekê gurzekî lêxin, bikujin.

Lê Baba zanibû, got:- Hemze, qiralê dêwa ya xwe kirîye yek, tu herî hundur wê te bikujin. Gava tu çûyî hundur slavê bide. Ew slava te venagrin. Tu xuber slava xwe vegre û here jorê.

Hemze usa jî kir. Sivê çû dîwana qiralê dêwa. Slav dayê, wana slava Hemze venegirt. Hemze xuber slava xwe vegirt û çû jorê rûnişt. Ewî destê xwe da ser nigê pêlewana, nigê pelewana gişka şkênand.

Qiralê dêwa rabû qîza xwe- Mîrînîgar da Hemze, lê got:

- Gerekê tu herî qelenê qîza min, Kutekî dêw ji minra dîl bînî.

Hemze û Baba rabûn çûn mala xwe, bar kirin çûn berbi Kutekî dêw. Ewana çûn, rêva rastî êla Qasimî- koçer hatin. Qîza Qasimî-koçer zef bedew bû. Ewê Hemze bire cem xwe. Hespê wî - Eşqerî dêmzer berî ser çil mihînê xwe da, tejîya wî berî ser çil tejyê xwe da.

Baba şev razaî bû, nişkêva banzda ser xwe, çû sîûneh hespîda vegerand, sîûneh tajîda vegerand: hespek û tajîk man, go:

- Evana jî kêrî min tên.

Ewana rabûn çûn, rastî berekê hatin. Gemî xwera çêkirin, lê Baba reşayê çû. Ewana çûn, rêva ser berê rastî qeyakê hatin. Rê tunebû, kirine gazî:

- Baba, Baba, qeyaye!

Defeke pêdabû.

Baba kire gazî:- Kuro, - go, - yek çomaqekî lêxe, gerekê defçîkî wê mala me derê.

Wana çomaqek lêda, rê vebû. Ewana çûn êra Kutekî dêw. Hemze û Kutekî dêw kirin şer, ya Kutekî dêw sêlbû. Gava Kutekî dêw gurzê xwe davît, Hemze dixist û direvya, lê Hemze nikarbû tiştek pê bikira. Ewî xwe avîte Baba. Baba got:

- Malê xwe minra nîvîke.

Ewî anî malê xwe Babara nîvîkir. Baba Kutekî dêw altkir. Kutekî dêw, mal û zêrê wî hildan anîn hatin. Dîsa nava berêda hatin gihîştine êla Qasimî - koçer. Qasimî koçer bihîst, rabû parî nan jerê perwede kir, da pîrikê. Got:

- Bive here pêşya Hemze, bêje: "Qîza Qasimî koçer gotîye bira buxwe, heta ez tême pêşya Hemze".

Pîrê hat, ranêzîkayî Hemze kir,go:

- Hemze, eva parî nînê hana qîza Qasimî koçer tera şandîye, gotîye: "Bira buxwe, heta ez tême pêşyê".

Hemze xar û ket. Baba kewkanyê xwe hejand pîrê kuşt. Êla wana hatine ser Hemze girya. Kutekî dêw hat lê nihêrî, got:

- Hêla heft roja jî wê saxbe, wekî hekimî Loqma bînin, wê saxbe.

Wana got: - Kê wê here?

- Babaê here, kê wê here.

Ewana xwe avîte Baba. Baba got:

- Werin malê xwe minra nîvîkin, ezê paşê herim.

Ewana malê xwe nîvîkirin Babara, û Baba rabû du- sê gede xwera birin, çûn ser kanîkê. Baba got:

- Werin em razên û paşê ravin herin.

Wana got: - Baba, em herin, axir yekî nona Hemze mirîye, em herin, derenge.

Baba got: - Hûn razên, çî wera?

Ewana razan. Baba rabû morya xewê kire guhê wana, çû.

Hekimî Loqma aşê xwedabû. Baba sêlek serda xwend,hekimî Loqma kire hebanê xwe, û Baba xuber bû hekimî Loqma, berê xwe da mala hekimî Loqma.Dîna xwe dayê qîza hekimî Loqma wê derê malêye û digirya.

Baba got: - Tu çima digrîyî?

Qîzikê got: - Îro sê roje, wekî gundda dewete, ez neçûme.

Baba got: - Here, dermanê minî heft sêlyêda heye, îro gişkî bîne û here. Xwera here dewatê, heta heft roja idî neyê mal, heta ez têm.

Qîzikê çû derman gişk anî da Baba. Baba hate ser kanîyê, deyli wan lawika kir:

- Kuro, ravin!

Gede rabûn, xewêda werimîne, gotin:- Bavikê bava, em herin.

Baba got: - Emê herine ku?

- Çawa em herne ku? Herin hekimî Loqma bînin.

Baba got: - Em naçin. - Û vegeryan hatin.

Ewana çûn cem malê xwe, gotin:- Me neçû hekimî Loqme nanî. Em çûn ser kanîyê razan û rabûn hatin.

Baba ji hebanê Loqme derxist, Hekimî Loqma lênihêrî, got:

- Mala qasidê we xiravbe, min derman neanîye û tişte neanîye, ezê çawa bikim?

Ewana dîsa xwe avîte Baba. Dîsa malê xwe nîvîkirin Babara. Gava heban dawşand, derman, çi bêjî hazire. Hekimî Loqma Hemze qenckir.

Hemze rabû jina xwe hilda û çû berbi Qiralê dêwa. Qiralê dêwa eskerê xwe şand miqabilî Hemze. Hemze pêra kire şer, eskerê Qiralê dêwa gişk kuta kir û jina xwe bir, heft roja kire dewat, gihîşte mirazê xwe.

Ew mirazê xwe şabûn, Xwedê mirazê we jî bike.

## 43. ŞÎRET

Wextekê sê xort dikevine rê, herine şeherekî. Sê zêr xortekîra hebûye, cem ewê din tişte tunebûye. Diçin, ser rêkê otaxek va, kalek têda rûniştî.

- Selam elêkim, bavê kal!

- Ser çeva, ser sera, xortê delal.

- Apê kal, tenê, wehîd, ser vê rê çawa derbaz dikî?

Go:- Lawo, ez şîreta li xelqê dikim!

- Çawa şîreta?

- Şîreta xwe dikim yek zêr.

- Apo, ezê zêrekî bidime te, şîretekî minke!

- Lawo, derxe, bide, şîreta tekim!

Xort derxist, zêrek da kalê!

- Lawo, kîderê ro te çû ava, wêderê xwe bernedî.

Hevalê wî go: - Kuro, biliv em herin, kalê zêrek badilhewa te stend.

Ewî go:-Apê kal go, zêrekî dinê jî bidim te, şîretekî dinê jî minke.

Go: - Lawo, go, tu diçî malekê divî mêvan, çiqa nan, xarinê tînin ber te - nevê bese.

Heval gotê, go: - Eva du zêr kalê te stendin, tu xapandî, pere jî cem me tune, wê çawabe?

Derxist go:- Apê kal, ma zêrek, ewî zêrî jî bidime te, şîretekî jî min bike.

Go: - Lawo, go, diçî, çemek dikeve pêşya te, heta merî pêşya te neçin, buhur nekevî, go, neçî.

Hevala go: - Welle, kalê tu xapandî, de biliv em herin.

Kalê hilda go: - Xortê delal, te zêrek da bona vê yekê: îdî berî êvare, go, kuda diçî, îşev mêvanê minbe, sivê rave here, Xwedê oxirê bide te.

Sivê lê ron bû, xort kete ser rê, lêda çû. Dîna xwe dayê, herdu hevalê wî nav mêşeda kuştîne, werimîne. Xort go: "Pak bû zêrê min deya neçû, wê ez jî tev wana bikuştama".Xort rabû kete ser rê,lêda çû.

Çû wê şevê mala merîkî bû mêvan. Xarin hat - tijî ser texte kirin, devê xwe tijî kir, bê- bese: kalê kete bîrê, zêrê wî kete bîrê: "Hê, go, mala min xravbe, go, min zêrek da seva vê yekê, go, bira nanê xwe bînin, ezê zikekî bixum". Êvar lê hat, dewletî anî sê dest doşek avîte bin wî, sê lihef avîte ser. Ewî svê rabû, dewletî gotê:

- Kuro, kê tu şîret kirî, ev gilî te kir? Kî hatibû minra gotibû - bese, - min serê wî lêda bû, nanê min bû.

Rabû kete rê, çû. Çemekî mezin kete pêşyê, ê, ne belede, wê kura here? Ewî kir ku lêkeve, kalê kete bîrê, go: "Ne min zêrekî xwe dabû seva vê yekê". Xwera rûnişt. Lênihêrî sîyarek xurcka wî tijî zêr, hespekî boz sîyare. Ajot nava avê: sê cara ketê û derket - xeniqî. Dest avît, xurcika wî xwera anî.

Şûnda vegerya hate mala xwe: hê bra bixwe, hê bra bixwe...

## 44. DEREW JI DEREWA MEZINTIR

Sê meriv rabûn çûne seyrangê, xwera qasekê bigerin. Lê tejîke wan hebû, ew jî wanra çû. Navê yekî Çilo,yê din Şilo,yê sisya Kulo.

Ewana çûne nava mêşe. Wira kêwrîşkeke razayî dîtin. Girtin, şerjêkirin, agir dadan, petin, danîne ber xwe, wekî bixun. Nizam çawa bû Kulo xeydî - nexar. Çilo û Şilova ew goşt xarin. Devê wana ma zep ziha, lê yê ku nexaribû-devê wî don girt,tejîyê jî devê wî alast. Hêrsa Kulo rabû, pihînek tejîê xist: tejîyê kire kastîn, revî. Ji tejîyê tope perçê xas ket.

Gelo tu dikarî bêjî - ew perçe wê bighîje kê?

Çilo, xayê tejîyê, divêje:

- Ezim xayê tejîyê, perçe dighîje min.

Şilo divêje: - Min jî kêwrîşk girtîye, dewsa kêwrîşkê - perçe digihîje min.

Kulo jî divêje: - Wekî we goşt xar, min nexar: tejîyê jî devê min alast, min jî lêda, ewê perçe avît - perçe dighîje min.

Vana hevdu nikarbûn razîkirina. Lêdan çûne cem qazîşuro. Go:

- Mera vê şuxulê rastkê - ka perçe wê bighîje kê?

Qazîşuro, go:- Kê ji we derewke mezin bike, perçe wê bighîje wî.

Çilo destpê dike derewa xwe dike:

Go: - Flankes, rojekê gamêşa min unda bû. Ez gelekî lê geryam, min nedît. Ez rabûme serê çîyayê Grîdaxê, çarniqal nihêrî - min nedît. Hatim çûme gelîyê hampûrê, derzîya kinca nikand, rabûme ser wê, nihêrî. Min dîna xwe dayê, wekî pişta Grîdaxê mişkekî çûçik wê guhê gamêşa min girtîye, kaş dike, dike qulê. Ez revîm çûm, min poçka gamêşê girt, kaşkir, mişk jî berbi qulê kaşkir, ancax min gamêş ji destê mişk derxist.

Derewa Şilo:Go: - Min jî rabû, deva xwe barkir, çûme aş, wekî nan bihêrim. Heta ketime aş, derketim - deve tune. Ez sivê heta nîvro geryam, min nedît. Ez birçî bûm, çûme mal, wekî hine nan bixum.

Jina min nan dipet. Nanek çûbû kût. Min go:

- Qîzê, qîzê, ewî kûtî derxe, ez bixum devê bigerim.

Min ew kût kire cêva xwe, ez çûm, ji gund derketim, kût derxist bixum. Gava min kût ker kir - deve ortêda, gurzê gihîa li ber duxe. Min deve ajot, çûme aş, nanê xwe hilda, hatime mal.

Derewa Kulo:Go: - Flankes, wê salê dîkekî min hebû. Ez rabûm rojekê, min heft top genim li dîkê xwe kir, çûme aş. Ez aşda li ber dêrî sekinîbûm. Wextekî merivekî xerîb hate bal min, go:

- Flankes, bazirganê mê hatîye ber çem sekinîye, çem rê nadê, were em herim, pê dîkê xwe derbazke.

Em rabûn, dîk syar bûn, çûn. Me bazirgan li ser pişta dîk kir, derbazbûn. Mêşoke garis rijya nava çêm. Min go:

- Hûn zanin, wekî mêşokê weda çend liv garis hebû?

Wana go: - Em zanin.

Min dîk berî çêm da, ava çêm timam çikand. Ez û dîkva ketinêda live- liv hevda, jimirî, da wan.

Wê rojêda pişta dîk kulbû. Ez çûme ser hekîma, pirskir, ka çi dermane? Wana got, wekî derman - gûza hindêye. Wî çaxî gûza hindê destnediket. Dya min go:

- Wexta me tu şîrevekirî, pê gûza hindê bû.

Min derzî hilda, orta dranê xwe vekola, heft hoqe gûzê hindê jê derxist, da ser pişta dîk - qenckir.

Qazîşuro, go: - Topê perçe dighîje Kulo!

Kulo topê perçe hilda, çû mala xwe.

## 45. MELLE Û WEZÎR SER BELA XWE VEDIBIN

Seyad padşa merîkî timakar bû, nedixast wekî çar kapêka li ser xwe xercke. Seba wê yekê jî rabû çû, mala xwe hilda bre zozana, lê hema qîza xwe tesmîlî mala melle kir. Tembe daê, wekî guhdaryê bide ser qîza wîda û lêda çû ew jina xweva.

Melle êvarê hate cem qîza wî, gotê:

- Gere tu serê xwe mira têkî yekda.

Qîzkê xwe jê xlaz nekir, got:

- Brabe, lê hema gere ez tera sîtlek avê germkim.

Paşê çû av germkir, qalbe sabûn danî, mizda û tije kef kire ser çeva, tasek da nava çeva û revya çû nêzîkî bajarekê, rabû serê darê rûnişt.

Padşakî din derkete ber dêrî û ser palkonê nihêrî, wekî îşqê avîte wêderê. Rabû gote wezîr û wekîlê xwe:

- Herin, çika ew çi îşiqe avîte wêderê?

Çûn nihêrîn, wekê merivê. Rabûn cav dane padşê.

Got: - Bîne virada, çika ew çi merivê?

Anîn mala padşê, ma heta wextekê. Kurê wîya dewa zewacê kir. Rabûn girtin dane kurê padşê.

Sekinî heta çar anê pênc sala. Xwedê sê kurik danê. Hela kurê padşêra xebernedaye. Rokê radibe diçe bal pîreke sêrbaz, pîrik divê:

- Tu rabe here du sêva bîne bide destê kurê xwe. Hema gere sêveke pakbe û yeke xiravîbe.

Ew jî usa dike û xwe dide ber derîda. Zar bona sêva şer dikin.

Jinik divê: - Xwedê bavê we bikuje, çima wera kîlo sêvê rind nanî, nedaye dest weda, çima hûn ha tînin serê hevda?

Kurê padşê dikeve hundur, divê:

- Te çima mira xebernedida?

- Lê te çima heta niha nedigot: "Ezê eslê wê bipirsim, çika çi esle û çi esase?"

Wêderê dipirse esl û esasê wê û dibêje bavê xweda:

Bavê wî radibe divêje wezîr, wekîlê xweda û deve delûla bar dike, dişîne mala bavê bûka xwe.

Diçe, êvar serda tê. Wezîrê padşa diçe ser cîyê wêda. Qîzik serê xwe pêra nake yekda. Wezîr radibe kurekî wê dikuje. Jinik radibe hundirê palata xweda dike çelda, guhê wî jê dike, dike cêva xweda. Herneserê, usa wê formê hersê kurê wê dikuje. Jinik jî radibe guhê hersêka dike cêva xwe. Serê xwe hildide diçe rastî şivanekî tê, divê:

- Brango, wekî tu kincê xwe bidî minda û hûrê berxekîva, ezê çend zêra bidime teda.

Çû cem pîrêkê, got:

- Pîrê, tu dikarî mira xebatekê bivînî, ez vira nebeladim.

Pîrê got: - Qazvanê padşêbe,were em herin.

Rabû çû wêderê, bû qazvanê bavê xweda, lê hema bavê wê nasnedikir, ji xwera kire qazvanda. Heta wextekê, melle û mala bavê mêrê wê hate wêderêda. Padşê gote wezîr, wekîlê xweda:

- Mera mijûlîkê bike!

Wêderê qazvan tê, disene ber dêrî divê:

- Ezê bêjim!

Wezîr û wekîlê padşê divê:

- Canim, here ber qazê xwe, çî terane?

Padşa dibê: - Na, bira bêje!

Destpêdike û divêje çi ku hate sêrî û divê:

- Herge tu bhar nakî serê melle binhêre.

Paşê tê dora wezîr û usa jî radibe guhê kurê xwe datîne ber padşê û divêje:- Ez qîza padşême.

Radibin serê herda jî lêdixin, qîzkê hildidin dibine mala xwe.

Xilas bû, çû.

## 46. WEYSETA BAVÊ

Padşak, şeş kurê wî û keçelokekî wî hebûn. Padşaî ber mirinê bû, gazî kurê xwe kirin û weysêt kir, go:

- Lawo, hûnê herne kêleka şeherekî biêwirin, wira dêwek heye. Ew dêwê we her şeşa bikuje. Miqatî xwe bin. Hûnê ji wêderê herne şeherekî din. Hûnê şeher binhêrin şeherî tijî perçeye, merî wî şeherîda tunenin. Hûnê destê xwe bidinê ew perçe- gişk rizyaye. Wî şeherîda pîrek heye, heft kurê pîrê hene, heft jî qîzê pîrê hene. Her heft kurê pîrê dêwin, ewê we bixun. Ew şehera gişk wana xarîye, wê we jî bixûn. Hûnê ji wêderê herne welatê Mûsê Çevtas. Nûsê Çevtasê zirareke mezin bide we.

Padşa mir. Wede derbaz bû, kurê wî rabûn û karê xwe kirin sîyar bûn, çûn seva şera û seva jina. Nezewicîbûn. Ew çûn, bi gotina bavê xwe çûn heman kêleka wî şeherî zwirîn. Keçelok jî bi wanra hatibû. Rêva du- sê cara keçelok kutan, nedihîştin bi wanrabe. Keçelok şûrê bavê xwe kevn tûjkir. Êvarê her şeş birê wî razan. Keçelok (navê wî Mîrzemehmed bû) weysêta bavê xwe kirbû guhê xwe, ew wê şevê raneza. Wextekî şevê lê nihêrî dêwek tê, beroşekî aşayî dêstdaye, hundurê wî beroşî aşayî tijî teyr- tûye. Dêw got:

- Mîrzemehmed, te navê min nebihîstîye, tu hatî mikanê min?

Mîrzemehmed got: - Min bihîstîye, ez hatime.

Dêw got: - Dora mine, dora teye?

Mîrzemehmed got: - Dora teye!

Ewî beraşê aşa Mîrzemehmed werkir. Mîrzemehmed xwe berda alîkî. Mîrzemehmed gihîştê, kutîkir, da ser hev.

Sivê rabûn wêderê rê ketin, çûne şeherê perçe rizyayî. Êvarê ketine odekê. Ew her şeş razan. Keçelok şûrê bavê xwe tûjkir kete ber arîkê odê, xwe veşart. Wextekî şevê Mîrzemehmed nihêrî pîreke hop-hop tê, hat kete hundurê tewlê, berê hesp jimirî. Hesp bûne hefta. Hate odê merî jimirîn. Merî bûne şeşa. Pîrik metel ma, got: "Hesp çima heftin, merî çima şeş?". Xwe- xwera got: "Hilbet barxana xwe lêkirine". Mîrzemehmed jî guhê xwe dida ser pîrê. Pîr ji wir derket û ji nav şeher jî derket. Mîrzemehmed jî tele- tele pey pîrê diçû. Pîrê kete hundurê mixzekê. Pîrê got:

- Lawo, ravin, Xudê risqekî rind daye me.

Her heft kurê pîrê hevra rabûn, derketin derva. Mîrzemehmed ser mixazê sekinî bû. Ew yek- yek derdiketin, Mîrzemehmed lê dida yek-yek kele dikir, ber bi cehme dişand. Her heft jî usa kele kirin. Mîrzemehmed kete hundurê wê mixazê. Pîrê dî, her şeş qîzê pîrê dîtin. Ji pîrê pirskir, got:

- Ka qîza te din?

Pîrê jêra rastî nekir. Ew qîza wê bedew bû. Mîrzemehmed ew hundurê odeke basqeda dît. Mîrzemehmed got: "Em heft birane, heft jî qîzin". Mîrzemehmed rabû hata bal birê xwe. Sivê ji wir jî çûn. Birê wî gotin:- Qe weysêta bavê me ne hate sêrî.

Çûne mikanê Mûsê Çevtas. Çûne hundur oda wî rûniştin, lê nihêrîn Mûsê Çevtas hat, got:

- Mîrzemehmed, te navê min nebihîstîye?

Got: - Min bihîstîye, çima ne bihîstîye?

Mûsê Çevtas bereşekî aşa Mîrzemehmed werkir. Mîrzemehmed xwe berda alîkî. Gihîştê, da ber şûra.

Got: - Mîrzemehmed, tu nikarî min bikujî, canê min gişk polaye, canê min xerab neke.

Mûsê Çevtas wî çaxî ew sê sala girtin, nehîştin tu derada herin, kirne qûl, xwera dane xevatê. Paşê her şeş berdan, keçelok berneda. Keçelok gote birê xwe:

- Weysêta bavê me hate sêrî. Min li wî şeherî heft dêw kuştine şeş qîz hene, her şeş jî xayê hevin, ya çûk odeke başqedane. Herekê yek ji wera, hûnê wêderê herne ewî şeherê kêleka qêmûş. Wira jî min dêwek kuştîye, daye ser hev, hûne wî jî bivînin, herin.

Ewana rabûn wira rêketin. Gotina Mîrzemehmed hate sêrî. Çûne malê. Xelqê pirsî:

- Kanê birê weyî çûk?

Wana got: - Ber şûra, rima çû.

Wana def dewatê xwe kirin. Jina Mîrzemehmed girtin dane kurê wezîr.

Mîrzemehmed Mûsê Çevtasra bû qûl heta mirinê...

Eva jî neheqya dinê...

## 47. TASA PÎRÊ

Hebû, tunebû - dewletîk, mêr û jinik.

Wextekî mêr ket mir. Hebûna wî zef hebû, pîrê go: "Ez çi bikim van zêra, pezê min heye, dewarê min heye ... Go, lazime van zêra xwera tekime tasekê, têda xarina xwe dixum, heta roja dimirim".

Zêrê xwe hilda bir çû cem çilinçî. Çilinçî go:

- Pîrê, Xwedê roja serê min daye, kapêkê evda min herambe, nexarîye. Bîne zêrê xwe bi kişandin bide min, bi kişandin jî bidime te.

Evî rabû zêrê wê kişand:

- A, go, pîrê, divînî - bû du kîlo.

Taseke bi gotina te çilinçî pîrêra hazir kir, go:

- Pîrê, go, ezê heqê xwe du zêra te bistînim.

Rabû gazî pîrê kir: Pîrê lêda çû, tasa wê kişand - bû du kîlo, go:

- Pîrê, dinhêrî ne girane, ne svik, şeyê te, go, min herame. Ka du zêrê min bide min, tasa xwe jî hilde here.

Pîrê du zêrê heqê wî dayê, tasa xwe hilda bir.

Pîrê kuda diçe - gere nanê xwe, xarina xwe wê tasêda bixwe, tasa xwe bişo, têke nava kaxiza, lêde here. Pîrê lêda çû, dî yek dike gazî: "Helîse, helîse", - helîsê difroşe. Pîrê go: "Wele ezê herim helîsekê bixum, birçîme vê sbêda". De nefsa pîra tenike û çû rûnişt, go:

- Helîseçî, tasa xweda ez nan dixum, tasa minda helîsê bîne.

Ewî tas ji destê pîrê girt, gava nihêrî - qe bahê tasê tune, zêre, îdî. Çilinçî tenişta helîseçîda bû, tasêeke wê formê jê stend helîsa pîrê kirê, da ber pîrê.

Pîrê xar, av têwerda, tasa xwe şûşt, hilda çû. Lê qîzek ber destê pîrê dixebiti. Pîrê ki çû, qîzikê go:

- Dya pîr, mala me şorba şîr çêkirîye, ka tasê, tera şorba şîr bînim.

Go: - Lawo, ez têrim, min hewle xarîye.

- E, go, daê, têrbûna şorba şîr çîye, go, şorbe germe, ka tasê, tera bînim.

Qîzikê tas destê pîrê girt, go:- Dayê, ev ne tasa teye, ka tasa te?

- Çawa, go, lawo, ne tasa mine?

- Dayê, tasa te zêre, grane, ev tas sivike: kê tasa te guhartye? - Qîzikê go: - Dayê, Xwedê kir, min tas nebir malê: wekî min çawa bikira - teyê bigota, te guhartîye.

Go: - Ê, lawo, kurê helîseçî bimire,ewî bive- neve tasa min guhêrîye. Lawo, ezê herim tasa xwe bînim, helîseçî nikare tasa min bixwe.

Pîrê vegerya çû cem hewleçî.

- Hewleçî,go,teçira tasika min guhêrîye, ne gune bû - te tasa min guhêrî.

Hewleçî hilda û gotê:- Kêlba heram, çi şerî hatî min alyaî? Min çi zû guhêrî, ez çi zû vegeryam hatim? Te çi daye destê min, min jî hewle kirê daye te, tu şerî vê sibê min alyaî?- Girt pîrê têr kuta.

Pîrê lêda çû qadî hilda, anî ser helîseçî. Lê qadî helîseçî hev nas dikirin: girt çar- pênc zêr da qadî, qadî hilda, go:

- Kelbê, tu şerî vê sibê mêrik alîyayî, çi zû çêkir, çi zû anî da te, xwe çilinçî nîne?

Lê pîrê girya, kete kûça û çû. Pîrê nihêrî bire mşak(pale) serê kûçê rûniştine ser palanê xwe, xwera xeber didin. Mşak go:

- Pîrê, tu çira digirîî, kurê te mirîye, yan qîza te?

- Ê, go, lawo, ne kurê min mirîye, ne qîza min!

Go: - Lê pîrê çi serê te qewimîye?

Pîrê hilda go: - Kurê helîseçî bimire, hal û hewalê min û helîseçî bû ev, tasa min birîye.

Lê mşak go: - Pîrê, tu dîwanê - helîseçî nikarî, tev nasê wîne.

- Ê, go, tu wekî herî cem diz Şemo, Şemo dikare tasa te bistîne bîne.

- Ê, go, lawo, ez mala diz Şemo nas nakim, wê çawabe halê min?

Kurê min, go, wekî tu bêyî, ezê manatekî bidime te. - Manat dayê, lêdan çûn.

Gihîştin mala Şemo, go:- Dya pîr, go, eva mala Şemoye.

Go: - De lêxe here.

Çû, Şemoyê diz wê nav zarêd xweda sekinîye. Çû, hema pêra xwe avîte ser lingê Şemo, kire devê xwe.

- Han, go, dya pîr, min gunekar neke, go, çi li te qewimîye?

Go: - Çi li min qewimîye?Go, kurê helîseçî bimire, go, hal-hewalê min helîseçî eve. Go, tasika mine zêr birîye.

Go: - Dya pîr, welle, min sond xaribû, wekî dizîyê nekim, lê, go, tu pîrî, guneyî, welle ezê îşev herim.

Welle Şemo rabû, hêdîka kincê xwe xwekir, berê xwe da mala helîseçî, çû. Ew çûn, terîye: ser serê helîseçî û jina wî sekinî: nav cîyê xwedanin. Helîseçî hilda gote jina xwe, go:

- Êvda Xwedê,te tas danîye ku? Nişkêva Şemoyê diz tê dive, ha?

Go: - Min kirîye nava kaxizê, danîye ser serê qutya mezin.

Hêdîka Şemoyê diz destê xwe ser serê wanra dirêj kir,tas hilda bir.

Helîseçî go: - Qîzê, ca çirê vêxe, dive tas birin jî?

Çira vêxist, tas tune.

- Ha, go, welle Şemoyê diz tas bir.

Ew rabû, kûçeke dinêda çû, kincê jina xwe werkir, ber dîwarê Şemoyê diz xwe teland. Şemoyê diz hat go:

- A, go, pîrê, go, Xwedê te bîne, go, eva tasa te, - û çû mala xwe.

Jina wî û pîrê hevra xeber didan, ewî go:

- Pîrê, ne min tas da te?

- Lawo, go, ez cem jina teme, xwera xeber didin.

Şemoê diz kete kûçeke dinê revî, çû - pez, dewar, golikê wî temam derxist derva. Şala jina li xwe warkir, xwe da ser bêşîka zara wî - yanê çiçik dide zarê.

Helîseçî tas da destê wê:

- Han, go, Şemoyê diz, pez, dewar, berx temam berdane: wê here unda bive, ezê herim bînim.

Ewî jî tas xlas kir, anî da pîrê.

- An, go, pîrê, eva tasa te!

Pîrê tasa xwe hilda, bir.

Eva jî bû qisa pîrê û Şemoê diz...

## 48. XÛŞK Û HEFT BIRA

Hebû, tunebû pîrek hebû. Qîza pîrê, bê mene, hevalê xweva çûne bndarîkê. Qîza pîrê, bê mene, çû îş xravkir. Hevalê wê çeva xistin, go:

- Wekî tu pak bûyî, heft birê te çûn nêçîrê, çira nehatin?

Qîza pîrê hat, devejenî pîrê bû, go:

- Minra rast bêje, çika birê min kuda çûne, rast nevêjî, ezê serê te lêxim.

Pîrê rabû sêl- kuçik kir, go:- Ezê tera nan lêxim, qelînoka biqelînim.

Qîza pîrê serê xwe hilda, ji hazira neçêtir, terkeselî dinê bû. Çû. Pir çû, Xwedê zanibê, lênihêrî dûkî zelal mixarekê dikişe. Çû ber mixarê, lênihêrî, wê xortekî delal tendûr dadaye, nan, emek hazirkirîye. Gava ku ew wî xortî kivş dive, xort divêje:

- Qîza qenc, were jorê, - divê, - qîza qenc, tu xûşka me, em birê te. Em heft birane, ancax Xwedê tu mera gîhandî.

Salix, sûlixê xwe dide, divê:

- Welle, em birê tene, şîrê me helal bû, Xwedê tu mera gîhandî.

Ew xort xûşkê vedişêre, divê: "Heta birê min bên". Êvarê birê wî tên, nan êmek didin ber, divê:

- Ax, ax, xwezil xûşkeke me hebûya, nan êmek mera hazirkira!

Birakî aqil têda bûye, divê:- Divek te îro tiştek bihîstîye, tu wê pirsê mera divêjî, te çima herşev nedigot?

Xûşk ji cîyê veşartî dertê, xwe davêje pêsîra birê xwe, divê:

- Ez xûşka weme!

Sivê radivin, divê: - Şikir Xwedê, xûşka me mera gîhand.

Her heft bira milê xwe hevra dikin, diçin ra û nêçîrê. Birakî aqil têda bûye, divê:

- Xûşkê, meûja pişîkê bin peltkêdane, nebî- nebî dixuî, tu ku bixweî, wê agirê têda vêse. Agirê teyê vêse - agir dest nakeve.

Qîzik rokê duda usa derbaz dike. Rokê meûja pişîkê dixwe. Sivê radive, tê wedê nan hazirkirinê. Tê tendûra xwe dadide, dinêre agir tune, divê: "Wey- weylêr, min yeke çawa serê xwe kir". Radive ser koçika xwe, dinhêre dûkî zelal wê dikişe, diçe.

Pir here- Xwedê zanibe, hindik here - Xwedê zanibe, diçe digîje agirê dêwa. Agirê dêwa bi meqesê, pirtî agir dibirin didinê. Pişta xwe didê, tê. Dêw radivin pey dikevin, tên. Dike nake dêrî venake. Dêw dibêje:

- Pêçya xwe qlîçê bide me, bê mene, qula dêrîra bese.

Dimêje, dimêje, xûnê jê dimêje diçe. Rokê usa, duda usa, sisya usa, birê wê êvarê tên, divê:

- Xûşkê tu ne tî dibî, ne brçî dibî, tu çira usa belengaz dibî?

- Werin, zêna min unda nekin, evê xûşka me meûjê pişîkê xarîye, çûye agirê dêwa anîye, dêw wa serê wê dikin.

Xûşkê didin çerçerê, xûşk divê:

- Welle, rûyê min ji we reşe, çi ji we veşêrim, hal û hewalê min eve.

Birê wê sivê radivin, çar xwe didin alîkî, sisê xwe didin alîkî, divên:

- Wexta dêw tê, derî veke, bra bê jorê.

De wî wextîda dêw tê, her heft bra lêdidin dêw dikujin. Cendekê wî davêne derva, derê xwe dadidin, tên radizên.

Sivê radivin, her heft bira dîsa diçin raw û nêçîrê. Lê dinêrin xûna dêw wê bûye kanîk dikişe ber koşik sera wan. Bira difikirin, divê:

- Xûşkê, nevî, nevî tu xarinê çê dikî, ava vê kanîê nekî nava xarinê, tê qira me bînî.

Xûşk radive xarinê çêdike, ava wê kêm dive, diçe tûsê tijî dike, berî nav xarinê dike. Êvarê birê wê tên, xarina xwe dixun, cî otaxê xwe datînin, radizên. Sivê radive, ha birê wê rabin, tune, herin paw û nêçîrê. Gava diçe lhêfê ser birê xwe hiltîne, her heft birê wê bûne karê xezala. Divê:- Ezê çawa bikim?

Çîçim çîçanok,
Kêrê tûj dikim bi hesenok,
Çawa min her heft brê xwe kirin karê xezelok?

Sivê radive her hevt birê xwe dide pêşya xwe, dive diçêrîne- karê xezala. Lê dinêre, sîyarekî heşpê boz wêda tê, divê:

- Ha, qîza qenc, tu van karê xezala nafroşî?-divê, - tuê min bistînî?

Divê: - Ezê te bistînim, lê birê minê çawa bin?

Şiva xwe bê mene lêdixe, gişkî dike merî, qîzikê davê terkuya xwe, diçe, dive diçe mala xwe.

Ew çû mrazê xwe şabû, tu jî mrazê xwe şabî, Xwedê bedena te şîn bike, keda te- te bide xarinê.

## 49. ÇÎROKA HEQO, NEHEQO

Merîk dixweze here şiherekî xwera bixebite. Dikeve rêda diçe, rastî rêwîkî tê. Ew jî diçû şiher. Silavê didine hev. Ew herdu rêwî dibine hevalê hev. Navê yekî Heqo bûye, navê yê dinê Neheqo bûye. Wan herdara jî nan hebûye. Duşurmîş dibin berê nanê kê buxun?

Heqo berê nanê xwe bi hevalê xwe dide xarinê. Rîya wana rîya sê- çar roja bûye. Wextê çûînê ewana çolê radizên, sebra wana hev derdikeve. Ew nanê Heqo temam duxun. Wextê nanê Heqo xilas dibe, dixazin nanê Neheqo buxun. Lê Neheqo nazweze nanê xwe bide Heqo. Neheqo nanê xwe nadê. Heqo dimîne birçî. Neheqo hindî diçe qewata wî zêde dibe, lê ya Heqo kêm dibe. Gilîkî Heqo, Neheqo hev diqetin.

Neheqo diçe dighîje şiher. Heqo wê rojê çolê dimîne, duşurmîş dibe çawa bike, çawa neke, wekî gur, hirç, terewil wî nexum. Diçe dikeve mixarekêda. Wê mixarêda çend cîya pûş- pelaş hebûye. Heqo cîyê xwe çêdike, dikeve nava hine pûşda xwe vedşêre.

Wextekî şevê derbaz dibe, Heqo xwe dihese, bin wî pûşîda dinhêre dengê tişta wê mixarêda tê. Heqo gelekî ditirse, dibhê mire- mira hirçê, kûze- kûza gur û rûvî. Heqo tê ser wê fikirê, wekî evana hevra xeber didin, tişta dibêjin, hev didine serwaxtkirinê. Nava wan mitalada Heqo radizê. Wextekî şevê tê xewna wî ew fikir û xwestina hirçê, gur, rûvî.

- Darek nava mêşada heye, wekî ew dara ber nagre, bona me terewila tu tiştî nade, - dibêje hirç-. Menya wê darê ewe, wekî binê wê darêda av heye, menya wê avê koka wê darê naxebite, û nahêle av ji binê erdê derkeve here ser şiher. Bona wê darêye, wekî cimeta şiher kêmasya avê dikşîne.

Gur dibêje: - Kerîkî pêz tê vî alî diçêre. Tûlekî hemis heye, ew nahêle, wekî ez bighîjime keryê pêz xwera tiştekî bigrim û buxum. Kesek tune here bêje padşê şihêr, wekî xûna wî tuleyî dermanê wîye. Gerekê wî tûlêyî şerjêkin, xûna wî li padşêxin, wê qencbe. Wextê wî tûleyî şerjêkin, xûna wî wê padşê qencke, pêsîra min jî wî tûlêyî xilasbe, halê min jî wê pakbe, ezê xwera ji wî kerî carê risqekî jê bigrim, îdara xwe pê bikim.

Rûvî dibêje:- Mişkek heye, ez dixwezim wî buxum, lê ew zêra derdixe derva, radixe, pê şa dibe, hişk dike, ez jî nakime fesalê wî bigrim, buxum.

Evan fikirê wan terewila, sura wana hemû diçû xewna Heqo. Wextê sibê safî dibe, ew terewil her yek diçe şuxulê xwe. Heqo jî diçe berbi wan cîyê wan terewila gotî. Heqo diçe berbi cîyê rûvî gotî. Wan zêra dibîne, xwera wan zêra top dike tîne. Bi dilekî şa diçe berbi şiher, ew zane wekî ew dar jî raste. Wî tûlê hemis ji şivên distîne pênc zêra, xwera dibe şiher. Pê dihese wekî padşa nexaşe, av jî kême. Heqo diçe

bal wî padşê şihêr, wekî nexweşe, dermanê wî jêra dibêje - xûna tûlê hemise, ew jî bal wîye, bi peretî digre difroşe padşê. Padşa xûna wî tûleî xwe dixe û qenc dibe. Derheqa wê darê avê jî dibêje padşê şiher, xwera serê her malekê zêrekî distîne, bi avê wî şeherî dide razîkirinê. Gilîkî, gele zêr xwera qazanc dike, halê xwe xweş dike.

Wextê diçe nava şiher digere, Neheqo dibîne, wekî halekî çetindane, ancax îdara xwe dike. Neheqo dest bi rûvîtyê dike, lefekîyê dike, tewaqe Heqo dike, wekî komekê bide wî, ew jî xwera hine pere, zêr qazancke, usa çawa ewî qazanc kirîye. Hingê Heqo dibêje usa, çawa ewî ew zêrana qazanc kirîye. Neheqo xwe neheqyê digre, diçe wê kûlêda radizê binê pûşda. Hirç, rûvî, gur hevra xeber didin bi zimanê xwe, wekî ewana çi vira dibêjin, derdikeve derva, ew kîye wekî wan gilya bela dike? Ewana sond duxun, wekî kes ji wana tu kesîra nabêjin. Hingê hirç dibêje:

- Lê ew mesela wê darê, tûle, zêra çawane naka tunene? Dar rakirine, padşa qenc bûye, zêrê qula mişkda birine.

Ewan terewila têne ser wê fikrê, wekî kûla wanada merî hene, dengê wana dibhên, nêta wana bela dibe. Rûvî dibê:

- Bisene, ez îro hemû qul bûcaxê kûlê binêrim, kanê kes van dera tune-. Wexta rûvî digere, nava kûlêda binê pûşda Neheqo dibîne. Hirç, gur, rûvî wî duxun.

Hima Heqo dibêje: "Heqo rêda, Neheqo zerêda".

Heq diçe ser heqîyê, neheq diçe ser neheqîyê, welle usane!

## 50. ÎBOYÊ KURMEXARÎ

Îbo emirê xwedê hate ser, ba lê bîter bû. Xwe- xwe jî merivekî dewletî, xweîkofî, xweyrem bû. Canê wî bû birîn, birînê wî kurm ketinêda. Cîyê korîya derzîyê nema bê kurm- her nekete ronaya çeva, nekete zimên, nekete navka dilê wî. Wexta kurm jê dişiqitîn, diketin, ewî ew kurm hildida, davîte ser canê xwe, digo:

- Heywanet, xwedê ez kirime risqê we, hûnê kuda herin?

Hekîma nikarbû qenc kira. Malê wî temam pûç bû, tişt nema.

Jinê go:- Îbo, tiştekî me nema, ez îdî nikarim te xweykim.

Qo:- Evda Xwedê, rast jî şerme, min bive cîkî nenas.

Usa bû: kire nav destexanê, girte destê xwe, kîderê ku eciz dibû, digo:- Min dayne.- Gotêda ser xwe,go:

Kurmê Îboyî zere,
Kurma xarîye sere,
Şikirîme ji ekbere.
Go, Îboyê min sebirê şike,
Kurma xarîye zike,
Şikirîme ji xaliqe.
Kurmê Îbêyî pene,
Kurma xarîye rene,
Şikirîme ji Remane.
Kurmê Îboyî çêye,
Kurma xarîye pêye,
Şikirîme ji Xwedêye.
Dil korêîya remane,
Zmên dikin dua û drozane,
Çev ronaja di çevane,
Kurm nekete nav hersyane.
Sebra min sebira Îbê,
Xwezîya baê nebîya…

Go;- Evda xwedê, de min hilde, go min bghîne avaya, - go, - ez birçîme.

Kulfeta wî bire perê gundekî danî, dîna xwe daê- malek wê nan dipije. Îbê li wir hişt, çu wekî jêra nan bîne, gote xaya malê, go:

- Nexweşekî min heye, nan dixweze.

Go:- De rûnî, nan bixwe, jêra jî bive.

- Ê, go, ne min dûr danîye, ka nanekî bide min, ezê herim.

Xaya malê nanek dayê, ew vegerya çû. Heta vegerya çû, dêlekê hat, destexana Îbîê hilda û revand. Pey dêlê ket, go:

- Dêlikê, min heft sala Îbîê xwey kirîye, tê kuda bivî?- ew nanê dabûnê kewkî kir.

Dêlê nan hilda, destexana Îbîê hişt û çû.

Jin çû, gote jinê, go:- Te minra nan anî?

Go:- Min nan, dêlikê destexana te hilda, go, min avîte ber dêlikê.

- Ê, go yarebî, şikir, hilbe risqê min dinê tunebû, min îdî nebe avaya.

Jinê hilda bir, gelekî çû, çû cîkî xerîbcî. Kanîke li ser rê bû, li ser kanîyê danî, jin girîya.

Qo:- Evda Xwedê, çima digrîî?Xwedê reme.

Qo:- Îvê, go, ne ev xiravcîye, go îdî avayî tune.

Jinê dîna xwe daê, deng tê. Dîna xwe daê- du xort pêva derketin. Herdu xorta go:- Xûşkê, tu çira dgrîî?

Go:- Brayo, hilbe derdekî min heye.

Yekî go:- Xûşkê, ev çîye nava destexana teda?

Jinikê go:- Brayo, dest nedinê, tişt tê tune.

Ewî xortî ser hilda, Îbê dît, go:

- Xûşkê, ev çî teye?

Go:- Helalê mine, mêrê mine.

Ê din go:- Xûşkê, îsal çend sale xwey dikî?

Go:- Brayo, îsal heft salê mine ez xwey dikim.

Çokê wî rast kirin, destê wî rast kirin, lingê wî rast kirin, ava kanîyê pê reşandin.

Jinik girya, go:- Ne ave sare?

Pê destexanê nixamtin. Wexta ji ser hildan: temiz qalikê wî ser çûye, gişt sor, temam sax bûye, ser xwe rûnişt, go:

- Şikir ji Xwedê, evda Xwedê, te dî Xwedê min hate remê.

Ewî jinêva xwe avîtin ser lingê herdu xorta. Ewan ji cêva xwe sêvek derxist, kerkirin, kerîk dane jina wî, kerîk dane wî - jin bû mîna bûkeke ber perdê, ew xwe- xwe jî bû mîna xortekî.

Go:- Emînê rebê min, moletê bidine min, bra der- cînarê min, min vî halîda bibînin.

Îbê û jinêva çûn, der- cînar hatin dîtin, go:

- Wele, tu çawa qenc bûyî?

- Ê, - go, - wexta dibê- Xwedê derd daye, derman jî daye. Xwedê dermanê min da!

Gote jina xwe, go:- Hemîn mirin heye, bese dinyalikî, me herin ba herdu xorta.

Çûne cem herdu xorta, jê zef hîvî kirin, go:- Ruhê me bistîne îdî!

Yekî go:- Bisene, go, ezê herim pirsyara we bikim.

Çû, çû hat, go:- Rebê min gotîye - anemeta wan bistînin buhuşt para wana.

Wan herdu xorta bi destê xwe herdu çel kirin, ew çûne rema Xwedê...

## 51. XELÎFE Û XORTEK

Go carekê yek hebû, dil kete qîza xelîfe, go, go:

- Qîza xwe bide min!

- Erê qurba, go, heger wê gola hanê, zivistane, ave bûze, qerimîye, heger vê golê tuê bikevî hetanî şivê, tu avê derkevî, golê derkevî, werî- tişt te neyê, ezê qîza xwe bidime te.

Ew merî çû kete avê. Hetanî sivê, siveron bû, tevê dayê. Qerewil daye ber sekinîye. Hat bal qerewila,birin bal xelîfê, go:

- Tu derneketîye, xwe germ nekir?Go: -na!

- Kuro, go, te qe îşiq dît?

- Erê welle, go, filan malê, go, fenera wî dişxulî, îşiqa wî xuyî dikir.

- Ha, go, te ber îşiqê te xwe germ kirîye.

Merûmî gotêda, go:Xelîfe, go, tu cimeta xweva sivê mêvanê minin, go, ezê peza xwe şerjêkim, gazî wekim. Go: -Erê.

Peza xwe şerjê kir, gazî wan kir, anî xwera kulav danî, çûn rûniştin. Tendûra xwe dadaye, sîtila xwe danîye ser kulekê.

Evana gelekî rûniştin, dêna xwe danê ne nan heye, ne av heye, ne tiştekî tîne.

- Canim, go, kanê?Te go :"Ezê gazî wekim", nan-xarinê bîne em bixun.

Go:-Bira bikele, ezê bînim werim!

- Ê, go, kanê ser tendûrê tineye?

Go: - Ser kulekêye, bra bikele.

- Ê, go, mala te xiravbe, kulek ku, tendûr kû? Wê çawa bikele?

- Ê, go mala te neşewite, lê, go, îşiqa lempê ku, gol kîderê? Tu divêjî min "xwe ber îşiqê germ kirîye", kîjan, go, xwe ber îşiqê germ dike?

Dêmek, gotina wî ser wêderê, xelîfe qîza xwe girt da wî xortî.

Ew çûn mirazê xwe şabûn.

## 52. BELÛL

Gotina gotîya, go Belûl, ku jêra digotin Berî, emirê xweda hebû hetanî sî-çil salî. Go, ewî tevî zara dileîst, xwera diçû meydana kolik çêdikirin.

Şevekî jina xelîfe xewna xwe divîne, wekî kolikek Berî standîye, wekî nava baxê cinetê nola qesreke sipî, têda pûniştîye. Sivê radive, divê: "Qirar qetem be, ezê gatekî Berîra çêkim, bivim herim, kolkekê jê bistînim". Divêje hêwîya xwe, divê:

- Rave, qasekî em herin bigerin.

Diçin digerin, rastî zara tên, xwera dileîzin. Gate dide Berî, divê:

- Berî, kolikek nav kolikê xwe bifroşe min.

Hêwîya wê pê dikene, divê:- Heyla, xwelî li serê xwe kirê, tu jî nola zara, mala te kavil be, tuê çi kolikê bikî?

Divê:- Na, dilê min dixeze, ez xwera distînim.

Gate dide Berî, xwera diçe kolikêda qasekê rûdinê. Hêwîya wê divêje:-Canim, rave, em herin.

Radivin, derdikevin, diçin. Diçine malda. Wê şevê disene. Hêwîya wê tê xewnê, wekîk ew hewîya wêye dêmek, kolik stendîye wê qesreke sipîda, nav baxê cinetê- wê qesirêda rûniştîye. Sivê divêje hewîya xwe.

Divê-Rave, em herin, - idî navêje mi tu ha xewna xwe dîtî, - divê, - rave em herin, ez jî dixazim kolikek ji Berî bistînim.

Dibê: -Erê, em herin.

Radivin diçin, ewê jî gate çêdike. Divêje Belûl, divê:

- Berî, ka kolikekê jî bide min.

Divê:- Na, nadim! Divê:- Çima nadî?

Divê:- Ez nadim!

- Te çima daye hewîya min, nadî min?

Yeke wê, yekî wî -Berî nadêda.

- Han tera zêrekî.

Divê:- Nadim! -Han tera du zêra.

Divê: -Nadim!

- Tera deh zêr.

Divê:-Nadim, nadim....

Ser wê derê, sondekî dixwe. Şerekî davêje Berî. Diçe dîwana Xelîfê, por-morê xwe vedirû, kinc-mincê xwe diqelişe, divê:

- Hal-hewalê min, birê te eve. Birê teyî cinû hatîye dora min, xwe avîtîye min...

Nava cimetêda Xelîfe şerm dike, wê sehetê dişîne pey Berî, tîne. Gazî Berî dike, divê: -Celat!

Celat hazir disekine. Divê:-Gere hûn serê Berî lêdin.

Ew cimet disekine, divê:-Filankes, -divê, - Berî merîkî serte, - divê, - çima çi kirîye? Welle tiştê usa nave, -divê, - şer avîtîye.

Divê: - Na, jina min rast divêje, gotin-gotina jina mine.

Berî dêna xwe didê, wê bikuje, divê:

- Erê, bira, çi heye tema dê bavane: ez û tu dê bavekîne. Were lingê xwe bide ser lingê min, destê xwe bide ser destê min, ez enîya te paçkim, serê min lêde, çi heye?

Wexta ew usa dike, Berî kiryameta Xwedê pêra hebûye-davêje, diçe heft seveqa diçe, diçe şeherê Bexdaê, wê topraxê unda dive.

Xelîfe diçe pey birê xwe. Diçe dêmekê digere, diçe nava şeherekî, merîyê şeher dipirse, divê:

- Hûn nizanin Bexda kîalîye?

- Na, em nizanin, navê Bexdaê tu divêjî me nedîtîye, em nizanin kîderêye. Merivekî mezin tucare, ew digerin. Carekî here bal wî, bipirse, heger ew bizanbe.

Diçe bal wî merî, dêna xwe didê - merîkî kalî extîyar. Selamê didê. Selamê vedigire, divê:

- Flankes, ez hatime bal te, -divê, - tu merîkî geryayî, tu nizanî şeherê Bexdaê kîderêye?

Divê:- Ez wê derê qe welle nizanim, tu divêjî guhê minda diçe - mi ne bihîstîye navê Bexdaê, - ew divêje, - here bal birê minî mezin, min mezintir -filan gundî.

Diçe wêderê dipirse mala birê wî, diçe dêna xwe didê, birê wî têlê sipî ketîye nava. Divê:

- Tu birê flnkesê mezinî?

Divê: -Erê!

Divê: - Ez hatime bal te, pirsekî ji te bikim.

Divê: - Keremke!

Divê: - Tu nizanî şeherê Bexdaê kîderêye?

Divê:- Flankes, ez nizanim, navê Bexdaê min nebihîstîye.

- Lê, -divê, - ez çawa bizanbim?

Divê:-Here filan gundî, biraê min mezintir wêderêye, heger ew bizanbe?

Diçe wî gundî dipirse, brê wî mezinra dibê:

- Flankes, ez hatime bal te, pirsekê te bikim. Tu nizanî şeherê Bexdayê kîderêye?

- Erê, -divê, - şeherê Bexdaê ez nizanim, lê kanîk rast fêza gundê meda heye, dareke ser wê kanîye, kanîya Zîyarete. Înî -înî teyrekî sipî heye- tê serê wê darê datîne, divêje, divê: "Belûlî Bexdaye". Her wêderê mi bihîstîye, wekî "Belûlî Bexdaê" divêjin.

Divê: - Ez ba herdu birê te bûme, tu birê wanî mezinî, dêna xwe didimê - ber çevê min tu sî-çil salîî, ji wana cahiltir dixênî, ew çi hesavîye?

Divê:- Qurba, çi hesavîye?- jina xwera, divê, - kulfet!

Divê:- Çîye?

Divê:- Here mera padvalê (zêrzemîne), zeveşekê mera bîne were.

Jina wî diçe padvalê, gotina gotîya, padvala wî çil nerdewan bûye.Diçe wêderê, zeveşek mala wîda heye. Wê zeveşê hildide tîne tê.

Divê:- Na, eva negihîştîye, bive here, zeveşeke din bîne.

Jinik carkê dive padvalê, carke tê, dîsa wê zeveşê tîne...Heta deh carî mêrik wêya paşda dişîne. Hemîn tenê ev zeveş bûye, jinikê negotîye, wekî tu vî halîda aqa cara mi dişînî, qest ber mêvîn divêjî- “ya mezin bîne”, ”ya gihîştî bîne”...ez jî tim vêya tînim.

Divê:- Qurba, jina min csinê merivane, jina birê minî ortê - cisnê kerane, jina birê minî biçûk- ew cisinê dêlikane, yê kûçkane, de halê birêd min jî wê çawa be?

- Belê, belê...

Ser wêderê dimîne. Rojekî dêna xwe didê, roja înîyê cimet karê xwe kirin, diçine ber Zîyaretê. Ew jî tevî wana diçe ber Zîyaretê. Teyrek tê, ser darê datîne. Ewana heger qurbana divin, xarin-marina divin, dixun, xwera kêf dikin. Ew hemin Berî wî nas dike -Xelîfeye, lê Xelîfe nas nake, divê:"teyre, ez çi zanim çi-teyre?"...

Ewanê te tên, gotina gotîya, wexta ew biçûna vegeryana, gere ew teyr jî bifirya, biçûya. Ew vedigerin, şûnda tên herine malê xwe, teyr nafire. Eva ber bi teyr diçe, dest davêje lingê teyr, teyr piranya dide xwe dive, diçe ber mala kalê, Xelîfe dest baskê wî peya dike. Wexta peya dive erdê -dîsa cinsê Berîye, xwe davêje dest-rûê birê.

- Xwedê mi qurbana teke, kiryameta te ha jî heye?

- A, -divê, -tu divînî, paşê min bîr tînî?

Ser wêderê gotê, go:-Bira, go, were ez te bizewicînim.

- Erê, go, çi heye, go birê minî mi bizewicîne: nîşanîkî minra bistîne, go, mi çi qîz xwestîye, go, bive nîşanke, minra bixweze.

Divê:- De were em herine şeher.

Ew Berî tev diçin, Berî diçe ber kevirekê, lingê xwe kêvir dixe, derîkî ber vedive, diçe hundur. Dîna xwe didê- şehere, fenerin, îşiqe, dikanin...Lê digere, divêje:

- Bira, were wê gistîla hanê minra bistîne.

Divê:-Qurba, lê qîmetê wê çîye?

Divê:- Sed zêr.

Divê:- Sed zêr baha nîne?

Divê:-Bahaye!

- Ê, -divê, - baha bahaye. Em herine dikana hanê, bazineke zêr minra bistîne. .

Diçin wê dikanê, bazinê zêr bazar dike, divê:

- Çiqasî?Divê: - Dusid zêr.

- Dusid zêr, go, bihaye.

Divê:- De em herine dikana hanê, qerefîlekê bistîne.

Divê:- Qîmetê wê çîye?Divê:- Sêsid zêr.

Divê:- Tiştekî usane, emê çawa bistînin?.

Divê:-De were em herine malê.

Lê çi? Wexta lingê xwe derî dixe, derî vedive, dêna xwe didê, yeke horî, du kurê wê hene, merî hizmetkare lê binhêre. Têda sekinîye, divêje:-Xelîfe, -divê, - eva kulfeta mine, eva jî zarê minin, eva hebûna han jî temam ya mine.

De ew kolik nava baxê cinetêda, ku herd hêwî xewnê xweda dîtibûn- hema ev cî bûye.

Divê:- Heyfa min tê wê heyfê, ku te nezan-nezan gura jina xwe kir. De ew jî bira tesmîlî Xwedêbe, - zêr, zîv dide birê xwe, jêra oxirê dixweze, verêdike, diçe.

## 53. ÎSKENDERÎ ZUQURNE

Îskenderî Zuqurne padşa bu. Wextekêda serê wîda stru şîn bûn. Kete halekî xirav, derheqa struê wîda nedixwest dinê bela be, lema jî dişande pey delaka: kîjan delakê serê wî kurkira, serê wî delakî lêdixist, o wî qrarî serê gele-gele delaka lêxist. Rokê jî şande pey delakekî. Pey serî kurkirinê, ewî delakî adkir:

- Wekî tu serê min lênexî, ez tu kesîra gilî nakim, wekî Îskenderî bi struye.

Îskenderî Zuqurne ew bawer kir û destê xwe nedayê.

Eva delakê han adkir, tu qûl û bendîra glî nekir.

Wextekêda merazek li canê wî delakîda peyda bû, werimî. Gelekî ser hekîma, doxtira gerîya, tu meraza wî sax nebû.

Carekê hekîmekî jêra got:

- Te adkirîye, heta tu wê ada xwe gilî nekî, meraza te sax nabe.

Ewî got: - Min ad kirîye, wekî tu qûl û benî ji devê min nabihê.

Go:- Ew zef rihete: here cîkî xewle, ser çelekê bêje- min wa kirîye, hemîn meraza teyê jî sax be, ada te jî tê cî, bê, wekî te kesîra negotîye.

Eva rabû çû cîkî xewle.Çelek hebû. Di hundurê çelêda sekinî, go:

- Çelê, Îskenderî Zuqurne struê wî hene…

Wextek sekinî. Ji wê çelê du smilê genim şîn bûn. Ew herdu smilê genim li hev ketin, go:

- Cimet, bizanbe, Îskenderî Zuqurne du struyê wî hene!

Ewê wextê dengê wî bi dinyayê ket: "Îskenderî Zuqurne dustruye".

- Axir, birê min, dnêda tişt nayê veşartinê!

## 54. ŞIVANÊ AQILBEND

Padişa gote wezîrê xwe:

- Gere tu herî heft sala dinyayê bigerî: te çi bihîstîye, çi dîtîye binvîse were, bêje.

Wezîrê wî çû, gelekî gerya, heft salê wî temam bû, wexta zivirî were ciyê xwe, dêna xwe dayê du merî rast hatin, du merîyê maqûle temiz rast hatin. Selam da wan merîya, wana jî selama wî vegirtin. Ewê te jê dûr ketin- yek padişa bû, yek jî wezîr bû- yê welatekî din, wekî hatibûn, ew jî bigerin heft sala. Ewî wezîrê padişa gote padişa:

- Ewî rastî me hatî, go, selama wî usa kivş kir, anê padişa bû, an jî wezîrê padişa bû.

Go:- Çawa?

Go:- Mi usa texmîn kir.

- De, go, gazîke, bra bisene.

Gazî kir, go:- Bisene!

Çûne bal, go:-Tu padişayî, an wezîrê padişayî?

Go:- Welle, ez padişa nînim, ez wezîrê padişême.

- Tu niha ku têyî?

Go:- Welle, padişaê min emir kirîye, gere heft sala ez dinê bigerim : qencî, xravî çi min dîtîye, ezê herim bêjimê.

Go:- Wekî usane, ez padişame, eva jî wezîrê mine, were, tev me were, em herin, heft sala em jî bigerin, em tev warin.

Go:- Belê!

Wexta go "belê", wanara qederkê çû,dşurmîş bû, go :"Min çi kir, "belê heye belaye", min çi kir? Îsal heft salê mine ez geryame, wekî heftê dinê jî bigerim- dive çarde sal. Çarde sala ez herim mala min, an jî padişa wê bê kuştin, an jî nayêne hewar, wê dest ji min bikşînin". Duşurmîş bû, go:-Padişa saxbe, ez tiştekî bêjim?

Go:- Keremke!

Go: - Padişa saxbe, go, ra çi nave?

Go:- Ra li jina xrav nave.

Wezîrê padişê jî go:- Ra li cînarê xrav nave.

Ewî jî go:- Na, ra emelê xrav nave.

Hersêka kire mecale, go:

- De were emê merîkî bipirsin, ka gotina kîjanî raste?-dêna xwe danê şivanek wêderêye, ber bire peze, dageryan, çûne bal şivên:

Gotin: - Bereketbe!

Go:- Ser çeva hatine, maqûlê min, keremkin. .

Go: - Ez pirsekê te bikim. Go me kirîye mecale, go, padişa gotîye- ra li jina xrav nave, wezîr jî gotîye- na, ra li cînarê xrav nave, min jî gotîye -ra li emelê xrav nave. Hersêka gotina kîjanêye?

Şivan go:- Hûn maqulin, hûn zêdene, ez merîkî şivanim, cahil : ez çi zanim, gere hûn bizanbin.

- Na, na aqilê xwe, bizanbî ra kîjanîdane?

- Filankes, go, jina xrav-xirave, go, xaykî, nayê xaykirinê, go, berde-jineke din bîne. Cînarê xrav, go xirave, pêra derbazke, derbazî pêra nave -mala xwe wêderê barke, here cîkî dinê. Lê go, xebera vî merîye, go, ra li emelê xrav nave.Emelê xrav,divê,merîê gora ranavin,emelê xrav çê navin.

- A, gotin, hemî xeber xebera teye!

Wezîr go: - Min îzina xwe xwestîye şeş-heft sala dinyayê bigerim. Heft salê min temam bûye, we go:"were, tevî me were". Min go:"belê". Belê heye belaye. Ezê ha dixwezim vî tiştî bêjim. Îsal çend sale, ez wezîrê padişame, min tiştekî, dêmek, derew nekirîye, wextê min temam bûye. Usane, wekî ez neçim, paşê ew jî dive pirseke dinê...Gotina şivîn jî hemîn serê lodê girt.

Go:- Wekî usane, tera oxirbe, here...

## 55. MIRINA WEZÎR

Wezîr rokê hat, go:

- Zanî, padşa, wê sivê dinya xirav be.

Padşa jêra got: - Wezîr, wê dinê çira xirav be?

Go:- Wê xravbe, miqîm!

Go:-Xrav neve, ezê serê te miqîm lêxim, were qol bike: sivê xrav neve-sere te çû.

Cimeta padşê bela dive.

Wezîr çû mala xwe, kaxezek da ber xwe, têda nvîsî: "Padşa, mala te xrav neve, te nego, çika ez wezîrê xwe pirs kim, çika dinyayê çawa xrav be? Te nego dinê hina minda xrav bû - çima ku ez îdî dmirim, çî minrane dû minra dinê şên be-çî minrane, şên nebe- çî minrane?

Sivetirê padşê go:-Herin gazî wezîrkin, wekî ez serê wî lêxim.

Çûn nihêrîn wezîr mirîye, hatin cav dane padşê.

Padşê go:- Rastî gotina wezîrê min derket.

## 56. AQIL

Carekê du merivê xwendî diçin nava gundekî. Diwestin, ber dêrê rûdinîn, nanê xwe dixun, rihet dibin. Hevalek dinhêre ser kevirekî dêrê nivîsîye:"Aqil ji yaşê mêriv nîne, serê mêrivaye". Gazî hevalê xwe dike, heval lê dinhêre-raste, dibê:

- Bin vî kevirîda bizanbe zêr hene.

Êvarê tên kevir radikin, binda gum-gum zêr divînin,xwera divin.

## 57. AŞÊ XAL Û XARZÎ

Genimê xarzî ya hêrandinê hebû. Go: " Ezê bivim herim aşê xalê xwe, ewê heqê hêrandinê wê kêm hilde". Genimê xwe bar kir, berê xwe da aşê xalê xwe.

Xal jî, gava xarzîyê xwe dît, şa bû, xwe-xwe xwera go:"Xarzîyê minê wa tê, ewê heqê hêrandinê zefî bide min"...

Her yek kara xwe digere.

Lema heta niha jî, gava pirseke usa tê ortê, ha-hanga dibêjin:

- Ew bû qisa - aşê xal û xarzîya.

## 58. KESÎB Û DEWLETÎ

Wextekê kesîbek hebûye, zef belengaz bûye, dême, hema usa stuê wî xelqêda xar bûye.

Rokê rûdinî ji xwera duşurmîş dive, divê :" Eva saxya min çirane?, divê, lazime ki hema ez herim cîkî xwe dardakim, hesabê dinê xwera xlas bim". Diçe mala xwe, warisekî hiltîne, qraxê gund avaîk hebûye, xalî, kes tê tunebûye, diçe ku xwe dardake. Gava diçe, dinêre, dewletîyê hebûna wî zef bûye, wê li kapda dardane, xeniqîye. Eva xêlekê lê temaşe dike, divê:

- Êhê... Xwedê zane, ez tucara xwe darda nakim!

Dizvire tê mala xwe, jina xwera divê:

- Keçê, -divê, - tu nizanî çi hewal hate serê min. Dilê min rabû, ez çûm xwe dardakim, min gava nihêrî dewlemendê me wê xwe darda kirîye, usa jî ez gelekî duşurmîş bûm, min go:"Hema ya qenc ewe, ez hema ker-lal herim nav zarê xwe",ha,jinik ew aqilî bû, yan bêaqilî bû?

Jina wî divê: - Aqil ji wî aqilî zêdetir tune, te qenc kirîye.

## 59. TEMO Û TAHAR

Carekê hebûye tunebûye du heval hebûne. Ewana xulamê dewletîkî bûne. Wextê herdu heval dizewicin- heqê wan têra wan nake. Rokê Tahar divê:

- Hetanî naha em tenê bona nefsa xwe duşurmîş dibûn, lê naha borc ketîye stîyê me.Were em herin cîkî xebateke xêr bivînin, pê ebûrê xwe bikin.

Rokî Tahar û Temo terkeseryatî dinê divin. Pir diçin, hindik diçin digihîjine şeherekê. Temo divê:

- Bira, sala me ku temam bû em gerekê vira rastî hev bên, ber vê darê.

Ber darê rûniştin, nanê xwe xarin, çûn dest-riyêd hevdu, xatirê xwe xastin û hevdu dûr ketin.

Temo bal axakî bû seyîs, ewî gelekî helal dixebitî. Bona helalya wî axa gelekî ji wî hiz kir.

Temo gelekî aqil û helal bû. Sala wî temam bû, axê go:

- Neçe, lawo, ezê heqê te zêdekim...

Lê Temo go:-Xudê qapîyê te şênke, ezê herim serîkî malêxim, dîsa bêm cem te. Ezî teze zewicî bûm- nahaka çevêd neferêd min rîya mine.

Bira Temo karê xwe bike. Em bizvirine cem Tahar. Ew xanekîda pale dixebite. Çi ku heqê xwe distîne tevî xumarbaza - rojê duxe. Wexta sala wî temam dive -tiştekî wî tunebûye, ku bive nav neferê xwe.

Herdu heval cîyê kivşkirî rastî hevdu tên, diçin dest-rîyêd hevdu.

Temo go:-Bira, minra nan heye, were em bixun, paşê rêkevin, - Temo nan derxist û go, -bira, ka keda teye salekê? Tê çi bivî nav nefera?

Tahar go:-Xudê reme.

Wextê wana nan xarin, Temo derê mêşokê xwe girêda, wedê rabû, Tahar go:-Rûnî, raneve, ezê te bikujim!

Temo go:-Ya Xudê ketî, hatî nava xumarbaza bê Xudê bûyî? Hanê piştoyêd min tera, tu here, lê ezê îsal jî vir bimînim, -ewî kir-nekir xwe ji Tahar xilaz nekir, go, -Tu tesmîlî Xudêbî, wextê em hatin vir-kulfeta min hemle bû, nahaka ew welidîye: eger qîz anîbe, bera navê wê daynin Hêçidan hêç, xê kur anîbe bira navê wî daynin Şervar şuretyoxtir…

Paşî va temîya ew Temo dikuje, piştoyêd wî hildide diçe malê. Wextê kulfeta Temo pê dihise bona hatina Tahar, diçe cem- pirsa mêrê xwe bike. Tahar divê:

- Xûşkê, ez korbim, ew satircemî bû, mir. Axê wî gazî min kir, ez çûm, Temo go: "Eger kulfeta min qîz anîbe-bera navê wê dayne Hêçidan hêç, xê kur anîbe- navê wî bera dayne Şervar şuretyoxtir".

Jinka belengaz digirî, diçe malê, navê kurê xwe usa jî datîne.

Gele wext diçe, gede mezin dive. Rokî qasidê padşê tê mala axê wan. Axa divê:

- Kuro, Şervar, gazî emetêke bona padişê û qrarêd wîye teze.

Qasidî merîkî dinêdîtî aqil bû, ewî go:

- Kuro, kî ew nav te kirîye?

Ça ku qewimîye, gede usa jî qasidra gilî dike. Qasid merî şandin pey Tahar. Taharra divê:

- Kuro, bêje, te bavê vî xortî ça kirîye?.

Tahar sond dixwe, ku ewî dest nedaye, ew satircemî bûye.

Qasid divê:- Kuro, tu heywanî-gîha didî ber kî?Ew navê gede xwexwe dibê ku te kuştîye. Ewî gotîye-herge qîzbe-hêçe, ezê bê heyf herim, herge kurbe, wê heyfa min hilîne…

Gazî du xulama dikin, Tahar rind, gotina te, dikutin. Paşê, ew xwe mukur tê ça mêrik kuştîye, ça hûr-mûrê wî xwera anîye.

Ber cimetê Tahar darda dikin...

Ew çû ser bela xwe vebû...lê hûn tucara usa bêbestiyê hevalêd xura nekin. Aqa!

## 60. SÊ KOSE

Carekê jinek û mêrek hebûn. Jinikê gote mêrê xwe:

- Çêleka me bibe birfoşe, mera bide kinc, bîne were.

Mêrik rabû çêlek bir, ço meydanê. Wir kose bûn, go:

- Qurba, go, tu bizina xwe ça didî?

- Heyran, qurban, go çêleke!

Go:- Na, em tera dibêjin bizin, go, bizine!

- Canim, go, ezê vê bazarê nefroşim, ezê bivim bazara dinê birfoşim.

Dîsa kosekî mîna wî koseyî gotê: - Wê gîska xwe narfoşî?

Go:- Canim, çêleke! Go:- na, gîsike.

Rabû bir bazara dinê. Dîsa kosek rast hat, ewî jî go - bizine (de ew kose brê hev bûn).

Evê te rabû çêlek qîmetê bizinê da, hate mala xwe, go:

- Hal û hewalê min kose ev.

Go:- Kosa tu xapandî. -Jinikê rabû, go, -bira kose qurbanî min kiribin.

Rabû tewlêda çelek kola. Rabû deste kincê rind xwe kir, ço meydanê. Ço ba kosê mezin.

- Mêrê min, go, bazirganbaşîye, go, şandîye sed zêrî minra bişîne. Go, - bazirganê wî grtine, go, gurmikê dixin, go, sed zêrî bide min, go dewsa sed zêrî, ezê sed pêncî zêrî bidim.

Kose wa dîna xwe dayê, go:- Tuyê serê xwe minra têkî yek?Mala te kî tangêye?

Go:- Ha kûça hane. Go:- Seheta çenda ez werim?

Go:- Ya çara were, ez serê xwe tera têkim yek.

Ço rastî yê dinê hat.Go:- Seheta çenda bêm?

Go:- Ya pênca were.

Yê dinêra go:-Şeşa were.

Yê ewil destmalek tujî êmîş kir, da rîya xwe, ço. Ewê mêrê xwe serwext kir, go:

- Ew ku hate hundur, weke nîv sehetê bisekine, paşê zengila bide hevdu. Ewê bêje: "çi zengile?". Ezê bêjim: "Welle bazirganê mêrê min hat".

Usa jî got, kose go:-Tuyê niha çawa min bikî?

Go:- Ezê te têkime bîrêda, heta mêrê min hat raza, ezê te derbazkim. he

Yê dinê hat seheta pênca. Destxan tijî êmîş kir, xwera çerez kirin. De dîsa jinikê usa anî serê wî. Yê dinê jî seheta şeşa hat, dîsa usa.

Ewana çawa mêrê wê xapand, ewê jî ew ecêv anî serê wan. Heqyata xwe stend, teze verêkir, çon.

## 61. BILBIL

Bilbil teyrekî çûçik bû. Mirîşkê çû qomsitîya wî kir, mirîşkê û reşêlekê: wekîk çiqa teyr hebûn çûn cem Slêman pêxember - şikyatê wî kirin, go:

- Teyrekî wa çûçike, şevda radive, bîstûçar zimana dixûne, nahêle em razên.

Slêman pêxember go:- Ew çi teyrekî teyrane? Ewî ne bin mor û mizefta midane?- hingê teyrê bez kivş kir, go, - Teyrê bez, gere tu herî wî bilbilî sax bigirî minra bînî.

Teyrê bez çû, nerm xeber da, ew jî hêlînê xwedane, maşoqê gulêye, çika gulê kengê bibişkive. Teyrê bez nerm gotê:

- Hukumê Slêman pêxembere, go, rave, gazî te dike.

Ewî gote teyr, go :-Here bêje Slêman pêxember, ez yê nolî Slêman pêxember nahêlim bên binpîya dîwana min.

Teyrê bez vegerya hate cem Slêman pêxember.

Slêman pêxember go :-Ka, te çira nanî?

Ewî go:- Gote min, yê nolî Slêman pêxember nahêlim bê binpîya dîwana min. .

Careke dinê Slêman pêxember kire ser teyrê bez, go :

- Tînî, bîne, neynî - ezê serê te lêxim.

Teyrê bez rabû çû. Çû. Dengê wî seh dike, lê nedîtîye qalibê wî çawane, çika çiqase. Çû pêra hêrs xeberda, hingê ewî go:

- Tera dibêm, rabe me herin.- Hingê gotê, go:

- Tu ne teyrekî teyrê refa,

Ezê te bigirim pê herdu kefa...

Hingê xrûşî ser kir, girt, îdî go:Boy xwedêbe, lingê xwe min neşidîne, go, te ez kuştim, go, te parxanê min şkênandin.

Hingê gotê: - Ez anemetê xwe ji gula bixwezim, dîsa ezê bêm.

Go:- Anemet, anemet gula sor, zere,

Hatîye ser min hukumê Slêman pêxembere.

Anemet, anemet, gula sor û sipîye,

Hatîye ser min hukumê Slêman pêxember bi eynîye.

Hingê teyrê bez bir ber Slêman pêxember danî. Slêman pêxember gazî teyra tevî kir, gote reşêlekekê: reşêlek berê teyrikeke spî bû, hihgê reş bû, go:

- Lê te digo, bilbil koka me teva anîye, ne eve? -Gazî mirîşkê kir, hingê mirîşk difirya, teyrka çolê bû, hingê nifir kir, go, - heta kadînê fira te hebe,tu bikevî ber destê evdê serreş, go,-eva çîye, te qomsîtîya wî kir?

Hingê dîsa îzina bilbil da, go:

- Heyran, dîsa here cîyê xwe, ji ku hatî-here wêderê.

## 62. ÇÎROKA MESÎ

Merîkî kal hebû. Ew kurê xweva diçûn ber berê, torê bavên berê, mesîya bigirin. Rokê mesî girtin, mesîkî mezin ket tora wan. Ji granbûna mesî nikarbûn tora xwe ji berê derxin. Ewî kurê xwera got, go:

- Ez û tu nikarin derxin, tu torê bigire, ez herim merîya bînim, alî me derxin.

Bav çû merîya bîne. Mesî kurê wîra xeberda, go:

- Bavê te wê min bive bifroşe, bide çend pera, go, gura bavê xwe neke, min berde, ezê kêrî te bêm wextekê.

Gede gura mesî kir, mesî berî berê da. Heta bavê gede hat, gede mesî berdaye. Kurê xwera kir şer, go:

- Te çima mesî berdaye?

Usa ew, kurê xweva hatin mala xwe. Gelekî qirika kurê xwe girt, bezî seba mesî. Kurê wî xeyîdî, da ser rê, alîkî çû. Çû dîna xwe dayê merîkî kal rast hat. Selam dayê, selama wî vegirt. Kalê jêra got:

- Tu çi dixwezî, kurê delal?

Go:- Ez herim şeherekî xwera bixevitim, kesî min tune.

Kalê go: -Welle, ezê jî herim xwera bixevitim.

Bûn heval, çûn tevayî xevitîn. Salekê, duda xevitîn, pere gelek ketin destê wana, kalê jêra got:

- Here xwezgînîyê qîza padişê, ez tera bixwezim.

Gede çû xwezgînya qîza padişê. Qelenê pir xwest, gede da, go :

- Ezê bidim.

Kalê, gede çi kû xevitîbûn dane qelenê qîza padişê. Bûka xwe anîn. Karê xwe kirin, go:

- Emê herin mala xwe.

Ji şeher derketin, çûn. Hatin nîvê rê gede kalêra got:

- Ez tu gere cihê bin, go, te ez zewicandime, te perê xwe daye, çi hebûn maye-ji tera.

Kalê qebûl nekir, kalê go:

- Na, raste min tera qîz anîye, lê çi hebûna me heye gere em par vekin: nîvî min, nîvî te.

Çi hebûn ku hebû rast nîvî kir -nîvî wî, nîvî gede. Go:

- Çî me ma?-go, - tenê tûla me ma, gere wêya jî parvekin.

Gede kenî, go: - Emê çawa parvekin?.

Şûrê xwe kişand, tûlê xist, bû du qeta, go, -a, nîvî min, nîvî te.

Go:-Îda çi ma? Go, qîzik ma, go, gere ewê jî nîvîkim- nîvî min, nîvî te.

Ewî şûrê xwe kişand, xwe gîhand keçikê, wekî bikuje. Keçik tirsya: du mer ji bêwla wê derketin. Wekî usa nekira, şevekê ew mer wê gede bikuşta.

Kalê gedera go:- Ez ew mesî bûm, yêk te ez berdam.... ez xilazkirim, îja ez hatim pêşya te. Eva mala gişk tera anî, eva jina- min tera anî, go, para min jî ji tera, de xatirê te - bû mesî û kete avê.

Gede malê xwe û jina xwe hilanî, hate mala xwe. Mala wî bû şayî, du şeva defê xistin, dewat kirin.

Ew çûne mrazê xwe şabûn, hûn jî herin mrazê xwe şabin.

## 63. DIZ Û PADŞA

Wextekê diz li şeherê padşê bîter bû. Evan diza ev şeher talan kirin, kesekî nizanbû kîne. Padşê rokê wezîrê xwera got:

- Em çawa bikin, wan diza bigirin.Go, - wezîr, tu dewsa min rûnî, ezê herim.

Û ewî kincê xwe guhastin, şev çû nava şeherê xwe gerya. Rastî sê merîya hat. Wexta padşa rastî wana hat, yekî ji wana go:

- Ewa hana padşaye!

Yê dinê go;-Ew çira padşaye, padşayê vê şevê çi bigere?- û wana ji padşê pirsî, go:-Tu kîyî?

Padşê go:- Hûn çi bikin, ez jî hevalê we.

- Ê, go, bêje, çi destê te tê?

Go:- Destê min tê, meriv herin ber celatê, ez xlas bikim, - îja padşê ji wanara go, - çi destê we tê?

Yekî go:- Ez zmanê kûçka zanim.

Yê duda go:- Wekî şevreş be, kîjan merî rastî min bê, ez nas dikim.

Yê sisya got:- Ez diçim ber derê kîjan dikanê, derî min vedive.

Padşê go :- Em niha kuda herin?

Wana jî go:- Emê herin dzîya xizna padşê. Padşa go :- Em herin!

Wexta çûn nêzîkî mala padşê bûn, kûçik ewtîya. Yekî go:

- Kûçik divê- padşa werane!

Hevalê wî got: - Heyran, padşê çi, padşa mera ku hat?

Padşê go: - De bike em zû herin.

Nêzîkî mala padşê bûn, tûlê padşê ewtîya. Yekî ji wana dîsa go:

- Tûle divê- padşa werane, neçin!

Hevalê wî pê kenyan, go:

- Qê tu îşev xrav razayî, - go, - em herin.

Çûn derê xiznê ber wana vebûn û dadanê mêşok tijî kirin. Dilê padşê êşya, go:

- Gelî camêra nekin cêvêd xwe, emê bivin li hev parvekin.

Û birin çûn koka darekêda çelkirin. Padşa go:

- De were, em cîyê malê xwe û nûmêrê malê xwe hevra bêjin.

Û hevra gotin. Padşê go:

- De em belavin, herine malê xwe, emê sivê êvarê bên hev parvekin, - û padşa çû mala xwe, û padşa go:

- Wezîr, zû bike, çend qewaza xwera bive here, van hersê merîya xwera bîne.

Û wezîr çû malê wana, gazîkirinê, go:

- Were, padşa gazî te dike, - û rê ketin ber bi mala padşê çûn.

Wexta derî vekirin, ewê ku gotibû " ewê hana padşaye", go:

- Aha, min nego ew padşaye, we go na.

Yê dinê go: - Ne min go, kûçik diewtin, divên padşaye, we ez yaniş hesav kirim.

Padşê go:- Wekî ku ew srafet destê we tê, hûnê cem min bimînin.

Padşa yek ji wana kire wezîrê xwe, yek jî kire lele, yê din jî kire wekîl û şand ew zêrê xwe jî anîn.

Ew çûn mrazê xwe şabûn, hûn jî herin mrazê xwe şabin.

## 64. MESÎ SÊRÎDA GENÎ DIVE

Silêmanê padisa bi emirnivîsarekê, elametî kir, wekî kê bi fikreke kur derheqa emirjîyîna wetenê minda du rêz nivîsar, yanê jî zarkî bêje, wê hezar zêrî bistîne

Lê hezar zêr hebûneke hindik nîbû. Bajarda gelek merîya dixwest, wekî bive xayê wê hebûnê...

Aha yek hate cem padişê bi du rêz nivîsara xweva: "Wetenê teda herdera azaye, cimet ji te razîye". Slêman gilîyê wî ber tiştekî hesab nekir. Cara duda hat derewînê bajêr, go:

- Cimet aqas dewletîye, wekî tu zêra rokî - kesek dest nade.

Silêman gilîyê wî jî ber tiştekî hesab nekir.

Ji derheqa emirnivîsara Silêman paşa du rojada bela bû nav wetenê wî. Ji her dera meriv dihatin, her yekî gilîk digot. Lê kalek hate cem Silêman paşa, awa destpê kir û got:

- Padişayî saxbe, ez çûme ser dergevan, ez bernedame hundur-ewî ruşet xwestîye. Ez çûme cem sûdya (yê ku sûda merîya dike), ewî jî ruşet xwest. Ez çûme cem kê - gişka rûşet xwest: dergevan girtî heta sûdya-gişka ruşet xwes (yan pere ji min xwestin,ha ).

Silêman paşa gava ew yeka bihîst, îda hezar zêr bîr kir, neda kalê. Lê kalê dîna xwe da Silêman paşê, wekî zêr nedayê û awa got:

- Mesî serîda genî dive...

## 65. KEDA MERÎYA ŞÎRINE

Hebû, tunebû merîkî dewletî hebû, kurekî wî xwera nedîtî hebû, ewî keda bavê xwe dixwer. Lê wexta mêrik kal bû, îda nikarbû bixebitîya, kete nav nivînê. Ewî gote jina xwe, go:

- Ezê hebûna xwe giştî bidime xelqê, ez tiştekî nadime kurê xwe, ew xwera nedîtîye, nikare pera qazanc ke, yê min jî wê pûçke.

Lê jina mêrik dixwest alî kurê xwe bike. Anî zêrek da kurê xwe. Gotê:-Evî zêrî êvarê bide bavê xwe, bêje, wekî -ez xevitîme.

Êvarê kur zêr da bavê xwe. Bavê zêr destê kurê xwe girt, avîte nava kuçik. Lê kurê wî qe xema wî nîbû.

Bavê gotê: - Ew te qazanc nekirîye.

Dya gede lênihêrî, wekî usa nave, gote kurê xwe.

- Tu xwera here bixevite.

Kur gura dya xwe kir û çû xevitî. Heftêkî xevitî - zêrek qazanc kir. Anî da bavê xwe. Bavê wî ew jî avîte kuçik, go :

- Te eva jî qazanc nekirîye.

Kur destê xwe kire nava agirê kuçikî gur, zêr derxist, kire qarîn:

- Tu çi dikî, bavo?Ne seva evî zêrî min heftêkî pişta xwe rast nekirîye.

Wî çaxî bavê gotê, go :

- Ay, ez zanim, wekî eva zêra te qazanc kirîye, - bavê gote kurê xwe, go, -Lawo, usane, keda merîya zef şîrine. Heta meriv xwe-xwe qazahc neke -dilê merîya naşewite.

## 66. MIN QEBÛLE

- Bê nikha nave!

Şêx rûdinî, gazî bavê qîzê û kur dike. Şêx divêje:

- Gelî camêra, werine em nikha qîzê û kur bibirin.

Destê xwe didine hevdu, şêx divêje bavê qîzê, divê:

- Qaçax, qîza te Sînem, te da kurê Şemo ji xezal hestu hinavê wê.

Divê:- Min da!

Şêx divêje bavê gede, divê:

- Qîza Qaçax, Sînem, te kurê xwera xwest- şil şetbe, korbe, te qebûle?

Divê:-Min qebûle!

Şêx divê:- Hebîsî resûl, qewlê Xwedê, gotina pêxember, nikhanî, cotanî, jinanî, mêranî, Xwedê bira bimbarek û pîroz bike.

- Kuro, de zûkin, cote gore şêxra bînin... De werin em hevra vê kasê hildin- vexun salixîya bûk û zevê. Bira Xwedê wana kal û pîr bike hevra! Bimbarek û pîroz be!. Xinamtîya me jî şîrin û zirav be!

## 67. MECALA DU AQILBENDA

Aqilbendekî kesîb bûye, yek dewletî bûye. Her yek ji êlekê bûye. Aqilbendê kesîb tê êla yê dewletî. Aqilbendê dewletî pê dihese, wekî aqilbendê kesîb hatîye êla wîya. Yê dewletî gazî xulamê xwe dike, gazî yê kesîb dike, tîne dibêje, divê:

- Ezê çend pirsa bidime te, te ku tê derxist -aqilbendî te helale, te ku tê dernexist -aqilbendîya xwe dayne û ji êla min jî here.

Ewê dewletî pêçîke xwe hildide, aqilbendê kesîb jî du pêçîyê xwe hildibire. Yê dewletî divê:

- Te ew gilî tê derxist. -Divê, - sozekî min dinê jî heye, tu evî derxî, tu bizanbî tu rast aqilbendî.

Cixîsekê dikşîne, cixîza glover. Aqilbendê kesîb jî cixîzek mezin dora wê cixîzê dikşîne, xezekê jî datîne ortê. Yê dewletî divê yê kesîb, divê:

- Te gilî tê derxist, aqilbendî te helale, - tesmîlî xulamê xwe dike, divê, -aqilbend bivin qonaxa wîya.

Merîyê dora aqilbendê dewletî jê pirsîn, gotin :

- Maqûl, ew çi gilî bûn, we hevra go?

Divê: - Min tilîke xwe hilbirî, min go - dinê ezmane. Ewî du tilyê xwe hilbirî, go:-dinê ji du tiştane: yek erde, yek ezmane.

Dive: - Lê ew çi cixîz bu, te kişand?

Divê: - Min got, wekî dinya glovere, divê, ewî jî cixîza mezin dorê kişand, go, raste dinya gilovere, xazek da ortê, go nîvî ave, nîvî jî erde. Ewîya wê formê tê derxist, lema min jêra dengê xwe nekir.

## 68. AQILÊ ŞIVÎN

Padişak hebû şeherda.Ewî usa emir berda:

- Kê lihefekê çapa min bidirû, kêm-zêde nînbe, ezê qulixeke rind bidimêda, hema kêm-zêde be ezê serê wî lêxim.

Merîyê terzî zef bûn, go:

- Em herin lihefeke çapa wî bidirûn, belî qulixwkê bide me jî.

Geleka dirût: pirtîk zêde bûya- serê wî lêdixist, kêm bûya jî-serê wî lêdixist. Gelek merî serê wan lêxistin.Şivanek çîyê bû, ber pêz bû, go: "Heyran, go, ev padişa çira usa hatîye xezebê, serê aqa merîya lê dixe? Usane, ezê jî herim jêra lihefekê bidime dirûn".

Perçe kirî, çû cem terzî, çû padişa velezand-pê darê xwe padişa pîvand, gote terzî, go:

- Min perçe daye te, tu weke bihustekê ji çapa padişa kêm bidrûyî.

Go:- Kuro, şivan, tu merîkî çolêyî, belengaz...tu divêjî- "bihustekê kêm bidirû", wê serê te lêxe.

Go:- Lêdixe, bira serê min lêxe, haqa serê xelqê lêdaye, bera serê min jî lêxe.

Sivê şivan hat, lihefa xwe hilda, bire dîwana padişê.Cimet gele pêra çû, go: "Em herin, wê îro serê şîvîn lêxe, go, em herin temaşekin"

Padişa pal da, lihef avîte ser padişê -lingê padişê heta gûzekê derva ma. Darek lingê padişê xist, padişa lingê xwe kişand-çapa orxanê lingê xwe kaş kire ber xwe.Cimet ma şaş, go:

- Heyran, ev çi ecêve, go, terzîyê me kêm didrût serê wan lêdixist. Evî şivanî kêm dirût, qe dengê xwe jêra nekir.

Padişa gote cimeta xwe, go:

-Binhêrin, eva şivane, go, hela darek jî serda lingê min da... Ez ne heyra lihêfa, dirûna we bûm.Min usa kir, wekî her kes femke- weke orxana xwe lingê xwe dirêj ke: filankes dewletîye-bira angorî orxana xwe lingê xwe dirjke,filankes kesîbe-ew jî angorî lihêfa xwe...

Cimet gelekî duşurmîş bû, got:-Aqilê şivîn serê me zêde bû!

Kûta bû.

## 69. ÇAWA KALÊ BERÎ ŞERÛD DA

Wextekê merivek diçe ser sînor disekine, dixweze dnê zeftke. Padşa wezîrê xweva diçin rast tên.

Divê:- Eva çi cixîze?

Cavê nade. Ev padişa divêje berdestîyê xwe, divê:

- Eva neynesîke vê cixîzê heye, wekî kişandîye û xwe daye ber, - divêje berdestîyê xwe, divê, - here bigere merîkî serwext, bivîne bîne, çika neynesîya cixîza wî çîye?

Ew diçe gelekî digere, tê cem yekî kal. Wî gilî jêra divêje.

Divê: - Pak, tu here, ezê sivê cavê bidimê te.

Kalê sivê radive lêdixe tê ser cixîza wî. Bala xwe dide disekine, duşûrmîş dive: "Eva dêmek dixaze dinê têke destê xwe". Tîne ewê cixîzê tozmîş dike.

Ew radive pîvazekê derdixe datîne wê derê, yan- "Ez merîkî tûjim, karê te min tune".

Kalê radive du serî sîr datîne rex pîvaza wî, wekî- "Tûjbûnê, ez te tûjtirim, alîkîda jî, mineta te weke vî sîra pûç, minetê te nakim".

Ew radive kulma xwe tijî garis dike, direşîne, yanê fkra wî çîye? "Haqa eskerê min heye, ezê te qirkim".

Ew radive dîkekî berî ser garisê wî dide, tevî dijbêre, dixwe:. "Usa bizanve mêrekî min beranberî eskerê te mevîye. Heta mêrekî min jî bimîne, ev xalî nakeve destê te".

Ew mêrik ker-ker radive diçe.

## 70. KEZÊ

Kezê rabû kete rê çû. Çû rastî gavenekî hat, go:

- Ya gavan, roja te xêr.

Gavan go:- Ser çeva, ser serara hatî, -go, - Kezê, tuê ha kuda herî?

Go: - Ezê herim mêrkim.

Go: - Tu min nastînî?

Go: - Çima nastînim, ezê te bistînim, go, tuê pê çi min bikutî?

Go: - Pê vî darê destê xwe.

Go:- Wekî usane, ez te nastînim.

Rabû çû rastî şvanekî hat, go, - Şvano, bereketbe.

Go: - Kezê, ser çevara hatî, go, Kezê, tuê ha kuda herî?

Go:- Ezê herim mêrkim.

Go:- Tu min nastînî?

Go:- Ezê te bistînim, lê tuê pê çi min bikutî?

Go: - Pê vê şivdarê.

Go:- Na!

Go: - Na, na, ezê pê vê berşivikê te bikutim.

Go: - Na, tuê min bikujî.

Kezê derbaz bû, çû pastî mişk hat, go:

- Mişko, roja te xêr.

Go: - Ser çeva, ser sera. Kezê tê wa kuda herî?

Go:- Ezê herim mêr bikim.

Go:- Tu min nastînî?

Go:- Ezê te bistînim, lê tuê pê çi min bikutî?

Go:- Pê vê poçika xwe ezê te bikutim.

Kezê da pey mişk, çû kete qulê.

Mişko go:- Kezê, em birçî divin, gerekê sivê ez herim dewatê, go, ezê herim hine nan mera bînim.

Mişk çû. Keza jina wî dilê wê zef şewitî, da dû mêrê xwe çû. Çû, pêşîya Kezê herî hebû, Kezê kete herîyê. Heta tarîê sîyarek wêda hat - here dewatê, Kezê go :

-Syaro, ha syaro, go,
Tê herî nav dewatê,
Go, bêje dêldirêjê me,
Bêje drançirê me,
Bêje hevandirê me,
Bê, were Kezê ketîye herîyê,
Heta tarîê bra bê hewara min.

Mêrik çû dewatêda qise kir, mişk guhê xwe da ser, go: "Usane, minrane, wekî Kezê dilê wê şewitîye, pey min hatîye ketîye herîyê". Çû Keza jina xwe ji herîyê derxist, da ser pişta xwe, çû mal.

Qederek wext temam bû, bû wextê nan dirûnê, mişk go:

- Jinê, ezê çûm, minê pale girt, çûm zevîyê bidirûm, wekî smilê zevîya bînim tijî mala xwekim: Kezê û mişk hevra pak derbaz kin, hetanî biharê.

Kezê dîzek tijî nan kir,
Palara nan hazir kir,
Kezê rabû ser dîzê - hevxe,
Kezê serîva kete dîzê...

Û şewitî.... Heyfa Kezê...

## 71. BÛM

Slêman padşa morsahib bû (xayê morê). Mora xwe di destê xweda difitiland - du esker li ber disekinîn, digotin:

- Slêman padşa, em dinyayê xirab bikin, yan ava bikin?- wan eskera digot.

Ewî jî hema digot:- Bira dinya xweş be, şên be, ez jî têdabim. (De dinya ji wîra jî nema, wê ji kêra bimîne?)

Belqîza jina Slêman padşa bû. Slêman padşa rojekê hat Belqîza jê xeyîdî. Slêman padşa go:

- Belqîza, tu çima xeyîdîyî?

Go: - Kela kevir, şûşe û şûşebend ez têda digerim, lingê min dêşe, hişke, ez radizêm kêlekê min dêşin.

Slêman padşa go: - Lê tu çi divêjî?

Go: - Ez divêjim, tu minra kelakê çêkî pûrta teyr û terewila.

Slêman padşa go: - Ezê çêkim.

Ewî gazî teyr û tûya kir. Ewil hat berçêmik, go:-Tu çi divêjî?

Slêman padşa go :- Ez ji we dixwezim pûrta we, ezê kelakê çêkim.

Ewil, hema ewê xwe rûçikand, pûrta xwe dayê, go:

- Ez herim, çêjikê min mane bêxweyî, ezê herim cem çêjikê xwe.

Sleman padşa gazî terewila kir, temam hatin ser hevdu, hema ew bûm nehat.Sê cara gazî kirê, nehat, cara çara hat.Slêman padşa jêra go:

- Kevirê wî qulîbe, çevê wî çawanin?

Go:- Çevê min- çevê mêra!

Go:- Hela tu serê wî binêr, serî çende?

Go:- Serê min serê şêra! Jina te tera gotîye, tu van terewila tînî tezî dikî, axir sê meh zivistan heye, ev terewilê gişkê tezîbûna qir bivin. Gunê wanê stuê teda bimne. Eva niha tuyê kelê çêkî, rokê bayê Rehmanê lê rave, wê ew kela te çêkirîye wê gişk xrav bike, wê pûrta wan bive, gunê wan jî wê stuê teda bimîne, qe aqilê te tune?

Slêman padşa go:- Here, glî jî- gilîyê teye, tuyî aqilî, te ev rê nîşanî min da, min rojê sê çûçik dane te, tu û îsafa xwe.

Îda bona wêderê yekê dixwe, duda aza dike.

Teyrûtû jî mîna wî xlaz bûn, çûn…

## 72. MÛRÎ Û MIXMIXK

Zivistan bû. Sar bû. Herdera berfê som dikir.

Mixmixk wê heyamê zivistanê derva mabû. Surê û sermaye, birçîbûnê lê zorkiribûn. Rabû gote mûrî, go :

- Mûrî, go, zivistane, halê min tune. Alî min bike heta baharê ez bidebirim.

Mûrî gotê : - Xûşka mine delal, Wexta havînê tu diçûyî ser sîngê qîz û xorta te xwera dilîst, kêf dikir, qe te nedigo-zivistan pey min tê, brakî mezine? Ezê naha vê qîametê devê kê bibirim, bidime te? Welle ya te- hema mirin lazime.

## 73. GUR Û BIZIN

Carekê bizin diçe çolê, rastî gur tê. Gur divê:Bizin, hoqe goştê bavê min ser bavê te heye, gerekê tu hoqe goştê bavê min bidî.

Bizin divê :- Ez herim, ez hatim, ezê hoqe goştê bavê te bidim.

Bizin rabû çû cem kûçikê, go:

- Were, tu têkeve bin gîhê, gur wekî hat, goşt xwest, ezê bêjim: "Gur, were sê cara lingê xwe gîhêxe, sond bixwe, ezê hoqe goşt bidime te". Wekî ewî lingê xwe gîhê xist, tu dadê bixeniqîne.

Kûçk şa bû, go: - Ez jî tiştekî usa dixwezim.

Gur çû cem rûvî, go: -Were ez û tu bivin bira. Sivê bizin hat, tu jî bive şede, wekî raste : hoqe goştê bavê min ser bavê wê bû.

Sivê gur jî, bizin jî hatin. Kûçik kete bin gîhê, xwe veşart. Wî çaxî gur tê, divê:-Bizin, ka goştê min?

Bizin divê:- Gur, were sê cara lingê xwe li gîhêxe, sond bixwe, wekî goştê bavê te ser bavê min heye, ezê heqê goştê te bidim.

Gur divê:- Birave!

Wî çaxî gur diçe sê cara lingê xwe gîhê dixe, sê cara sond dixwe. Kûçik dadidê dixeniqîne. Rûvî wira direve, divê:

- Îmana bavê minda be, derewe, derewe, derewe...

## 74. HIRÇ Û MERIV

Gotina gotîya gelek sala berê meriv û hirç dibine biraêd hevdu. Hevra diçin û tên, miqatîyê li hevdu dikin, alî hev dikin. Usa sal tên û derbaz divin diçin.

Rojekê, çawa dibe, meriv dibêje hirçê :-Bîn ji te tê...

Hirç wê gavê dibêje mêriv:

- Balte hilde destê xwe.

Meriv dibê :- Bona çi?

Dibê:- Ez tera dibêm, hilde!

Meriv çar û neçar balte hildide destê xwe. Hirç serê xwe nêzîkî wî dike, dibê:

- De orta serê minxe. .

Meriv sil dibe, xwera dibê:"Çawa serê wîxim,qe tiştê usa dibe? " Şûnda vedikşe, destê wî naçe.

Hirç dibê:- Ne min tera go "lêxe", çira lê naxî?.

Meriv çi bike? Evê carê çar û neçar balte hema digire li orta serê wî dixe...

Hirç îda kere-ker radibe diçe...

Ji wê rojê muxdarekî dirêj derbaz dibe. Rokê jî meriv lê dinhêre hirç va hat. Dilê xweda dibêje:" Pî, ev çi ecêv?" Xwe dide alîkî. Hirç ku ranêzîkî wî dibe, jêra dibêje:

- Qurba, tiştekî nebe dilê xwe, ez tiştekî tera nabêjim. Were nêzîkî min.

Meriv evê carê jî çar û neçar nêzîkî wî dibe.

Hirç dibê:- De naha serê min binhêre, çika cîyê lêxistina xwe dibînî?

Meriv serê wî pak dinhêre, dîna xwe didê- sipî saxe.

Hirç dibê:- Hi çawane, te tiştek dî?

Dibê:- Na, welle!

Dibê: - Te dît, birîna serê min qenc bûye, lê ew xwberê xirav te minra got, hê - hê bîra min dane. Gava dikeve bîra min, kerba, ez gelekî ber xwe dikevim.

Û ji wê rojê şûnda hirç û merî dûrî hev dikevin.

## 75. KER Û GUR

Ker rabû çû, here hec.Dîk rast hat,go:- Kuro, go, kero, tê kuda herî?

Go:- Ker jî, kurê kera jî,
Ezê herim hec,
Ezê bixum mêrg û çîman,
Wekî paîzê bême aran.

- Ê, go, welleh ez jî hevalê teme.

Xêlekê çû, dîna xwe dayê mîk rast hat, go:

- Kerê, tuê kuda herî?

Go:- Ezê herim hecê,
Bixum mêrg û çîman,
Paîzê vegerim bêm aran.

Mîyê go:- Ez jî heval!

Çû rastî kêwrîşkê hat. Kêwrîşkê go:

- Kero, tê kuda herî?

Go:- ker jî, kurê kera jî,
Ezê herim hec,
Ezê bixum mêrg û çîman,
Wekî paîzê bême aran.

Go: - Ez jî hevalê te!

Wextekê derketine zozana. Xarin mêrg û çîman, bû paîz, vegeryan hatin aran. Hatin rastî gurekî hatin.

Kerê go :- Guro, go, tu çi dixwezî?

Go:- Ez hatine, go, gere tu mîyê bidî min- ez bixun.

- Haşa, go, tu were, go, tu were g... vî mêrî bîn bike, ezê mîyê bidime te, tu bixwî.

Gur devê xwe bire nav lingê kerê. Ker şeqê xwe lê givaşt, mîyê lê hate kela, dîk jî çevê wî derdixist, kêwrîşkê jî erd jêra dikola, mezel dikola. Dîk gote kerê, go:-Bese, go, me kuşt.

Gur xwe terkemirarî avît. Gur wê delkê xwe destê wana derxist, revî, gihîşte hevala.

- Olo, go mala we xiravbe,
Birevin, ha birevin.
Yekê ez digirtim, ,
Yekê ez dikuştim,
Yekî, go, çevê min derdixist,
Yekî, go, mezelê min dikola:
Min xwe terkemirarî avît-
Wê delkê destê wan revîm, xlas bûm.

## 76. ÇIVÎK

Hebû, tunebû çivîkek hebû. Birîna çivîkê hebû. Çivîk çû mala pîrê. Dit tendûra pîrê wê dû dike, go:

- Pîrê, vî sitrî tilya min derxe, bavêje tendûra xwe wê bişxule.

Pîrê derzî anî, sitrî tilya çivîkê derxist, avîte tendûrê. Çivîkê te çû. Tendûr şuxulî, bû gure-gur, şuxulî. Pîrê heft nan û totikek petibû.

Çivîk hat, go:-Pîrê, tuê heqê strîyê min bidî min, tuê heft nana bidî min.

Pîrê go:- Çivîk, xwe min heft nan petîye, ezê çawa bidim te?

Pîrê rabû heft nan da çivîk. Çivîk heft nan hilda, çû. Dît kerî pez va vire, du şivana bişkul hûrî şîr dikirin, şîr dixwerin.

Go:- Gelî şivana, hûn çira ha dikin?

Go:- Çivîk can, nan welatê me tune.

Go:- Hanê wera heft nana, hûrkine şîr bixun.

Şivan nan hildan, hûrkirine şîr, xwer. Çivîk çû. Seheteke sekinî, çivîk hat, go:

- Şivan, ka heft nanê min bidin min, yan heft berana.

Şivana go:- Çivîk, emê tera heft berana ku bînin?

Çivîk bû xetabela, heft beran şivana stend. Çivîk beranê xwe hilda, çû rastî gundekî hat. Dît wî gundîda hespa şerjê dikin, kûçika şerjê dikin, bûkê syar dikin, wekî nanê sîyara bidin. Çivîk got:

- Gelî gundîno, hûn çira tiştê ha dikin?

Go:- Çivîk, wekî heywanê gundîyê me tune, em van kelba şerjê dikin, wekî bûkê verêkin.

Çivîk berana dide wana, şerjê dikin. Çivîk çû, got:

- Para min hildin.

Çivîk hat, dît -par tune, got:

- Yanê hûnê heft beranê min bidin, yan jî bûkê bidin.

Çivîk pey sîyara ket, bûkê sîyara stend, hilda çû. Rastî merivekî bilûrvan hat. Go:

- Xorto, vê bûkê hilnadî, wekî wê bilûrê bidî min?

Xort bilûr dayê, bûk jê stend.

Çivîk bilûr hilda çû, serê çîyakî rûnişt, bilûrê xwe xist, go:

Tû, tû, tû…
Min strîyek da heft nana,
Heft nan daye heft beran,
Heft beran daye bûkekê,
Bûk jî min daye bilûrekê…
Tûrê, tûrê, ez bilûrê xwe dixim…

## 77. HIRÇ, GUR Û RÛVÎ

Rojekê hirç, gur û rûvî hatin cem hev sekinîn. Dîna xwe danê kerî pez hat derbaz bû.

Hirçê go:- Bira, ha bira, dikarin mera pezekê bînin?

Rûvî go:- Ew ne pêşê mine, pêşê birê teyî gure, bra here bîne.

Gur lêda çû, pezek anî. Hirçê gote rûvî, go:

- Gur westyaye, tu rave postke.

Rûvî go:- Flankes, tu nizanî, ez ancax diçim qayîş-mayîşê cota tînim. Ev pêşê min nîne: bra kê ku anîye, ew jî şerjêke.

Gur rabû şerjê kir, post kir.

Hirçê go:-De pareveke.

Gur go:- Rûvî çawanî?

Go:- Na xêr, ez nikarim.

Hirçê go:- Lê kê wê pareveke?

Rûvî go:- Ji te û gur bira yek pareveke. .

Hirçê dîna xwe dayê, dît ku nikare, gote gur, go :

- Te hemîn zemet dîye, tu pareveke.

Gur rabû ew pez parevekir. Herça goştê rind, bezê rind temam da alîkî, hestu- ew jî dane alîkî, hûr û rûvî jî- ew jî dane alîkî. Hestu dane ber hirçê, hûr û rûvî dane ber rûvî, goştê xaş û bezva dane ber xwe.

Hirçê dîna xwe dayê: "Peyî, ewî anî parevekir û goştê temiz xwera bir, hestu danî ber min, hûr û rûvî jî dane ber rûvî". Dilê hirçê temûl nekir, rabû lingê wî girt, avîte erqeke wêderê. Cendekê wî têda unda bû, poçika wî tîk ma.

Hirçê go:- Rûvî, rave pareveke.

Rûvî rabû, herçî goştê temiz, bezva da ber hirçê, herça hestu-mestu, hûr û rûvî- rûvî xwera hilda û kete ser xar.

Hirçê go:- Rûvî, go, tu wî aqilî ji ku tînî, te ew hiş ji ku hilda?

- A, go, ji poça hana, ku ba dive...

## 78. XAYÊ KERÊ, XAYÊ HESPÊ Û XAYÊ GÊ

Xayê kerê, xayê hespê û xayê gê wextekê kirîn-frotan dikirin. Rojekê jî dîsa rêda çûn, kesirî bûn, birçî bûn. Cîkî rûniştin, wekî hêsa bin, lê ker, hesp û ga berî zevîke ceh dan. Xayê zevîyê jî, bextê wanra, li wêderê hazir bû, dilê wî şewitî, dilê xweda got: "Ez çawa bikim, go, ez li hersêkaxim, go, ez pê nikarim, go, ezê yek-yek li wanxim". Çû cem wan hersêka, go:

- Selam elêkim, gelî birano!

Wana jî go:- Ser çeva û ser sera,- gotin, -çira usa xirav sekinîyî? Keremke cem me rûnî.

Xayê zevîyê jî go:-Zef razîme, go, kî ji we xayê kerêye, go, şuxlê min bi wî heye.

Xayê hespê go:- Ewê hane.

Wî çaxî xayê zevîyê go:- Xayê kerê, ca keremeta xwe hinekî pêşda were. -go, -xayê kerê, go ga ketîye zevîyê, go, keda milê wîyedixwe. Hesp jî meriv lê syar dive. Xayê kerê, lê te çima ker berî zevîyê daye?

Xayê zevîyê wêderê xayê kerê têr dikute. Herduê dinê jî li xayê kerê dinhêrin, pê dikenin, divên:

- Ga û hespê em xlaz kirin ji wî hirçî.

Xayê zevîyê jî xayê kerê verêdike, îja vedigere ser xayê hespê, divê:

- Hela ga dixevite, keda milê wîye, te hesp çira berdayê?

Ewî jî wêderê têr dikute û dîsa verê dike. Îjar vedigere ser xayê gê, divê:

- Tu korî, çira navînî eva zevîye, keda milê mine, te bona çi ga berdayêda?

Ewî jî wêderê rîya wîda verê dike, divê:

- De herin, dehê xwe bêjin, yeke min bêjin, çima zevî bê xayî bû?- û vedigere tê mala xwe.

## 79. BALÛLÎ ZANE

Carekê çevê yekî êşîya.Ewî gazî kurê xwe kir, gotê:

- Lawo, here mala Balûlî Zane, bêje çevê bavê min dêşin, çika çi çarekê çevê minra dike?

Gede çû mala Balûl,glîyê bavê xwe kir, gotê:

- Apo, çevê bavê min dêşin, bavê min digot, bira çarekê bike.

Balûl destê xwe da piş xwe û nava odêda çû û hat, deng nekir.Gede nihêrî ew dengê xwe nake, vegerya hate mal.Ew ku çû hundur, bavê dest xweda pirsî:

- Lawo, gidî, qe çi got, çi kir?

- Qe tişt jî ne got.

- Lê hilbet?

Gede gotê:- Te çawa minra gotibû, min jî usa wîra got.Ew rabû, destê xwe da piş xwe, nava odêda çû û hat.Ne deng kir, ne his.Ez jî eciz bûm, vegeryam hatim...

Bavê gede kenîya, kêfxweş bû, got:

- Kurê min, Balûlî Zane her tişt jî gotîye...Gava te derheqa çevê min jêra gotîye, ewî destê xwe daye piş xwe çûye û hatîye. Bi wê yekê

xwestîye te bide serwext kirinê, wekî tu minra bêjî, ku ez destê xwe nedime çevê xwe, çevêd xweda nekevim- wê qenc bin.

Aqa!

## 80. CABA AQIL

Merivek rêda çû, lê nihêrî lingê devekê hatîye derbaz bûye.Li weşa devê nihêrî, li fesala devê, ewî her tişt fem kir.Derbaz bû, çû.

Lê nihêrî merîk direve tê.Tu nevê xayê devêye, go:

- Selam elêkim!

- Elêkim selam, ser çeva, ser sera! Qurban, go, tu çira usa direvî?

Go:- Heyran, deveke min hatîye unda bûye, naha pey wê ketime.

- A go, deva te kor bû? Kulfeteke duhala ser bû, takî devê rûn bû,takî din jî-dims?

Go:- Erê, lê kuda çû?

Go:- Welleh min nedîtîye, min qeretûyê wê nedît.

- Lê çawa te nedîtîye, çawa salixa didî?

- Qurban, go, min nedîtîye!

Xayê devê milê wî girt, bir dîwanê.Merivê dîwanê îsindax kir, da xeberdan, go:

- Te çawa dîye?

Ew jî hema divê:- Min nedîye, lê ez zanim.

Merivê dîwanê destê xwe kire cêba xwe, şeyê xweyî çûk derxist,destê xwe hişk lê girt, go:

- Ewa çîye destê minda?

Ewî jî caba wî da, go:-Destê teda tiştekî zere, navê wî jî şeye.

Ewî destê xwe vekir -zere jî,şeye jî.

Go:- Rast tu bilyan-zaneyî, lê te ya wê devê çawa tê derxist?

- Min deve usa zanibû, deve alîkî rê çêrya bû-min zanibû kore.

- Lê te çawa zanibû, kulfeta duhalane?

- Min zanibû, kulfetê deve îx kirîye, jê peya bûye...Wexta rabûye, herdu lepê xwe dane erdê, paşê rabûye.

- Lê te çawa zanibû tekî wê rûne, yê dinê dimse?

Go:- Dewsa takî mêş lê civya bûn, dewsa takî-mûrî.Mûrî li alîyê dims civya bûn, mêş-li alîyê rûn.

Merivê dîwanê li wêderê îzina wî da, go:

- Eva meriva esnafe, azaye,-yê dinêra jî got,-niha tu here pey deva xwe bigere, belkî tu deva xwe bivînî.

## NIVÎSARNASÎ

**1. "Elo û Fatê"**-gotîye Şîrinê Çopo Xudoyî, 70 salî, nexwendî, binelîyê gundê Çobengermesê (naha Avşên), li ser nehîya Aragasê.

Hikyatbêj yekî dinêdîtîye, qedirbilyane. Gelek û gelek nmûnêd zargotinê zane, mijûlkirîkî hewaskare. Bi gotina wî, oda mala bavê wî şevêd zivistanêd dirêj mijûlbêj, hikyatbêj berev dibûn. Yekî mijûlya xwe xilaz dikir, yekî dinê destpê dikir... Ewî jî tim bi hizkirin guh daye wana û ji wana hîn bûye.

Hikyata "Elo û Fatê" ya bûyîngotinêye û sêrbazîgotinêye: Elo û Fatê ji destê dêmarîya xwe direvin, pey pir çetnayara qîz û kûrê padişê distînin û xûşk û bira dîsa rastî hev tên.

Hikyatêd "Elo û Fatê ", Şerê jina", "Mozik", "Xasê", "Mergîsk", "Nêçîrvanêd bira", "Temo û Tahar" hatine bernivîsarê sala1979-a.

**2. "Şerê jina"**-gotîye Şîrinê Çopo, binhêre nvîsarnasîya 1-ê.

Çîrok bi xwe ya bûyîngotinêye: jinik mêrê xwe dide bawer kirinê, wekî Xudê meriva gere şerê jina xweyke.

**3. "Mozik"**- gotîye Şîrinê Çopo, binhêre nvîsarnasîya 1-ê.

Hikyat ya bûyîngotinêye: jin û merê tembel mozika xwe unda dikin, paşê jinik bi fêlava paşda tîne, lê hê pirsa wan- "wê kê mozikê bive avê?" dimîne.

**4. "Xasê"**-gotîye Şîrinê Çopo, binhêre nvîsarnasîya 1-ê.

Hikyat ya bûyîngotinêye: xasî qêmîş nake nan bide bûkê xwe. Bûka mezin-Xasê, heqê wêra dertê.

**5. "Ahmed û Mergîsk"**- Şîrinê Çopo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 1-ê.

Hikyata "Mergîsk"-ya sêrbazîgotinêye: kurê padişê qîza padişê mergîska hiz dike. Pey pir zêrandinara ewana digihîjine mirazê xwe.

**6. "Nêçîrvanêd bra"**-gotîye Şîrinê Çopo, binhêre nvîsarnasîya1-ê.

Hikyat ya buyîngotinêye: du nêçîrvanêd bira heyfa bavê xwe ji wezîrê padişê hildidin.

**7. Kundur**-Roza Eslan Xudoyî gotîye, 40 salî, xwendî, ji gundê Çobanmazê (Avşênê) li ser nehîya Aragasê. Gundê Sîpanêda mêr kirîye, dersdara mekteba gundê Sîpanêye.

Roza Eslan kulfeteke aqil, jêhatî, rûnerm, maqûl û berbihêre. Cînar, şagirtê wê gelekî jê hiz dikin, qedirê wê zanin.

Hikyatêd " Kundur", "Qîza namûs", "Bêcan pelewan" hatine bernivîsarê sala 1981-ê.

**8. Qîza namûs**-gotîye Roza Eslan, binhêre nvîsarnasîya 7-a.

**9. Bêcan pelewan**-gotîye Roza Eslan, binhêre nvîsarnasîya 7-a.

**10. Ebûzêt**-gotîye Bekirê Rostem Aloyan, 50 salî, xwendî, dersdarê mekteba gundê Sîpanê(Pampê).

Bekirê Rostem yekî merivhiz, hevalhize.Ewî hevaltîke baş û helal tevî gundîyê xwe,helbestvan Fêrîkê Ûsiv dike,xêrxazê wîye, poêzîya wî fem dike,qîmet dike.Fêrîk jî pir qedirê wî zane.

"Ebûzêt" û " Hebka hinêr" hatîne bernivîsarê sala 1979-a.

**11.Hebka hinêr**-gotîye Bekirê Rostem, binhêr nvîsarnasîya 10-a.

**12. Ferat û Xosrov**-gotîye Avîyê Elî Slêmanyan, 55salî, nîvxwendî, ji gundê Quriboxazê, naha malêva hatine gundê Lênûxî. Gelek nimûnê zargotinê zane. Hikyat hatîye bernivîsarê sala 1959-a.

**13. Mîrzehmed û beq**-gotîye Egîtê Lewand, 70 salî, xwendî, ji êla sîpka. Ew ji gundê Qozilcêye, alîyê qeza Qersê. Sala1918-a gundîyêd wana muhacir dibin, têne nehîya Aparanê.

Egît wextê xweda xortekî xwendî, serwext, jêhatî bûye. Zarbêjê me bi hewas çîroka dibêje.

**14. Qero**-Mecîtê Reşîd Fawoyan gotîye, dersdarê mekteba gundê Baysizê li nehîya Talînê. Mecîtê Reşîd ji dya xwe bûye sala 1925-a. Eva hikyata sala 1960-î 18-ê meha hezîranê li bajarê Êrêvanê hatîye bernivîsarê- wexta kûrsa zimanê kurmancî ji bona dersdarêd zimanê kurmancî hatibû teşkîlkirinê. Mecît nimûnêd zargotinê gelekî zane.

**15. Dûrger oxlî û Semend**- Mecîtê Reşîd gotîye, binhêre nvîsarnasîya 14-a.

**16. Mîrze Mehmed**-Mecîtê Reşîd gotîye, binhêre nvîsarnasîy14-a.

**17. Qesavî comerd û Kiraszêrîn**-Rostemê Emer Sloyan gotîye, ji gundê Pampa kurda ( naha Sîpan) li ser nehîya Aparanê. Ji dîya xwe bûye sala 1910-a, nîvxwendî, ji êla sîpka, bereka mixaîla, sovxozêda dixebite. Rostem nava der û cînarê xweda merivekî qedirgirtîye, mezinara- mezine, çûkara-çûk, merivekî xîretî xebathize.

Hikyata "Qesavî comerd" ya bûyîn-gotinêye. Wêderêda tê gotinê, çawa Qesavî comerd sura (eyba) destgirtîya xwe li dinê naxe û wêra tu xeberê sar navêje.

**18. Çîroka Zal**-gotîye Mecîtê Reşît, binhêre nvîsarnasîya 14-a.

**19. Aşiq Qerîb**-gotîye Rostemê Emer, binhêre nvîsarnasîya 17-a.

**20. Rostem û kurê wî Gurgîn**-gotîye Rostemê Emer, binhêre nvîsarnasîya 17-a.

**21. Stîya Al û Ferxê**-got: Rostemê Emer,binhêre nvîsarnasîya 17-a.

**22. Rostemê Zal-** Ûsivê Hesen gotîye, 70-ê salî, xwendî, ji gundê Pampa kurda (naha Sîpan), li ser nehîya Aparanê, kolxozvan.

Hikyatbêj ji gundê Şîrinkuyê bûye, li ser qeza Qersê. Wextê şerê 1918-da muhacir dibin, malêva diçine Tibîlîsîyê, wê şûnda têne gundê Pampê.Ûsivê Hesen yekî gelekî zênî, laqirdçîyî, aqilî, maqûle.

**23. Slêman Pêxember**-Xelîlê Biro gotîye, 70 salî, nexwendî, bajarê Tibîlîsîyêda dijî. Sala 1918-a ew muhacir dibin, ji Qersê têne Tibîlîsîyê.

Hikyadên "Slêman pêxember", "Hikyata Osman", "Rostem û xarzîyê wî Mehmed" ji zarbêj hatine bernivîsarê sala 1972-a.

**24. Hikyata Osman**-gotîye Xelîlê Biro binhêre nvîsarnasîya 23-a.

**25. Rostem û xarzîyê wî Mehmed**-gotîye Xelîlê Biro, binhêre nvîsarnasîya 23-a.

**26. Çil Çop**-Ûsivê Hesen gotîye, binhêre nvîsarnasîya 22-a.

Çîroka "Çil Çop" ya sêrbazîgotinêye. Çil çopê mirî dibe toz, xwelî, lê dîsa zaru pey dibe. Ew zaru dîsa bi navê Çilçop mezin dibe û alî xalê xwe dike.

Sala 1944-a hatîye bernivîsarê.

**27. Tahar- Mîrze, Zohireb, Gulîzer-** Ûsivê Hesen gotîye, binhêre nvîsarnasîya 22- a.

**28. Cibirî**-gotîye Ezîzê Emer, ji gundê Sabûnçîyê, li ser nehîya Talînê, 60 salî, nexwendî, kolxozvan.

**29. Sê xort**-gotîye Xudê şêx Ozmanê şêx, ji gundê Sengerê, li nehîya Aparanê, 65 salî, nexwendî, kolxozvan, gele hikyata zane.

**30. Çerxê felekê**-gotîye Şawoê Mamo, 65 salî, nexwendî, ji gundê Hekko, li ser nehîya Talînê.

**31. Serhatîya kesîb-** Mistoyê Sefo gotîye, 70 salî, nexwendî, li Batûmîyê wextekê dergevanî kirîye. (13. 08. 1937, Batûmî).

**32. Kur û belengaz**-Ahmedê Xudo gotîye, 30 salî, xwendî, şivanê gundê Heko, li ser nehîya Talînê.

**33. Qencî-qencîya tîne-** Ahmedê Xudo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 32-a.

**34. Gêla xerîb**-gotîye Biroyê Beko Ûsûbov, 85 salî ji gundê Dîgorê, li ser qeza Qersê. Naha gundê Sengerê- li nehîya Aparanêda dimîne, nexwendî, Şêxê Şêxûbekire.

**35. Rostemê Zal**-Egîtê Lewandê Elo sala 1967-a gotîye, binhêre nvîsarnasîya 13-a.

**36. Hemze pelewan**-got Egîtê Lewand, binhêre nvîsarnasîya 13a.

**37. Sê rêwî**-gotîye Egîtê Lewand, binhêre nvîsarnasîya 13-a.

**38. Îsmaîl**- gotîye Egîtê Lewand, binhêre nvîsarnasîya13a "Çîroka Îsmaîl" ya bûyîngotinêye. Dewletîyê no du bira dikuje, lê birê wanî çûk heqê wîra dertê.

**39. Mîrze Memûd û beran**-Şekoyê Ûsiv gotîye, 70 salî, nexwendî, ji gundê Camûşvana çûk, li ser nehîya Aragasê. Şeko wextekê li Stêpanavanê şvantî kirîye, lê naha li gundê xweda şivantîyê dike. Ewî gele tişt ji dîya xweye remetî- Senemê hîn bûye. Senem kulfeteke aqil, xweyî hurmet bû.

Şekoyî gelekî laqirdçîye, xeberdan, carina distirê, carina bilûrê dixe. Gelekî pêz hiz dike. Şivanê pisporî hizkirîye.

Çîroka "Mîrze Memûd û beran" derheqa heywandane: beran dikêlime, Mîrze Memûd jî zimanê wî fem dike û gura wî beranî dike.

**40. Silto** -got: Şekoyê Ûsiv, binhêre nvîsarnasîya 39-a.

Hikyat ya sêrbazîgotinêye, ka Silto çawa pîra merivxur red dike û herçê kuştî dide qenckirinê.

**41. Daûd pêxember**-Şekoyê Ûsiv gotîye, binhêr nivîsarnasîya 39-a.

**42. Hemze û Baba**-Erebê Abasê Hemze gotîye, ji bajarê Abovyanê. Ereb sala 1911-a ji dya xwe bûye li gundê Şatiroxlîyê li ser qeza Qersê. Sala 1918-a, çawa êzdîyê wê qezayê, usa jî êzdîyê wî gundî cîşihetî dibin: hinek diçin Gurcistanê, li bajarê Tibîlîsîyêda cîwar dibin. Mala Areb jî wanara koç dike, diçe wî bajarî. Paşê salêd 1930-î tê Ermenîstanê û Têxnîkûma kurdaye pêdagogîêye Pişkavkazê xwendina xwe xilaz dike. Peyra li nehîya Kotaykê dibe dersdarê zimanê kurmancî.

**43. Şîret**-got: Erebê Abas, binhêre nvîsarnasîya 41-ê.

**44. Derew ji derewa mezintir** -Got: Erebê Abas, binhêre nvîsarnasîya 42-a.

**45. Melle û wezîr ser bela xwe vedibin**-Têmûrê Sadiq gotîye. Ew sala1922-a li gundê Amokê, wekî li ser qeza Wanêye (Tûrkîya) ji dya xwe bûye. Sala1926-a malbavanê Têmûr derbazî welatê covêtê dibin. Têne gundê Hebilkendê li nehîya Êcmîazînê. Ewî salêd1933-1937-a li têxnîkûma kurdaye pêdagogîêye Pişkavkazêda hîn bûye. Pey kutakirinêra dersdarîyê dike. Wextê şerê wetenîyê ew li cêrgê eskerê covêtîyêda qulix dike. Pey şêrra tê Êrêvanê û li ûnîvêrsîtêtêda li para zimanê îranîêda hîn dibe.

**46. Weyseta bavê-** Têmûrê Sadiq gotîye, binhêre nvîsarnasîya 45-a.

Çîrok ya sêrbazîgotinêye: kurê padişayî çûk-keçelok (Mîrzemehmed) miqatî şeş birê xweye: dêwa, pîra merivxur dikuje, birê xwe ji wana xilaz dike, dizewicîne, lê Mûsê çevtas (canpolat) wî digire û dike qûlê xwe.

**47. Tasa pîrê-**Têmûrê Teyo gotîye, 45salî, ji gundê Hekko, li ser nehîya Talînê, xwendî, têxnîkûma kurdaye pêdagogîye kuta kirîye, dîrêktorê mekteba gunde, yekî aqile, laqirdçî, maqûl û merivhize.

**48. Xûşk û heft bira-**Nevata Heso gotîye, 60 salî, nexwendî, ji gûndê Kervanserê (Poştê) li ser nehîya Aragasê.

Gundê Nevatê berî qeydê sovêtîyê gundê Otkov bûye(Bexdetolî), li ser nehîya Spîtakê. Sala1920-î, gava eskerê Romê digihîje wî gundî, temamya herçê binelîyê têda mayî (kal, pîr, nexweş, zaru) didine şewitandinê. Nevata çûk weke du-sê roja nava mrîyada dimîne- tirsa, birçîna bêhiş dikeve. Paşê merivê gund tên wê û herçê tek-tûk mayî ji devê mirinê xilaz dikin.

Nevat, wekî kevanîke erhedeye, naha li gundê Kerwanserê (Poştê) li ser nehîya Hecî-Xelîlê dimîne: gundîyê wana cîguhêzî evê gundê pojkanîyê dikin.

Eva hikyata bi navê "Xûşk û heft bira" ya sêrbazîgotinêye: xûşkê bi mêrkirina xweva alî heft birê xwe dike, û ewana ji karê xezala dîsa dibin merî.

**49. Çîroka Heqo, Neheqo-** Nevata Heso gotîye, binhêre .nvîsarnasîya 48-a.

**50. Îvoyê kurmexarî-** Hemoyê Sehîd gotîye, 40 salî, xwendî, ji gundê Mîreka mezin, li ser nehîya Aparanê, serwêrê fêrma pêz. Hatîye bernivîsarê sala 1952-a.

**51. Xelîfe û xortek-**got: Hemoyê Sehîd, binhêre nvîsarnasîya 50-a.

**52. BELÛL-**Têlîyê Esedê Biro gotîye, 55 salî, nexwendî, ji êla sîpka, ji gundê Emençayîrê, li ser qeza Qersêye berê. Niha li Tbîlîsîyê dimîne. Têlîê Esed, wekî yekî qemerî orteye, merivekî gelekî xwehizkirîye. Çawa ew, usa jî birê wî Xelîl gelek nimûnê zargotinê zanin.

**53. Îskenderî Zuqurne-**got Têlîyê Esed, binhêre nvîsarnasîya 52-a.

Çîroka "Îskenderî Zuqurne" ya bûyîn-gotinêye, pêra jî motîvê sêrbazîgotinê pêra hene. Têda tê nîşandayînê, wekî tu tişt nayê veşartinê.

**54. Şivanê aqilbend-** got:Têlîyê Esed, binhêre nvîsarnasîya 52-a.

Ev çîrok ya bûîngotinêye, edet û şîret. Şivan padişa û wezîr şîret dike, wekî dinêda tiştê lapî kirêt ew emelê xiravin.

**55. Mirina wezîr-** got: Heseníkê Hiso, 50 salî, nexwendî, ji gundê Pampa kurda, li ser nehîya Aparanê, kolxozvan,nivîsî sala 1952-a.

**56. Aqil** -Aşiq Ahmê Çolo gotîye, ji gundê Elegezê, li ser nehîya Aparanê, 75 salî, nexwendî.

Ahmê Çolo gelek sala bûye berxvan, paşê şivan. Ahmê bi hostatî ke mezin distirê, li bilûrê, tolimê û saz dixe.Ew kilam, çîrok bi hostatîke mezin-dengê xweyî xweşî dirêjî tijî, bi hejandina serê xwe, dest û pê xwe pir xweş dibêje.

Efrandina "Aqil" ya bûyîngotinêye: meriv gerekê pêşîyê bifikire, paşê şuxulê xwe bike.

**57. Aşê xal û xarzî-**Got: Ahmê Çolo, binnêre nvîsarnasîya 56-a.

**58. Kesîb û dewletî-** got: Ahmê Çolo, binhêre nvîsarnasîya 56-a.

**59. Temo û Tahar-**got: Şîrinê Çopo, binhêre nvîsarnasîya 1-ê.

**60. Sê kose-** Ahmê Çolo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 56-a.

**61. Blbil-**Basoê Bekir gotîye, 70 salî, nîvxwendî, ji gundê Pampa kurda, li ser nehîya Elegezê, ji êla sîpka, ji bereka witîya, kolxozvan.

Baso ji1937-ê salê heta sala1947-a li tatrona kurdaye dewletêye ya nehîya Elegezêda xebitîye- çawa bilûrvan û dengbêj. Naha li bajarê Tbîlîsîyêda dimîne.

**62. Çîroka mesî -** Basoyê Bekir gotîye, binhêre nvîsarnasîya 61-ê.

"Çîroka mesî"- şaxê wê dinê jî hene, têda tê gotinê, çika mesîê destê kurê torçî azabûyî, paşê çawa alî wî xortî dike: qencî tê pêşîyê. Çîrok ya sêrbazgotinêye.

**63. Diz û padişa-**got: Basoyê Bekir, binhêre nvîsarnasîya 61-ê.

**64. Mesî sêrîda genî dive-**got: Ezîzê Eşo, ji dya xwe bûye sala 1927-a, xwendî, kolxozvanê gundê Pampa kurda, li ser nehîya Aparanê. Ezîz yekî aqile, beşerxweşe, laqirdçîye, merivhize.

**65. Keda merîya şîrine-**got Ezîzê Eşo, binhêre nvîsarnasîya 64-a.

**66. Min qebûle-**got: Ezîzê Eşo, binhêre nvîsarnasîya 64-a.

**67. Mecala du aqilbenda-**Reşîdê Mîrze gotîye, 50 salî, ji gundê Pampa kurda, li ser nehîya Aparanê, ji êla sîpika, ji bereka şemsika.

Reşîdî xwendîye, wexteke dirêj li gundê xweda dersdarîyê dike. Şagirt, hevalêd wîye dersdar jê hiz dikin, qedirê wî digirin. Zarbêjê me yekî laqirdçîyî, hazircabe. Meriv ji xeberdana wî têr nabe, aqayî zarxweşî xeberdane.

Hikyata "Mecala du aqilbenda" - ya şîretkarîêye, bûyîngotinê. Aqilbendê dewletî dixweze aqilbendê kesîb bicêrbîne, çika aqilê wî digihîje tişta? Paşê, gava dinhêre, yê kesîbî aqile, xwe mukur tê.

**68. Aqilê şivîn** -got Reşîdê Mîrze, binhêre nivîsarnasîya 67-a.

**69. Çawa kalê berî şerûd da**-Reşîdê Mîrze gotîye, binhêre nvîsarnasîya 67-a.

**70. Kezê**- Reşîdê Mîrze gotîye, binhêre nvîsarnasîya 67-a.

Çîroka "Kezê" ya derheqa heywandane, terewilane.

**71. Bûm**-Bondoê Îbo Asatûrov gotîye, ji dya xwe bûye sala 1912-a li gundê Êngûkê li ser qeza Qersê. Pey revêra dikeve êtîmxana Ermenîstanê. Paşê Têxnîkûma kurdaye dewletêye pişkavkazêye pêdagogîyê xilaz dike, peyra salêd dirêj li gundê Hekoda dersdarîyê dike. Naha li bajarê Nêbît-Daxê dimîne.

**72. Mûrî û mixmixk**-got Bondoyê Îbo, binhêre nvîsarnasîya 71ê.

Nêta evê mijûlîyê ya şîretkarîyêye: gotî her tişt wextê xweda bê kirinê.

**73. Gur û bizin**- Bondoyê Îbo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 71-a.

**74. Hirç û meriv**-Kida Îvoyê Hemo gotîye.

Sala 1918-a gundîyê Kidê ji gundê Emençaîrê li ser qeza Qersê, muhacir dibin tên nehîya Aparanê. Malmêr û malbavanê Kidê xwe li witîyê bereka xwe digirin- tên gundê Pampa kurda dibin xwey mal û avayê teze.

Kidê kulfeteke şuxulhize, şuxulkare, xemkêşe, dilovane, pir xîrete. Saya aqil, kemal, nandarî - hurmeta wê û qedirê wê nava gundda û gundê cînarda gelekî heye.

Nêta evê mijûlîyê ya şîretkarîêye, gotî -"xebera xwe bipêje, paşê birêje".

Hikyatêd "Hirç û meriv", "Ker û gur", "Çivîk"," sala 1948-a hatine bernivîsarê.

**75. Ker û gur**-Kida Îvo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 74-a.

"Ker û gur" çîroka şîretkarîêye, ya derheqa heywana. Dide kivşê, wekî hergê tifaq hebe-kesek wana nikare.

**76. Çivîk**- Kida Îvo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 74-a.

**77. Hirç, gur û rûvî**- Nevata Hozo gotîye, binhêre nivîsarnasîya 72-a.

**78. Xayê kerê, xayê hespê û xayê gê**- Nevata Hozo gotîye, binhêre nvîsarnasîya 48-a.

# NAVEROK


Du gilî ....... 4

Xeznexaneke gel ....... 5

Dewsa pêşxeberê ....... 6

1. Elo û Fatê ....... 9
2. Şerê jina ....... 13
3. Mozik ....... 14
4. Xasê ....... 16
5. Ahmed û Mergîsk ....... 16
6. Nêçîrvanêd bra ....... 21
7. Kundur ....... 28
8. Qîza namûs ....... 34
9. Bêcan pelewan ....... 42
10. Ebûzêt ....... 48
11. Hebka Hinêr ....... 55
12. Ferat û Xosrov ....... 57
13. Mîrmehmed û beq ....... 63
14. Qero ....... 70
15 Dûrger oxlî û Semend ....... 76
16. Mîrze Mehmed û Kraszêrîn ....... 81
17. Qesavî comerd ....... 87
18. Çîroka Zal ....... 88
19. Aşiq Qerîb ....... 91
20. Rostem û kurê wî Gurgîn ....... 100
21. Stîya Al û Ferxê ....... 105
22. Rostemê Zal ....... 112
23. Silêman pêxember ....... 113
24. Hikyata Osman ....... 116
25. Rostem û xarzîyê wî Mehmed ....... 119

26. Çil Çop ........ 122
27. Tahar Mîrze, Zohireb, Gulîzer ........ 124
38. Cibrî ........ 130
29. Sê xort ........ 135
30. Çerxê felekê ........ 137
31. Serhatîya kesîb ........ 139
32. Kor û belengaz ........ 142
33. Qencî-qencîya tîne ........ 145
34. Gêla xerîb ........ 149
35. Rostemî Zal ........ 156
36. Hemze pelewan ........ 159
37. Sê rêwî ........ 163
38. Îsmaîl ........ 164
39. Mîrze Memûd û beran ........ 166
40.Silto ........ 168
41 Daûd pêxember ........ 169
42. Hemze û Baba ........ 172
43.Şîret ........ 177
44. Derew ji derewa mezintir ........ 178
45. Melle û wezîr ser bela xwe vebibin ........ 179
46. Weyseta bavê ........ 181
47. Tasa pîrê ........ 183
48. Xûşk û heft bira ........ 185
49. Çîroka Heqo, Neheqo ........ 187
50. Îvoyê kurmexarî ........ 189
51. Xelîfe û xortek ........ 192
52. Belûl ........ 192
53. Îskenderî Zuqurne ........ 196
54. Şivanê aqilbend ........ 197
55. Mirina wezîr ........ 199

56. Aqil....199
57. Aşê xal û xarzî....199
58. Kesîb û dewletî....200
59. Temo û Tahar....200
60.Sê kose....202
61. Bilbil....203
62. Çîroka mesî....204
63. Diz û padişa....205
64. Mesî sêrîda genî dive....207
65. Keda merîya şîrine....207
66. Min qebûle....208
67. Mecala du aqilbenda....209
68. Aqilê şivîn....209
69. Çawa kalê berî şerûd da....210
70. Kezê....211
71. Bûm....212
72. Mûrî û mixmixk....213
73. Gur û bizin....214
74. Hirç û meriv....214
75. Ker û gur....215
76. Çivîk....216
77. Hirç, gur û rûvî....217
78. Xayê, kerê,xayê hespê û xayê gê....218
79. Balûlî Zane....219
80. Caba aqil....220
Nivîsarnasî....221

**HIKYATÊD CIMETA KURDA**

**KITÊBA 6-A**

**Rêdaktor - ÇERKEZÊ REŞ**

Rêzkirina kompûtorê, korêktor, rûpêldanîn- **FRÎDA JEWARÎ**

ԳԱԱ Հիմնարար Գիտ. Գրադ.
220090241

A II
90241